

XWEDÊ, TU LI KÎDERÊ YÎ?!

NAVA QÛMISTANA
XWEDA QEWATÊ Û
MEREM BIBÎNE



CON BÎVÊR

Hevalê Giranbiha,
Dema ku em rastî cêribandinên dijwar û pevçûyîna tîn, wî çaxî gelekî hêsa ye derheqa sozdayînên Xwedê de bîr bikin. Min ev kitêb nivîsîye, ku piştgirîyê bidime we: her êtapeke nava jîyana meda bi meremekî ye, usa jî qûmistan e.

Nava êtapên qûmistanêda Xwedê dilê me dide nermkirinê û keysetê me çê dike, me bona wan bernamên mezin hazir dike, ên ku Ewî bona me qirar kirine. Diqewime hûn texmîn bikin, ku Xwedê bêdeng e, û hazirîya Wî ji we dûr e, lê Xwedê we tenê nehiştiye: Ew dilê weda xebatê dike. Bi xwendina vê kitêbê, hûnê bibînin wekî pêşkêftin wî çaxî tê, dema ku hûn bi açixî qûmistana xwe derbaz dibin.

Ev kitêb bona we pêşkêş e. Bi vê matêriyalê, aza wan bawarmenda ra pareve bin, bona kîjana ev banga piştgirîyê lazim e. Usa jî li sayta CloudLibrary.org-ê biqesidin bona ku hûn gelek matêriyalên bi zimanê xwe bar bikin û lêkolîn bikin.

Ez dua dikim, ku hûn qûmistana xwe derbas bibin û beşa qewat û serwêriya Wî ya diha zêde bistînin, bi dilrehmîyêva tijî bibin û dengê Wî diha baş nas bikin. Ez dua dikim, ku çawa zêr nava agirda paqij dibe, usa jî şuxulkariya we ya li qûmistanê we bike mîna zêrê paqij.

Sozên Wî her dem bîra xweda xweykin û hetanî dawîyê herin.

Duakirî bin!

Con



CloudLibrary.org

Con Bîvêr
JohnBevere@gmail.com



MESSENGER
INTERNATIONAL
MessengerInternational.org



The background features a large, stylized eye shape on the right side, with a bright circular center. The overall design is minimalist and uses a grayscale color palette with soft, flowing lines.

XWEDÊ, TU LI KÎDERÊ YÎ?!

NAVA QÛMISTANA
XWEDA QEWAÊ Û
MEREM BIBÎNE

XWEDÊ, TU LI KÎDERÊ YÎ?!

NAVA QÛMISTANA
XWEDA QEWATÊ Û
MEREM BIBÎNE



CON BÎVÊR

God Where Are You?! by John Bevere, Kurdish Latin

© 2019 Messenger International

www.MessengerInternational.org

Originally published in English as God Where Are You?!

Additional resources in Kurdish Latin by John Bevere are available
for free download at: www.CloudLibrary.org

To contact the author: JohnBevere@ymail.com

“Xwedê, Tu li kîderê yî?!”, Con Bîvêr, bi kurdîya latînî

© 2019 Messenger International

www.MessengerInternational.org

Pêşda bi zimanê inglîzî, bi sernavê “God Where Are You?!”

hatiye weşandinê

Matêryalên Con Bîvêre mayîne bi kurdîya latînî hûn dikarin belaş li
malpera www.CloudLibrary.org-ê barkin

Bo îzbatkirina pêwendiyên tevî xudanê kitêbê: JohnBevere@ymail.com

SERECEM

| | |
|---|-----|
| PÊŞGOTIN | vii |
| NAVEROK | 1 |
| 1 "TU LI KÎDERÊ YÎ?" | 5 |
| 2 HEVKARÎYA BAŞ | 17 |
| 3 QÛMISTANA PÊWÎST | 27 |
| 4 HELEQETÎ | 37 |
| 5 ŞERABA NÛ | 49 |
| 6 REWA EZMÎN | 63 |
| 7 RÎYA XWEDÊYE HERE BAŞ | 75 |
| 8 BAŞ ÇÊ BIKIN | 91 |
| 9 HÎNBÛNA QÛMISTANÎ | 105 |
| 10 AV LI QÛMISTANÊ | 119 |
| 11 RÊYA XUDAN HAZIR BÎKIN | 133 |
| 12 SERKEFTINA LI QÛMISTANÊ | 149 |
| PIRSÊN BONA GOTÛBÊJKIRINÊ | 167 |
| ZÊDEKIRIN | 173 |

PÊŞGOTIN

“Çimkî Xudan wê Sîyonê baristan bike, wê hemû xirabên wê û qûmistana wê mînanî buhuştê çê bike û cîhê wêyi xwelî bike mînanî Êdênê. Wê nava wêda eşq û şahî be, dengê pesindayîne û stirana be”.

- Îşaya 51:3

Ez kitêba Îşaya hiz dikim: ew peymanî Kevinda pêxemberê minî herî hizkirî ye. Nava vê xeberêda Îşaya alêgorîyayê dide xebatê, bona ku me bide bawarkirinê, wekî Xwedê divedîne hemû govekên jîyana meye bê-fayde werguhêzî baxçên eşqê bike. Ev xeber eyan dikin, wekî axa qûmistanêye hişkbûyî, bi texmîn, nîşana werguhastina me ye. Ew çî ku berê bûye, ji me tê dûrxistinê, em derheqa wê yekêda eyantîyê distînin, çî ku wê pêşerojêda bibe. Bavê me me vê êtapa hazirbûnêra derbas dike, bona ku em bighîjine sozên Wî.

Bo min qedir bûye ku ez li rex malxwê xwe bim, wextê ku em qûmistanên bêgumanîyêra derbas dibûn, li kîderê girên qûmêye bêgumanîyê dixwestin me unda bikirana. Min dîna xwe didayê, ku ewî çawa dua dikir, difikirî û dikire qîrîn: “Xwedê, Tu li kîderê yî?!”

Em her şev hişyar diman, difikirîn ku şaşîya me kîjane? Diqewime em şimitî bûn, lê diqewime me şaşî kiribû, ya ku me dikaribû rast bikira.

Her roj, sibê zû, hetanî derketina royê, Con ji malê derdiket bo ku guhdar bikira û bersiva wê yekê bigerîya... bi wê gumanê, wekî wê rojê wê zelalbûn û guhartin bianiya. Ez nerihet bûm û hîvîya paşdahatina wî bûm. Wextê ku ew dihate malê, kurên me êdî hişyar bûn.

-Te tiştêk bihîst?, - min hêdî digote wî. Con serê xwe dibir-dianî. Kederê dilê min dipêça û gumana min dida tarîkirinê.

Diqewime em dîn bibûn? Diqewime me bi rastî dengê Xwedê bi-

hîstîbû? Gelo ew yek dikaribû bibûya? Heger Xwedê hetanî li vir rêberî li me kiribû, bo çi Ew nava tengavîya meda bêdeng bû.

Belê, ez li qûmistanê razî nîbûme.

Xwezî wî çaxî min hemû tişt bizanibûya, çi ku ez niha zanim. Ezê nava qûmistanêra bi dilê diha sivik û bi gavên bawarîyêva tijîbûyî derbas bûma. Minê fem bikira, wekî nava wî wedeyîda ez paqij û hazir dibûm.

Bin ronahiya vî hemû tiştîda, ez difikirim, wekî ev kitêb rênîş e, û gelek alfyava pêşkêş e. Dersên qûmistanê qebûl bikin, û nava êtapa jîyana weye bi sirêda ewê qulixeke baş bidine we.

Serê xwe bilind bikin: hûn tenê nînin.

- Lîza Bîvêr

Li gora kovara “*Nyû York Tayms*”-ê,
xudana kitêbave eyan

NAVEROK

Ev kitêb derheqa wê şuxulkarîya min, ya li qûmistanêdane, usa jî derheqa cêribandinên gelekaye wî cûreyîdane. Ez hela hê “negihîştîmê”, û min ne jî ew hemû tişt stendîye, çî ku Xwedê bona min hazir kirîye, lê ez dua dikim, wekî hûn nava van rûpelên kitêbêda qewata lazim û serxwebûnê bibînin, bona ku hûn li ser xwe guman berbi navê xweyî nava Xwedêda herin.

Ez nabêjim, wekî ew kitêb lêkolîneke berbiçev e. Derheqa wê yekêda meriv dikare zêde binivîse. Lê belê, vê kitêbêda ez bi wan alfiyên serekeva tevî we pareve dibim, yên ku derheqa wî wedê qûmistanêdane. Meremê kitêbê ewe, ku ez nasîya we bidime wê têtmayê, bona ku îzinê bidine Ruhê Pîroz ku vê bangê bike ya kesane û wê nava jîyana weda bide xebatê.

Ev kitêb derheqa wê yekêda dibêje, ku qûmistan çî *ye* û çî *nîne*. Li vir derheqa merem û kardarîya qûmistanêda tê axaftinê. Duayê min ew e, wekî bi meselên, şirovekirin û şîretên vê kitêbêda raberkirî hûn fem bikin ku çî cûreyî hûn bi aqilmendî li qûmistanê bişuxulin.

Çawa ku min got, hûnê gelek meselên ji jîyana min bibînin, yên ku wextê herdu kifşkirinên mine qulixêda qewimîne. Ya ewlin li bajarê ştata Têxasêyî Dallasê bû, li kîderê çar û nîv salî min qulixî serwêrê xwe û mêvanên wî kir. Êtapa qûmistanêye bona min ya wê demê wextê 18 mehên dawî bû, wextê ku ez hatibûme kifşkirinê. Êtapa mayîn jî wextê kifşkirina duem bû: ez li civîneke li Flordîyaê du û nîv salî serwêrê qulixdarîya cahila bûm. Himberî qûmistana duda, qûmistana min ya ewlin ya li Dallasê minra çawa şayî hate texmînkirinê. Tişteki ecêb e, lê ew cêribandina qûmistanêye berk dîsa nava 18 mehên dawîda qewimî.

Gelo nava jîyana mînda êtapên qûmistanêye mayîn tunebûne? Bêguman hebûne, lê wextê ku ew destpê bûn, min îdî ew baş fem dikirin. Min nedikire qîrîn: “Xwedê, ev çî diqewime?”, yan jî “Xwedê, Tu li kîderê yî?”. Nava êtapên derbazbûyîda ez awqas tişt hîn bibûm, wekî

min zanibû ku çî diqewimî û nava wî halîda min gerekê çî bikira.

Min tevî gelek mêr û jina qîse kirîye, yê ku nava vê êtapêda nin. Çawa qanûn, ew derheqa tevlihevbûn û gumanbirîya xweda dibêjin. Gelek qet fem jî nakin ku çî diqewime. Van axirîya, tevî Lîza jina xwe me du dengnivîsar derheqa wê yekêda hazir kirin, encamên kîjana diha berfireh bûn, lê ne ku pêşda me çî stendibû. Wê yekê ez anîme li ser wê qirarê, ku ez kitêba xweye ewline nivîsar careke mayîn lê binihêrim, ya ku pêşda bi sernavê “*Serkeftina li qûmistanê*” hatibû çapkirinê.

Ew kitêb nêzikî 30 salî pêşda min nivîsibû. Dema ku min bi guhdarî xwend, min fem kir, wekî ew bona salên 1980-yî û destpêka 1990-î banga pêxembertîyê bû. Dêmek, me tevî rêdaktorê xwe rastyên bêwedeye ji wê kitêbê cuda kirin, gelek prînsîp serda zêde kirin, yê ku nava 30-î salên dawîda hebûne, û me kitêbeke nû nivîsî. Dêmek eva kitêba lênihêrandî nîne, lê bangeke nû ye. Ez gumanim, wekî ev kitêb, ya ku niha destê wêda ye, ya bona wedê kifşkirî nîne, ya ku wê him roja îroyîn, him jî nava pêşerojêda alî meriva bike, ku evê êtapa jîyanêye girîngra derbas bibin.

Nivîsar e: “Wedê hemû tiştî heye û wedê wê yekê heye, çî ku bin ezmînda tê kirinê” (Zanebûn 3:1). Jîyana me pareveyî li ser êtapa dibe û meremê her êtapekêye mexsûs heye. Girîng e ku meremê her êtapekê fem bikin, bona ku nava wêda tiştên rast bikin. Wê gelekî hewaskar bûya, heger merivek bi kincên zivistanêye sportê bi rêya şîrîtê hilkişîya serê çîyê û bi hemû eşiyayên sportêva, ji rêya şîrîtê peya bûya û dewsa xweşimitandinê deverû biketa. Bo çî? Çimkî ew havînê hilkişîya bû serê çîyê, wextê ku li ser çîyê berf tune bû. Ew kirên wî wê zivistanê kardar bûna, encamên wana vê êtapêda zyankar bûn.

Kitêbêda ez dixwezim derheqa wê êtapa girîngda bidime hînkirinê, ya ku bona zêdekirina qewatên me têra hatîye dîtinê. Meremê wê yek e, em xwe *amade bikin*. Hûnê carekêra bibînin, wekî ez gelekî derheqa qulixdarîyêda dibêjim. Ji me her kes bona şuxulkirina nava govekekêda, bîznêsê, perwerdê, saxlemîxweykirinê, serkarîkirina dewletê û govekên mayînda, hatîye gazîkirinê. Navê min pênc pêşkêşên qulixê ne: dêmek serhatîyên min derheqa wê yekêdanin. Lê belê, hûn dikarin prînsîpên

vê kitêbê nava her govekekêda bidine xebatê, li kîderê Xwedê gazî we kirîye. Merivên ku nava goveka bîznêsêda hatine gazîkirinê, gerekê hema bi wî cûreyî bona navê xwe amade bin, çawa ku qulixçiyên Mizgîniyê wê yekê dikin. Ev derheqa hemû govekên jîyanêdane.

Dîsa tişteki bêjim: min beşên zêde raber kirine, yên ku çawa “Qûmistanê çawa derbas bibin” tê navkirinê. Nava wanda şîretên cuda hene û xeberên piştgiriyê hene, yên ku wê şuxulkariya weye li qûmistanê diha kardar bikin. Ez gumanim, wekî ev bang wê zelalîyê bîne nava jîyana we, bona ku hûn rûyê nezanîya derheqa qûmistanêda zyanê nekevin, çawa ku ew yek hate serê min, û ewê piştgiriyê bide we ku hûn her dem berbi Şexsê tek-tenê bicedînin, yê ku dikare razîbûnê bide we.

Bi dil:

Con Bîvêr,

Meha çile sala 2019-a


“TU LI KÎDERÊ YÎ?”

“Wextê ku em bi bêdengî li ber zîhabûnê û wêranîyê teyax dikin, em şedetîyê didin, wekî em Xwedê hiz dikin, lê wextê ku Ew bi şîrinaya hazirîya Xwe li me diqeside, Ew şedetîyê dide ku me hiz dike”.

– Madam Gîyon /Janna-Maria Bûvyê dê la Mott-Gîyon

“Awa ez berbi rojhilatê diçim û Ew tune, û berbi rojavayê diçim, û Wî nabînim. Berbi bakûr, nava şuxulkarîya Wî da, û ez nizanîm: li başûr tê veşartinê, û ez Wî nabînim”.

– Îbo 23:8, 9



Ez li ser hemûya hêrsketî bûm û min qet nizanibû jî bo çî.
Tê bêjî tu tişt nedihate stendinê.
Kurê minî ewlin Êdîson 18 mehî bû, û ez hindava wîda bêsebir bûm.

Min li ser Lîzayê dikire qîrîn.

Ez ji serwêrê xwe aciz bibûm.

Ez li ser wan meriva hêrsketî bûm, tevî kîjana ez dixebitîm.

Ez bi dil xwe mikur bêm, wekî diqewime ez ji Xwedê jî aciz bibûm û li ser Wî hêrsketî bûm. Min gazinê xwe dikir:

“Tu çî dikî?”

“Bo çî Tu nava jîyana minda naşuxulî?”

“Mîyaserbûna wan sozdayîna li kîderê ye, yên ku Te dane min?”

“Bo çî tu tişt nayê stendinê?”

“Bo çî Tu minra xeber nadî?”

Min, ser hev, bin pozê xweda, dikire kute-kut û nerazîbûna xwe dida kifşê: “Tu li kîderê yî?”

Gelo nava jîyana wêda usa bûye, wextê ku dihate texmînkirinê, wekî Xudan awqasî nêzîk bû ku tenê bes bû, wekî meriv tenê navê Wî bi dengê nimiz bida, û we *carekêra* hazirîya Wî texmîn dikir û bersiva Wî dibihîst?

Lê belê, demek hat wextê ku hûn berbirî Wî dibûn, lê we tu bersivek nedistend. Tê bêjî Ew ji jîyana we derketibû. Diqewime hûn niha halekî usadanin û hûn dixwezîna nava wê bêdengîyêda hema wê pirsê bidin, ya ku min dida: “Xwedê, Tu li kîderê yî?”

Ez li qûmistanê bûm, lê min derheqa wê yekêda nizanibû. Ez li ştata Têxasê, li bajarê Dallasê dimam û min xwe çawa peyhatîyê Îsayî qenc

hesab dikir, yê ku ji alfyê Xwedêda hatibû bîrkinê. Wedekî kurt bû ku ez bibûme mesîhî û ez difikirîm, wekî ew yek bona min cêribandina qûmistanêye ewlin bû.

Hetanî wî çaxî tenê bes bû ku min gazî bikira, û Xudan carekêra bersiva min dida. Tê bîra min, wekî Ewî hetanî bersivên mine bêfikir jî didan. Hazirîya wî gelekî nêzîk bû, gelekî zelal bû, gelekî qewat bû. Dêmek wî çaxî min fem nedikir ku çi diqewimî. Min her roj li ser çoka ji Wî dipirsî: "Xwedê, ev çi diqewime? Tê bêjî Tu bi mîlîyona kîlomêtra ji min dûrî".

Min her dem jîyana xwe dinihêrî û dipirsî: "Gelo min gunehkî çiqasî xirab kirîye?"

Bêguman, mîna her kesekî li vê dinîyayê, ez carina dişimîtîm û guneh dikir, lê min jî lez tobe dikir û baxşandina Îsa hîvî dikir. Çiqasî ez zanim, nava jîyana minda gunehê her demî û bi zanebûn tunebûn.

Her roj, wextê ku zîhabûn dihate texmînkirinê, min dipirsî: "Xwedê, bona çi Tu êdî minra xeber nadî?"

Meriv çetin wê bikaribûya min himberî navekî ji Kitêba Pîroz Îbo bikira, lê bersivdayîna min hinekî mînanî bersivdayîna wî bû. Xeberên Îbo, yên ku wextekê bona min çawa yên xerîb dihatine texmînkirinê, niha diha femdarî dibûn. Ji xeberên wê kitêbê çend xeber gelekî rast ew halê li qûmistanê dianîne ber çava, yên ku derheqa minda bûn.

"Awa ez berbi rojhilatê diçim û Ew tune, û berbi rojavayê diçim, û Wî nabînim. Berbi bakûr, nava şuxulkarîya Wî da, û ez nizanîm: li başûr tê veşartinê, û ez Wî nabînim" (Îbo 23:8,9).

Min ser hev dua dikir, lê tê bêjî ezman mînanî sifir qewîn bû.

Wê demê Xudan nîşanî min da, wekî nava jîyana mesîhîfyêda himberîhevkinên tevî mezinbûna zarokê hene. Ez merivê ruhanîyî zarok bûm, lê niha jî ez berbi êtapa nû diçûm. Nava wî wedeyîda min ew yek bi mesela tebyetî didît. Êdîson nêzîkî 18 mehî bû. Lîza dayîkeke baş bû, û wextê ku Êdîson digirîya, ew carekêra nêzîk dibû û hildida li ser milên xwe. Ew carekêra dikete hembêza dayîka xwe û dihate têrkirinê, xwerin û berdildahatin distend.

Feqet Êdîson, mîna her zarokekê gerekê mezin bûya û bi kutasî bighîšta mezinayê. Wede hat, dema ku hemû kurên me (çar kurên me hene) gerekê bi xwe xwerin bistendana. Xwedêyê min, wî çaxî tevîshevbûneke usa destpê dibû! Ez zanim wekî hûn min fem dikin. Dema ku wana dicêriband bi xwe xwerinê bixun, nivê xwerinê dirijîya li ser kursî û erdê.

Zarok awqasî gumanbir dibin, wekî wana mînanî berê têr *nakin*, lê hûn êdî wana têr *nakin*, çimkî hûn dê û bavê cabdarin. Wextê ku zarokên me xwerin li dor- berên xwe dirêtin, me dixwest ku em nêzîkî wana bûna û bi destê xwe ew têr kirana, lê me zanibû, wekî ew yek wê îzin neda ku ew normal pêşda biçûna. Me îzin dida zarokên xwe ku ew mezin bûna. Me tu cara nedixwest ku bi kevçî hetanî 18-salîyê xwerin bidana wana.

Zarokên tezebûyî mezin dibin, û cûrê xweykirina wane bona pişt-girîya mezinbûn û pêşdaçûyîna wana tê guhartinê. Xwedê jî wî cûreyî dike, ku em bi ruhanî pêşda herin û mezin bibin. Wextê em mînanî zaroka tezebûyîne û bi Ruhê Pîrozva tijîbûyîne, Ew her car bersivê dide, wextê ku em gazî Wî dikin. Feqet, piştî hinek wede (û ez gumanim, ku emê mezinbin û emê tenê bîra şîr bikin, Îbranî: 5:12), Xwedê îzinê dide me bi êtapên usava derbas bibin, nava kîjanada Ew bersiva her gazîkirineke me carekêra nade. Menî ew e, wekî ew dixweze alî me bike, ku em mezin bibin û bighîjin.

Wextê ku Xudan alî min kir, ku ez fem bikim, wekî prosêsa gihîştina ruhanî mînanî wê yekê ye, kîjanêra her kes gerekê ji zarotîyê bighîje hetanî mezinayê, min destpê kir ku ez diha gelekî derheqa wê yekêda bifkirim û min ji xwe pirsî: *“Diqewime ez şaş dibûm? Diqewime, wekî nava çira ez derbas dibim, ji alîyê Xudanda ceza nîne? Diqewime, wekî ez birime qûmistanê ku tişteki hînbim, bona ku mezinbin û bi saya wê yekê ez diha bi kardarî li peyî Îsa herim û qulixî Wî bikim?”*

Wî çaxî min bîr anî, wekî ew yek hate serê Îsa jî. Hema peyî wê yekêra, wextê ku Ew ji alîyê Yûhennada hate nixumandinê, û Bavê Wî pesinê Wî da, Ruhê Pîroz Îsa bire qûmistanê. Îsa xeberên hêrs nedistendin û bêşik tu guneh nekiribûn.

Demek, wextê ku ez bi hêrsêva tijî bûm û gunê min li min dihat, ez fikirîm: *“Diqewime qûmistan awqas jî tirs nîne, çawa ku ez usa difikirîm?”*

Meriv çawa qûmistanê fem bike?

Heger em mînanî Îsa bin, wî çaxî xeysetê me gerekê pêşda here. Usa dertê, wekî qûmistan ew cîh e, yê ku Xwedê bona wê armancê bijartîye. Gelek cara, wextê ku em li qûmistanêne, tê bêjî Xwedê bi mîlfiyona kîlomêtra dûrî me ye, û sozên Wî valane. Feqet ew yek texmînkirin e, lê ne rastî ye. Bi rastî Ew nêzikî me ye, çimkî soz daye me, ku wê tu cara me bernede û me tenê nehêle (binihêre Îbranî 13:5).

Derbasbûna nava qûmistanêra êtapeke usa ye, li kîderê tê bêjî çûyîna we dijî xiyalên we û wan soza ye, yên ku çawa ku hûn li ser xwe guman zanin, Ewî dane we. Nava qûmistanêda hûn mezin bûn û pêşkeftina ruhanî texmîn nakin. Bi rastî hûn dikarin texmîn bikin, wekî hûn serbara serda paşda diçin. Tê bêjî hazîrîya Wî kêma dibe, lê ne ku zêde dibe. Diqewime usa bê texmînkirinê, wekî hûn nayêne hizkirinê û hesabildanê, lê ew yek rast nîne.

Bêşik, qûmistan ew cîh e, li kîderê hemû peyîhatîyên Mesîhe bêqelîpîn, nenihêrî wê yekê, wekî hûn dikarin texmînkirin, ku hûn tenê mane. Rastî ew e, wekî qûmistan bona her zarokê Xwedê pêwîst e. Bi rastî, bona bûyîna şagirtê Îsayî aqilmend û gihîştî, diqewime hûn çend cara qûmistanêra derbas bibin.

Xwezila min bikaribûya li ser xerîtê rêya kurt, yan jî hêsa, nişanî we bida, hûn neketana nava cîhekî usa, lê tiştê wî cûreyî tune. Hevalê min, ew yek baş e, çimkî derbasbûna meye qûmistanêra û qebûlkirina wê êtapê pêwîst e, heger em dixwezin bighîjine welatê xweyî sozdayî.

Qûmistan çî ye?

Şikir ji Xwedêra, ji me gelek mecbûr nînin bi fizîkî li wan cîha bijîn, li qûmistana rast, li kîderê av tune û gelekî dijwar e cîhê mayîne bibînin. Roj germ e, lê şev jî sar e, û em tenêne, tî û birçîne. Tevî wî hemû tiştî, em undabûyîne û em nizanin çawa ji wî cîhê derbikevin. Diqewime em li cîhê usa nîbûne, lê *texmînkirinên* qûmistanî li cem me hebûne. Vê kitêbêda ezê derheqa çend cêribandinên xweye qûmistanêye

girîngda wera gilîkim: nava jîyana minda cêrge qewimandinên wî cûreyî qewimîne, û ji wana tu yek yên xweş nîbûne.

Mizgînî ew e, wekî qûmistan gerekê prosêsa xirab nîbe, heger em hazirin gura Xwedêda bin. Ez zanim, wekî ew yek dikare çawa tiştê ne nêzîkî aqila bê texmînkirinê, lê meremê qûmistanê yê baş e, ku me telîm bike, paqij bike, qewat bike û me bona heja nû, ya Ruhê Wî amade bike, nava encamên kîjanêda emê diha gelekî rez bidin.

Gelek meriv wextê ku dikevîne qûmistanê, bi nezanî dikevîne nava tirsê û destpê dikin tiştên bêaqil bikin. Bêyî femkirin, ew dîcedînin tiştên şaş bikin û gavên şaş biavêjin. Mesela wê yekê dikare bibe guhartina cîhê xebatê, çûyîna ji civînekê berbi civîneke mayîn û her guhartineke başqe, ya ku bi fikira wana dikare wana bextewar bike, yan jî halê wanî sade bide dasekinandinê. Mînak, merivên tenê dikarin bi nezanî, piştî cîhêbûna bi êş, bi nezanî pêwendîyên nû destpê bikin.

Heger hûn bicêribînin hetanî femkirinê rê bibînin, ku bona çî Xwedê hûn anîne ew cîhê zîha, hûnê wedê xweyî li qûmistanê bidine dirêjkirinê. Nava encamên wê yekêda hûn dikarin diha zêde tengavîya bibînin, diha gelekî aciz bibin û binkevin, çimkî hûn wê êtapê û wî cîyî fem nakin, nava kîjanada Xwedê rêberî li we kirîye.

Ev yek hate serê zarokên Îsrayêl, yên ku çil sal li qûmistanê derbas kirin. Wana fem nekîr ku çî dihate serê wan, û nava encamên wê yekêda nisileteke tam kêrî welatê Sozdayî nehat. Eva tiştêkî tragîk e. Xwedê ew birine qûmistanê ku wana bicêribîne, telîm bike û hazir bike, bona ku ew qewat bûna û şerkar bûna, ku bikaribûna bibûna xweyê sozê ji alîyê Xwedêda stendî, welatê xweyî nû. Dewsa wê yekê zarokên Îsrayêl bi şaşî qûmistan çawa ceza fem kirin û destpê kirin gazina bikin, şikyat bikin û bixwezin.

Dema ku wede bû ku ew ji qûmistanê dûr biketana û bibûna xweyê welatê Sozdayî, merivên wana paşda vegeşîyan û xeberdan kirin, nava encamên kîjanêda cimetê behsa xirab, ya derheqa merivên nerazî û şikyatkirda bihîst. Wana gerekê di navbera sozên Xwedê û karebûna Wî û fikrdarîyên merivatîyê û nekarebûna wanda hîlbijartin bikira, û wana qirar kir bawarîya xwe li meriva, lê ne ku li Xwedê, bînin. Wana ew derew qebûl kir, wekî ewê binkevin û wê ji welatê xwe şîr û hingiv nesi-

tendana. Wana rûyê nasnekirina xeysetê Xwedê û cudatîyada xirabî kir.

Xwedê bersiveke berfireh da wana, fikira kîjanê ev bû: “Hûn çawa dixwezin, usa bikin”. Ew prosêsa qûmistanêye wedekurt, ya ku gerekê salekê bikişanda, hetanî dawîya jîyana wana kişand.

Fesal bin! Emê nexwezî wekî nava serpêhatîya meda derheqa qirara wî cûreyîda nivîsarbe. Feqet em dikarin jî şaşîyên wana hînbin, û Pawlosê şandî derheqa vê yekêda dibêje: “Ev tişt hatine serê wana çawa mînak û bona şîretkirina me hatine nivîsarê” (A Korintî 10:11, CSB).

Heger em hînbin, cêribandina qûmistanê nas bikin, çawa ku em bikevine nava wê, dewsa hêrsa xwe rakirinê û kirina gazina emê razîbin, wextê ku em bizanbin, wekî piştî wê yekê “welatê” gihîştina nû, qewatê, dua, mecala û sozên mîyaserbûyî tê. Nava encamên wê yekêda ev wedê dijwar wê awqasî jî dijwar neyê texmînkirinê, û emê Aqûbra qayîlbin:

Wextê ku hûn rastî her cûre tangasîya tîn, wê yekê çawa mecala bona şabûna mezin hesabkin... çimkî dema ku sebira we (yan jî teyaxê we) bi temamî hazirbe, hûnê tam bin û hewcê tu tiştî nîbin” (Aqûb 1:2,4, NLT).

Gelo ketina nava qûmistanê dide kifşê ku ez bi rastî teribîme?

Pirseke baş e:

Bi ketina nava qûmistanê, bona me geleka nêzîkî aqilaye ku bipirsîn: “Şaşîya min kîjan e? Min çi kiriye, ku awqasî hêrsa Xwedê rakirîye?”. Ev yek derheqa kemala qûmistanê û meremê wêda fikirdarîke şaş e.

Nava Încîlêda û temamîya dîrokêda him mêr û him jî jin fem kirine, wekî qûmistanêda ew hazir bûne bona ku bikevine nava wî navî, yê ku Xwedê daye wan. Dêmek, qûmistan nade kifşê, wekî Xwedê we înkâr dîke: ew cîhê hazirbûnê ye.

Bêguman, ez difikirim, wekî meriv dikare rûyê qirarên şaşda bikeve nava halê qûmistanê. Rastî ew e, wekî nenihêrî wê yekê ku em çiqasî mînanî Îsa bûne, em hela hê gerekê dijî gunehê şerkarîyê bikin, û em hela hê dikarin bîn teribandî. Dêmek, em dikarin rastî pîrsgirêkên mezin bîn, heger em qirara şaş, yan jî cêrge qirarên awqasî jî nerast, qebûl bikin.

Qûmistanê çawa derbas bibin

#1 Wedê xwe fem bikin

Bawar bikî em hemû jî zendegirtî dimînin, wextê ku dikevine nava qûmistanê. Xwedê awqasî qenc e, û em hînî duayên Wî, hazirî û sozên Wî dibin. Em hîvîyê nasekinin, wekî ew dema baş wê ser hevda bê, lê rojekê em fem dikin, wekî tişte hatîye guhartinê. Dêmek, dewsa ketina nava tirsê, girîng e ku em halê pêşdahatî lê binihêrin. Hûn gerekê fem bikin, ku nava çira derbas dibin, çimkî heger fem nekin, ku nava kîjan êtapa jîyanêdanin û li kîderêne, bersiva we wê şaş be.

Vê yekê meriv dikare himberî guhartina klîmayê bike, ya Florîda başûre germ berbi bakûr, Kanadayê. Wextê ku zivistan tê û dereca hewê ji sifir nimiz dibe, hêja ye bizanibin, wekî bêyî potê germ hûn nikarin ji malê derbikevin.

Hema ev pirînsîp jî derheqa qûmistanêdane. Heger hûn guhdariyê nadine li ser wan nîşana, yên ku nîşan didin ku hûn cîhekî wêrandanin, hûn dikarin gelekî aciz bin û diqewime şaşîke usa bikin, ya ku paşê dikare li ser we biha rûnê. Peymana Kev-inda nivîsar e, wekî kurên Îsekar “wede fem dikirin û zanibûn, ku Îsrayêl gerekê çi bikira” (A Dîrok 12:32, NET).

Heger hûn fem bikin, wekî hûn ketine nava qûmistanê, hûnê jî bizanibin ku gerekê çi bikin.

Lê belê, rastî ew e, wekî Xwedêyê me û Serekkahîne meyî mezin heye, yê ku dibaxşîne, yê ku zeyîfyên me fem dike. Dêmek, bona derketina ji qûmistana ku rûyê pîrsgirêkên meda, yan jî gunehkarîya meda, pêşda hatîye, berê ewlin gerekê berbirî Bavê ku me hiz dike, bibin: “Bavo min guneh kirîye: ez _____ im (xebera têberdayî daynin). Hîvî dikim, li min bibaxşîne. Ez tobe dikim û niha ezê bi kerema Te destpêkim cûrekî mayîn bijîm”.

Gotina min ew e, wekî heger hûn rûyê şaşîyên xweda ketine nava cîhekî wêranbûyî, pêwendîyên xweye tevî Xudan rast bikin, îzinê bidin ku Ew wê yekê serhevda bîne, çi ku dixweze we hînke, û pêşda bilivin ku bikaribin zû ji qûmistanê derbikevin. Bêguman, wede Wî va girêdayî ye. Zebûr dinivîse: “Wedê min destê Te da ye” (Zebûr 31:15).

Bi hesabildana vî hemû tiştî jî, bi texmîn, hûn nava qûmistanêdanin, çimkî niha Xwedê dixweze ku hûn hema li wir bin. Hûn rûyê şaşîyên xweda neketine nava van dijwarîya. Ez zanim, wekî ji alîkîva ew yek hal diha zêde dide dijwarkirinê. Meremekî nivîsara vê kitêbêyî hîmlî ew e, ku alî we bikim, ku hûn fem bikin, ku Xwedê qûmistanê çawa dinihêre û Ew çiqasî dixweze wê bide xebatê, bona ku alî me bike mezinbin û diha gelekî mîna Îsa bin.

Rastîk jî heye, ya ku gerekê zelal bê femkirinê: Xwedê hûn neanîne qûmistanê ku li ber fêlbazîyên mîrêcin bihêle û derheqa weda bîr bike. Hetanî ku îzin hate dayîne ku nisileta Derketinêye duda bikeve welatê Sozdayî, Xwedê anî bîra wan:

“Bîr bîne temamiya rêya qûmistanêda, kîjanêda Xudan Xwedêye te eva çil salin ku te dibe, bona ku te ta bike, bicêribîne, wekî bizanibe çi dilê teda heye, ka tê emirên Wî biqedînî, yan na” (Q Ducarî 8:2).

Bi vî cûreyî, nenihêrî wê yekê, wekî Îsrayêlî teribîbûn û rûyê bêaqilîya, serhildan û bêşêkirîya xweda gelekî dirêj li qûmistanê mabûn, Xwedê gerekê we werguhêzî qencîyê bikira. Ew her dem wî cûreyî dike û ez gelekî bona wê yekê şa me. Gelo hûn şa nînin?

Derheqa qûmistanêda şaş nefikirin. Xwedê nava jîyana meda şuxu-lkarîya xwe nade sekinandinê, çimkî em li wir in: Ew me qûmistanêra *derbas dike*. Bêyî Wî, emê tu cara ji wir derneketana. Serda zêde bikim, wekî qûmistan ew cîh nîne, li kîderê Ew me li ser kursîyê zêde dide rûniştandinê, hetanî ku bixweze me bide xebatê. Bavê meyî dilrehm usa nake. Ew bi cûrekî qewat nava jîyana meda dişuxule, hema wî çaxî û li wî cîhî.

Dibêjin “Daristan rûyê darada nayê kifşê”. Hema wê yekê jî meriv

dikare derheqa qûmistanêda bêje: hûn nabînin, wekî Xwedê dişuxule, wextê ku hûn merkeza şuxulkarîya Wî da nin.

Em gerekê rastîkê jî zelal bidine dîyarkirinê: qûmistan cîhê binketinê nîne, qet na bona wan meriva, yên ku gura Xwedê da nin. Îsa qûmistanêda çil rojî ser hev ma, ji birçîbûnê zeyîfbûyî, bêyî tu kesî, ji kîjanî Ewî dikaribû guman û piştgirî bistenda, bêyî xweykirina bedenê û qewatên nebînayî, wextê ku mîrêcin êrîş bire li ser Wî. Îsa bi Xebera Xudan ser ket. Qûmistan ew cîh nîne, li kîderê zarokên Xwedê bin dikevin: “Lê şikir ji Xwedêra, Yê ku her dem pêga koma Mesîhe serkeftinêda rêberîyê li me dike...” (B Korintî 2:14, NET).

Wextê ku cimeta Îsrayêl li qûmistanê dima, miletên ku li wir diman, êrîş dibirine ser wan û Xudan temî dida Îsrayêl, ku derba cabdayîne bidin. Zarokên Îsrayêl hindava Emorîya (binihêre Jimar 21:21-25), Midîyana (binihêre Jimar 31:1-11) û cimeta Başanê (binihêre Jimar 21:33-35) serketin. Heger Xwedê bixwesta ku ew binketana, wî çaxî Ewê emir nekira ku wana tabîyên xwe biparastana. Nenihêrî wê yekê, wekî qûmistan gerekê cîhê binketinê nîbûya, lê belê, piranîya cimetê, bêyî ketina li welatê Sozdayî, mir. Ew yek ne ku Xwestina Xwedê bû, lê encamê gurûned-abûnê bû.

Ez hêvîdarim ku hûnê dilê xweda bên li ser wê fikirê, wekî menîya ketina nava qûmistnê ne nerazîbûna Xwedêtye, ne jî cezayê Wî ye. Qûmistan cîhekî usa nîne, li kîderê Xwedê we tenê dihêle û derheqa weda bîr dike. Qûmistan usa jî cîhekî usa nîne, li kîderê em dikevîne erdê û binketina xwe qebûl dikin.

Xwedê hazir dibe tişteki qenc bike

Şuxulkarîya li qûmistanê ne dema gera nişana, dua, zêdayê û ecêba nîne. Ew dema gera li dilê Xwedê ye, çimkî ewê xeysetê we çê bike û wê gewata we zêde bike. Ew wedê xweykirina dîtina we ye. Heger usa nebe, heger em sozên Xwedê dilê xweda zelal nebînin, wî çaxî ew şuxulkarî wê gumanbirîyê û gazina pêşda bîne.

Heger hûn fem bikin ku hûn li kîderêne, hûnê destpê bikin pêşeroja

xwe bibînin. Wî çaxî hûnê bikaribin destê Xwedê bibînin, heger hûn nêzîkaya Wî texmîn nakin. Wede ye ku hizkirina weye hindava Wî da bighîje ku hûn êdî nepirsin: “Ewê bona min çi bike?”, lê bipirsin: “Ew çi dixweze ku ez bikim?”.

Hê pêşda min ew acizî bîr anî, ya ku Îboyê pîrozî wedê kevinar da dîyarkirinê, wekî ewî fem nedikir ku Xwedê çi dixwest. Ew li kîjan alî dizivirî Xwedê nedidît. Heger şirovekirina Îbo bi wê yekêva ser hevda bihata, wî çaxî li cem wî wê gumanbirî pêşda bihata. Feqet Îbo gumanbir nebû û teslîm nebû: ewî bi gotina xeberên bawarîyê û gumanê berdewam kir:

“Feqet Ew rêya min zane: wextê ku min dicêribîne, ezê mînanî zêr derkevim” (Îbo 23:10).

Eva eyantîke gelekî berbiçev e. Çiqasî jî em bicedînin fem bikin, ku Xwedê me kuda dibe, lê Ewe, Yê ku rê zane. Em dikarin bi temamî li Wî aminbin, çawa ku Pawlosê şandî dinivîse: “Ez bi temamî gumanim, wekî Ewê ku dilê weda destbi şuxulê xweyî qenc kirîye, wê heta roja hatina Mesîh Îsa jî bighîne sêrî” (Fîlîpî 1:6, TPT).

Û em zanin, wekî eva rast e... hetanî li qûmistanê jî.

2

HEVKARÎYA BAŞ

“Dema ku mesîhî rastî bagerên miqabil tên, ew dikarin bi bedewetîya diha zêde bilindbin. Ew mînanî darên li ser çîyanin, yên ku ji aliyê bayêda lêxistîne, lê darên wan yê herî qewînin”.

- Bîllî Grêhêm

“Û Îsa bi Ruhê Pîrozva tijî...Ruh Ew bire qûmistanê”.

- Lûqa 4:1



Bi xêr hatine li qûmistanê! Hûn ji vê silava eşq zendegirtî mane? Hîmlî em hesab nakin, wekî mayîna li qûmistana ruhanî baş e, lê gerekê bizanibin, wekî Bavê meyî hizkirî cîhên wî cûreyî bilind qîmet dike, û niha hûn nava hevkarîya başdanin.

Heger hûn difikirin, wekî wê baş bibe ku hûn wextê bawarîya xwe nekevîne nava qûmistanê, ez bangî we dikim, ku hûn fikira xwe lê binihêrin. Rastî ew e, wekî li qûmistanê em rêçên pîrozîyên bêhesab dibînin, yên ku gelek wede li wir derbas kirine, û usa jî rêça Kurê Xwedê.

Bi gilîkî mayîn gotî, wextê ku em li qûmistanêne, em nava hevkarîya başdanin... û em tenê nînin.

Ez hîvî dikim, ku hûn min nava cêribandina raberkirina navên eyanda gunehkar nekin, lê ez bêjim wekî navnîşa binelîyên qûmistanê bi rastî berbiçav e.

Bêguman min îdî navê Îbo bîr anî, yê ku li gora Încîlê “ji hemû rohilatîya mezintir bû” (Îbo 1:3). Ewî hemû tişt unda kir, hebûna xwe, zarokên xwe, saxlemîya xwe û piştgirîya jina xwe. Neniherî wê yekê, wekî Îbo merivekî baş û heq bû, hevalên wîye nêzik ew nava gunehê veşartîda gunehkar kirin. Îbo li qûmistana xwe awqasî berxwe ketibû, wekî ew bi xwe difikirî ku wê diha baş bûya ku ew nehata li ser rûbarê dinîyayê.

Wextê ku hûn li qûmistanêne, hûn cîhên Birahîme derbasbûyîra diçin. Xwedê emir kir, ku ew merivê dewletîyî li bajarê Ûrê, yê ku jîyaneke baş derbas dikir, wî hemû tiştî bihêle û rêke başqe destpê bike, bona ku welatê sozdayî bibîne. Sara jî tevî Birahîm bû, ya ku gav bi gav peyî wî

diçû. Piranîya jîyana wana li qûmistanê derbas bû.

Mûsa jî qûmistan baş nas dikir. Ew li sera Firawin mîna kurê padişê mezin bibû, lê piştî kuştina yekî misirî ew kete qûmistanê, li kîderê çil salî pez diçêrandin. Hema li vir jî Xwedê nava dirîya ku dişewitî li Mûsa eyan bû:

“Mûsa pezê xezûrê xwe, Îtroyê terêqê Midîyanê, diçêrandin. Ewî kerî ajot çû berîyê derket û gihîşte Horêbê, çîyayê Xwedê. Milyaketê Xudan bi alava êgir nava dirîyêda wîva xuya bû. Ewî dîna xwe dayê, wê alav dirîyê ketîye dişuxule, lê dirî naşewite. Hingê Mûsa got: “Hela vegezin vê dîtinoka ecêb bibînin, ka çima dirî naşewite?”. Xudan dîna xwe dayê, wekî ew vegeziya ku bibîne, Xwedê ji nava dirîyê gazî kirê û gotê: “Mûsa, Mûsa!”. Ewî got: “Ez va me”” (Derketin 3:1-4).

Peyî wê yekêra, çawa ku em zanin, Mûsa paşda vegeziya Misirê û cimeta xwe ji wir derxist...berbi qûmistanê.

Li qûmistanê hûn rastî Êsiv, kurê bavê xweyî hizkirî tên, yê ku ji alîyê birayên xweda hate avîtinê li çelê, lê paşê bona xulamîyê hate firotanê û ew birine Misirê. Paşê ew hate zindankirinê, çimkî nava xirabkarîyêda hate gunehkarkirinê, ya ku ewî nekiribû. Paşê li hebsa Firawin Xwedê li Êsiv xuya bû, û ewî destpê kir xewinên nanpêj û merivê ku şerabê belav dike, şirove bike. Wê cêribandinê, bi nezanî, ew bona şirovekirina xewina Firawin hazir kir.

Dawidê padişa jî li qûmistanê bû. Samûêl bû pêxember, yê ku wê paşê bibûya padişa, lê piştî wedekî kurt Dawid bona padişatîyê hazir dibû, yê ku li şikevtada dima û qûmistanada digeriya. Li wir Xwedê li Dawid xuya bû, çawa Serwêr, Zorayî, Mertal û Kela wî.

Yûhennayê Nixumdar bona pêxembertîyê hatibû gazîkirinê: bavê wî derheqa wê dîtinokêda jêra gilî kiribû, bi rêya kîjanê ew yek hatibû zanînê. Lê belê, Xwedê li qûmistanê li Yûhenna xuya bû, lê ne ku li mekteba încîlê. Ew li qûmistana Cihûstanê dima, kincên ji çermê heywana dirûtî xwe dikir û bi bihuka têr dibû. Lûqa 3:2,3-da nivîsar e: “Xebera

Xwedê berîyêda Yûhennayê kurê Zekeryara hat û Yûhenna hat hemû dor-berên çemê Êrdunê dannasîn dikir, ku cimê ji gunehkirinê vegere û bi avê bê nixumandinê, wekî Xwedê wan bibaxşîne”.

Li qûmistana Erebiştanê bû, wextê ku Xwedê ew hemû tişt li Pawlosê şandî eyan kir, yê ku wê bibûna piranîya peymanê Nû. Ew dini-vîse, wekî meremê Xwedê bû “ku Kurê Xwe li min eyan bike ku nava necuhyada wî dannasîn bikim, hingê min şewira xwe tu kesî nekir, ne jî rabûme Orşelîmê, cem ewên ku berî min bibûna şandî, lê ez pêra-pêra çûme Erebiştanê... (Galatî 1:16,17).

Yûhennayê şandî li kîderê bû, wextê ku ewî *Eyantîya Îsa Mesîh* stend?

“Ez Yûhennayê birê we, yekîtîya Îsada heval-parê weyî tengavîyê, padişatîya Wî û sebira we me. Ez bona Xebera Xwedê şedetîya bona Îsa wê giravêda bûm ku jêra Patmos dibêjin” (Eyantî 1:9, NLT).

Patmos girava xwelî bû û bona cêribandina qûmistanê cîhekî kamil bû.

Tiştê herî girîng ew e, wekî Îsa rêberîyê li we dike, Yê ku eşkere duayê Bavê xwe û Ruhê Pîroz stend, bi rêberîya xwedêtîyê çû qûmistanê ku rastî fêlbazîyên mîrêcin bê.

Min gelek cara dîtîye, wekî hema gelek cara vî cûreyî diqewime: Xwedê tiştên mezin nîşanî me dide, kîjana Ew dixweze pêşerojêda bi destî me mîyaser bike, lê paşê raste-rast dibe qûmistanê, bona ku me hazir bike.

Heger qûmistan bona pîrozên kifş û Îsa Mesîhê me pêwîst e, ez dikarim wê fikirê qebûl bikim, ku wê diha baş bibe em wedekî li wir derbas bikin, nenihêrî wê yekê, wekî minê bixwesta ku rêyeke diha hêsa hebûya. Qûmistan ew cîh e, li kîderê Xwedê dicêribîne, dide takirinê, qewat dike û me paqij dike. Hema li vir e, wekî xeysetê Wîyî xwedêtîyê nava meda çê dibe. Qûmistan cîhê hazirbûnê ye, bona mîyaserkirina xebata kardare nava Padişatîya Wî da.

Qûmistanê çawa derbas bibin

#2 Hûn çiqasî jî xwe tenê texmîn bikin, Xwedê li cem we hazir e

Gelek cara alîkî cêribandina qûmistanêyî girîng ew e, wekî tê bêjî Xwedê ne nava jîyana medane. Tê bêjî Ew bi mîlîyona kilomêtra ji me dûr e, lê em hewcetîya hazirîya Wî ji hemû tiştî zêdetir texmîn dikin.

Girîng e wekî hûn du cûrên hazirîya Xwedê fem bikin. Ya ewlin, li ser vê xebera Încîlê hatîye hîmdanînê: “Ezê tu car ji te neçim û tu car te bernedim” (Îbranî 13:5). Eva heyîna Xwedê ya herdemî ye. Dawidê padişa derheqa wê yekêda dibêje: “Heger rabime ezmên, Tu li wir î, berjêr herime diyarê mirîya, dîsa li wir î” (Zebûr 139:8). Heger hûn Încîlê bawar dikin û aminaya xwe li Xwedê tînin, hûn zanin, wekî bêyî texmînkirinên we û halên cûre-cûre, Xwedê tevî we ye.

Dîyarbûna hazirîya Xwedê ya mayîn kîjanê em hemû jî hiz dikin û ya ku beşeke jîyana mesîhîtiyê ye, hazirîya Wîye eyanbûyî ye. “Eyanbûn” dide kifşê, wekî tiştê ku nayê dîtinê bibe yê dîtinê, tiştê ku nayê guhdarkirinê bê guhdarkirinê û tiştê ku nayê zanînê, bê zanînê. Em bi wê yekê careke mayîn dijîn, wextê ku Xwedê Xwe li me eyan dike. Hevdîtina wî cûreyîye tevî Xwedê gelekî baş e, ya ku dikare wana wextê pesindayînê, yan jî nava duayê şexsîda biqewime, wextê gera nava daristanêda, wextê karên herroje û diqewime nava prosêsên başqeda jî.

Dêmek, heger hûn li qûmistanê birçîbûna ruhanî û tîbûnê texmîn dikin, û Xwedê bi hazirîya Xweye ecêb û hijmekar li we dua nake, tevlihev nebin û *gumana xwe bidine ser sozên Wî*, ji kîjana tiştê herî sereke ev e: “Ezê we bernedim û berê Xwe ji we venegerînim”. Ew yek, wekî em bi Wî va şa dibin û hazirîya Wî ya eyanbûyî texmîn nakin, diha gelekî zelaal hizkirina me ya hindava Wî da dide kifşê.

Qewimandina ruhdarkirinêye here qewat li qûmistanê ew e, wekî li wir Xwedê ji nûva eyan dibe. Îşaya pêxember dinivîse:

“Çimkî Xudan wê Sîyonê baristan bike, baristanîyê bide hemû xirabên wê, wê çol-bestên wê bike mîna Êdênê, qûmistana jî mîna baxçê Xudan. Wê nava wêda eşq û şayî be, dengê pesindayînê û stirana be” (Îşaya 51:3).

Buhuşt yan jî baxçê Êdênê ew cîhe, li kîderê Xwedê Xwe eyanî Adem dikir û ew bi hevra xeber didan.

Qûmistanêda û hindava Xudan da birçîbûnê û tîbûnê texmîn dikin: hûn nava tengavîyêda nin û diha bi kel û ced Wî digerin. Dêmek, wextê ku Xwedê qirar bike ku Xwe eyan ke, nava wî halîda hûnê diha bi hêsanî bikaribin ji vê jîyanê berê xwe vegeŕînine berbi Wî. Heger em bersiva banga Xwedê bidin, nava jîyana meda wê cêribandina vî cûreyî hebe. Xudan li qûmistanê ji nûva xwe eyan dike. Îşaya 45:15-da nivîsar e: “Rast Tu Xwedêyê ku Xwe dinixêmi, Xwedêyê Îsrayêl, Xilazkir”. Ew Xwe ji wan meriva dinixême, yên ku berbi Wî divedînin, bona ku hindava pêwendiyên nêzikda birçîbûna mezin pêşda bê. Xudan usa jî Xwe ji wan meriva dinixême, yên ku hindava Wîda birçîbûnê texmîn nakin, çimkî Ew tu cara îzinê nade ku bi cûrê nelayîq, yan jî sade, nêzikî Wî bibin.

Birçîbûna hindava Xwedê da

Xwedê wê li wan meriva Xwe eyan bike, yên ku bi temamiya dilê xweva Wî digerin.

Bîr nekin, wekî Xwedê got, ku Ewî zarokên Îsrayêl birine qûmistanê bona ku ew ta bûna û birçîbûn li cem wan pêşda bihata. Lê belê, dewsa texmînkirina birçîbûna hindava Xwedê da, mîna Yêşû, wana destpê kirin wî hemû tiştî bixwezin, çî ku Xudan ji wana dûrxistibû. Û dema ku Xwedê hat ku Xwe eyan bikira, çawa ku li Mûsa eyan kiribû, wana nexwest Wî bibînin. Bi gilîkî, wana Xwedê înkâr kir. Nava kitêba Qanûna Ducarîda nivîsar e:

“Çaxê we deng ji nava tarîstanê bihîst, çîya jî bi agir dişewitî, wî çaxî hûn, hemû serwêrên qebîlên we û rûspîyên we nêzîkî Min bûn û gotin: “Awa Xudan Xwedêyê me rûmeta Xwe, mezinaya Xwe nîşanî li me kir û me dengê Wî ji nava agirda bihîst. Îro me dît, wekî Xwedê tevî însên xeber dide, û insan sax dimîne. Niha çima em bimirin? Ev agirê hanî mezin wê me hûfî xwe bike, wekî em dîsa dengê Xudan Xwedêyê xwe bibihên emê bimirin. Çimkî kîjanî xwîn-goşt dengê Xwedêyê zêndî ku ji nava êgir xeber dida, mîna me bihîstîye û sax maye? Tu here nêzîk bibe û bibihê, hemû çî ku Xudan Xwedêyê me wê bêje û tu tamamî mera bêje. Çi ku Xudan Xwedêyê me wê bêje te, emê jî bibihên û biqedînin”” (Qanûna Ducarî 5: 23-27).

Careke mayîn Xwedê dixwest Xwe li cimeta qûmistanê eyan bikira, çawa ku Xwe li Mûsa eyan kiribû. Lê cimet ji wê hevdîtîne paşda vekişîya, û hîvî ji Mûsa kir: “Tu here nêzîk bibe û bibihê, hemû çî ku Xudan Xwedêyê me wê bêje û tu tamamî mera bêje. Çi ku Xudan Xwedêyê me wê bêje te, emê jî bibihên û biqedînin”.

Mixabin, cimetê usa jî Xwedê *nas nekir*. Zarokên Îsrayêl tenê derheqa Wî da *zanibûn*. Rûyê wê yekêda wana usa jî nikaribû wî hemû tiştî biqedînin, çî ku Ewî emir dikir. Rûyê nasnekirinêda wana usa jî ew welat nedîtî, ye ku hatibû sozdayîne û ew li qûmistanê mirin.

Xwedê me dibe qûmistanê, çawa ku Yûhenna, Mûsa, Dawid, Ûsiv, Pawlos û yên mayîn birin, bona ku bicêribîne û bizanibe, ku gelo emê hindava Wî da birçîbûnê bibînin, yan jî emê jîyana berêye baş û eşq bixwezî, ji kîjana em miqûf mane. Aqûb dinivîse:

“Û gava hîvî dikin, nastînin, çimkî ser nêta xirabîyê hîvî dikin, wekî kêfên dilê xwe derbas bikin. Bêesilno! Hûn nizanin kê wê dinîyayê hiz dike ew neyartîyê li Xwedê dike? Awa kî dixweze bibe yarê dinîyayê, ew xwe dike neyarê Xwedê. Yan jî bi texmîna we badîhewa nivîsar dibêje, ku Xwedê demana Wî Ruhê ber meda ye? Lê belê, Ew hê keremê dide me. Lema nivîsar dibêje: “Xwedê miqabîlî kubar-babaxa ye, lê keremê dide şikestîya. Awa ber

Xwedê şikestî bin. Dijî mîrêcin bisekinin û ewê ji we bireve. Xwe li Xwedê bigrin, Xwedê jî wê xwe li we bigre. Destên xwe bişon, gunehkarno, dilên xwe paqij bikin, dudilîno” (Aqûb 4:3-8).

Dema ku em bi tamamîya dilê xwe nêzîkî Xwedê bin, Ewê nêzîkî me bibe. Zarokên Îsrayêl diha gelekî derheqa xwestinên xweda difikirîn, lê ne ku xwestinên Xwedê da. Ew bêsil bûn û berbi wan hemû kêfa divedandin, yên ku rêyên vê dinîyayê dikaribûn bidana. Wana gelekî zû bîr kir, wekî ev hebûn û dewlmendîya dinîyayê misirî û eskerê wan xilas nekirin.

Xwedê dibêje, wekî bona ku nêzîkî Wî bin, em gerekê du tiştî bikin. Berê ewlin destên xwe bişon. Nava B Korintî 7:1-da nivîsar e: “Em ku xweyê van sozane, delalno, de em xwe ji hemû kirêtiya, qalib û ruhê xwe paqijkin û bi xofa Xwedê lap buhurtî-jibare bin”. Guneh me ji Xwedê diqetîne: “Lê belê, ew neheqiyên we hûn ji Xwedê qetandine, Ewî ji dest gunehên we piştî xwe da we ku nebihê” (Îşaya 59:2).

Ya duda, dilên xwe paqijkin, Aqûb dinivîse: “Dilên xwe paqijkin, dudilîno”(4:8). Merivên dudilî hew dinihêrî berbi Ruh diçin, yan jî berbi bedenê diçin. Fikir û dilê wan li ser xwestina Xwedê îzbatbûyî nînin. Kolosî 3:1-3-da nivîsar e: “Awa ku hûn tevî Mesîh ji mirinê rabûne, ku usa ye, li tiştên jorin bigerin, wê derê li kîderê Mesîh li milê Xwedêyî rastê rûniştî ye. Ser tiştên jorin bifikirin, ne ku li ser tiştên vê dinîyayê” (NKJV).

Dilê we li ser wan tiştî îzbatbûyî ye, berbi kîjana hûn divedînin. Nava vê beşêda xebera sereke “îzbatbûyî” ye. Dema ku jin porên xwe çê dike, ew por bi rêya hukûmê kîmîyayî tî guhartinê. Ew por kurîşkî dibin, çimkî ew wî cûreyî tî çêkirinê. Hûn dikarin porê kurîşkî bikişînin û rastkin, lê dema ku hûn berdin, ewê careke mayîn bibe mîna cûrê çêkirî.

Meriv dikarin herine civînê, stiranên pesindayîne bistirên û tevî teşkîldariyên mesîhîtiyê bibin, lê fikira wan li kîderê ye, dema ku ew bi şuxulkariya “mesîhîtiyê”-va mijûl nînin?: li wir e, li kîderê ew îzbatbûyî ye. Hema meriv ji avayê civînê, yan jî ji atmosferê mesîhîtiyê dûr dikeve, fikira wî paşda vedigere li ser wî tiştî, li ser çî ew îzbatbûyî ye,

mîna wî porî, yê ku paşda vedigere li ser cûrê çêkirî wextê ku berdidin.

Min li welatê me tevî gelek meriva qise kirîye, yên ku diçine civînê, sitranên pesindayîne distirên, têlêfonên xweda wextê terîfa tiştê dinivîsin û serbara serda bona qulixdarîyên civînêye cûre-cûre wede başqe dikin. Bêguman ew hemû tişt xirab nîne, lê dema ku ew tevî berevbûnên civînê û qulixdarîyên rezedilî nabin, ew tenê derheqa pera, sporta profesyonel, kinca, besên nava torên sosiyalîda, tiştên ku hiz dikin, jina yan jî mêra, xurek, kirîn-frotanê, nivîsarên têlêfonê û têtmayên vê dinîyayêye başqeda xeber didin. Beşera wan gelekî xweş dibe dema ku ew derheqa wan têtmada dibêjin, lê xwendina Încîlê, duakirin, qulixkirina bona meriva û çûyîna li civînê jî tiştên usanin, kîjana ew bi borcedarî dikin.

Wextê ku mêrek bengîyî li ser jinekê dibe, dibe dergîstî, hazir dibe bizewice, wî çaxî hewce nîne bêjine wî, wekî ew gerekê derheqa wê jinêda bifikire, pêra nava pêwendîyada be. Ew jin her dem fikira wîdane, û rengê dengê wî her car têtguhartinê, wextê ku navê wê jinê dide. Menî ew e, wekî huba wî, yan jî dilê wî, li ser wê jinê îzbatbûyî ye. Ew dudilî nîne, derheqa jinên başqeda nafikire: ew bengî bûye (evîndar e).

Zebûr 16:8-da Dawid dibêje: “Xudan her dem ber çavê min e”. Ew dudilî nîbû. Dilê wî paqij bû. Dilê wîda tiştên usa tunebûn, yên ku ewî ji Xudan zêdetir hiz dikirin. Hizkirina wîye hindana Xudanda her tiştêkî qenc dida tarîkirinê, kîjana ev dinîya dikare pêşnîyar bike. Ew tiştên ku em hiz dikin, begemîya xwe didine kîjana û diha zêde li wana amin dibin, ne ku li Îsa, mînanî wan heykelane, yên ku meriva çê kirine. Dawid dinivîse:

“Kî dikare rabe çîyayê Xudan, û kî dikare li cîhê Wî yê pîroz bisekine? Ewê ku bi destê xweva helal e û dilê paqij e, yê ku şexsê xwe nade neheqîyê û derew sond naxwe” (Zebûr 24:3,4).

Merivê ku dilê wî pîroz e ew e, yê ku hiz dike, begemîyê dide û diha zêde li Îsa amin e, lê ne ku li tiştêkî mayîn. Metta 10-37-da Îsa dibêje: “Ewê ku bavê xwe yan dayîka xwe ji Min zêftir hiz dike, ne hêjayî Min e. Ewê ku kurê xwe yan qîza xwe ji Min zêftir hiz dike, ne hêjayî Min e”.

Werin, dema ku em li qûmistanêne, mîna zarokên Îsrayêl nîbin, yê ku jîyana li ser dinîya xwe awqasî gelekî hiz dikirin, wekî mecala naskirina Xwedê ji destê xwe berdan.

Îşaya 35:1,2-da nivîsar e:

“Qûmistan û welatê zîha wê şa bibin,
û cîhê vala wê şa be û mîna kulîlkê şîn be.
Wê ve be, şîn be û bi şabûn şa be, û bi dengê bilind bistirê:
Rûmeta Libnanê wê wîra bê dayîne,
Hijmekarîya Karmêlos û Saron:
Ewê rûmeta Xudan bibînin,
Hijmekarîya Xwedêye me”.

Rûmeta Xudan li qûmistanê eyan dibe.

Werin em bighîjine wan hemû pîroza, yê ku pêşîya me jîtine. Werin em bi dest û dilê paqij nêzikî Xwedê bin, mîna Dawid, Mûsa, Pawlos, Êsiv û qulixçiyên Xwedêye mayîne eyan, dixwezî mêr be, dixwezî jin be.

3

QÛMISTANA PÊWÎST

“Nava fikirên xweda hemû cêribandinên xwe bîr bînin. Derheqa wê yekêda bifikirin ku çawa Xudan li qûmistanê rêberî li we kirîye û hûn her roj têr kirine. Çawa Xwedê hemû nerazîbûnên we û cedandinên berbi “kêfên Misirê” qebûl kirîye. Derheqa wê yekêda bifikirin, wekî Kerema Xwedê nava hemû tengavîyên weda têrê kiriye”.

- Çarlz H. Spêrcên

“Temamîya rêya qûistanêda bîr bîne, kijanêda Xudan Xwedêyê te eva çil salin ku te dibe bo ku te ta bike, bicêribîne, wekî bizanibe çi dilê teda heye, ka tê emirên Wî biqedînî, yan na”.

- Q. Ducarî 8:2



Dema ku ez cara ewlin ketime qûmistanê, ez carekêra tevlihev bûm. Bi rastî gotî, her du salên ewline ku ez peyî Mesîh diçûm, mînanî wedekî başî dirêjkirî bû. Em, tevî Lîzayê, li bajarê ştata Têxasêyî Dallasê diman, û piştî xebata înjênêrîyê ez li civîna me derbasî li ser xebatê bûm. Min qulixî serwêrê xwe û jina wî dikir û pêra jî mêvanên civînê qebûl dikirin. Ew yek bona min şabûneke mezin bû. Tê bêjî ez nava ezmanada bûm. Min qulixçiyên mezin, yên ku li ser topa dinîyayê bûn qebûl dikirin, çimkî civîna me li temamiya Amêrîkayê ya here bi nav û deng bû.

Dema ku ew rêberên hemmiletîyê û navnetewî dihatine firegehê, ez pêşîya wanda diçûm û bi erebê ew dibirine civînê, yan jî li wan cîha, li kîderê ew gerekê bi mêvandarî bihatana qebûlkirinê. Wextê seredanên wan min bi erebê ew dibirine li wir û li wir min tevî wan xwerin dixwer. Min sehetên dirêj tevî qulixçiyên nisileta meye mezin derbas dikir. Salên mine ewlinda, yên wê qulixêda, bi jîyaneke başva tijî bûn.

Lê belê, piştî hinek wede, nava jîyana minda dijarî destpê bûn, dijarîyên gelekî mezin. Wî çaxî min nizanibû, wekî ez diçûme qûmistanê, çimkî Xwedê derheqa wê yekêda negotibû. Qûmistan ew cîh e, li kîderê Xwedê me hazir dike. Li qûmistanê xeysetê me çê dibe û bawariya me qewîn dibe. Ew bona me *pêwîst e*.

Vê yekê bînin ber çavên xwe: hûn îsrayêlî ne, yê ku nava temamiya jîyana xweda xulam bûye û tenê van axirîya azayî stendiye. Hinekî pêşda we tirseke mezin texmîn kir: hûn nava du dîwarên ji bagera behrê û pêlên

avê çêbûyîra derbas bûn, bêqezîya û zîha gihîştine kenarê mayîn. We paşda nihêrî û dît, wekî ew dîwarên ku we diparastin li ser dijminên we hedimîn. Ewên ku peyî we ketibûn, heta-hetayê unda bûn. We bi şabûn ev yek da kifşê û bi saya azadkirina Xwedêye rûmet hûn reqîşin. Hûn texmîn dikin, wekî tu kes we nikare, çimkî hûn zanin, wekî Xwedê pişt-girê we ye. Hûnê îdî li ser qewat û aminaya Wî şikber nîbin.

Niha hemû tişt cûrekî mayîn e. Çend roj derbas bûne, û hûn westîyayîne, tîne û ji germê dizêrin. Hûn li ser sînorê “welatê sozdayî” nînin: dewsa wê yekê hûn bêyî armanc li qûmistana bi mera û dûpişkava tijî digerin. Hûn îdî bona Xudan nareqîşin, nastirên, wekî erebe û sîyar xwe avîtine behrê, lê hûn şikyatê xwe li rêber dikin, dibêjin: “Bo çi te em ji Misirê derxistin: bona ku em tî bimînin û me, zarokên me û heywanên me bikujî?”

Niha em derheqa weda xeberdin. Gelo hûn bawar dikin, wekî Xwedê bi cûrekî qewat em ji destê dijmin aza kirin, bona ku em qûmistanêda bizêrin? Gelo ew bû armanca Wî? Na xêr. Awqasî pêwîste ku hûn qûmistanêra derbas bibin, ku bighîjine wî cîhî, yê ku bona we hatîye sozdayîne.

Xudan usa rêberîyê li we dike, çawa ku Ewî rêberî li zarokên Îsrayêl fikir, ji Misirê berbi qûmistanê. Xwedê hûn birine qûmistanê, lê ne ku mîrêcin ew yek kiriye. Meremê Wî û bernama Wî bona wê êtapê heye. Pêşda Ew me dide takirinê, lê paşê dicêribîne. Ew usa dike, bona ku em bizanibin, ku *bi rastî* dilê meda çi heye.

Ew çawa me dide takirinê? “Ewî tu ta kirî, birçî hiştî û mana tu dayî xwerinê” (Q. Ducarî 8:3). Ewî Îsrayêlî dane takirinê, îzin da, ku ew birçî bimînin. Lê, anegorî gotina bi sirê, Ewî ew bi manayê têr kirin. Ev tişt tê bêjî hev nagirin. Çawa dikaribû biqewimîya, ku Ewî dikaribû ew birçî bihiştana û pêra jî bi manayê ew têr bikirana?

Mana xurekê herî baş e, yê ku meriv dikare buxwe: ew beşeke xurekê milyaketa ye. Îlyas bona gera çilroje qewat stend, wextê ku ewî du destên manayê xwerin, lê îsrayêlîya ew bi merdanî distendin. Nava hevtêda şeş roja wana beşên manayêye nû distendin, lê manaya roja şeşa berevkirî hetanî dawîya roja hevta dihate xweykirinê. Ew qet carekê bêyî xurek neman, ji wê rojê destpêkirî, wextê ku Xwedê mana da wan, hetanî wê rojê, wextê ku wana li welatê Sozdayî esker danîn.

Wî çaxî bona çî Xwedê got?: “Min hûn birçî xweyî kirin”. Derheqa birçîbûna çî cûreyîda Ew dibêje? Bona ku hûn wê yekê fem bikin, halê wan bînine ber çavê xwe. Bînin ber çavê xwe, wekî teştîya we tenê nanek e û her êvar şîva we dîsa nanek e, rûnê we tune, masîyên we tunene û tu tiştêkî mayîn tune, *tenê nan e*. Û ew wî cûreyî dijîtin, lê ne ku çend roja, lê çil salî.

Dema ku ez serwêrê qulixdariya cahila bûm, tevî pêncî û şeş cahila, em çûne Trînîdadê, sefera mîsyonêrîyêye heştroje. Xwerina me li wê civînê dihate hazirkinê, li kîderê em bûn, û merivên li wir gelekî mêvanhîz bûn. Lê belê, me her roj goştê mirîşka dixwar. Wana xwerinên cûre-cûre çê dikirin û tevî birinc yan jî tiştêkî mayîn didan, lê *me her dem goştê mirîşka dixwar*.

Piştî heşt rojên xwerina goştê mirîşkê, me dixwest xwerineke başqe bixwera. Piştî vegera malê, cahilekî koma me ji dayîka xwe pirsî ku ewê

Qûmistanê çawa derbas bibin

#3 Dijî wê cêribandinê derkevin ku hûnê bikaribin pirsên xwe bi xwe helkin

Li qûmistanê cêribandîneke merivaye here mezin ew e, ku ew meriv bi xwe pirsên xwe hel bike. Tê bêjî Xudan bi mîlîyona kîlômêtra ji me dûr e, wextê ku cêribandinên biçûke bona kirina bo padişatîya Xwedê tên teribandinê, wextê ku duayê bi seheta tenê êşa çoka pêşda tîne, û em ji gumanbirîyê dikarin çî bêjî bikin bo ku tiştêk bibe. Eva fikireke xirab e. Bi texmîn, li qûmistanê gelek tişt nabin, li wir hinek av û xurekê ku mêriv aciz dike hene. Nava wê wêranîyêda em hîn dibin wekî jîyan diha zêde ye, ne ku ew hemû tişt, çî ku heye û ew hemû tiştên ku em dikin. Fikira jîyanê bi nêzîkayî naskirina Wî û qedandina xwestinên Wî ye herroje ye.

Ji qûmistanên min yekîda her rojek hevtêk bû tê texmînkirinê,

wextê şîvê çî bixun û dayîka wî gotê: “Goştê mirîşkê”. Çawa ku ewî ew yek bihîst, ewî kire qîrîn, lê paşê hîvî ji dayîka xwe kir ku bona wî hambûrgêrê bikire.

Li Trînîdadê, tenê piştî heyşt roja, em nerazî bûn: hûn dikarin wê yekê bînin ber çavên xwe ku ew wede çil sal bûne. Ne ku çar sal, lê çil sal, tenê bi cûrekî xwerinê. Xwedê ew tişt nedidane wana, çî ku madê wan dixwest, lê ew tişt didane wana, hewcê kîjana bûn ew, bona ku sax û silamet bûna.

Nava halê wanda êdî çî sedem hebûn ku wana birçîbûn texmîn bikira, berbi wan tişta bicedandana yên ku li wir tunebûn? Bi xwendina vê serpêhatîyê, bona me wê gelekî balkêş bê texmînkirinê, wekî kinc û solên wan nedimaşîyan: eva êkonomîya baş e bona byûcêya malbetê. Feqet weyê bixwesta çil sala ser hev dîsa ew kinc xwebikirana? Tiştê acizbûnê ye. Tu ji tu dikanekê tu tiştî nakirî, derheqa moda nûda nafikirî: çil sala ser hev cotê çarixa nigên tedanin.

û her hevtêk mehek bû, çimkî dîtina min sînorkirî bû û xwestin, cedandina min tune bû. Neniherî wê yekê, min gerekê şuxulkarîya xwe berdewam bikira. Ez gerekê pêşda biçûma, gerekê ji Xebera Xwedêye dilê xweda xweykirî hilda, baş qulix bikira, wextê berevbûna hazir bûma û fesal bûma, wekî min ji bêsebirîyê tişteki bêaqilî nekira. Min gerekê bianîya bîra xwe, wekî ez li wir bûm, li kîderê Xwedê dixwest ku ez li wir bûma. Ewî wede unda nedikir, û Ewê sozên Xwe biqedanda.

Bêguman qûmistan cîhekî usa nîne, li kîderê hûn gerekê bicêribînin pêşda herin. Bîr nekin, wekî hûn paqij û hazir dibin. Hûn gerekê xebathiz û îzbatbûyî bin û dijî her cêribandineke gunehkirinê derkevin.

Li ser vê rê, ya ku Xudan li qûmistanê çê dike, her dem tevî Wî herin. Tu cara qîrar nekin ku ji Wî derbaztir bin, çimkî, bi fikira we, Ew gelekî hêdî dilive.

Belê, hewcetîyên wane hîmlî razîkirî bûn: ew ji germê û sermê xwey-kirî bûn, lê nava jîyana wanda gelek tişt tunebûn, yê ku ewê bixwestana.

Dîsa derheqa wê tebyetêda bifikirin, ya ku her roj li ber çavên wan bû, lê ne ku çend hevîya, lê çil sala. Gelo meyê bixwesta dîsa ew kaktûs, qamîş û erdê zîha bidîtana, û ji kanîyên edil, daristanên şîn û baxên tiriyaye bedew miqûf bimana? Gelo meyê bixwesta her roj tenê qûmistan bidîta?

Ew tiştên ku bona wan pêwîst bûn li cem wan hebûn, lê ne ku ew tiştên ku wana dixwest.

Bin ronahiya vî hemû tiştîda em careke mayîn vê beşê bixwînin:

“Ewî tu ta kirî, birçî hiştî û mana tu dayî xwerinê, ku ne te zanibû çi ye, ne jî kal-bavên te, bona ku teva eyanke ku însan tenê bi nê nê najî, lê bi her tiştê ku ji devê Xudan derdikeve dij” (Q. Ducarî 8:3).

Xwedê birçîbûn pêşda anî û ew tişt dûrxistin, çi ku wê xwestin û cêdandinên qalibê wan bidana razîkirinê, lê pêra jî hewcetîyên wane hîmlî dane razîkirinê. Birçîbûn ew dicêribandin: Xwedê dixwest bidîta, ku ew berbi Wî divedînin, yan berbi wî hemû tiştî, çi ku wana hiştibû? Gelo ewê Xudan bigerîyana, yan ew hemû tiştê ku wana dixwest, ew hemû tiştên ku bedena wana dixwest, bigerîyana? Gelo birçîbûn û tîbûna wane hindava heqîtyêda wê hebûya, yan hindava kêf û eşqêda? Mixabin, dilên îsrayêlîya li ser Şexsê tek-tenê îzbatbûyî nîbûn, Yê ku dikaribû ew razî bikirana, û ew wê cêribandinêra derbas nebûn.

“Miletên başqeye bêpergal nava wanda dilhaviji kirin. Zarên Îsrayêl jî dîsa girîyan û gotin: “Kê wê goşt bide em bixun? Tê bîra me ew masîyên Misirêye bêheq ku me dixwerin, usa jî xiyar, qawin, pîvazok, pîvaz û sîr. Ê niha nevs me çila bûye, tu tişt tune, tenê mana ye li ber çavên me” (Jimar 11:4-6).

Wana ew yek bîr dianîn çi ku li Misirê hiştibûn. Ew xulamîya wane li Misirê wanra diha baş dihate texmînkirinê, ne ku ew cîhê xalî, li ku Xwedê ew biribûn. Wana destpê kir gazina bikin û şikyat bikin, bona goşt girîyan.

Xwedê dengê wan bihîst:

“Û xwerin, gelekî têr bûn, û xwestina wan da wana... Ewî xwestina wan da wan (goşt, karîtk) û nexweşî jî şande ser wan” (Zebûr 78:29, 106:15).

Wana ew çî ku dixwestin stendin, lê bona wê yekê heqê giran dan. Rûyê wî goştîda ew zeyîf bûn, ew zeyîfî îzin neda wana ku teyax bikin û cêribandina xwe derbas bin. Nava encamên wê yekêda, ew usa jî neketine welatê Sozdayî. Gunehê wan ew nîbû, wekî wana goşt hîvî dikir: guneh sedema hîvîkirina wan bû. Wê yekê dida kifşê, wekî dilê xweda ew ji Xwedê razî nîbûn, usa jî ji rêberîya Wî û mêtodên razîkirina wana ew nerazî bûn. Wê yekê dida kifşê, wekî xwestina wane hindava wê jîyanêda mezin bû, ya ku wana li Misirê hiştibû. Wana tenê alîyên wê jîyanêyî xweş bîr dianîn û bîr dikirin, wekî ew nava xulamtîyêda mabûn.

Ev yek bona me hemûya dersa hişyarkirinê ye. Heger em tenê soza digerin, û ne ku li Wî digerin, Yê ku soz dide, qewata me bona qûmistananê jîyana me wê bes nibe.

Emê dîsa ew rojên berêye qenc bîr bînin, yên ku ji alîyê rastîyêda qenc nîbûne, lê ew roj rojên xulamtîyê bûne.

Ew yek tişteki mayîn e, ku Xudan bi wê menîyê bigerin, ku Ew çî dikare *bona we bike*, yan jî Ew çî dikare *bide we*, lê ew jî tişteki lap başqe ye, ku Xudan bona wê yekê bigerin, ku *Ew Kî ye*. Mesela ewlin bi meremê bo xwe ye, û menîyên weye xwehizîyê wê we bighînin pêwendîyên tevî Xwedêye negihîştî. Lê belê, heger em bicedînin Wî naskin, wî çaxî pêwendîya qewîn wê çê bibe, kîjanê em hemû dixwezîn.

Kêmasîya pîroz

Çawa ku meriv dikare hîvîyê be, jîyana nava qûmistana bêavda kêmasîya mecalâ têra dibîne. Nava wî wedeyîda hûn wî tiştî distînin, çî ku bona we bi moralî, fizîkî û matêriyalî lazim e, lê ne ku hûn çî dixwezîn. Xwedê soz daye ku wê hewcetîyên meye hîmlî bide razîkirinê:

dêmek, li qûmistanê Ew xurek dide me, lê ne ku bereketa hemû tiştî dide.

Li Amêrîkayê, wextê ku jîyan xweş e, em dibêjin, wekî em parçên goştê berazî bijare dixun. Li qûmistanê qet parçekî goştê beraz tune. Cêribandina vî cûreyî dikare ji gelek tiştî mêriv miqûf bihêle. Nava vî wedeyîda hûn wê jîyana civakî distînin, hewcê kîjanêne hûn, lê ne ku wê jîyanê kîjanê hûn dixwezî. Xwedê zane, ku nava jîyana xweye ruhanîda çi we lazime û diqewime, bi fikira we, ew yek ew nîne, çi ku we lazime. Nava vî wedeyîda Ew hewcetîyên me dide razîkirinê, lê ne ku xwestinên me diqedîne.

Meremê qûmistanê ew e, ku me paqij û qewat bike. Em gerekê berbi *dilê* Wî, lê ne ku berbi *dayîna* Wî bicedînin. Û peyî wê yekêra, wextê ku em bikevîne nava zêdayê, emê bîr nekin, wekî Xudan Xwedêyê me bereketê dide me, ku sozê Xwe îzbat bike (binihêre Q Ducarî 8:2-18).

Pirseke hîmlî heye: ew e ku *em* hewcetî û xwestinên xwe çawa şirove dikin û ew ne anegorî rastîyê ye. Em “hewcetîya” çawa xwestin nav dikin, lê ew yek usa nîne. Diqewime pîranîya bawarmenda gerekê fem bikin ku Pawlos bi vê yekê çi dixwest bigota:

“Ez nabêjim ku ez hewcê tişteki bûm, çimkî ez hîn bûme razî bim (razîbûna li ser wê derecê, wekî nerihet yan jî xeyîdî nînim), nava çi halîdabim jî. Ez zanim ku çawa bi kêmasîya û şikestî bijîm, nava mecalên tengda, û usa jî nava hebûnêda bijîm. Ez sura nava her halekîda zanim, yan têrbûyî, yan jî birçî mayî, yan jî nava hebûnêda, yan tunebûnêda. Qewata min Mesîhda bona hemû tiştî heye, Yê ku qewatê dide min” (Fîlîpî 4:11-13, AMPC).

Bi qewata Mesîh Pawlos hîn bû, wekî wextê dijwarîya ew dikaribû usa razî bûya, çawa ku wê nava hebûnêda razî bûya. Tê bêjî em, bawarmendên civîna Rojavayê, hîn nebûne razî bin, çimkî mixabî, ewên ku nava hebûnêda dijîn usa nerazîne, çawa ku merivên nava tunebûnêda dijîn. Heger ew hemû tişt tunene, çi ku em dixwezî, wî çaxî em nerazîne. Em meriva bi hebûna wane derheqa halê wanî bawarîyê û ruhanî, açixîya û dereca sosîyalî qîmet dikin, lê gerekê dereca xeyset û bawarîya wan qîmet bikin.

Zarokên Îsrayêl ji Misirê bi talanekî mezin çûn, bi eşîyayên zîv û zêr û kincên bedew, yên ku wana bi talankirina misirîya hildan. Feqet wana li qûmistanê bi wan hesinên giranbiha pût çê kirin, lê paşê kincên xweye bedew xwekirin û li ber wî pûtî reqisîn. Ber cava ye, wekî wê hebûnê nedida kifşê wekî ew xwedêparêz bûn, ew wekî mayîn bûn. Tenê du merivên ku ji Misirê derketin xweyê xeysetê usa bûn, yê ku îzin da ku ew bikevine welatê Sozdayî. Tenê Yêşû û Kalêb ketine wî welatî, çimkî wanda ruhekî başqe hebû: ew bi tamamîya dilê xweva peyî Xwedê diçûn (binihêre Jimar 14:24).

Sîstêma meye qîmetîya feşkirî ye, heger em hev bi hebûkê qîmet dikin, lê ne ku bi heyîna şexsîtiya me.

Ji alikî mayînva, gelek cara, wextê ku mesîhî dighîjine hebûna finansî, tabîya serkarîkirinêda cîhê xwe digrin, yan jî hukum dest tînin. Ew hesab dikin, wekî bi wê yekê Xwedê îzin daye wan ku ew çî dixwezî dikarin bikin. Ew wî hemû tiştî dest tînin çî ku dixwezî, perên xwe li ser xwestinên xwe xerc dikin, yan jî tabî û qulixa xwe bona berjewandîyên xwe didine xebatê. Gelek cara evana ew merivin, yên ku wextê dijwarîya bi aqilmendî neşuxulîne. Bi rastî, hebûka finansîye ku hatîye dayînê, û serkarîkirina mezin, gerekê usa bikin ku em diha zêde Xwedêva girêdayî bin, bona çûyîna peyî merem û rêberîya Wî.

Derheqa wê yekêda bifikirin ku tabîya Îsaye nava qulixa Wî da çî bû. Menîyên Wî ye xwehizîyê tune bûn. Ewî guneh, nexweşî û cezayê me hilda ser Xwe. Ewî xweşîya me diha bilind qîmet kir, ne ku ya Xwe, nenihêrî wê yekê, wekî Ewî tu cara guneh nekiribûn. Meremê jîyan û qulixa Wî ne ku xwehizî bû, lê xwepêşkêşkirin bû. Bi dayîna Şexsê Xwe, Ewî pêşkêşa here mezin da me, jîyana heta-hetayê.

Xwedê xeysetekî wî cûreyîye gihîştî nava meda çê dike, wextê ku em li qûmistanêne. Qûmistan ew cîh e, li kîderê rezê Ruh dighîje. Dema ku em bi avên Wî va tînen bêcerkirinê, bi xwestina naskirina Wîye bi qewat, em hîn dibin usa bikin, çawa ku Ew dike.

4


HELEQETÎ

“Awqasî tiştê ecêbmayînê ye, wekî çiqwas dijwarî bêyî tu cedandinekê tîn rastkirinê, wextê ku jîyana mêrive hundur tê qeydekirinê”.

- Ê. Û. Tozêr

“Heger hûn Min hiz dikin, hûnê temîyên Min xweyî bikin”.

- Yûhenna 14:15, NET



Xwedê bona Xwe çî digere wextê ku me dibe qûmistanê? Me derheqa cudatîyên xweda xeberda û emê diha zêde bidine eşkerekirinê ku gelo li qûmistanê bona Xwedê jî tiştek heye? Belê, heye. Ew dixweze dereca pêwendîyên me bide pêşxistinê. Ew hiz dike, ku em tevî Wî nava pêwendîyên nêzîkda bin. Mixabin, nava meda gelek meriv pêwendîyên meye tevî Xudan didine xebatê û îzinê didin ku hizkirina meye hindava Wî da sar bibe.

Ez û Lîza dergîstî bûn, û ez hetanî guhên xwe li ser wê bengî bibûm. Ez her dem derheqa wêda difikirîm. Min hemû tişt dikir ku min diha zêde wede tevî wê derbas bikira. Heger Lîzayêra tiştek lazim dihat, nenihêrî wê yekê ku ez çiva mijûl dibûm, ez lez diçûme berbi ereba xwe û min bona wê dest dianî.

Tê bîra min, wextê ku carekê em nêzîkî pênc seheta li mala dê û bavê wêda tevayî bûn. Ez nerazî çûm. Ez teze gihîştibûme malê, wextê ku dengê têlefona min hat. Ew Lîza bû. Ewê bi dengê xweyî şîrin û nazik got:

-Delalê min, te potê xwe li mala me bîr kirîye.

Tê bêjî guhên minda dengê miqamekî dihate bihîstinê. Min, bêyî paûza, bi şabûn, bersiva wê da:

-Wî çaxê ez mecbûrim paşda vegerim û potê xwe hildim.

Min usa jî kir, û me ji sisîya hetanî çar seheta tevayî derbas kir: ew rojeke gelekî baş bû.

Wan roja heger ewê nivê şevê jî minra têlefona bikira û bigota: “Delalê

min, ez ayskrîmê dixwezim”, minê bi şabûn bersiv bidayê: “Piştî deh deqa ezê li wir bim. Lê tu ayskrîma bi kîjan tamê dixwezî?”. Ez wede û menîya digerîyam ku tevî wê bûma. Min bêhesab ew hiz dikir, bo wê yekê jî min bi şabûn ew tişt dikirin, çi ku ewê dixwest. Min ew hemû tişt bona wê yekê nedikirin ku min hizkirina xweye hindava wêda *bida kifşê*: min ew yek dikir, çimkî min ew *hiz dikir*.

Hewce nîbû ku min xwe mecbûr bikira ku tevî meriva derheqa Lîzayêda xeberda...bi hazîriya hemûya min pesinê wê bida, ên hazir bûn guhdarî bikirana. Heger têma xeberdanêye tevî kesekî ser hevda dihat, bêyî tu dijwarîya, min destpê dikir derheqa Lîzayê û zewaca meye pêşerojêda xeberda. Ez evîndar bûm.

Çend sala piştî zewaca me, guhdarîya min êdî li ser tiştên mayîn hate merkezîkirinê, nava kîjanada bûn sport, pêwendîyên tevî hevala û bi taybetî qulixa min. Niha jî derbaskirina wedê tevî Lîzayê acizî pêşda dianî. Ez awqasî jî derheqa Lîzayêda nedifikirîm. Ewê tenê roja bûyîna xwe, salvegera zewaca me û bûyîna Pîrozda rêşkêş distendin û min ew yek hinekî jî bi nerazîbûn dikir. Carekê jî, min roja Valêntîn bîr kir jêra pêşkêşê bikirim. Ew gelekî aciz bibû. Min tenê dikaribû baxşandin jê bixwesta. Tiştê herî xirab ew bû, wekî ez awqasî gihîştî nîbûm ku min bikaribûya nîşanên ku “sêzonên” zewaca me didine kifşê fem bikira. Di navbera meda sertbûn pêşda dihat: evîndarîya min ya ewlin dimir.

Ez awqasî razîme, wekî bi kutasî Xwedê guhdarîya min kişand û dilê min da guhartinê. Ewî îzin da min ku ez bibînim ku ez çiqasî xwehiz bûm. Bi rehma Xwe, Ewî agirê hizkirina me careke mayîn da gurkirinê û zewaca me qenc kir.

Tiştên wî cûreyî dikarin di nava pêwendîyên me û Xwedêda biqewimin. Gelek peyîhatîyên Mesîh dighîjine cîhekî bona wan baş, yan jî xala here bilind, li kîderê ew berbi tu tiştî nacedînin, lê tenê destanînên xwe xweyî dikin. Ew êdî berbi Xwedê nacedînin. Ew qîrar dikin ku normên wane ruhanî himberî yên merivên başqe zêdetirin û wê yekê hesab dikin ku bes e. Ew êdî nacedînin ku bi kûrayî û bi xwe Xwedê nas bikin. Ew guhdarîya xwe li ser karên herroje, cedandina berbi açixîyê û dijawriyên vê jîyanê didine merkezîkirinê. Ew destpê dikin Xwedê ne ku

bona naskirina Wî bigerin, lê bona stendina duayîên Wî. Ew bere-bere destpê dikin nava dilên xweda unda bibin, berê wan ji Xwedê berbi şex-sên wan vedigere. Diqewime ew pêwendîyên “mesîhîfîyê” tevî meriva dîsa xweyî dikin û nav û tabîya xweye li civînê çê dikin, lê ew êdî berbi Wî nacedînin, Yê ku jîyanê dide wan.

Dema ku em wede didine cudakirinê, karê û duayê ji Xwedê digerin, ne ku bona pêwendîya tevî Wî divedînin, wî çaxî em bi hêsanî unda dibin. Werin em bêqelp bin: em bi xwe ber dilê Xwedêda tên, wede bona duakirinê başqe dikin, lê heger me bikaribûya li duakirinên xwe dewsa li Wî binihêrîya, meyê fem bikira ku em dicêribînin Wî bidine xebatê. Em Xwedê biçûk dikin, Wî werguhêzî kanîya alîkarîyêye wextê hewcetîyên me dikin. Feqet Ew awqasî me hiz dike, wekî wê îzinê nede me ku em xapîyayî bimînin. Ewê bona me jî wê yekê bike, çî ku Îsa bona cimeta ku digerîya kir:

“Roja din ew elaleta ku li wî berî golê mabû...meriva dît, ku ne Îsa li wire û ne jî şagirtên Wî, hingê ew xwexwe jî ketine qeyîka û çûne Kefernahûmê, wekî li Îsa bigerin. Gava wana Îsa li wî berî golê dît, jêra gotin: “Dersdar, Tu kengê hatî li vêderê?”. Îsa li wan vegerand û got: “Ez rast bêxêlif wera dibêjim, hûn li Min digerin, ne ku bona wê yekê ku we nîşan dîtine, lê bona wê yekê ku We ji wî nanî xwer û têr bûn”” (Yûhenna 6:22-26).

Îsa menîyên rast, yên karên me zane, wextê ku elalet hatin ku *Wî bigerin*, Ewî dît, wekî Ew diha gelekî bi duayê başqeva (xwerina belaşva), lê ne ku bi wan nîşanava û femkirina wanva hewaskar bûn. Nîşan rê nîşan dide yan jî elam dike: ew bi xwe nade kifşê. Îsa zanibû, wekî ew elaleta bi rastî bona wê yekê li peyî Wî nedîçû, wekî nîşanên Wîye kirî li wan eyan nekiribû ku Ew kî bû: ew bona xwetêkirinê li peyî Wî diçûn.

Hûn merivekî usa nas dikin, yê ku tevî we pêwendîyê wî çaxî îzbat dike, wextê ku hewcetîya wî heye, yan jî tiştêkî ji we dixweze. Yan jî nava jîyana weda merivê usa hebûye, yê ku tê bêjî dixwest bibûya hevalê we, lê piştî hinek wede zelal dibe, wekî ewî tenê dicêriband ku ji

we tişteki bistine, hukum, pera, yan ji tişteki materyaliyi mayin? Bi rastî ew derheqa weda nedifikirî û hûn hiz nedikirin: awqasî hinek wede we qulixî meremên wî dikir. Ew yek tişteki *bi êş e*, wextê ku ji aliyê yekî mayînda têyî xebitandinê.

Tabîya wî cûreyîye xwehizîye ketîye nava civaka me, usa jî nava bedena Mesîh. Li civînê gelek nerazîne: hizkirina wane hindava Îsada sar bûye. Ew bona kara xweye şexsî qulixî Xwedê dikin, lê ne ku bona hizkirina hindava Wî da. Wextê ku Xwedê *xwestinên* wana diqedîne, ew bextewarin û bi Wî va ruhdar dibin. Lê belê, wextê ku tengavî tên û jîyan dijwar dibe, meniyên dilê wan eyan dibin.

Wextê ku meriv li ser *xwe* merkez dibe, nerazîbûn pêşda tê. Bo çi? Çimkî çawa jî hebe, emê rastî tengavîya û dijwarîya bên. Hema ew yek biqewime, ji xwehizîya gurbûyî nerazîbûn destpê dibe. Nerazîbûnê awqas wext bikişîne, çiqwas dijwarî bikişîne. Vê yekê em nava jîyana zarokên Îsrayêlda dibînin. Wextê ku Xudan ew ji zêrandinên Misirê xilaz kirin, yên ku wana bin destê Firawinda didîtin, cimet şa bû:

Meyrema xwîşka Harûnê pêxember def girte destê xwe, hemû kulfet jî def destada, bi reqasê, li peyî wê derketin. Û Meyremê li wan vedigerand: “Xudanra bistirê, çimkî Ew xweyê rûmeta mezin e, hesp û sîyarî avîtine behrê” (Derketin 15:20,21).

Şabûna cimetê mezin bû. Şabûna wana bêsînor bû û ew difikirîn, ku Xwedê bi mezinaya Xwe, bi qewata ecêb, qencîya Xwe, ew ji xulamtiyê xilaz kirin. Lê belê, piştî sê roja, wextê ku ew gihîştine avên qûmistana Sûrêye tal, nerazîbûn destpê bûn: “Emê çi vexun?” (Derketin 15:24). Bi texmîn ew nerazîbûn yên bêfikir bûn. Gelo hema ew Xwedê, Yê ku nava wedê kurda ew behra Sorra derbas kirin, nikaribûn ava vexwerinê bida wan? Gelo Mûsa dîsa ew rêberê mêrxas nîbû, çawa ku sê roj pêşda bû?

Bi rastî Xwedê ew av kirine yên vexwerinê, lê ew ecêb jî lez hate bîrkirinê. Piştî çend roja, cimetê dîsa nerazîbûna xwe da kifşê, lê vê carê bona xwerinê. Wana gazinê xwe dikirin: “Hetanî wî çaxî, wextê ku Xwedê em aza kirin, jîyana me diha baş bû”. Gelo ev yek rast e? Gelo çêkirina blokên ji heriyê û qamçiyên li ser piştên wan diha baş bûn?

Qûmistanê çawa derbas bibin

4 Progiramên xwe zelal bikin

Wextê cêribandineke qûmistanêye pêşda, bona min gelekî dijwar bû ku min nêzîkbûna baş xweyî bikira, çimkî usa dihate kifşê, wekî tu tişt wê nehata guhartinê. Ez ne awqasî bona hîvîyêsekinandinê xemgîn bûm, çiqwas ew êş bû, ya ku min wextê hîvîyêsekinandinê texmîn dikir. Ez ji tiştêkî acizkirinê gelekî westîyayî bûm, ya ku dida texmînkirinê, îzin nedida min ku ez wê xiyalê mîyaser bikim, ya ku min wextê destpêkirina qulixdarîya terîfkirinê ji Xwedê standibû. Xudan gotibû min, wekî Ewî ew qûmistan bona paqijkirina min dida xebatê. Feqet, carekê, wextê ku min dîsa reca Xudan dikir ku minra şirove bike, ku bona çî “ew şuxulkarîya li qûmistanê awqasî dirêj dikişand”, Xudan bîr anî: “Ez dixwezim bibînim ku tu qulixî Min, yan qulixî xiyala xwe dikî?”.

Wê yekê bala min kişand. Ez gerekê diha gelekî bifikirîyama û dua bikira, bona ku min fem bikira, ku gelo min dixwest xiyala xwe mîyaser bikira: Mizgîn li temamîya dinîyayê dannasîn bikira, yan meremekî minî diha rast hebû, ku bi gurêkirinê aminaya xwe li Xwedê bianîya û hîvîyê bisekinîyama ku Ewî xeberda û nava jîyana minda bişuxulîya? Tenê wî çaxî xwestinên min wê anegorî xwestinên Wî bûna.

Bi vî cûreyî, şêwira min ev e: “Îzinê nedin ku xiyala başe ji alîyê Xwedêda dayî bona we bibe diha girîng, ne ku jîyîna nava hazîrîya Xwedêda û tenê mîyaserkirina xwestinên Bavê we.

“Temamîya civîna zarokên Îsrayêl li qûmistanê hindava Mûsa û Harûn da bîna xwe teng kirin. Zarokên Îsrayêl gotine wan: “Xwezî em bi destê Xudan li welatê Misirê bimirana, gava em ber sîtilê goşt rûdiniştin û me têr nan dixwer” (Derketin 16:2,3).

Nava wedê giran û hişkda nerazîbûn hindava rêberada, endamên malbetê, hevala, dijmina û hetanî hukumatê jî tên kifşê. Ji me gelek meriv (rûyê tirsêda) tu cara nabêjin, wekî menîya pirsgirêkên me Xwedê ye. Hema wî cûreyî jî îsrayêliya nerazîbûna xwe dijî Mûsa û Harûn didane kifşê, lê bêşik ew usa difikirîn: “*Xudan em gumanbir kirin*”. Mûsa ew yek fem kir û eşkere gote wan: “Hûn bîna xwe li me teng nakin, lê li Xudan” (Derketin 16:8).

Qûmistan menîyên dilê me eyan dike ew yên *xwehizîyêne*, yan *xwepêşkêşkirinêne*? Hîvî ji Ruhê Pîroz bikin, ku nîşan bide, ku bi rastî dilê weda çi diqewime. Menîyên we kîjanin? Tabî yan jî kirên çi cûreyî we nava xulamtîyêda, li “Misira” weda xweyî dikin, yan jî usa dikin ku hûn qûmistana xweda gazina bikin? Pêşerojêda bona ku bighîjine açixîyê ew yek bêhesab girîng e, ku hûn paqijayê bidine kifşê û bona rastkirina Wîye pirhiz vekirî bin.

Bona me hemûya jî mizgînî heye: tu tişt qedexe nake ku em tobekin û tabîya dilê xwe biguhêrin. Em carekêra dikarin terka gazina bidin û paşda vegerine nava pêwendîyên tevî Xwedê û li Wî tenê çawa mecala stendina tiştêkî nenihêrin.

Bi gilîkî, Xwedê dikare me bi hizkirin bişîne qûmistanê.

Xwedê hê zêde ye, ne ku qirarek.

Zarokên Îsrayêl berbi Xwedê nedicedandin. Wana rêyên Wî niznibûn. Ew bi karên Xwedêye qewatva ruhdar dibûn, lê wextê ku qewata Wî ya nebînayî eyan nedibû ew ji Wî dûr diketin. Dema ku Mûsa li ser çiyê bû, ew dûr ketin û destpê kirin bilîzin. Ew tenê bi zêdayên xilazkirinêva razî dibûn û nedicedandin Xwedê naskin û nava hazirîya Wî da bijîn.

Rojekê, li qûmistanê, Xwedê teslîmî Mûsa kir, ku ew here li cem cimetê û emir kir ku ew xwe paqij bikin, çimkî Ewê peyayî li ser çiyayê Sînayê bibûya bo ku wan ra xeberda, çawa ku pêşîya wê yekê Mûsa ra xeberdabû. Lê belê, dema ku ew roj hat, û Xudan bi rûmet û mezinaya Xwe eyan bû, cimetê nikaribû li ber wê yekê teyax bikira:

“T’emamîya cimetê qirçîn û dengê boriya sturîyê bihîstin, birqvedana birûskê û dûyê ji çîyê derdiket dîtin, risasê cimetê girt û dûr sekinîn. Hingê gotine Mûsa: “Tu tevî me xeberde û emê guhdarîya te bikin, lê bila Xwedê tevî me xeber nede, bo ku em nemirin”” (Derketin 20:18,19).

Wana reca li Mûsa dikir: “Dewsa me tu Xwedê ra xeberde, bêje me çi ku Ew emir dike, û emê biqedînin”. Wana careke mayîn dida kifşê, wekî wana bi xwehizî dixwestin ji Xwedê kar bistendana, lê bêyî *heleqetîya* tevî Wî. Diqewime menîyên wana yê qencîyê bûn (wana dixwest Xebera Xwedê xweyî bikira), lê bêyî *heleqetîya* nêzîke tevî Xwedê wana nikaribû nava wêda jîyan bikira.

Îsrayêlyax dixwestin bersivên pirsgirêkên xwe bistendana, lê ne ku pêwendî hebûna. Ê çi qewimî? Xwedê Deh temî dane wana. Lê belê, wê yekê jî pirsgirêk hel nekir. Her nifşek dîsa û dîsa dida kifşê, wekî meriva nikaribû ew temî xweyîkirana.

Lê em derheqa nifşa xweda çi dikarin bêjin? Çiqas meriv roja îroyîn dicêribînin bi meremên here baş rêyên Xwedê xweykin? Em peymanax pêşda dikişînin û soz didin, lê naqedînin, hetanî ku ew bar li ser me awqasî giran dibe, ku em bi dijwarî dikarin wextê duakirinê dengê xwe bilind bikin. Em dikarin guhdarîya serwêrekî, yekî li rex xwe, heval yan jî blogêrekî bikin, bi wê gumanê, bi wê cêribandinê hînbin, ya ku wana wextê gera li Xwedê dest anîye û bi wê yekê pêwendîyên meye tevî Xwedê milahîm kirine. Em dicêribînin bona wan zarokên Îsrayêlê wî cûreyî Xebera Xwedê, yan jî temîyên Wî, xweyîkin, bêyî pêwendîya sax û şexsîye tevî Wî. Yûhenna 14:21-da Îsa dibêje: “Ewê ku temîyên Min qebûl dike û wana xweyî dike, ew e, yê ku Min hiz dike. Ê ewê ku Min hiz dike, ewê ji alîyê Bavê Minda bê hizkirinê. Ezê jî Wî hiz bikim û Xwe wîva eyankim.”

Min ev xeber dixwend, difikirîm, wekî Xudan dixweze bêje: “Con, heger tu temîyên min xweyîkî, tê bidî kifşê ku Min hiz dikî”. Carekê Xudan emir kir ku ez vê xeberê careke mayîn bixwînim. Dema ku min xwend, Ewî got: “Tu hela hê fem nakî ku Ez çi dibêjim: careke mayîn

bixwîne”. Ew yek ewqasî wekilî, hetanî ku min ew xeber neh yan deh cara xwend.

Bi kutasî, min kire gazî: “Xudan, bêaqîlya min bibaxşîne: nîşanî min bide ku Tu çi dibêjî”.

“Con, Ez nabêjim ku bi xweyîkirina temîyên Min tê bidî kifşê ku tu Min hiz dikî,- Ewî got. -Ez êdî zanim ku tu Min hiz dikî, yan na? Ez dixwezim bêjim, ku heger meriv li ser Min bengî bibe, ewê karebûna xweyîkirina temîyên Min bistîne”.

Min fem kir! Ev xeber derheqa *pêwendiyê* da ye, lê ne ku derheqa qanûnê da ye. Min ew yek çawa temî yan qanûn qebûl dikir, lê Xwedê nîşanî min da, wekî ew yek derheqa girîngîya *pêwendiyê* da ye.

- Bi rîya qanûna nikarin Xwedê naskin.
- Bi rîya mêtoda nikarin Xwedê bibînin.
- Nikarin Xwedêyê Pîrozî Kamil, biçûk bikin, werguhêzî qirarekê bikin.

Lê belê, ji me gelek meriv derheqa Xudanda vî cûreyî difikirin. Em *pêwendîya* tevî Xwedê “qanûna û qirarava” diguhêrin, çawa mînaka hevt gav berbi jîyana bextewar, bernama xilazbûnê ji pênc xala ye, pênc alîyên *pêwendiyên* açix, mecala kontrolkirî bona stendina bersiva duayê. Em difikirin, wekî Xwedê nava qalibê sozada sînorkirî ye, ji kîjanî meriv dikare sozên cuda hilde, heger *pêwîst* bibe. Heger meriv vî cûreyî *nêzîkî* Xwedê dibin, gelo hêja ye zendegirtî bimînin, wekî ew nikarin hindava gunehêda ser bikevin?

Xwedê formûla nû nîne. Ew Xwedêyê sax e, Yê ku dilên zarokên Xwe, we û minda, dijî. Ew dixweze me nas bike û tevî temamîya jîyana me û karên me bibe. Meremê Wî *pêwendîya nêzîk* e. Bi hesabhildana wê yekê, wekî meriv dikarin îzinê bidin ku hizkirina wan sar bibe, hûn dikarin fem bikin ku bona çi Îsa got:

“Lê gazineke Min li te heye, ku tu mîna berê Min hiz nakî. Awa niha bîne bîra xwe, ku tu ji kîderê ketîyî û ji gunehkirinê vegere, kirên xweye pêşîyê bike. Heger na, Ezê bême cem te û şemdana te ji cîh bihejînim” (Eyantî 2:4,5).

Himberî Îsrayêlîya, Mûsa ra tenê hebandina Xwedêye ji dûrva têrê nedikir. Bi dîtina eyanbûna hazirîya Xwedê, ew paşda venekişîya, lê nêzîk bû. Derketin 20:21-da nivîsar e: “Û cimet dûr sekinî, lê Mûsa çû nêzîkî wê tarîstana şeverêşê bû, li kîderê Xwedê lê bû”. Neniherî wê yekê, wekî serwêrtî û hukumê Mûsaye mezin hebû, neniherî wê yekê, wekî ew rêberê sê mîlîyon meriva bû, neniherî wê yekê, wekî ew tevî ecêbên peymanê Kevine here berbiçev bibû, ewî zanibû, wekî ew hemû tişt tu cara wê ew razî nekirana. Duayê wîyî peyî wê yekêra bixwînin, wextê ku ewî ew nîşan û ecêb dianîn li ber çavê xwe:

“Lê niha hîvî dikim, heger min li ber çavên Te kerem dîtîye, rêyên Xwe li ber min veke, wekî ez Te nas bikim, û li ber Te keremê bibînim. . . Heger Tu neyêyî, me ji vir dernexe...Hîvî dikim dîndara Xwe minva eyan bike” (Derketin 33: 13-18).

Xwedê pêşniyareke balkêş bona Mûsa kir. Ew nava qûmistana hişkda bû, û Xwedê temî da wî ku cimetê hazir bike û bibe li welatê Sozdayî. Ewî serbara serda pêşniyar kir, ku milyaketekî bijartî bişîne, yê ku wê ew bêqezîya bigîhandana cîh. Ewî anî bîra Mûsa ku ew welat çiqasî baş bû: li wir şîr û hingiv dikişîyan û gelek cîhên tebyetêye bedew hebûn, bi baxçe û daristanên fêkîyava tijî. Lê belê, Xwedê got, wekî Ewê tevî wan neçûya. Çawa ku Mûsa ew yek bihîst, ewî pêşniyara Xwedêye merdanî înkâr kir. Bi texmîn, ewî got: “Ez hesab dikim ku hazirîya Te hebe, bêyî sozên Te, lê ne ku sozên Te bêyî hazirîya Te”. Ez bawarim, wekî ew yek li Xwedê xweş dihat, wekî Mûsa wî cûreyî Ew hiz dikir.

Mûsa diha zêde dixwest, û li ser xwe guman hîvî kir: “Ez hîvî dikim, rêyên Xwe li ber min veke, bo ku ez Te nas bikim” (Derketin 33:13). Bona ku em Xwedê nas bikin, em gerekê *rêyên* Wî nas bikin. Ew rêyên Xwe li wana eyan dike, yên ku dîcedînin dilê Wî naskin, lê ne ku tenê qewat û dayîna Wî. Merivên ku dilê Wî nas dikin, wê bi qewata Wî bişuxulin. “...lê ew merivên ku bi rastî Xwedêye xwe nas dikin, wê qewat bibin û karên mezin bikin” (Danîyêl 11:32, KJV).

Heta ku min destpê kir qulixî Xwedê bikim, min her sibe nêzîkî du

seheta dua dikir. Duayên min vî cûreyî bûn: “Xwedê, min bide xebatê ku ez meriva xilazkim, min bide xebatê ku nexweşa qenc bikim, min bide xebatê ku cina derxim”. Min ser hev ev dua diwekiland, lê bi xeberên cûre-cûre. Minva dihate texmînkirinê ku duayên min yên xwepêşkêşkirinê bûn û min gazî Xwedê dikir, bo ku qulixa min hukumdar bûya.

Û rojekê Xudan gote min: “Kurê Min, duayên te yên xwehizîyêne û nagihîjine merem”. Ez ji gotinên Wî nişkêva vecênîqîm.

“Tu wan tişta dixwezî, lê menîya te kîjane?,- Ewî pirsî. –Ez tenê ji te dibihêmin min bide xebatê...Merkeza duayê teda tu yî. Min tu çênekirî ku tu meriva qazanc bikî, cina derxî û nexweşa qenc bikî. Min tu çêkirî bona heleqetîya nêzîk: ev e meremê te”.

Ji wê yekê ez vecênîqîm. Peyî wê yekêra Ewî tiştek gote min, kîjanê ezê tu cara bîr nekim: “*Cihûda meriv aza dikirin û nexweş qenc dikirin: ewî ew hemû tişt bi navê Îsa dikir*”. Belê, bi şandina 12-a, Îsa hemû jî şandin, usa jî Cihûda, yê ku paşê hindava Wî da xayîntî kir. Ez li ser tiştên şaş hatibûme merkezkirinê. Meremê Xwedêyî bona me, dêmek, rewa Wî ya ezmana, *naskirina Îsa Mesîh e* (binihêre Fîlîpî 3:10).

Piştî çend sala Lîzayê hema wî cûreyî dua dikir, dema ku ew bona berevbûnekê hazir dibû. Wê rojê ewê û Xudan qise kirin. Ewî got:

“Lîza, Ez meriva nadime xebatê: Ez wana rûn dikim, Ez wana qenc dikim, Ez wana diguhêrim, Ez wana anegorî şikilê Xwe diguhêrim, lê Ez meriva nadime xebatê”. Ewî axaftina Xwe berdewam kir: “Lîza, kesekî ji hevalên te qet tu dayî xebatê?”.

“Belê”,- ewê got.

“Lê te ew yek li ser xwe awa texmîn dikir?”,- Xudan pirsî.

“Tê bêjî hindava minda xayîntî kiribûn”.

Xudan axaftina Xwe berdewam kir: “Gelek qulixçîya gazî Min kirine, ku ez tenê wana bidime xebatê: “Min bona qenckirinê, hukumkirinê, xilazkirinê bide xebatê”. Min bersiva wan da bi wê gumanê, wekî ewê dilê xwe pêşkêşî Min bikirana, lê ew qulixêva gelekî mijûl bûn ku xwe pêşkêşî Min bikirana. Ewana usa jî nexwest rêyên Min hînbin û nava encamê wê yekêda pêşkêşa Min bona çêkirina padişatîya xwe dane xebatê. Wextê ku tengavî hatin, wana destpê kir gazî Min bikin û xe-

yîdîn, dema ku Min bersiva duayên wan bi cûrê wanî xwestî û wedê wanî xwestîda neda. Wana texmîn kir ku ew ji alîyê Min da hatine xebitandinê û li ser Min hêrs ketin. Qulixçiyên wî cûreyî ketin, çimkî wana Ez nas nedikirim”.

Weyê derheqa wê jinêda çi bigota, ya ku tenê divedîne zarokên wê ji mêrê wê hebin û ew hewaskar nîne ku mêrê xwe nas bike? Bînin ber çavên xwe ku ew dikeve li ber lingên mêrê xwe û dike gazî: “Tu mêrê minî, hîvî dikim, min bide xebatê ku ez bona te zaroka bînim. Hîvî dikim, hîvî dikim, zaroka bide min: heger na ezê bimirim”. Ew yek tê bêjî bêaqilî ye, lê em jî wî cûreyî dikin, dema ku em gazî Xwedê dikin, hîvî dikin, ku Ew “me bona xilazkirina meriva bide xebatê”, lê em bi xwe jî tevî Wî nava pêwendîyada nînin. Dema ku em nêzîkî Xwedê bin, zarokê bibin mîna wê yekê, çawa ku jin tevî mêrê xwe nava pêwendîyên nêzîkda ye.

Bi vî cûreyî, cedandinên Îsrayêlîya rast nîbûn. Wana berbi tiştên *efrandî* divedand, lê ne ku berbi *Efrandar*. Û em zanin ku çi qewimî. Dewsa wê yekê ku qûmistan bibûya cîhê hazirkirina wana û serwaxtî gewat bida wana, ew bû welatê neserwextîyê, û bi kutasî nisileteke tam daqurtand. Gelo undakirineke çawa ye, ew jî wî çaxî, dema ku ew dikaribûn li welatê Sozdayîda bûna!

Eva derseke bona me hemûya ye! Em gerekê bi hazirî şuxulkarîya xweye qûmistanê li ser vê rêya nêzîkbûnêye bi rûmet qebûlkin.

5


ŞERABA NÛ

“Bila em bona Şeraba Teye nû bibine derdan, ya ku hemû tiştî çê dike”

- Yêprêm Asorî

“Tiştên buhurî bîr neynin û li ser tiştên berê nefikirin. Va ez tişteki nû dikim û ewê niha kifş be: gelo hûnê vê yekê nebînin? Ezê çol-bestada rê vekim, qûmsitanêda jî çema derxim”.

- Îşaya 43:18, 19



Em gerekê bi hazirî guhartina qebûl bikin, bona ku ji diha nêzîkva Xwedê nas bikin. Bo vê yekê jî cîhekî ji qûmistanê baştir tune, bo ku van guhartina bibîn. Li evî cîhê vala û xalî emê bibine şedê şuxulkarîya Ruhê Wîye nû.

Pirsek heye, ya ku li cem geleka pêşda tê: “*Bo çi bona anîna guhartinê wedê dijwar yan jî hişk tê xwestinê?*”. Nava vî serê kitêbêda emê bicêribîn bersiva vê pirsê bidin.

Wextê ku ez nava evî wedê qûmistanêyî dijwar ra derbas bûm û wê yekê 18 meha kişand, ez çawa serwêrê cahilayî li civîneke Flordîyaê hatime kifşkirinê (ew yek gelek sal pêşda bû). Wî çaxî ew civîneke usa bû, ya ku gelekî lez mezin dibû, û ez hinekî li ser xwe guman nîbûm, çimkî cêribandina min, ya serwêrê qulixdarîya cahila, tune bû. Lê belê, min zanibû, wekî Xwedê ez şandibûme li wir û heger ez bi kel û ced Wî bigeryama, hemû tiştê baş bûya.

Ew qulixdarîya cahila bi cûrê edetî hatibû çêkirinê, anegorî kîjanê cahil tevî hemû mijûlîyên hewaskar dibûn. Mixabin, piranîya cahilên nava wê qulixdarîyêda bi ruhanî pêşda neçûbûn. Ji wana gelek jîyana bêqanûnî derbas dikirin. Dema ku min ew qulix hilda li ser xwe, min texmîn kir, wekî Ruhê Pîroz gote min: “Tu gerekê tobekirinê, pîrozîyê, şikestîbûnê û derheqa serwêrtîya Xwedêda terîf bikî”. Min terîfkirin destpê kir, û derheqa wê yekêda ew hîn dikirin û nava wedêda nava wê qulixêda guhartin qewimîn.

Encamên wê yên ecêb bûn. Hejmara cahila nava çend mehada sê

cara zêde bû. Gelek endamên komên xirabkar, peyîhtîyên dînên başqe û cahilên ji Xwedê dût Îsa qebûl dikirin. Gelek cahil, yên ku berê paşda vekîşiyabûn, agir gur kirin. Me hemûya hazirîya Xwedê texmîn dikir û huba meye hindva Wî da her dem zêde dibû. Xwedê bi mezinahî me û xebata me dua dikir.

Ez ji nûva ji qûmistana ewlin derketibûm, ya ku ez ji bajarê Dallasê derbas bibûm. Ez difikirîm, wekî cêribandina min, ya qûmistanê êdî ser hevda hatibû. Niha ez êdî li ser navê xwe bûm, û min Mizgînî terîf dikir. Ez vî cûreyî difikirîm: heger Îsa tenê carekê qûmistanêra derbas bibû, usa ye ez jî gerekê qûmistanêra derbas bûma. Feqet ez şaş bûm. Lazim bû ku ez diha zêde paqij bûma û qewat bûma û derheqa şuxulkariya qûmistanêda min gerekê zêde bizanibûya. Qûmistana mayîn, ya ku hîvîya min bû, usa bû û himberî ya pêşda ya derbasbûyî bû û mîna lîstika zaroka bû.

Ruhê Pîroz gelek fikirên teze didane koma meye qulixdarîyê. Ev yek wî çaxî diqewime, wextê ku ji Ezmîn şeraba nû tê dayînê, wextê ku piştî wedê hazirîya qûmistanê “em ji Xwedê tên şandinê”. Ew me hîn dike, ku em kardar û rezdar bin, çawa ku Ewî Mûsa, Dawid, Ûsiv û yên mayîn hîn dikirin.

Qulixdarîya meye cahila bi rastî bi qewata nebînayî mezin dibû. Lê belê, nenihêrî wê yekê ku em gihîştibûne açixîyê, min barekî gelekî giran texmîn dikir, yê ku ne tenê koma meye cîhva girêdayî bû. Min texmîn dikir, wekî em gerekê bighîştana hemû cahilên Florîda merkezî. Bo wê yekê jî, wextê duakirinê fikirek li cem min pêşda hat: “*Wê çi bibe heger em qulixdarîya cahila bi têtêvîzyonê biweşînin?*”. Wî çaxî, nîveka salên 1980-yî bû, ew mecala here baş bû ku bighîştana meriva. Wî çaxî ne întêrnê hebû, ne torên sosiyalî hebûn, ne «YouTube» hebû, ne têtêfonên smartfon hebûn. Ez pê hesiyam, wekî kanaleke têtêvîzyonêye cîh bona çar mîlîyon temaşevana progiramên xwe diweşandin. Ez ecêbmayî bûm çimkî wedê weşana wêye azad jî hebû, êvarê seheta deha. Min zanibû, wekî ew wedekî baş bû bona “girtina” cahila.

Min derheqa wê yekêda serwêrê mera got, û ewî got, wekî bona wê yekê derfetên civînê tunene. Min jê pirsî, ku gelo dikarim bangî cahila bikim, ku ew pera berev bikin bona sponsortiya progirama bi têtêvîzyonê.

Ew qayîl bû, û min derheqa wê yekêda raberî cahila kir ku emê çawa bighîştana cahilên temamiya Florîda merkezî, yên ku narkotîkava, al-koholêva girêdayî bûn û pêra jî gelek pîrsgirêkên wan hebûn. Cahila ew yek qebûl kir, û soz dan ku ji perên xebatên xwe pêşkêşî wê yekê bikin. Nava encamê wê yekêda me bi cûrê soza gelek pere berev kirin ku her hevtê êvarê bi têtêvîzyonê programa xwe biweşînin.

Serwêrê me zendegirtî ma û fem kir, wekî ew yek karê Xwedê bû. Ew encamê şeraba nû bû: ew tiştêkî usa bû ku tu cara tu kesî nebihîstibû, wekî qulixdarîya civînêye cahila bi têtêvîzyonê bihata weşandinê, ew jî êvara şemîyê, sehetaya deha. Feqet hemû tişt çêbû. Zûtîrekê me çandîna cahilayê mezin dît, yên ku wê guhdarîya Mizgînîyê nekirana, heger me “şeraba nû” qebûl nekira. Piştî gelek sala, dema ku min serwêrtîya qulixdarîya cahila êdî berdabû, min hela hê şedetîyên derheqa wê yekêda dibhîstin, wekî bi rêya weşandîna progiramiyê bi têtêvîzyonê jîyanên gelek meriva hatibûne guhartinê, ya ku me çawa “Cahiltîya agirî” nav kir.

Guhartin baş e

Zûtîrekê emê paşda vegerine li ser qulixdarîya cahila. Hetanî wî çaxî em derheqa wê yekêda biaxivin ku şeraba nû çî ye û bo çî ew girîng e. Ew guhartin, berbi kîjanê Xwedê me dibe, çawa qanûn rihet nîne, lê her dem baş e û rezê xwe dide. Gelek cara em dijî guhartinê derdikevin, çimkî ew hukumî li ser xwestinên me dike. Meriv dikare bêje, wekî em ji xeysetên xwe çêbûyîne. Hema ew nava meda koka xwe diatînin û guhartina wana acizîyê li cem me pêşda tîne. Feqet, bona ku em padişatîya Xwedê diha baştir çê bikin, em gerekê bona guhartinê vekirîbin.

Heger em malbata bawarmendada mezin bûne, wî çaxî cûrê şuxu-lkarîya bawarîya me, edet û xeysetê me ji zarotîyêda çê bûne û bi kûrayî nava meda cîwarbûyîne. Bêguman, hemû edet nînin ku şaşin, lê wextê ku meriv tiştêkî dikin û tenê edet hesab hiltînin, lê ne ku ji dilê xwe, usa ye xwedêparêzîya wan ji karên bêjîyan çêbûyî ye.

Bi rastî, ew kar dikarin werguhêzî qewînbûna dînî bibin. Ew merivê ku bûye ruhanî û rûyê wê yekêda paşda çûye, usa ye tenê şikilê wî ye

xwedêparêzîyê ye, ew wî hemû tiştî qebûl dike, çî ku Xwedê berê *dikir*, lê dijî wî hemû tiştî ye çî ku Ew niha *dike*.

Fêrisî û rêberên ayîna dîne mayîn, yê ku hêna Îsada hebûn, hema wî cûreyî bûn. Wana pesinê xwe didan, digotin, wekî ew zarokên Birahîm in, lawên peymanêne û şagirtên Mûsane. Wana hemû tişt qebûl dikir, çî ku Xwedê kiribû, lê dijî Kurê Xwedê bûn, Yê ku nava wanda sekinî. Wana hevşûdî li edet û cûrê xwedêparêzîya wana dikirin. Bo wê yekê jî ew dijî wê yekê derketin, dema ku Îsa hat û nava wan hemû govekada guhartin kirin, kîjan bona wan baş bûn û qewîn bûn. Îsa zelal da kifşê, wekî Xwedê wê qewilên wanra qayîl nibe... ew gerekê qewilên Xwedêra qayîl bûna. Ew dijî wê guhartinê bûn û edetên xweva girêdayî man.

Li cem merivên wî cûreyî tabîya vî cûreyî çê dibe: “Xwedê wê tenê bi destî me û tenê anegorî normên me bişuxule”. Tabîya wî cûreyî fikira şaş dijî fikira saxlem pêşda tîne, û heger terka wê yekê nedin, wî çaxî hiznekirin û xayîntî pêşda tê. Ev yek hêna Îsada qewimî û nava temamiya dîroka civînêda qewimîye.

Bona ku em bêne guhartinê û ji dereceke rûmetê derbasî ya mayîn bibin, em gerekê bixwezî wê tabîya xwe berdî û bi wê rêyê herin, bi kîjanê Ruhê Xwedê rêberîyê li me dike. Ew rê wê gelek cara me qûmistanêra derbas bike, li kîderê Xwedê wê jîyana nû çê bike.

Ev yek zelal nava jîyana Yûhennayê Nixumdarda tê kifşê. Bavê wî kahîn bû, û wedekî jî serekkahîn bû. Yûhenna gerekê mîna bavê xwe bibûya kahîn. Bona ku ew bibûya kahîn, ewî gerekê li Orşelîmê, li cem mamostekî eyan xwendin bistenda. Lê rojekê Ruhê Xudan gazî wî li qûmistanê kir. Çiqwasî zêde Yûhenna dua dikir, awqasî qewata çûyîna li qûmistanê diha gur dibû. Ez hêvîdarim, wekî dilê wîda şerkarî bû û diqewime ew difikirî:

“Hemû hevalên min, tevî kîjana ez mezin bûme, diçine “mekteba Încîlê”. Ewê nasnama bistînin û wê bibîne rêberên qebûlkirî.

Ewê navê ruhanî bistînin û wê bikaribin li hemû civînen welêt terif bikin. Gelo ewê derheqa minda çî bifikirin? Ez çawa navê xwe biqedînim, heger neçime “mekteba Încîlê”?

Ez zanim, wekî nava jîyana minda bang heye. Bavê min gotîye min,

wekî serwêrekî milyaketa derheqa bûyîna minda elam kirîye û gotîye, wekî ezê qulixçî bim. Lê heger ez herime qûmistanê, tu kes wê nizanibe ku ez kî me. Wê tu cara min bona terîfkirinê dewat nekin”.

Lê belê, banga bona çûyîna qûmistanê dilê wîda dişuxulî, Yûhenna pirsên nava fikira xweda hesab hilnedan. Ewî qirar kir li peyî Ruh here û here qûmistanê. Derheqa wîda nivîsar e: “Kurik mezin dibû û bi ruh gewat digirt û heta roja Îsrayêlêva xuya bû jî li berîyê dima”(Lûqa 1:80).

Tiştêkî hewaskar e, wekî Yûhenna hazirîya xweye li qûmistanê za-

Qûmistanê çawa derbas bibin

5 Çadirêda bijîn: malê çênekin

Tu cara bîr nekin, wekî qûmistan wedelû ye, û hûn awqasî wêra derbas dibin. Dêmek, hetanî hûn li qûmistanêna çadirêda bijîn û tu cara malê çênekin.

Nenihêrî wê yekê, wekî îsrayêlîya bi deha sala, bi dijwarîya, li qûmistanê man, em bêjin, wekî Xwedê ew yek program nekiribû. Wî temî kir ku qûmistanêda cîhê herî baş bibîn, li wir bijîn û mala çêkin, wê rastîyêra qayîlbin, ya ku tê bêjî wê nehata guhartinê. Na xêr, ew çadirada diman û her dem hazir bûn eşiyayên xwe berevkirana û cîhguhartinê bûna, wextê ku ewir ji cîh dileqîyan. Qûmistan her dem çawa cîhê wedelû têra hatîye dîtîne, lê ne ku çawa cîhê herdemî. Xwedê tu cara negot: “Qûmistan awqasî jî cîhê xirab nîne. Welatê Sozdayî kêra lazim e? Werin em hîm biko- lin û malên qewîn bona xwe û Min çê bikin”. Heya Xwedê jî nava temamiya derbasbûna qûmistanêra çadirêda ma.

Mayîna li qampê dikare hewaskar û eşq be, lê tenê bi wedê kurt, lê gelek meriv dixwezin ji cîhên vekirî dûrbikevin û mala rastîda bijîn. Şaş nebin û bingeha xwe li qûmistanê çênekin. Her dem hazirbin ku eşiyayên xwe berevkin, pêşda herin, û çadira xweye kevin li imbarê veşêrin.

rotîyêda destpê kirîye. Ew bi sala bona qulixê hate hazirkirinê, ya ku tenê şeş meha kişand. Lê belê, Îsa got, wekî ew pêxemberê “ji jinê bûyî” yê herî mezin bû.

Kitêba Pîroz derheqa wê yekêda nabêje, ku Yûhenna çiqas wede li qûmistanê derbas kirîye, çend qûmistanara ew derbas bûye û nava gewilên çî cûreyîda bûye. Lûqa 3:2-da nivîsar e: “Henan û Qeyafa jî serekkahîn bûn. Hingê xebera Xwedê berîyêda Yûhennayê kurê Zekerîyara hat”. Tiştêkî balkêş e, wekî Henan û Qeyafa nava sistêma dînîda û jî Xwedê dûrketî dişuxulîn, li cîqê dijwar û bêav derdaneke teze çê dibû. Hema li wir jî şeraba nû gerekê xuya bûya.

Xwedê Yûhenna li qûmistanê hazir kir, lê ne ku “Li mekteba Încîlê”-ye rojên wîda qebûl kirî. Ji temamiya Cihûstanê û Orşelîmê elaletên mezin dihatin ku guhdarîya Xebera Xudan bikirana, dema ku Yûhenna li qûmistanê xeber dida. Bayê ruhî teze dihat: şeraba nû dikişîya, lê ew li *qûmistanê* bû, lê ne ku li îdarên ruhanî. Ew merivên ku ji feşbûn û edetên dînî westiyayî bûn, yê ku bi dil dixwestin bihatana guhartinê, çûne cem Yûhenna û xwe bona eyanbûna Kurê Xwedê hazir dikirin.

Piştî hinek wede Îsa hat, bo ku ji alîyê Yûhennada li çemê Êrdunêda bihata nixumandinê. Neniherî wê yekê, wekî Yûhenna texmîn dikir ku ew layîqî nixumandina Wî nîbû, lê Îsa got wekî ew wê yekê bike. Pêwîst bû, ku qulixa Îsa ji wê yekê bixuluqîya, çî ku Ruhê Xwedê wî çaxî li ser dinîyayê dikir. Piştî wê yekê, Îsa bi Ruhva tijî bû, û ew hate birinê li qûmistanê.

Kitêba Pîroz zelal dide kifşê, wekî wextê ku Îsa hate birinê li qûmistanê, Ew bi Ruhva *tijîbûyî* bû, lê piştî cêribandinên çil rojî Ew jî qûmistanê bi *gewata* Ruh paşda vegeşîya. Ew niha sîlihkirî bû, bo ku ew qulix mîyaser bikira, bo çî Ew hatibû. Çend meha piştî qulixa Yûhennayê Nixumdar tiştêkî nû jî qûmistanê xuliqî: qulixa Îsa Mesîh.

Meşkên nû

Hinek wede peyî wê yekêra derbas bû, wextê ku Îsa qulixa Xwe destpê kir û em dixwînin: “Wana ji Îsa pirsî: “Çima şagirtên Yûhenna û usa jî yê fêrisîya her dem rojî digrin û dua dikin, lê şagirtên Te dixun

û vedixun?”” (Lûqa 5:33). Pirsê ewlin, kîjanê em gerekê bidin, ev e: ew “kîne?”. Em bersiva vê pirsê mizgînîya Mettada dibînin. Wî çaxî şagirtên Yûhenna hatine cem Wî (Îsa) û gotinê...” (9:14). Bi sala ser hev ez difikirim, wekî ev pirs Fêrisîya da, lê wextê ku pê hesîyan, wekî ew şagirtên Yûhennayê Nixumdar bûn, min ew beş bin ronahîke başqeda dît. Ew hêrsketî bûn, çimkî wana gelek cara rojî digirtin û bi seheta dua dikirin, lê şagirtên Îsa usa nedikirin. Peyîhatîyên Yûhenna qurbanîyên mezin dikirin? Lê temamîya guhdarîyê li ser şagirtên Îsa bû.

Rojên Yûhennayê Nixumdarda ji wan mecala yek, bi kîjanê Ruhê Pîroz dilivîya, rojî bûn. Lê belê, şagirtên Yûhenna ji cûrê qulixa Yûhenna derbastir nebûn çî ku *niha* Ruhê Xwedê dike. Ew guman bûn, wekî ew rezê ruhanî wî çaxî nava encamên qulix û hebandina wanda pêşda hatibû. Bona çûyîna li peyî Yûhennayê Nixumdar wana bihakî mezin dabû. Wana malbetên xwe hiştibûn, li qûmistanê diman û dewsa xwerinê kêzik û bihuk dixwerin, lê niha jî rêberên wan hebsêda bûn. Şagirtên Qulixçîyê Nû “bi qanûnên wan nedilîstin”. Koma Yûhenna xeyîdî bû û li ber qezîyayê sekinîbû.

Bîr nekin, wekî ruhên dînî her dem nêzîkî wî hemû tiştîne, çî ku Xwedê îdî pêşda *kiriye*, lê dijî wê yekêne, çî ku Ew niha *dike*. Diqewime ku peyîhatîyên Yûhenna hela hê pêşda guhdarîya xwe dabûne li ser aminbûna xweye hindava rêberê xwe, lê ne ku çî ku Xwedê *niha* dibêje û dike. Wana êdî guhdarîya xwe nedida li ser dilê Xwedê. Niha wana guhdarîya xwe dabû li ser wî *cûreyî*, yê ku nava wedekîda dikaribû rêberîya berbi dilê Xwedê bikira.

Kubarî û xeyîd serî bilind kirin. Merivên tevî Yûhenna wedê xwe û diqewime mecalên xweye finansî kiribûne nava vê qulixê. Niha ew tiştên ku wana kiribû, piştgirîya çî wana dikir û çî dest anîbûn, bin qezîyaêda bûn. Dêmek, ew başqe bûn û dijî guhartinê bûn, nenihêrî wê yekê, wekî rêberê wana derheqa Îsada got: “Ew gerekê mezinbe, lê ez biçûk bim” (Yûhenna 3:30).

Awa Îsa çî gote wan: “Hûn dikarin bêjine xwendiyên dewatê: “Rojî bigrin”, heta ku zeva tevî wane?” (Lûqa 5:34). Ewî kirên wane dînî eşkere kirin û got: “Bona çî ew gerekê rojî bigrin, heger Kurê Xwedê

teví wan e? Heger ew tişteki ji Xwedê bixwezin, ew dikarin bêne cem min (şirovekirin). Fikirdarîya dînî usa kiribû ku wana bawar bikira, wekî wana gerekê razîbûna Xwedê bi rojîya û karên dînîye mayîna qazanc bikirana. Rojî bona wana mecala ketina li cem Xwedê bû, ya ku bi fikira wana, wana ew ji merivên başqe bilindtir dikirin, yê ku rojî nedigirtin (mêtodên wane mayîna nedidane xebatê). Bi wî cûreyî kubarî kete nava jîyana wan. Cûrê qulixa wan diha girîng bû, lê ne ku rezê wêyî pêşin.

Nenihêrî wê yekê, wekî nava girtina rojîyêda kar heye, lê meremê wê xebitandina Xwedê nîne, ew e ku dengê Wî diha zelal bibihên. Dêmek, bona çî şagirta gerekê rojî bigirtana, ku dengê Xwedê bibihîstana, wextê ku Ew li rex wan bû? Careke mayîna Lûqa 5:34,35 bixwînin: “Hûn dikarin bêjine xwendîyên dewatê: Rojî bigrin, heta ku zeva tevî wane? Lê rojê bîn, gava zeva ji wan bê hildanê, hingê wan rojada wê rojî bigrin”.

Ewî negot, wekî ew nava wan rojada *dibek* dikarin rojî bigrin. Ewî got, wekî ew *ese* rojî bigrin. Ew meriv tenê derheqa hildana rojîyêye ji xwerinê digotin, lê Îsa derheqa rojîke başqe digot. Guhdarîyê bidine ser, wekî ew rojî wê wan rojada hebûya, wextê ku Zeva ji wan bê hildanê. Ew rojîya hazirîya Wîye eyanbûyî ye, lê ne ku ji xurek e. Em derheqa wê yekêda zanin, çimkî Ewî bi metelokekê şirove kir. Bîr nekin, wekî qûmistanê meriv dikare çawa tunebûna hazirîya Xwedêye eyanbûyî şirove bike.

Em wê metelokê bixwînin, ya ku Ewî da xebatê, ku gotina Xwe şirove bike:

“Û ne jî kesek şeraba nû dike meşkên kevin. Heger usa bike, şeraba nû wê meşka biteqîne û birije, meşkê jî xirab bibin” (Lûqa 5:37).

Încîlêda şerab sembola hazirîya Xwedê ye. Pawlos Efesî 5:18-da dinivîse: “Û bi şerabê serxweş nebin, ku emirê mêriv pûç dike, lê bi Ruhê Pîrozva tijî bibin”.

Em gerekê bi şerabê, bi hazirîya Xwedêva, tijî bibin. Şeraba nû heja Ruhê Wîye nû ye.

Îzinê bidin ku ez carekê jî derbasî vê pirsê girîng bibim. Tê bîra we,

ku çiqas baş bû, wextê ku teze Ruhva tijî bibûn? Hazirya Xwedê şîrin û qewat bû. Her car, wextê ku we dua dikir, hazirîya Wî carekêra eyan dibû, û we temamiya rojêda ew yek texmîn dikir. Hûn carina li civînê rûniştî digiryan, çimkî Ew awqasî nêzikî we bû.

Lê belê, piştî hinek wede hûn destpê dikin bibînin, wekî hûn usa hêsa nikarin hazirîya Wî texmîn bikin. Hûn dîsa dua dikin, çawa ku we berê dikir, lê dîsa li cem we pirs pêşda tê: “*Xwedê, Tu li kîderêyî?*”. Hûn li qûmistanêne.

Menîya wê qûmistanê, yan jî rojîyê, mexsûs ji hazirîya Xwedê tê. Xwedê we hazir dike, ku hûn bibine meşkên nû. Hûn nikarin şeraba nû, heja Ruhê Xwedêye nû, bikin meşkên kevin.

Rojên Îsada meşkên şerabê ji çermê pêz çê dikirin. Dema ku şerab dikirinê, meşk şidîyayî û baş bû. Ew bi hêsanî dirêj dibûn û xirab nedibûn, dema ku şerab dadigirtin. Feqet hewa Rohilata Navîn nava salada meşkê şerabê zîha dikir, ew hişk dibû û bi hêsanî xirab dibû. Heger şeraba têda birijîya û ya nû bihata dagirtinê, ew meşk wê li ber giraniya şeraba nû teyax nekira, çimkî ewê biterikîya, yan jî biqelişîya. Bona helkirina wê pirsê meşkên kevin çend roja bi avêva tijîkirî dihiştin, lê paşê rûnê zeytûnê li wana dixistin. Rûn usa dikir ku meşk dîsa şidîyayî û baş bûya.

Ev yek nîşan dide ku çî tê pêşîya me, çimkî em meşkê şeraba ruhanîye nûne. Em hatine gazîkirinê, ku hazirîya Xwedê li ser xwe bibin. Ew atmosferê, ku em têda dijîn dikare texmînkirina meye hindava rêyên Xwedê bide zeyîfkirinê. Em li ezmana nînin: em nava cîhê xirabbûnêda dijîn, li vê dinîyayê. Dêmek, fikira me gerekê çê bibe. Bo ku meşkên me şidîyayî bin, bona ku ew her dem bo şeraba nû hazir bin, em gerekê bikevine nava Xebera Xwedê. Efesî 5:26-da Pawlos dinivîse: “Wekî wê bi Xeberê buhurtî jîbareke, pê avê bişo”. Wextê ku rûnê zeytûnê li ser meşk dixin, meriv wê yekê dikare himberî wê yekê bike ku nava duada Xwedê digerin. Dema ku em wede tevî Xwedê derbas dikin, nava Xebera Wî û duada fikira me çê dibe, û rêyên me û kirên me êdî hişk nabin.

Lê belê, bona tezekirina meşkê kevin gerekê pêşda şeraba kevin birê-jin. Dêmek, meşkê bêyî şerab bimîne, bêyî hazirîya Xwedêye eyanbûyî. Wê yekê meriv dikare çawa rojîya ji hazirîya Xwedê eyanbûyî nav bike,

yan jî çawa ku em her dem dibêjin, wedê hişkî yê. Nava êtapên jîyana weye wî cûreyîda hûn bo *guhartinê* hazir dibin.

Bo çi Xwedê hazirîya Xweye nêzîk dûr dixê? Bona ku hûn gumana xwe bibirin? Na xêr, nenihêrî wê yekê jî ew yekê biqewime. Yan bona ku ew we “dexilêda xweyke”, hetanî ku careke mayîn hûn Wî lazim bên? Na xêr. Ew hazirîya Xwe dûr dixê bona ku usa bike, ku hûn bi kel û ced Wî bigerin. Gera dîtina Xwedê dîsa mêriv dişidîne. Merivên hişk û neşidîyayî ew in, yên ku Xwedê nagerin. Ew nava cûrê xebata xweda û nava wan qirarada hişk dibin, yên ku pêşda li cem wan hebûne.

Peyîhatîyên Yûhennayê Nixumdar ketibûne nava halekî wî cûreyî. Ew gihîştibûne Yûhenna û dîtibûn, wekî Xudan bi destî wan bi cûrê qewat dişuxulî. Lê belê, dewsa wê yekê ku ew berbi rewayê ezmana biçûna, yê ku naskirina Xwedêye jî nêzîkva ye, ew nava fikir û cûrê şuxulkirina Xweda hişk bibûn.

Nava her hejeke Xwedêda hînbûneke teze dixulîqe. Hînkirin û mamostatîya saxlem ew derfet in, yên ku me nêzîkî dilê Xwedê dikin. Feqet, heger em guhdarîya xwe bidine ser hînkirinên cuda, yan jî mamostatîya, wî çaxî ewê bibine nava diltîya dînî, qanûnparêzîyê, yan jî nava hemûya bi hevra.

Hûn nikarin Xwedê naskin, heger peyî hebandineke cûrê hişk herin, lê gelek mesîhî bi nezanî wî cûreyî dikin. Ew bona xwe cûrê hebandinê û mêtodên xwe îzbat dikin. Lê wextê nava jîyana wanda terbê mesîhîtiyê baş çê dibe, ew êdî terka çûyîna *gera* Xwedê didin û destpê dikin anegorî wan edeta bijîn, yên ku çê bûne. Lê belê, ew valahîkê xweda texmîn dikin, nenihêrî wê yekê, wekî ew hesab dikin ku ew anegorî Mizgînîya tam dijîn.

Yêrêmîya 29:12,13-da nivîsar e:

“Hingê hûnê gazî Min bikin û bên, hûnê li ber Min dua bikin û Ezê guhdarîya we bikim. Hûnê li Min bigerin û bibînin, çimkî bi tamamîya dilê xwe hûnê li Min bigerin”.

Bona gera li Xwedê tenê duakirin bes nîne. Ewên ku peyî edetên dînî

diçin, bi rastî dua dikin, lê Xwedê dibêje wekî nava duayên xweda hûn gerekê bi kel û ced li *Wî* bigerin. Nava wê xeberêda Ew dide kifşê, wekî nava duayêda gerekê ger hebe, lê bona wê yekê jî diha zêde tê xwestinê, ne ku çûyîna li peyî edet. Bona wê yekê xwestina bi cedandin û cedandina naskirina dilê *Wî* pêwîst e. Awa bo wê yekê jî Îbranî 11:6-da Xwedê dibêje: “Lê bêyî bawarî tu car nabe ku însan li Xwedê xweş bê, çimkî ewê ku nêzîkî Xwedê dibe, gerekê bawar bike ku Xwedê heye û wê wan xelat bike, yên ku li *Wî* digerin”.

Niha werin em careke mayîn xeberên Îsa bixwînin:

“Û ne jî kesek şeraba nû dike meşkên kevin. Heger usa bike, şeraba nû wê meşka biteqîne û birije, meşkê jî xirab bibin. Lê gerekê şeraba nû bikine meşkên nû. Û kesek peyî şeraba kevinra naxweze ya nû vexwe, çimkî ya kevin hê lê xweş tê” (Lûqa 5:37-39).

Ewê ku hûnî şeraba kevin hatîye, “zûtîrekê” wê ya nû nexweze. Nava vê gotinêda xebra kilît xebra “zûtîrekê”-ye, çimkî em merivin, yên bi edet û cûrê şuxulkarîya xweva. Xwedê gerekê wan hemû tiştên ku li me xweş tîn ji me dûr bixe, *şeraba kevin* birêje û îzinê bide, ku em hazirbûna qûmistanêra derbas bibin, bona ku bo *şeraba nû* em tî bin. Wextê ku hûn tî bin û tiştêkî vexwerinê tunebe, hûnê gazina nekin: “Ez vê şeraba nû naxwezim. Ez ya kevin dixwezim”. Heger hûn hazirîya Xwedê û qewata *Wî* dixwezim, hûnê heja Ruhê Xwedêye nû nava jîyana xweda qebûl bikin. Hûnê bibine mînanî Dawid, yê ku wextê derbasbûna xweye qûmistanêra got:

“Xwedêyo, Tuyî Xwedêyê min:

Ez demana Tedame.

Ruhê min tîyê Te ye:

Canîya min heyra Teda ye, çawa erdê tî û ziha,
dera ku av lê tune.

Belê, min cîhê pîrozda Tu dîtî,

Dîna xwe da qewat û rûmeta Te” (Zebûr 63:1,2).

Dawid, tîyê qewat û hazîrîya Xwedê bû. Bo wê yekê jî, wextê ku ew kete nava navê xwe, ew himberî Şaûlê padişa bona xwestinên Xudan şîdiyayî bû, çimkî Şaûl hemû tişt bi cûrê xwestina xwe dikir, lê ne ku bi xwestina Xwedê.

Dîsa qûmistanek

Çawa ku min pêşda vî serê kitêbêda gilî dikir, qulixa serwêrê cahila qulixa mine serwêrtîyêye ewlin bû. Berevbûnên ku bi têlêvîzyonê hatine weşandinê gihîştine açixîke mezin. Me usa jî progiramên Mizgînîyêye kurt bi radîyoyê didan û ew radîyo kanaleke nava nehîya meda ya here eyan bû. Hemû tişt baş bû.

Lê belê, rojekê, dema ku min dua dikir, Ruhê Xwedê gote min, wekî nava jîyana meda guhartinê bibe: “Wê te ji qulixa serwêrê cahila dûr bixin,- Ewî got,- û Ezê te bişînim civîn û hemcivînên hemû bajarên Amêrîkayê, ji kenarê Rohilatê destpêkirî hetanî kenarê Rojavayê û ji sînorê Kanadayê destpêkirî hetanî sînorê Mêksîkayê, berbi Alayskayê û adên Havayê...”

Min derheqa wê yekêda Lîzayêra got, çî ku Ruhê Xwedê gote min û me destpê kir dora wê yekê bifikirin. Me tu kesîra derheqa wê yekêda negot, xêncî hevalekî, yê ku li ştateke mayîn serwêr bû. Xwedê got, wekî Ewê wê yekê bike, û min zanibû ku heger bi rastî Ewî ew yek bikira, hewce nîbû ku bona mîyaserkirina wê yekê min alî Wî bikira.

Lê belê, ji salekê zêdetir derbas bû, lê tu tişt neqewimî. Nava wî wedê hîvîyêsekinandinêda ez diha bi dijwarî diketime nava hazîrîya Xwedê, heya ku ew yek minva hate texmînkirinê ku ew yek ne tiştê bûyînê bû. Min wê demê diha zêde dua dikir ne ku berê, lê tê bêjî hemû tişt bêfeyda bû. Xêncî wê yekê dîtinoka mine bona qulixa cahila dîtemirî (şeraba kevin dirijîya). Min çiqasî zêde dua dikir, awqasî ew yek zeyîf dibû. Ji derva tu tişt nedihate guhartinê, lê ji hundurva cedandina min kêma dibû.

Min, bi seheta ser hev, pêşîya qulixa cahila dua dikir û çend cara min hîvî ji Xwedê dikir ku bona terîfkirinê merivekî başqe bişanda. Ez bi texmînkirinên vala diçûme qulixê, lê hazîrîya Xwedê mînanî xêlîyê

peîyayî li ser min dibû, hetanî ku min qulixa xwe xilas dikir. Wextê ku min ser hevda dianî û li ser rêya malê bûm, hazirîya Wî careke mayîn bi hevtêkê dihate hildanê.

Bi wî hemû tiştîva tevayî, nava jîyana meda tengavîyên der û hundur pêşda hatibûn, yên ku tu cara li cem me tunebûne. Min ji xwe dipirsî, gelo pirsgirêk nava mindane? Ez her gunehekî ku min kiribû xwe mikur dihatim, lê min tu sivikayî ji hişkaya xwe texmîn nedikir.

Carekê, wextê ku min dicêriband fem bikira ku min çi guneh kiribû, Xudan got: “Tu bona wê yekê li qûmistanê nînî, wekî te tobe kiriye. Ez te bona guhartina pêşerojê hazir dikim”.

Ewî nava minda ew xeysê çê dikir, yê ku lazim bû, bona ku min banga Wî bona êtapa qulixa mine mayîn qebûl bikira. Bixwînî Îşaya 43:18,19:

“Tiştên buhurî nekine bîra xwe û ser tiştên berê nefikirin. Va Ez tiştêkî nû dikim û ewê niha kifş bibe, gelo hûn vê yekê nabînin? Ezê çol-bestada rê vekim, qûmistanêda jî çema derxim”.

Diha dereng, ezê vê kitêbêda gilî bikim ku çawa wededa Xudan bi cûrê ecêb derheqa wê “guharta pêşerojêda” bi hûngilî eyan kir. Nava temamiya wî wedeyîda, nava rojên qûmistana mine here giranda, Xudan hazir dibû ruh bida qulixa me, yê ku wê hukumê xwe li ser miletên Amêrikayê û paşê gelek miletên mayîn bihişta.

Hevalê min, Xwedê wê şeraba weye *kevin* vala bike, bona ku wextê ya *nû* bê (lê tevî şeraba *nû* cêribandinên nû tîn), hûn nexwezîna paşda vegevine li ser ya *kevin*.

6


REWA EZMÎN

“Hinek meriv paşda vedigerine li ser paşeroja xwe û hemû tengaviyên xwe yeko-yeko lê dinihêrin, yên ku wextêda hebûne, lê paşê pêşeroja xwe dinihêrin û hîvîyêne, wekî wê diha zêde tengavî hebin, û wî cûreyî bi dudilî tamamîya jîyana xwe dijîn”.

- D. L. Mûdî

“Na xêr, xwişk-birano, ez xwe hesab nakim ku min ew yek qazanc kirîye, lê ez li ser tiştêkî disekinim: bi bîrkirina tiştên li piş xwe hiştî û bi gumana wê yekê, çi ku pêşîya min e, ez bi kel û ced berbi dawîya vê yekê dicedînim û wê rewa ezmîn bistînim, bona kîjanê Xwedê bi navê Îsa Mesîh gazî me dike”.

- Filîpî 3:13,14



Pawlosê şandî du sêanîya namên peymanana Nû nivîsîn û gelek civîn dane hîmdanînê. Qulixa wî li temamiya dinîyayê belav bû, lê dawîya jîyana xweda ewî got: “*Ez hela hê negihîştimê*”. Ew razî nîbû, û ew nikaribû razî bûya, hetanî ku şuxulê xwe xilas nekira û rewa ezmîn nestenda.

Bona ku em şuxulkarîya xwe ser hevda bînin û rewa xwe bistînin, berê ewlin em gerekê guman bin, wekî dilê meda ew e, wekî em hela hê negihîştine wê yekê.

Em kamil nebûne: em gerekê bêne guhartinê û bighîjin.

Navê Mûsayî balkêş jî hebû: ewî rêberîya milletê sê mîlîyonê kir û tevî cêrge nîşan û ecêbên peymanana Kevin bû. Lê belê, Xwedê got, wekî Mûsa li ser temamiya dinîyayê merivê herî şikestî ye. Ewî hesab nedikir, wekî ew gihîştibû, lê ewî bi kel û ced dicedand ku şuxulkarîya xwe ser hevda bîne û rewayê ezmîn bistîne. Bona ku em bêne guhartinê û bighîjin, em gerekê hîn bin.

Ya duda, bona ku em şuxulkarîya xwe bo Xwedê ser hevda bînin, em gerekê “*tiştên berê*” (serkeftin û binketina) bîr bikin. Careke mayîn, nava Îşaya 43:18,19-da Xwedê dibêje:

“Lê wî hemû tiştî bîr bikin:

Ew yek himberî wan tiştan tu tişt nîne, çî ku Ez hazir dibim bikim.

Çimkî Ezê tiştêkî nû bikim,

Binihêrin, Mîn îdî destpê kirîye. Gelo hûn vê yekê nabînin?

Ezê nava qûmistanêda rê çê bikim.

Ezê çol-bestada çema derxim”.

Heger em berdewam bikin derheqa binketinên xweye pêşda qewimî, încarbûnê û gunehada bifikirin, ew yek wê îzinê nede me ku em nava Mesîhda pêşda herin. Lê belê, *serkeftinên* meye pêşda jî dikarin me paşda bigrin. Heger em li ser xwe guman bin û îzinê bidin ku destanînen berê bibine stûna me, wî çaxî emê wî hemû tiştî tê berdîn, çî ku Xwedê bona wedê niha hazir kirîye. Xwedê nava serê Îşaya 43-da hema vê yekê dibêje. Ew çî ku berê qewimîye dîsa ji Wî bû, lê bona ku em pêşda bilivin û progiramên Wî mîyaser bikin, em gerekê hazir bin ji wê yekê paşda bisekinin, çawa Xwedê bi destî me berê dişuxulî. Heger usa nibe, wî çaxî qezîyayê li pêşîya me be: em dikarin bibine meşkê kevin.

Pawlos jî ev rastî da dîyarkirinê.

“Gava ez zarok bûm, min mîna zaroka xeber dida, mîna zaroka difikirîm, mîna zaroka dida ber hesêb. Gava ez mezin bûm, ew tiştên zarotîyê min ji xwe dûrxistin. Niha em çawa qeretûkî neynikêda dibînin, lê hingê emê rû bi rû bibînin. Niha ez pirî-hindikî zanim, lê hingê ezê tam nas bikim, ku çawa ez hatime naskirinê” (A Korintî 13:11,12).

Zarok şaş nîne: ew awqasî gihîştî nîne. Dema ku ez pêncsalî bûm, temamîya dinîya min ji avtomaşînen bona lîstikê û konstrûktora çêkirî bû. Ezberîgotina elîfbê çawa destanîneke mezin dihate hesabê. Min bi berçavkên rengîn li jîyanê dinihêrî, çimkî ez ewqasî negihîştî bûm ku min bikaribûya ew govekên giran û berfireh fem bikirana.

Dema ku ez bûme 18-salî, avtomaşînen bona lîstikê û konstrûktor êdî bibûne tiştên berê. Niha, piştî gelek sala, min êdî bi berçavkên rengîn li jîyanê nedinhêrî. Dereca femdarîya min û karebûnên min zêde bibûn. Dema ku merivê 18-salî mînanî zaroka pêncsalî dike, ew yek normal nîne. Bi mezinbûnê em kir û fikirên berê em bîr dikin, yên ku îdî kardar û praktîk nînin, ku em bona hewcetî û xwestinên xwe mîyaser bikin.

Bi vî cûreyî, bi gihîştina nava rastîyên xwedîtîyêda û bi derbasbûna nava etapên jîyanêra, em gerekê cûrê fikirdarîya berê û kirên berê berdîn. Pawlos dibêje, wekî niha em rîyên Xwedê û rûmeta Xwedê baş nabînin,

Qûmistanê çawa derbas bibin

#6 Çi gerekê neyê kirinê

Li ser bingeha vî hemû tiştî, çi ku Încîl derheqa cêribandina îsraêliyaye zeyîfda mera gilî dike, hene tişt, kîjana em gerekê li qûmistanê nekin, li wan çol û besta, li kîderê em wedelûne. Bi rastî, ew navnîşa wan kirên qebûlnekirinê yan jî guneha, derheqa her êtapeke jîyana mesîhîtiyêdane, lê balkêşîya wana, bi texmîn, diha mezin e, dema ku em li qûmistanê şerkarîyê dikin. Awa beşeke navnîşa kirên wane here giran:

1. Xwestinên tiştên xirab. Carina, wextê ku em zyanê dibînin, em dikarin bifikirin, wekî kirên şaş wê alî bikin ku em diha baş û bextewar bin.
2. Cedandina berbi pûta. Ev yek dide kifşê, ku em berbi xwestinên xwe divedînin, wextê ku em zanin ku ew dijî Xwedêne, usa jî wextê ku em zêdetir hizkirina xwe pêşkêşî kesekî yan tişteki dikin, lê ne ku pêşkêşî Îsa dikin.
3. Cîdayîna bona dilhavijîyê û bêesilîyê.
4. Cêribandina Xudan.

lê em çiqasî zêde berbi rewa ezmîn bicedînin, emê awqasî zelal bibînin, hetanî wê demê, wextê ku em Xwedê rû bi rû bibînin, Wî usa naskin, çawa ku Ew me nas dike.

Ew rewa ezmîn kîjan e, derheqa kîjanêda Pawlos dibêje? Ewî bersiva vî pirsê nava xebereke pêşda da. Fîlîpî 3:10-da nivîsar e: “Ez dixwezim Wî û qewata rabûna Wîye ji mirinê nas bikim, tevî cefayên Wî bim, bikevime halê mirina Wî”. Rewa Xwedêye Ezmîn bûyîna mîna şikilê Îsa Mesîh û naskirina Wî ye, çawa ku Ew me nas dike. Hetanî ku em negihîştine wî meremî, em gerekê nesekinin. Dêmek, em gerekê tu cara gera li dilê Xwedê nedine sekinandinê.

5. Gazinkirin, gazinkirin, gazinkirin.

Nava nama ewlinda, ya bona bawarmendên Korintîyê, Pawlos dide kifşê, wekî em dikarin ji pêşên xweye li qûmistanê yên derheqa jîyanêda gelek tiştî hînbin.

“Xwîşk û birayên delal, ez naxwezim ku hûn derheqa wan kal-bavên meda bîr bikin, yên ku berê li qûmistanê bûn... Xwedê ji wana gelek meriv begem nekirin, û bedenên wana nava qûmistanêda belav bûn. Ev tişt çawa eşaretîya bona me qewimîn, bona ku em tiştên xirab nexwezim, çawa ku wana xwest” (A Korintî 10: 1,5,6).

Îsraêlîya bona wê yekê bihakî giran dan: usa ye werin em ji mînaka wan hînbin.

Hevalê min, qûmistanêda hûn dikarin rêyên Xwedê û dilê Wî bibînin, lê gerekê dilê xweda hûn qewîn bin û li ser xwe guman bêjin: “Xwedê, ez bawar dikim ku Tu qencî, û wekî Tu min hiz dikî, hetanî wî çaxî jî, dema ku ez qencî û hizkirina Te texmîn nakim”.

Ya sisîya, bona ku em bighîjine rewayê ezmîn, em gerekê “li peyî merem herin (yan jî bi kel û ced berbi merem bicedînin)”. Ev yek dide kifşê, wekî emê rastî dijîderketinê yan jî hukum bên. Tişteki usa heye, yê ku dijî naskirina Xudan e.

Bona mîrêcin qezîya here mezin merivê bi şikilê Îsa Mesîh e, û qewatên tarîstanê ji hemû tiştî zêdetir dijî wê yekê şer dikin. Westê ku bawarmend bi şikilê Mesîh pêşda tîn, wî çaxî ew bona xwe najîn, lê bona Wî dijîn, Yê ku nava wanda dijî. Ew bawarmend destpê dikin jîyana xwe diha zêde û bi hukum nava mesîhda bidine kifşê. Awa bo wê yekê jî Pawlos got, wekî bona naskirina Wî em gerekê bibine tevbûyê cefayên

Wî. Cefayê wê bedenê, derheqa kîjanîda ew dibêje, mirina merivatîyê ye, peyî kîjanêra jîyana heta-hetayê tê. Petrûs dinivîse:

“Awa Mesîh ku bona me bedenî cefa kişand hûn jî bi wê nêt-fikirê sîlhkirî bin. Çimkî yê bi bedenî cefa kişand, wî dest ji guneha kişandiye, wekî îdî heta mirina xwe ne ku li gora dilhavijîyên xweye merivahî bijîn, lê li gora qirara Xwedê” (A Petrûs 4:1,2).

Heger em bi bedenî cefê bikişînin, emê êdî tu cara bi rêyên xweva pêşda neçin û fikirên me wê li ser wê yekê nîbin, usa ye emê berbi nêt-meremên vê dinîyayêye gunehkar necedînin. Xeysetê Mesîh wê nava meda bişuxule. Ev e ew nîşangeh, kîjanê em gerekê lêxin.

T'evî Mesîh cefê bikişînin

Cefayên Mesîh kîjanin? Li cem geleka usa ye, wekî derheqa wê yekêda rast fem nakin, çimkî hineka hînkirinên dînî û ev femdarîya Încîlê tevî hev kirine. Cefa *nade kifşê* ku ji nexwaşîkê bimirin, yan jî pere tunebin ku hesaba dadin. Ew yek *nade kifşê* ku bi hevtîya tu tiştî nexun bona ku Xwedê bi wê qurbanîyê razî be. Cefa qurbanî nîne, lê şikestîbûn û gurêdabûn e. Xudanê Îbranîya zelal dide kifşê ku cefayê Mesîh kîjanin:

“Îsa jîyana Xweye vê dinîyaêda gelekî bi keser û bi hêsira, lava û reca ji Wî dikirin, Yê ku dikaribû Ew ji mirinê xilaz bikira û bona milûktî û êlimîya Wî hate bihîstinê. Rast e Ew Kurê Xwedê bû, lê dîsa bi wan cefayên xwe guhdarîyê hînbû” (Îbranî 5:7,8).

Îsa milûktî neanîbû li vê dinîyayê: Ew mecbûr bû wê yekê hîn bibe. Ew hîn bû ku wî çaxî gura Bavê Xwe bikira, wextê ku gurênekirin diha hêsa bû. Ewî nedicedand meriva razî bike. Ewî zanibû, wekî nava encamên wê yekêda merivê ji milûktîya Wî kareke mezin bistendana. Petrûs da kifşê, wekî cefayê rast dide kifşê ku anegorî xwestina Xwedê bijîn, lê ne ku anegorî xwestinên merivatîyê (A Petrûs 4:2).

Gotina “cefayên Mesîh” dide kifşê: bi rêya Xwedê wî çaxî gerekê herin, wextê ku fikirdarîya me, texmînkirinên me dixwezîn me berbi razîbûna û berdaxustinê, usa jî rihethizîyê bibin. Gelek cara em dikevine nava şerkarîya wî cûreyî, wextê ku Xwedê temîyê dide *me* ku em rêyeke başqeva herin, lê hevalên me, endamên malbetê, xebatkar û yên mayîn dixwezîn ku em rêyeke mayînda herin. Mixabin, tê bêjî ev yek ji wan meriva tê, yên ku gelekî nêzîkî mene. Mînaekeke klasîk jî ew e, wekî Petrûs derheqa mirina Îsa û definkirina Wî da qayîlnebûn elam kir.

“Peyî wê yekêra, Îsa destpêkir şagirtên Xwera eyan bike, ku gerekê Ew here Orşelîmê, ji alîyê rûspîya, serekên kahîna û qanûnzana gelek cefa bikişîne û bê kuştinê, lê roja sisîya ji mirinê rabe. Lê Petrûs Ew da alîkî, lê hilat û gotê: “Dûrî hindava Te, Xudan! Ew tişt tu car li Te neqewime!”. Îsa ser Petrûsda vegeyîya û gotê: “Ji ber çavê min betave bibe, cino! Tu bona Min pişkbûnî, çimkî ew nêfîkîra te ne ji Xwedê ye, lê ji merivayê ye” (Metta 16:21-23).

Îsa şagirtên xwera eyan kir, wekî bona kirina gura Xwedê gerekê biçûya Orşelîmê, cefa bikişanda, bihata kuştinê û roja sisîya ji mirinê rabûya. Li ber çavay e, wekî Petrûs xeberên Îsaye derheqa rabûna ji mirinê nebihîstibûn, bo wê yekê jî ewê ewqasî bona gotina Îsaye derheqa mirina Wîye nêzîkda xemgîn nîbûya.

Ez difîkirm ku meriv dikare fem bike ku Petrûs çi difîkirî:

“Bisekine, Tu mesîhî yî (hinekî pêşda ew yek li wî eyan bibû), û Tu gerekê padişatîya Îsrayêl bidî dasekinandinê û izbat bikî. Min îşê xwe hiştîye, jin û malbeta xwe hiştîye ku Peyî Te bêm. Rûyê peyîhatina Te da min hevalên xwe unda kirine. Min gelek wede kirîye nava vî karî. Min navekî xirab dest aniye. Rêberên civîna difîkirin ku tu dînî: rojname û kovar her dem gotara derheqa wê yekêda dinivîsin ku Tu çiqasî yekî başqe yî. Tu têma here sertî nava torên sosîyalîda û piranîya fikirên meriva nebaşin. Tu ji alîyê rêberên xwedêzan û ulmzanada çawa yekî dijî civînê têyî hesabê. Û Tu derheqa mirinêda dibêjî? Lê çi wê bê serê min? Min awqas

wede xerc kirîye ku peyî Te bême: ezê destevala bimînim û xêncî navê xirab tu tiştên min wê tunebin”.

Petrûs bêyî fikirmîşbûn got: “Na xêr, Xudan, Tu nikarî usa bikî” (şirovekirina berfireh).

Îsa mecbûr bû carekêra bida kifşê, wekî fikirên Petrûs yên xwehizîyê û yên vê dinîyayê bûn. Ewî bi çavê Xwedê nedinihêrî. Mîrêcin (“xwedêyê vê dinîyayê”, B Korintî 4:4), ev dinîya hîn kirîye, ku berjewandîya xweye şexsî bigere. Nava padişatîya ezmînda hemû tişt wekî mayîn e. Dêmek, bona mîyaserkirina xwestina Xwedê em gerekê dijî kûltûra vê dinîyayê herin. Mînak, heger tu dijî “birayekî, yan xwîşkekî nava Xudanda” herî, fikirdarîya kîjanî ya vê dinîyayê ye. Petrûs merivekî xirab nîbû. Lê nava wê pirsêda fikira wî bin hukumê vê dinîyayêda bû, lê ne ku bin hukumê Mesîh da. Ew dijî wê guhartinê bû, çimkî fikirdarîya wî cûrekî mayîn bû.

Mînakeke vî cûreyî hema derheqa cesûsada ye, yên ku ji alîyê zarokên Îsrayêlda hatibûne şandinê, yên ku çûbûne welatên Kenanê, ku dîna xwe bidana dor-berên li wir. Ew ji salekê zêdetir li qûmistanê bûn, û Xwedê temî da Mûsa ku meriva bişîne welatê Sozdayî, bona ku behseke usa bistînin, ya ku Ewî dixwest ku ya wan bûya. Mûsa 12 rêber bijartin, ji her eşîrekê rêberek. Ji wana dudu Yêşû û Kalêb bûn.

Gava ku cesûs paşda vegeyîyan, wana behsên dijî hev derheqa wê yekêda anîn, ku wana çi dîtibû û çi lazim bû bikirana. Ji wana deh meriva gotin:

““Lê miletê li wî erdî dijî qewat e, bajar jî bi sûrên gelekî mezinin, usa jî me zarokên enaqîya li wir dîtin. Amalêkî li Necefê dijîn, hîtî, yebûsî û emorî li ser çîya-banîya dijîn, kenanî jî devê behrê û kêleka Êrdunê dijîn...Em nikarin hevraz herin miqabilî wan, çimkî ew ji me qewattirin”. Wana cab-sawên xirab bela dikirin nava zarên Îsrayêl, bona erdê lê cesûsî kirî digotin: “Erdê ku eme çûbûnê ku cesûsîya wê bikin, ew erd binelîyên wî hûfî xwe dike û hemû merivên ku me li ser wê dîtin, merivne bejinbilindin”” (Jimar 13:28-30,32,33).

Besa Kalêb û Yêşû cûrekî mayîn bû

“Lê Kalêb cimet li ber Mûsa da kerkirinê û got: “Rabin em hevraz herin û wî bikine milkê xwe, çimkî emê ese wî zefî xwe bikin... Heger Xudan hizke, ewê me bibe wir û wî erdî bide me, yê ku şîr û hingiv jê dikişe. Tenê miqabilî Xudan ranebin û ji merivên wî erdî netirsîn, çimkî ewê bibine xurên me. Sîya ser wan ji ser wan hate hildanê. Xudan tevî me ye, ji wan netirsîn” (Jimar 13:31, 14:8,9).

12 cesûs tevayî çûbûn ku li wî welatî cesûsîyê bikin. Wana hema ew welat, bajar û meriv dîtibûn. Bona çi deh meriva behseke başqe anîn, lê du merivên mayîn jî cûrekî mayîn gotin? Pirsgirêk nava femdarîya wanda bû.

Xwedê derheqa Kalêb û Yêşûda got, wekî ruhê wan başqe bû, çimkî ew bi temami gura Wî da bûn (Jimar 14:24). Bi gilikî mayîn gotî, ew ji wê yekê derbastir bibûn, ji xwestinên merivayê berbi xwestina Xwedê çûn. Wana bi çavên Xwedê dinihêrîn, lê ne ku hemû tişt bona xwexweykirina xwe dinihêrîn. Ev yek alî me dike, ku em fem bikin ku bona çi deh cesûsa tiştekan dîtin, lê ne usa, çawa ku Yêşû û Kalêb dîtin. Ew diha zêde derheqa xwe û malbetên xweda difikirîn, lê ne ku derheqa xwestinên Xwedêda. Ew derheqa jîyana xweda difikirîn, lê ne ku derheqa padişatîya Xwedêda. Wana fem nedikir, wekî Xwedê wê tu cara wana bernede û nava hemû rêyên Xweda wê açixî bida wan. Ev cûrê fikirdarîya şaş usa jî ya cimeta mayîn bû, çimkî wana jî got:

“Temamiya zarên Îsrayêl dijî Mûsa û Harûn bêhna xwe teng kirin, temamiya civînê gote wan: “Xwezî em erdê Misirêda bimirana, yan xwezî em li vê qûmistanêda bimirana! Gelo çima Xudan me dibe li wî erdî? Wekî em bi şîr bêne qirê? Jin û zarên me talan herin? Gelo mera neqenc e em vegerine Misirê?”” (Jimar 14:2,3).

Zarên Îsraêl “rojên berêye baş” bîr dianîn, dema ku zikê wan têt bû, û nava jîyana wanda hinekî qewînbûn hebû. Neniherî wê yekê, wekî

ew li Misirê xulam bûn, lê li vir rastî çî dihatin ew ji xulamtîyê diha girantir dihate texmînkirinê. Ew hemû dijî wê guhartinê bûn, ya ku bo wan lazim bû. Wana êdî destpê kiribûn li qûmistanê xwe çareserkirî texmînkirin, çimkî êdî dor-berara nas bûn, nenihêrî wê yekê ku jîyana wane koçerîyê û xwerin-xurekên wan ji kamiltîyê dûr bûn. Nava encamê wê yekêda wana usa jî welatê Sozdayî nedît û usa jî xwestina Xwedê nekirin.

Lê belê, Yêşû û Kalêb gerekê *pêşdaçûyîn berdeyam bikirana*. Ew dijîderketin, rastî kîjanî hatin, ji “birayên” wan hat, kîjana dixwestin ku ew bêdeng bikirana: “Lê temamiya cimetê derheqa wê yekêda xeberda ku Yêşû û Kalêb bidine ber kevira” (Jimar 14:10). Ew merivên ku dijî Yêşû û Kalêb bûn, fikirên wan yên çêkirî nîbûn û hela hê mînanî vê dinîyayê difikrîn û didîtin. Ew bi serhişkî rêyên xweva... û fikirdarîya qûmistanêva qemitîbûn.

Mîna Yêşû û Kalêb, Pawlosê şandî got, wekî ewî gerekê derheqa wan tiştada bîr bikira, ên ku li piş mabûn û *gerekê bi kel û ced berbi rewa ezmîn bicedanda* (Fîlîpî 3:14).

Careke mayîn ev gotinên Îşaya 43:18,19 bixwînin: ev gotin wê bêşik piştgirîyê bidine me:

“Lê wî hemû tiştî bîr bikin:

Ew yek himberî wan tişta tu tişt nîne, çî ku Ez hazir dibim bikim.

Çimkî Ezê tişteki nû bikim,

Binihêrin, Min êdî destpê kirîye. Gelo hûn vê yekê nabînin?

Ezê nava qûmistanêda rê çê bikim.

Ezê çol-bestada çema derxim”.

Mixabin, roja îroyîn gelek meriv zêdetir dixwezin nava xulamtîya xweye “çarserkirîda” bijîn, lê dewsa wê yekê gereke bi kel û ced berbi azadîyê bicedînin, bi mîyaserkirina Xwestina Xwedê. Ew diha gelekî ji guhartinên pêşîya xwe ditirsin, lê ne ku ji wedê nihaye bi hukum û wanra nas ditirsin. Hene merivên usa jî, yên ku bi wê yekêva razîne, çî ku Xwedê nava jîyana wanda êdî kirîye, û ew naxwezin berbi tiştên nû herin. Belê, Xwedê bi destî wan tiştên mezin kirine, lê ew jî li ser

açixîyên berê sekinîne.

Kirina gura xwestina Xwedê jîyanê û azadîyê pêşkêş dike, û ew yek mecala tek-tenê ye ku razîbûna rast hebe. Lê belê, cedandina berbi rewayê ezmîn dikare li ber çavê we çawa tiştê nebûyîne bê texmînkirinê. Xwedê bi destî Îşayayê pêxember got, wekî Ewê tiştên nû bike, lê ew yek wê li qûmistanê eyan bibe. Bi cûrekî mayîn gotî, dema ku em li peyî Ruhê Xwedê herin, bixwezin wî hemû tiştî bikin, çî ku Ew dixweze, emê bikevine nava halên wî cûreyî. Feqet em zanin, wekî ew tiştê ku bona meriva yê bûyîne nîne, bona Xwedê yê bûyîne ye (binihêre Lûqa 18:27). Piştî qûmistana weye roja îroyîn serkeftin, razîbûn û jîyana tam hene.

Mîna wan deh cesûsa û cimetê nîbin, yên ku nexwestin xwestinên Xwedê qebûlkin û li ber wê guhartinê ber xwe dan, ya ku wê ew ji cefayên qûmistanê aza bikirana. Dewsa wê yekê, li ser xwe guman berbi welatê Sozdayî pêşda herin, berbi rewayê Xwedêyî ezmîn, yê ku bona we hatîye çêkirinê.

7

RÎYA XWEDÊYE HERE BAŞ


“Dijwarî hacetê sade nîne. Ew hacetê Xwedêyî herî kardar e, yê bona pêşdaçûyîna jîyana meye ruhanî. Ew cudatî û qewimandin, kijana em çawa paşdaçûyîna dibînin, gelek cara dibine destpêka êtapên gihîştina ruhanî. Çawa ku em destpê dikin vê yekê fem bikin û vê yekê çawa rastîya ruhanî qebûl dikin, wî çaxî em dikarin diha bi hêsanî li ber dijwarîyê teyax bikin”.

- Çarlz Stênlî

“Dengê gazîkirê li qûmistanê:

“Rîya Xudan hazir bikin û bona Xwedêyê me rêya nava çolbestada rastkin”.

- Îşaya 40:3



Bi çiqasîva jî tiştên ecêbmayînêbe, qûmistan ew cîh e, li kîderê Xwedê cîhê rêya here baş qirar kiriye. Hema li vir rêya Wî çê dibe, rêya Wîye berbi jîyana bilind, bi kîjanê merivê ku diçe dikare mîna Wî bijî û bifikire.

Nava temamiya dîrokêda hindik meriv bi vê rêyê çûne. Lê belê, niha Xwedê geleka bona vê yekê hazir dike. Derheqa vê yekêda Îşaya 35:6,8-da nivîsar e:

“Çimkî li qûmistanê avê derbikevin, û çol-bestada kanî wê derên...Û li wir soqaq û rê wê hebin, kîjanara wê bêjin rêya Pîroz”.

Navê rêya Xwedêye li qûmistanê wî cûreyî nîne, mînak “Î-95” yan “Rîya 66-a”. Ew awqasî çawa *pîrozî* tê navkirinê.

Şirovekirineke pîrozîyê “halê paqijayê ye”. Îsa dibêje: “Xwedê li wana dua dike, dilên kîjana paqijin, çimkî ewê Xwedê bibînin” (Metta 5:8).

Îsa wê bona civîna nepîroz û nepaqij paşda venegere: ew tê peyî civîna usa, zewala kîjanê û qerçimoka kîjanê tune.

Çend dehsalî pêşda, dema ku ez cahil bûm û min gavên xweye ewlin nava qulixêda diavîtin, dema duakirinê, Xudan nîşanî min da, wekî Ewê jîyana min paqij bike. Ez awqasî ruhdar bûm, wekî min gote Lîzayê: “Xwedê wê hemû nepaqijaya ji min dûr bixe”, û min destpê kir wan hemû tiştên nebaş nav bikim, yên ku Ewê dûr bixista (diqewime Lîzayê

jî çend heb serda zêde kirin, yê n ku min ji navnîşa xwe tê berdabûn).

Nava sê mehên bi sirêda tu tişt neqewimî. Bi rastî, hemû tişt nava jîyana minda diha xirab bû, û ez diha gelekî hewcê paqijbûnê bûm. Ez çûme cem Xudan û min pirsî: “Bona çi xeysetên mine xirab diha xirab dibin, dewsa wê yekê ku dûr bikevin?”.

“Kurê min,- Ewî got,- Min got, wekî *Ezê* te paqij bikim. Te dicêriband bi qewatên xwe wê yekê bikî. Niha *Ezê* wê yekê bi cûrê Xwe bikim”.

Min pêra jî nizanibû, wekî li cem min êtapa qûmistanêye ewlin wê destpê bûya û ewê 18 meha bikişanda.

Rêyên Wî ne rêyên mene

Nava destpêka jîyana mine ruhanîda min nasîya xwe da qulixdarîya Tî Êl Osborn. Doktor Osborn qulixçî û nivîskarekî gelekî baş bû. Ew û jina wî, Dêyzî, bi hevra serkarîya qulixdarîya mizgîndarîyêye qewat, doxtirîyê dikirin, ya ku çend dehsalîya ser hev li temamîya dinîyayê dişuxulî. Qulixdarîya wan bi deha mîlîona meriv anîne ber xilazbûnê.

Dêmek, hûn dikarin bînine ber çavê xwe ku em çiqasî ruhdarbûyî bûn, dema ku ez rastî doktor Osborn hatim, yê ku hate Dallasê ku li civîna terîf bike. Serbara serda, xebata min usa jî ew bû ku min gerekê mêvan-terîfkirên civînê qebûl bikirana, û wî çaxî min raste-rast nasîya xwe da wî. Tî Êl şexsekî ecêb bû. Dema ku ez tevî wî bûm, teyê bigota ez tevî Îsa bûm.

Tî Êl çend cara hate civîna me û em nêzîkî hev bûn. Dema ku ew bona qulixkirina xwe hazir dibû, ewî ew hemû kitêb pêşkêşî min kirin, kîjan ewî cahiltîyêda lêkolîn kiribûn. Xêncî wê yekê ewî du cara gelek kincên xwe pêşkêşî min kirin. Wî çaxî perên min û Lîzayê tunebûn ku me kinc bikirîyana: dêmek, ew pêşkêşên du cara dayî bona min alîkarîke mezin bû. Piştî wan seredana, ew û Dêyzî bona min û Lîzayê bûne çawa dê û bav.

Çend sal pêşda, wextê ku ez hela hê hevalfîke amêrikîda dixebitîm, ez wextê qulixdarîkê hazir bûm, li kîderê Tî Êl terîf dikir, û Ruhê Pîroz bi dengê nimiz gote min: “*Rojekê tê qulixî wî bikî. Tê bona Doktor Tî Êl Osborn bixebitî*”. Ez fikirîm, wekî ew hemû tişt derheqa wê yekêda îzbat dikirin, wekî ezê nava koma wîda bûma, û pêçerojêda minê qulixdarîya mizgîndarîyêye wî cûreyî destpê bikira.

Lê belê, tu tişt nediqewimî: “Ez hela hê li qûmistanê bûm. Ofîsa qulixdarîya Osbornaye sereke li Talsayê bû, lê ew li bajarê Orlandoyê diman. Wede derbas dibû û min bi cûrê qewat destpêkirina qulixkirina xwe texmîn dikir, bi wê derecê, wekî min qirar kir ku ez cîguhartî Orlandoyê bim, bona ku diha nêzikî Osborna bûma. Meremên min yên dubare bûn. Berê ewlin Tî Êl wê bidîta ku min tu civînekêda qulix nedikir. Ew merivekî gelekî paqij bû. Min zanibû, wekî ewê tu cara min hilneda li ser xebatê û bi wî cûreyî ji civîna me dûrbixista. Ya duda ew bû, wekî ez tevî Lîzayê, emê bajarê Orlandoyê bimana, û meyê bikaribûya bi hêsanî bighîştana qulixdarîya wana. Çawa ku em cîguhartî li wî bajarê ştata Florîdayê bûna, ezê gelekî nêzikî wî bûma.

Bêguman, ez zanim, wekî ew yek ji alfyê minda hinekî çawa xiyal bû. Lê belê, ez hazir bûm, ku min “alî” Xwedê bikira, bona ku Ewî rêya raste berbi navê min bida pêşîya min.

Min hîvî ji serwêrê xwe kir ku rastî min bê, bona ku min elamî wî bikira, wekî ezê ji xebatê derketama û cîguhastî Orlandoyê bûma. Feqet, êvara pêşîya wê rojê, sê serwêrên ji bajarên cuda-cuda minra têtêfon kirin. Ji wana her kes pê hesîyabûn ku minê rojtira mayîn çî bikira, û hema derheqa wê yekêda ji min pirsîn: “Lîza tera qayîl e?”

Lîza qayîl nîbû. Çend cara ewê gotibû min: “Con, ezê gura rêberîya te bikim, lê ez nikarim bêjime te ku ez bi dil texmîn dikim, wekî tu rast dikî”. Min ew xeberên wê hesab hilnedidan. Ez difikirîm: “*Lîza awqasî fem nake, û heger ez malxwê malême, ew gerekê gura rêberîya minda be*”. Gelo eva fikireke çawa bêfikir û negihîştî bû! Dema ku serwêrê sisîya êvarê dereng minra têtêfon kir û hema ew pirs da min, tê bêjî dilê minda tiştêk şikest. Çavên min vebûn û min fem kir ku min dicêriband alî Xwedê bikira ku Ewî progrîma xwe mîyaser bikira, dewsa kîjanê min

gerekê îzin bida ku Ewî bi xwe ew yek bikira.

Rojtira mayîn, em tevî Lîzayê rastî serwêrê min û jina wî hatin. Min jêra gilî kir, ku bona çi min hîvî kiribû ku rastî hevdu bên û min gote wî, wekî piştî hersê têtêfonkirinên êvarê min êdî fikira xwe guhartibû. Ew gelekî em hiz dikirin û gotin ku ew dixwezîn, wekî em tevî wan bimînîn. Min dikaribû qulixa xwe berdewam bikira.

Min texmîn kir, wekî barek ji ser milên min ket û ez niha hazir bûm, wekî Xwedê bi Xwe bona me bişuxulîya. Min nizanibû, wekî prosêsa paqijbûna min hela hê ser hevda nehatibû. Pêleke paqijbûnêye mayîn jî hebû, ya ku wê hema wê rojê ser minda bihata. Piştî rasthatina meye tevî serwêr û jina wî, şeş sehet derbas bibûn, dema ku ez li malê bûm û hazir dibûm biçûma tevî xebatkarên civîna me baskêtbol bilîsta, zengilê têtêfonê lêxist: Tî Êl Osborn bû. Ez zendegirtî mam.

Wextê qisa têtêfonêye 90 deqê, ewî bona min û Lîzayê li qulixdarîya xwe xebat pêşniyar kir. Me gerekê alî wî û Dêzyîyê bikira, usa jî tevî wana li temamîya dinîyayê nava rêwîtyada bûna. Me usa jî gerekê li Talsayê civînek bida hîmdanînê, ya ku gerekê bibûya nimûna hîmdanîna civînên mayîn. Merem ew bû, wekî civînên wî cûreyî li temamîya dinîyayê bidana hîmdanînê, li wan cîha, li kîderê wana piranîya wedê xwe nava berevbûnên mizgîndarîyêye berfireh derbas dikirin.

Wextê wê qisa têtêfonêye dirêj ez difikirîm: “*Bavo, min zanibû ku Tê bikî, lê ez zendegirtî mame ku ew yek çiqasî lez qewimî. Te ew yek kir*”. Dijwar e meriv wê ecêbmayînê û şabûnê bîne ber çava, ya ku min texmîn dikir, dema ku min tevî Tî Êl Osborn bi têtêfonê xeber dida. Ez guman bûm, wekî ew yek hema derketina ji qûmistanê bû, hîvîya kîjanê bûm ez. Ez awqasî bextewar bûm, wekî min texmîn kir, ku ez dikarim banzdim û bi serê xwe banê mala me bixim. Piştî xilasbûna xeberdana bi têtêfonê ez ji malê derketim bona razîbûna ji Xwedê, lê ruhê xweda min tiştêkî mînanî qedexekirinê texmîn kir. Kûraya dilê minda tê bêjî texmînkirineke ne baş hebû.

Ez fikirîm: “*Na, Xwedê, na, na, na. Tu nikarî usa bikî. Te zûva soz daye, wekî rojekê ezê bona Tî Êl Osborn bixebitim. Tu nikarî wê yekê qedexe bikî*”.

Texmînkirina wê qedexê dûr nediket. Sê roja ser hev, min dicêriband hemû tişt bikira bona ku ew yek bi rêya duakirinê dûrbiketa. Min dicêriband ku ez ji wê texmînkirina nerihetîyê azad bûma. Min dikire qîrîn: “Xwedê, nava vê pirsêda şabûnê bide min”. Lîzayê jî ev qedexekirin texmîn dikir, nenihêrî wê yekê, wekî ewê jî dixwest li cem Obsorna bixebitîya.

Bi kutasî min qirar kir ku ez bawar nekim, wekî ew qedexekirin dikaribû ji Xwedê bûya (ew jî gaveke negihîştî û bi qezîya bû ji aliyê minda). Dêmek, em, tevî Lîzayê, bi teyarê çûne ştaba Oklahomayê ku tevî hevpeyvînê bûna, û dihate texmînkirinê, wekî hemû tişt dihate ber çava. Tî Êl û Dêzyîyê bi resmî ew xebat pêşnîyarî me kirin û êvara cejina Pîroz nasîya temamîya koma xwe dane me.

Em paşda vegeŕiyane Dallasê û ez ji xebata xweye li civînê derketim. Feqet ew texmînkirina qedexê ji min dûr nediket. Min bi seheta nava duakirinêda derbas dikir, lê ez nerihet bûm. Min her dem dicêriband wê texmînkirina nebaş ji xwe dûrbixista û diha zêde dua dikir, lê tu tişt nedihate guhartinê.

Bi kutasî min gote Lîzayê:

-Ez nizamim çî diqewime, lê tiştêk rast nîne.

Ew minra qayîl bû:

-Ez dikarim hema wê yekê jî bêjim.

Min Tî Êl Osborna têlêfon kir û derheqa wê yekêda jêra gilî kir. Ewî got:

-Werin em hev bibînin û derheqa wê yekêda xeberdin.

Em bi teyarê çûne Talsayê, û piştî rasthatina dusehetê Tî Êl got:

-Me ev xebat pêşnîyarî we kir, çimkî em we bi dil hiz dikin û em zanin, wekî hûn jî me hiz dikin. Feqet em difikirin, wekî ew yek diqewime ne ji Xwedê ye.

-Ez jî wê yekê fem nakim, - min got, - lê ez difikirim hûn rastin.

Min nikaribû bawar bikira, wekî ew xeber ji devê min derketin. Ji min xwekontrolkirin hate xwestinê ku min ew yek bigota. Xebata tevî Tî Êl Osborn xiyala jîyana min bû.

Wan sala ez sibe zû ji malê derdiketim û min ji seheteke hetanî

du seheta dua dikir. Feqet piştî du hevtîya, piştî wê acizîyê, min êdî bi dijarî dua dikir, dema ku ez sibe zû ji malê derdiketim. Tê bêjî ez tenê dikaribûm bigirîyama. Min dikaribû tenê hemû tişt bîr bianîya, çî ku nava çend mehên dawîda qewimibû, û min bawarîya xwe li wê yekê nedianî. Xemgînîya min nedihate şirovekirinê. Tê bêjî min şîna merivekî hizkirî dikir. Ez du hevtîya nava halê wî cûreyîda bûm û carekê ez li cîhekî bûm, li kîderê tu kes nikaribû dengê min bibhîsta, û min çiqas dikaribû usa bilind kire qîrîn:

-*Bo çî?* Bo çî Te usa kir ku min ew yek berda. Berî şeş sala Te minra xeberda û got, wekî ezê bona Wî bixebitim. *Bo çî?*

Ezê tu cara wê yekê bîr nekim, ku çî Xudan gote min: “Çimkî Min dixwest bidîta, ku te qulixî Min, yan qulixî wê xiyalê dikir?”.

Ez zendegirtî mam.

Ewî xeberdana xwe berdewam kir: “Awa bo çî Min emir kir, ku Bi-rahîm Îshak dayne gorîgehê. Min dixwest bidîta, ku ewî diha hindik Min hiz dikir, yan ew duayê sozadyî, yê ku Min da wî? Ewê bida kifşê, ku gelo ewî qulixî wê xiyalê dikir, yan qulixî Min dikir ku wê xiyalê bistîne, yan qulixî Min dikir û aminaya xwe li zelalîya Min dianî û bawar dikir wekî Minê ew xiyal mîyaser bikira”.

Ew xeberên Wî bersiva hemû pirsên min dan, kîjanara ez nava du hevtîyên dawîda nava şerkarîyêda bûm. Ê cara ewlin, ji 17 meha zêdetir derbas bibûn, û ruhê minda şabûn pêşda hat. Jîyana min tê bêjî careke mayîn vebû û min fem kir ku wî çaxî ez çiqasî duakirî bûm. Min jineke bedew stendibû û kurekî minî baş hebû. Ez careke mayîn bengîyî li ser jina xwe û kurê xweyî biçûk bûm. Ez difikirîm, wekî em maleke tezeçêkirîda dijîn, ji kîjanê hinekî wêdatir hewzekî bedew hebû, û bawar bikî, her roj, ezman zelal bû. Min ew hemû tişt nedidîtin, çimkî guhdarîya min çûbû li ser hukumê qulixê, bi wî hemû tiştîva, çî ku bi fikira min, min gerekê bikira ku li Xwedê xweş bihata.

Niha, dema ku ez paşda dinihêrim, ez vê yekê fem dikim: Xwedê gotibû, wekî ez gerekê bona Tî Êl Osborn bixebitîyama, û ew mecal bona min hebû. Min gelek cara qulixî wî kiribû, dema ku ew bi mêvandarî hatibû civîna meye li Dallasê.

Qûmistanê çawa derbas bibin

#7 Hevalên xwe fesal bibijêrin

Diqewime ev yek gerekê we zendegirtî nehêle, lê gelek cara rex-nekirên meye sert û dijminên here berk ew merivin, yên ku çawa endamên koma me hatine hesabkirinê. Gelek cara zêrandin ji wî merivî tê, yê ku hûn çawa hevalên xwe hesab kirine.

Qûmistanêda dikare zêrandina rast destpê bibe, û em gerekê fem bikin, wekî em dikarin hîvîya zêrandinê bin, heger em peyî Mesîh diçin. Pawlosê şandî dinivîse: “Belê, her kesê ku dixweze yektîya Mesîh Îsada bi xwedênasî bijî, wê bê zêrandinê “(B Tîmotêyo 3:12). Zêrandin beşeke şuxulkarîya paqîjbûna me ye. Lê kî dikare rola wîda be, yê ku dizêrîne? Ew meriv dikarin bizêrînin, yên ku derewînin, yên ku xwe hesab dikin bawarmend, ketine nava cimeta Xwedê, lê bi rastî, bi dil Xwedê hiz nakin. Awa bo wê yekê ye, ku Pawlos derheqa Hanês û Hamrêsa dinivîse, yên ku dijî Mûsa bûn. Ew meriv ji der nîbûn: ew ji cimeta Xudan Pawlos derheqa hinek zêrandin û qezîyada gilî dikir, yên ku rastî wî

Lê belê, xebata min êdî tunebû. Ez, şikestî, paşda vegerîyame civînê û min pirsî ku ez dikarim xebata xwe paşda bistînim. Tê bîra min, wekî min hevalê xwe nihêrî, yê ku alîkarekî serwêr bû, û min gotê: “Ez awqasî biçûk xwe dibînim, wekî ez difikirim ku ez dikarim bin derîra derbas-bim”. Min hema usa jî gotê. Min hemûyara gilî kiribû, wekî ezê li cem Tî Êl û Dêyzîyê bixebitim. Serwêrê me serbara serda ji ser dikê derheqa wê yekêda elam kiribû, lê ew yek neqewimî.

Civînê xebatek pêşniyarî min kir. Min li wir dîsa heyşt meha qulix kir, peyî kîjanêra êtapa navê minî duda destpê bû, bona kîjanî Xwedê ez hazir dikirim. Li civîneke Amêrîkayêye ku lez mezin dibe, xebatek pêşniyarî min kirin. Ew yek bi cûrê ecêb qewimî. Me, tevî Lîzayê, zan-

hatibûn û nivîsîye, wekî ewî “ji birayên derew” tengavî dîtibûn (B Korintî 11:26).

Li qûmistanê gelekî kardar e, heger li rex we meriv hene, yên ku we hiz dikin, derheqa weda difikirin û xwestina Xwedê eyan dikin. Wera rexnekir û merivên usa nelazimin, yên ku we def didin ku hûn gura Xudanda nîbin, mîna jina Hob û hevala. Û wera pêx-emberên derew lazim nînin, yên ku lefektîya li ber we dikin, dema ku li cem we hewcetîya rastkirina xwedêtîyê heye. Wera meriv lazimin, yên ku we hiz dikin, û Serwaxtîya Xwedê eyan dikin.

Lê belê, hişyar bin, dema ku kesek destpê dike we gunehkar dike, dibêje, wekî hûn gunehkarin ku ketine nava qûmistanê. Diqewime ew meriv bi rastî hevalê we nîne. Ruhê Pîroz wê nava gunehda dijî me be, û Ewê gelek cara merivên başqe bide xebatê, bona ku alî bike, ku em şaşîya xwe bibînin û tobe bikin. Feqet gunehkarkirinên her dema, nava kîjanada guman tune, ew ji dijminin. Hişyar bin! bûn.

ibû, wekî ew yek derîyê ji alîyê Xwedêda vekirîbû. Wî çaxî ruhê minda jîyana nû û dîtînok hebû, çimkî ez meşkê bi şeraba nûva tijîbûyî bûm, bona wê xebata nû hazirbûyî bûm.

Rêya paqîjbûnê

Bi sedsala ser hev, ji wî çaxîda destpêbûyî, wextê ku Îsa ji vê dinîyayê dûr ket, peyîhatîyên Wî cêribandinê bi cedandinên xweva bighîjine pîrozîyê. Bi rastî, ji wan cêribandinên bêfayde, bawarîyên civînaye cûre-cûre pêşda hatine. Feqet em wî cûreyî bûne xulamê qanûnparêzîyê, çimkî pîrozî nava encamê xebata kerema Xwedêda pêşda tê, lê ne ku

nava sînorkirina ji bedenê der.

Xwedê keremê dide şikestîya, lê ne ku kubara. Merivê kubar difikire ku ew dikare bêyî alîkarîya Xwedê bighîje pîrozîyê, bi çûyîna peyî qanûna û qanûnên nivîsar. Merivê şikestî zane, wekî ew yek bêfayde ye û gumana xwe dide li ser qewata Xudan. Pîrozî ji heleqetîya nêzîke tevî Xwedê pêşda tê, çimkî tenê bi rêya heleqetîya wî cûreyî meriv dikare qewatê bistîne, bona ku qanûnên li ser dilê xwe nivîsar xweyî bike.

Geleka cêribandiye anegorî nivîsara peymanê Nû yan jî fikirên ne ji kitêba Pîroz bighîjine pîrozîyê û mixabin nikaribûne. Çawa ku cuhîya badîhewa dicêriband xilazbûnê bistînin, bi xweykirina herfa qanûnê, usa jî em nikarin pîroz bin heger peyî qanûna herin. Geleka bi fikirên qanûnparêzîyêva xwe dane sînorkirinê, anegorî hinek kirina yan jî faktora. Wana sînorkirinên ji der dane xebatê û cêribandine bighîjine pîrozîya hundur.

Lê belê, Xwedê pîrozîya ji der nagere: Ew dixweze ku dilê we bê guhartinê, çimkî ji dilê paqij wê kirên paqij derbikevin. Metta 22:26-da Îsa dibêje: “Pêşîyê hundurê fîncan û tasê paqij bike, wekî li derva jî paqij bibe”.

Heger dilê we paqij be, hûnê nexwezin tiştên usa bikin, yên ku wê navê Îsara bêqedirîyê binin. Hûnê ji rûpelên întêrnêtêye pornografîyayê dûr bimînin û kincên vekirî li xwe nekin. Diqewime mêr yan jinek pesinê xwe bide ku ew tu cara jî mêr yan jî jina xwe cihê nebûye, lê dilê xweda ew hindava xebatkarekî xwe bi xwestinêva tijîbûyî ye, yan jî her dem saytên pornografîyayê bi întêrnêtê temaşe dike. Gelo eva pîrozî ye?

Heger dilê we paqij be, kompyûtêr û tîlefon wê we def nedin ku hûn matêriyalên neçêkirinê bigerin. Aparatûryaên tîxnîkî bi xwe me nakine nepaqij. Dilê wêda çî heye, ew yek we berbi wê gavê def dide. Heger dilê we paqij be, hûnê tenê tiştên usa bixwezin kîjana Xwedê dixweze.

Qûmistan ji wan cîha ye, kîjana Xwedê dide xebatê, bona ku menîyên me paqij bike. Bona paşdavegerandina li civîna Xwe Xwedê dilên me hazir dike. Xwedê nisileteke usa bilind dike, ya ku wê rûmeta Wî eyan bike, lê ne ku ya xwe, ya merivên usa, yên ku bi şikilên Wîva çêkirîne û anegorî xeysetê Wî dişuxulin:

“Maleke mezinda ne tenê derdanên zêr û zîv hene, lê yên ji dar û ji herîyê jî hene. Hinek bona derecên bilindin, hinek jî bona derecên nimiz. Awa, heger yek xwe ji wan tiştên necayîz paqij bike, ewê bibe derdaneke dereca bilind, buhurtî-jibare, kêrî xweyê xwe hatî, bona her derecên qencda hazir” (B Tîmotêyo 2:20,21).

Guhdarîyê bidine li ser wê yekê, wekî du cûrên derdana hene, yên bona derecên bilind û yên bona derecên nimiz. Xebera “nimiz” zimanê yûnanîda xebera “*atîmîya*”-ye, ya ku dide kifşê “bêhurmetî, şerm, eyb, bêqedirî”. Xebera “qedir” zimanê yûnanîda xebera “*tîmê*”-ye, ya ku dide kifşê “giranbiha”. Xwedê dibêje: “Heger tu qedir-qîmetê ji bêkêrîyê başqe bikî, tê bibî mîna gotina devê Min” (Yêrêmîya 15:19). Qedir-qîmet bi rêya paqijbûna hûre-hûr ji bêkêrîyê tê dûrxistinê, yan jî bi rîya dûrxistina nepaqijîyê tê kirinê.

Malaxî pêxember ji peymana Kevin bû, yê ku cêrge pêxembertî derheqa wedê peymana Nû da kirin. Femdarî ye, wekî li cem wî xeberên peymana Nû tunebûn. Bo wê yekê jî ewî xeberên “kahînen padişatîyê” û “kahîn” dane xebatê, wextê ku ewî ew yek şirove fikir, çi ku Ruhê Pîroz nîşan dida û derheqa mesîhîyên peymana Nû da digot.

Malaxî pêşda got, wekî Xudanê *bihata* paristgeha Wî (civîna Wî), hetanî *paşdahatina* bona paristgeha Xwe, û Ewê bihata ku ew paqij bikira. Ew dinivîse:

“Ewê rûnî, lêwîya paqijke, çawa yekî zîv dihelîne û paqij dike, wê usa jî mîna zêr û zîv wana paqijke û ewê bi heqî dîyarîya bona Xudan bidin” (Malaxî 3:3).

Merivên li civîna Kahînen padişatîyê şêwira peyîhatîyên Mesîh in. Xwedê paqijbûna van kahîna himberî paqijbûna zêr û zîv dike. Ê ewê kardarbe ku fem bikin, ku cudatîyên zêr û zîv kîjanin û ew çawa paqij dibin. Ezê tenê derheqa zêrda bêjim, çimkî paqijbûna van herdu hesina jî cûrêkî tê kirinê (A Petrûs 2:9).

Rengê zêr zerê bedew e û ew hindik dibriqe. Zêr dikarin li gelek cîha bibînin, lê her dem ew hindik e, û hindik cara ew paqijbûyî tê dîtinê. Piştî

paqijbûnê zêr nerm e, rihet diqurife û ew ji jengê, ji matêrîyalên başqe aza ye. Wextê ku ew tevî hesinên mayîn dibe (sifir, hesin, nîkêl), zêr diha hişk dibe, rihet naqurife û diha zû dikare jeng bigre. Tevbûna hesinê mayîn çiqasî zêde bibe, zêr awqasî hişk e, lê wextê hesinê başqe kêr e, zêr awqasî nerm e û hêsa diqurife.

Himberîhevkirin carekêra dide kifşê: dilê paqij li ber Xwedê mîna zêrê paqij e. Dilê paqij nerm e, milahîm e û rihet diqurife. Awa bo wê yekê jî Ruhê Pîroz dibêje:

“Îro, dema ku hûn dengê Wî bibihên,
Dilên xwe berk nekin,
Mîna Îsrayêl, dema ku wana serî hildan,
Wextê ku wana Ez li qûmistanê cêribandim...
Hûn gerekê eşarefîyê bidine hevdu, çimkî hela hê “roja îroyîn” e,
bona ku ji we tu kes gunehêva nexape û berk nebe...”
(Îbranî 3:7,8,13, NLT).

Guneh ew matêrîyalê zêdekîrî ye, yê ku zêrê meyî paqij dike tişteki mayîn, dilê me berk dike. Dema ku nermaya dil tunebe, em ewê cudatîya xwe unda dikin û em nikarin dengê Xudan bibihên.

Mixabin, îro gelek meriv nava halê vî cûreyîdanin: şikilê wanî xwedêparêzîyê heye, lê dilê wanî nazik tune, yê ku bona Îsa dişuxule. Dewsa huba hindava Xwedêda xwehizîya sar e, ya ku berbi lezeta xweye şexsî, xweşî û berjewandîya xwe dicedîne. Bi hesabkirina wê yekê, wekî xwedêparêzî mecala destanîna berjewandîya şexsî ye (binihêre A Tîmotêyo 6:5), ew tenê berbi berjewandîya ku ji sozdayînen Xwedê tê dicedînin û bi nezanî Sozdar hesab hilnadin. Merivên nava vî halê xapîyayîda vê dinîyayêda dijîn û hîvîyêne, wekî ewê ezmîn jî bistînin. Xwedê tabîya wî cûreyî naxweze:

“Bawarîya paqij û rast li ber Xwedê û Bavê dide kifşê... îzinê nedin, wekî dinîya we heram bike” (Aqûb 1:27, NLT).

Îsayê bê peyî civîneke usa, ya ku pîroz e û tu zewaleke wê, yan jî

nepaqijîya wê, tune (binihêre Efesî 5:27), wê bê peyî bedena Xwe, ya ku ji wan meriva ye, yên ku bi rêyên vê dinîyayêva herambûyî nînin.

Cudatîke zêr jî ew e ku ew jeng nagire. Neniherî wê yekê, wekî hesinên mayîn ji qewilên atmosferayê rengê xwe diguhêrin, zêrê paqij hukumê wî cûreyî nabîne. Tevlîhevexistina sifir û sinkê zer mîna zêr e, lê ew cûrekî mayîn e. Ew bi hêsanî jeng digre, rengê xwe diguhêre. Ji derva ew mînanî zêr e, lê cudatîyên wêye zêr tunene. Li civînê jî derdanên ji wî hesinî hene, yên ku ji derva mînanî zêrin, lê ne zêrin. Tenê agirê ku paqij dike wê nîşan bide ku firqîya van herduya kîjan e. Malaxî dinivîse, ku piştî paqijbûnê çi diqewime:

“Wî çaxî hûnê careke mayîn firqîya di navbera yên heq û neheqda bibînin, yên ku qulixî Xwedê dikin, û yên ku qulixî Wî nakin”
(Malaxî 3:18, NLT).

Em paşda vegerine li ser paqijbûna zêr. Tevkerina matêrîyalên mayîne nava zêrda ne tenê zêr hişk dikin, lê ew usa jî dikare jeng bigre û xirab bike. Ew diha rihet hukumê atmosferê li vê dinîyayê li ser xwe dibîne.

Roja îroyîn rêyên vê dinîyayê ketine civînê, kûltûra vê dinîyayê tevî me bûye û em bi wê yekêva haram bûne. Li Amêrikayê qîmetîyên civînê wî cûreyî herambûyîne. Gelek meriv wê yekê texmîn nakin û fem nakin, ku ew hewcê paqijbûnê.

Malaxî 3:3 nîşan dide, wekî Îsayê civîna Xwe ji hukumê vê dinîyayê paqij bike, mîna paqijkirina zîv û zêr. Wextê wê paqijkirinê zêr dinihêrin û tevî matêrîyala bi navê flyûs dikin. Ev herdu qinyat dikine cîhekî û bi agirê gur dihêlin. Matêrîyalên başqe tevî flyûsê dibin û radibine li jor. Zêr (yê ku diha giran e, li jêrê dimîne). Ew tiştên mayîn (yên mînanî sifir, hesin û sink, tevî flyûsê) tên dûrxistinê.

Niha em bi guhdarî bixwînin ku Xwedê çawa paqij dike:

“Ezê destê Xwe dirêjî te bikim û qirêja te paqij bikim, û Ezê hemû tiştên başqe dûrxim. Ezê hakimên te paşda bînim, çawa ku berê bû, û usa jî şewirmendên te, çawa ku pêşda bû. Paşê wê tera bêjin Bajarê heqîtyê, gundê amin”” (Îşaya 1:25,26).

Gelo Xwedê wê agirê çawa bide xebatê ku me paqij bike? Bersiva vê pirsê li vir e:

“Hûn bi wê şa dibin, rast e, niha jî usa diqewime, ku hûn hinekî medekirîne, ji dest cûre-cûre cêribandina. Ev yek dibe sebeb, wekî xilazîya bawarîya we hê bi qîmet kifş be, ne ku ew zêrê ku nava êgirda tê cêribandinê, lê dîsa unda dibe û bi vî awayî ew bawerîya we wê hêjayî pesin, rûmet û qedir be, wextê xuyabûna Îsa Mesîh” (A Petrûs 1:6,7).

Agirê Xwedêyî paqijkirinê *tengavî û cêribandin* in, yên ku li qûmistanê hacetên serekene. Germaya wana nepaqijîyên nava meda ji xeysetê Xwedê başqe dike. Ev yek bi têorî rêberîyê berbi pîrozîyê li me dike (zûtirekê ezê şirove bikim, ku bona çî ez xebera “bi têorî” didime xebatê).

Cudatîke zêr jî ew e, wekî nava halê here paqijda ew zelal e (şirovekirina kîjanê ew e, wekî tu navra dikarî usa bibînî, çawa ku tu nava şûşêra dibînî). “Û meydana bajêr ji zêrê xasî mîna şûşê zelal bû” (Eyantî 21:21). Wextê ku hûn bi cêribandinên agir paqij dibin, wî çaxî hûn zelal dibin. Derdana zelal rûmetê ne ku wêra tîne, lê wê yekêra tîne, çî ku hundurê wêda ye. Ew dijwarîya pêşda nayne û tê bêjî qet nayê kifşê.

Çawa ku em paqijbin, ev dinîya wê careke mayîn Îsa bibîne. Wextê ku em zelalbin, bibine merivên usa, yên ku rastîyê xeber didin, kubar nînin, xweyê sozê xwene, rastgone û tu tiştî venaşêrin, merivên vê dinîyayê wê wana bibînin.

Kitêba pêxember Îşayada em diha zelal vê yekê dibînin:

“Min tu paqijkirî, lê ne ku usa çawa ku zîv paqij dibe. Dewsa wê yekê, Min tu cîhê helandina cefayêda paqijkirî. Ezê te boy Xwe xilas bikim, belê, boy Xwe. Ezê îzinê nedim, wekî navê Min bê heramkirinê, û Ezê rûmeta Xwe pûtara pareve nekim” (Îşaya 48:10,11, NLT).

Cîhê helandina bi agir cefa ye, lê ne ku agirê matêrîyalî, bi kîjanî zîv (yan jî zêr) paqij dibe, û ev yek şirove dike ku bona çî Ew dibêje: “*lê ne*

usa, çawa zîv". Cêribandinên me ew agirê gur e, yê ku tiştê giranbiha ji tiştên bêkêr cuda dike.

Xwedê tiştên bêkêre nava meda, bêyî xwestina me, dûr naxe. Awa bo çî Pawlos B Tîmotêyo 2:21-da dinivîse, wekî ew merivê ku dixweze paqij bibe "şexsê xwe paqij dike". Heger hûn dixwezî xwe heq derxin, îzinê bidin, wekî nexweşiyên xeysetê we we paşda xweyîkin, Xwedê wê we borcdar neke ku hûn wana berdin. Nava şuxulkarîya wî cefayîda wê fayde tunebe (hema bo vê yekê ye, ku min li jorê xebera "têorî" da xebatê). Şuxulkarîya paqijbûnêye li ser rêya pîrozîyê ya herdemî ye, berde-wam dibe û gelek cara bi êş e. Lê belê, ez wê yekê qebûl dikim, fem dikim ku ewê rezê çawa bide.

Xudanê kaxeza îbranîya dibêje: "Bikin...bêyî pîrozîyê tu kes wê Xudan nebîne" (12:14). Îsa dibêje: "Xwezî li dilpaqija, çimkî ewê Xwedê bibînin" (Metta 5:8). Dawid, yê ku bi dil berbi Xwedê divedand, dikire qîrîn: "Kê dikare şaşiyên xwe nas bike? Ji gunehên veşartî Tu min paqij bike (Zebûr 19:12).

Bila eva bibe qîrîna me. Heger em hîvî ji Xwedê bikin, ku Ew dilên me paqij bike, Ewê wan nepaqijîya dûr bixe, yên ku ji me veşartîne. Xwedê fikir û menîyên dilê me zane, heya wî çaxî jî heger em derheqa wanda nizanin.

Ez ber dilê weda têm, ku hûn wedê qûmistana ruhanî naskin û qebûlkin. Wextê ku cêribandinên agir tîn, hêrs nekevin û meriva neheq nekin, lê meremê wan cêribandina binihêrin. Dilê xwe pirsîkin û îzinê bidine Xwedê, ku tiştê bêkêr ji tiştên giranbiha dûr bixe. Ew temîyê dide: "Pîroz bin, çimkî Ezî pîroz im" (A Petrûs 1:16).

Bizanibin, wekî prosêsa paqijbûnê wê yekê qewat dike, çî ku êdî genc e, û wî hemû tiştî dûr dixê, çî ku zeyîf û heram dike. Şuxulkarîya Wî ya paqijkirinê qebûl bikin, bona ku hûn bibîne derdana qedirê, ya ku dikare bi cûrê baş û zelal rûmeta Wî bide kifşê.

BAŞ ÇÊ BIKIN

“Li tu cîhekî steyrk awqasî gelekî nabriqin, çiqasî li ezmana. Tu avek awqas xweş nîne, çiqas ava ku ji qûma qûmistanê derdikeve û tu bawarîk awqasî giranbiha nîne, çiqas ew bawarî ye, ya ku nava dijwarîyada dijî û ser dikeve. Bawarîya cêribandî cêrbandinê tîne. Weyê tu cara bawar nekira ku hûn zeyîfin, heger hûn mecbûr bûna nava dijwarîyara derbas bûna. Û weyê tu cara qewata Xwedê nas nekira, heger hewcetîya weye bona qewata Wî, ya bona navra derbasbûnê tune bûya”.

- Çarlz Spêrcên

“Çimkî yên ku li gora binyata merivayê dijîn, ew li ser tiştên binyata merivayê difikirin, lê yên li gora Ruh dijîn, ew ser tiştên Ruh difikirin”.

- Romayî 8:5

Qulixçiyê Xwedê, dixwezî jin be, dixwezî mêr be, bi saya xeyset pêşda diçe, lê ne ku bi saya rûnkirinê. Lê çêbûna xeyset, yan paqijbûna wî li qûmistanê diqewime, wextê ku hukum pêşda tên, acizbûn pêşda tên û xiyal tê bêjî nagihîjine mêriv.

Wedekî li qûmistanêyî usa tê bîra min, dema ku min şerkarî dikir, bo ku min hêrsa nava xweda alt bikira. Serê kitêbêyî ewlinda min derheqa wê yekêda hinekî xeberda. Min ji Xwedê pirsî: “Bona çi ez li ser hemûya hêrsketîme? Nava jîyana xweda ez gerekê çi va bêm girêdanê, yan jî çi ji jîyana xwe dûr bixim?”.

Ewî bersiv da: “Kurê min, tu nikarî bedena xwe girêdî yan jî dûr bixî: tu gerekê ewê xaç bikî”.

Min diha bi gumanbirî pirsî: “Lê ev hêrs ji kîderê ye? Min tu cara tiştên usa texmîn nekiriye, hetanî xilazbûnê jî”.

Ew bi sala teda hebûye,- Ewî got,- lê ew nayê dîtîne, çawa ku ew nepaqijayên nava gustîlka teye zêrdanin. Ewê neyêne dîtîne, hetanî te ew nehelandîye, lê dema ku tu bihelînî ew nepaqijayî wê derêne ber çava. Min hêrsa te nîşanî te da, dema ku Min tu anîyî cîhê zêrandinayî helandinê.

Min nizanibû ez ew yek çawa bida xebatê, çi ku Xwedê gote min: dêmek, Ewî diha bi hûrgilî şirove kir:

- Tu dikarî jina xwe, xebatkarên xwe, hevalên xwe, wî hukumî gunehkar bikî, yê ku rûyê bûyîna zaroka nûda, yan jî halekî mayînda pêşda tê. Heger tu usa bikî, ew hêrsê bimîne, û dema ku agir zeyîf bibe, ewê careke mayîn paşda vegere û wê hewce be ku ew hemû tişt careke mayîn

destpê bibe. Lê tu dikarî bi duakirinê tobe bikî: “Xwedê, ez poşmanim: vê hêrsê ji min dûr bixe”. Heger tu usa bikî, Ezê heska Xweye mezin hildim û wê yekê ji te dûr bixim”.

Min hema usa jî kir. Dema ku hukumê qûmistana agir hêrsa min eşkere kir, min gunehê xwe da rûyê xwe, tobe kir û hîvî ji Xwedê kir ku wê yekê hilde.

Awa dîsa menîke başqe ku qûmistan bona çî bêhesab qîmetlû ye. Neniherî wê yekê, wekî ew dikare gelekî berk be, lê ew dawîyê şabûneke mezin pêşkêşî me dike.

“Hûn bi wê şa dibin, rast e niha jî usa diqewime ku hûn hinekî medekirîne, ji dest cûre-cûre cêribandina. Ev yek dibe sebeb, wekî xilazîya bawarîya we hê bi qîmet kifş bibe, ne ku ew zêrê ku nava êgirda tê cêribandinê, lê dîsa unda dibe û bi vî awayî ew bawarîya we wê hêjayî pesin, rûmet û qedir be, wextê xuyabûna Îsa Mesîh” (A Petrûs 1:6,7).

Qûmistan ew cîh e, li kîderê em paqij dibin, û li kîderê xeysetê me çê dibe. Hema nava van zêrandinada merivê xwedêparêzî rast dihele û çê dibe. Romayî 5:3,4-da nivîsar e: “Em usa jî dikarin şa bin, wextê ku em rastî dijwarîya cêribandina tîn, çimkî em zanin, wekî ew alî me dikin ku sebir hebe. Lê sebir jî xeysetê qewîn çê dike”(NLT).

Xwedê Dawid begem dikir, çimkî ew mervê himberî dilê Wî bû: ewî berbi dilê Xwedê dicedand, lê ne ku berbi padişatîya ezmana. Şaûlê padişa jî qûmistanêra derbas nebû, ya ku wê ew yek paqij bikira, çimkî nava wîda nepaqijayî û neçareserî hebûn. Dawid li qûmistanê paqij bû, û Xwedê serbara serda Şaûl da xebatê, bona ku wî bişîne li wir.

Rêyên Xwedê dikarin yên nefemdarî bin, lê programên Wî her dem yên qencin.

Gelo xiyal tê paşdaêxistinê?

Lê belê, paqijbûn dikare bi êşeke mezin be jî. Ezê derewa nekim: qûmistan mînanî çûyîna li Dîsnêylêndê nîne. Cefa cefe ye, û carina bi

cûrê êşandinê derbê dighîne me.

Diqewime Xwedê dîtînok nîşanî we dane, yan jî xiyalên derheqa navê weda nîşan dane. Diqewime Ewî wera derheqa wan progiramada xeberdaye, kîjan Ewî bona we qirar kirine. Feqet li qûmistanê tê bêjî gelek cara tê texmînkirinê ku hûn çiqasî zêde Xudan digerin û gura Xebera Wî dikin, hûn awqasî zêde ji wê xiyalê dûr dikevin, ya ku Ewî danîye nava dilê we.

Derheqa Êsivda bifikirin: ewî xewin dîtîbû, anegorî kîjanê ew gerekê bibûya rêber û heta birayên wî û malbeta wî jî wê bin serwêrtîya wîda bûna. Gelo peyî wê yekêra çi qewimî? Ew meriv, yên ku gerekê ew biparastana, birayên wî, ew avîtine çelê û nava wedekî kurtda ew li welatekî başqe firotine xulamtîyê. Gelo hûn dikarin şaşbûna wî, gumanbirî û êşa wî bînin ber çavên xwe?

Ez li ser wê fikirême, wekî ew difikirî ku Xwedê wê tevî wê pîrsê bûya û nava wedekî kurtda wê ew aza bikira. Ew guman wê bitemrîya, çimkî xulamtîya wî çend meha nekişand, yan jî çend sala nekişand, lê ji deh sala zêdetir kişand. Ew wedekî dirêj e. Nava wî wedeyîda ewî zanibû, wekî ewên ku ew êşandibûn, nava azayêda dijîtin û jîyana xwe li mala bavê xweyî dewletî derbas dikirin.

Êsiv çi dikir? Bersiva wîye nava wedê qûmistanêda çi cûreyî bû? Ewî bawarîya xwe xweyî dikir, qulix dikir û sozê Xwedê bîr nedikir. Ew amin bû, serwaxt bû, xebathiz bû û çawa encamê wî hemû tiştî, ew gihîşte duabûnê û açixîyê.

Lê belê, qewilên wî careke mayîn nişkêva hatine guhartinê û diha xirab bûn. Jina serwêrê wî bi xwestineke mezin, bi çavekî mayîn li wî dinihêrî. Ewê dixwest wî berbi bêesilîyê def bide, lê ne ku carekê, yan jî du cara, lê gelek cara. Wî çaxî jî Êsiv gura Xwedêda ma, û her car ji bêesilîya bedenî xwe dûr xist. Paşê wê jinê xwe usa nêzikî wî kir, wekî Êsiv mecbûr bû ji destên wê bireve. Piştî wê yekê, wextê ku wê jinê xwe bêhurmetkirî dît, ewê Êsiv nava wê yekêda gunehkar kir, çi ku Êsiv nekiribû. Ew bi cûrê neheqî “gunehkar kirin” û ew avîtine hebsê (xulamê ji welatekî mayîn, yê ku cêribandibû jina merivê padişê bişuhurîne, ew tu cara gerekê ronahî nedîta).

Wedê merivê ku hebsêdaye bona fikirmîşbûnê gelek e. Hûn dikarin

bînin ber çavê xwe ku Ûsiv mecbûr bû dijî fikirên çawa şerkarî bikira?:
*“Nava temamîya jîyana xweda min qulixî Xwedê kiriye û min çi stendîye?
 Ez bêyî neheqîyê ketime vê hebsê, li kîderê jî ezê birizim. Jîyana min
 êdî serhevda hatîye. Birayên mine xirab azadin, û bi texmîn, ew niha
 jîyaneke baş derbas dikin. Min çi şaşî kirîye? Min tenê birayên xwera
 ew xewin gilî kir, ya ku çawa ez difikirîm, Xwedê dabû min, û awa çi
 qewimî? Çi kar hebû ku min qulixî Xwedê kir? Tê bêjî çiqasî zêde gura
 Wîda me, awqasî zêde jîyana min xirab dibe”.*

Kî dikare Ûsiv bona fikirên wî cûreyî gunehkar bike? Ew hemû gotin
 jî nêzîkî aqilane, ne usa ye?

Û rojekê Ûsiv li hebsê rastî cêribandina qûmistana xweye here mezin
 hat. Xwedê du meriv anîne li cem wî, yekî nanopêj û yekî ku serwêrê im-
 bara şerabê bû, ji kîjana her yekî xewin dîtibûn. Rûyê xewinên xweda ew
 şaş bibûn, dixwestin derheqa şirovekirina wanda bizanibûna. Heger Ûsiv
 bawarîya xweye hindava Xwedê û sozê Wî da undakirî bûya, ewê xwe-
 hiz bûya û qulixî wana nekira. Ewî dikaribû bigota: “We şeva derbasbûyî
 xewin dîtine? Min jî carekê xewin dît. Ez jî fikirîm, wekî ew xewin ji
 Xwedê bû. Lê hûn zanin, wekî xewin mîyaser nabin? Xewin bêfaydene,
 valane û mêriv şaş dikin. Hûn dikarin min rihet bihêlin?”.

Heger Ûsiv usa bikira, ew dikaribû qûmistana xweda diha dirêj
 bima, diqewime hetanî dawîya jîyana xwe jî. Ewê mecala stendina azayê
 tê berda (paşê serwêrê imbara şerabê padişêra gilî kir, wekî Ûsiv dikaribû
 xewin şirove bikirana, nava encamê çida ew ji hebsê aza bû û gihîşte
 pêşkeftinê). Heger ewî gunehê xwe li xwe bianîya, ewê usa jî hebsêda
 bimira. Ewê bibûya merivekî şikber û gumanbirî û wê bi her cûreyî big-
 ota meriva: “Xwedê ne amin e: Ew sozên Xwe xweyî nake”. Feqet Ûsiv
 usa nekir. Ewî ew fikir û fikirdarî ji xwe dûrxistin, yên ku dijî sozê ji
 Xwedê stendî bûn, û ewî qîrar kir qulixî wan herdu meriva bike. Ewî
 gura Xwedê kir. Û çi qewimî? Ew roj hat, wextê ku ew aza berdan, ew
 gihîşte pêşkeftinê û bû cîgirê firawin.

Piştî neh sala, wextê ku Ûsiv bibû rêber, birayên wî rûyê xelayêda
 hatine Misirê û li ber wî sekinîn. Ûsiv necêriband heyfê ji wana hilde,
 çawa ku geleka dikaribû ew yek bikira. Nava wîda xeysetê rêberê

padişatîya Xwedêyî rast çê bibû. Ewî hindava wan merivada, yê ku xirabî li wî kiribûn, qencî da kifşê. Ew bi bawarîyê, bi hizkirinê, bi baxşandinê hindava wan merivada tijbûyî bû, yê ku xayîntî li wî kiribûn. Zebûr derheqa Êsivda dinivîse:

“Ewî [Xwedê] merivek şande pêşîya wan, Êsiv, yê ku çawa xulam hate frotanê. Nigên wî qeydada êşandin: ew kirine nava hesin. Hetanî wî wedeyî, wextê ku *Xebera Wî* mîyaser bû, *Xebera Xudan* ew cêriband” (Zebûr 105:17-19, NKJV).

Tenê Xwedê zanibû, ku ew soz wê kengê mîyaser bûya, yê ku Ewî dabû Êsiv (ji 20 salî zêdetir piştî xewina wî). Qûmistanê nava wîda xeysetekî usa çêkir, bi saya kîjanî ewê jîyana xwe rast çê bikira, malbet û ew hemû tiştên mayîn, çî ku ewê serwêrî lê bikira. Kilîta açixîya wî hizkirin û xofa hindava Xwedêda bû. Neniherî wî hemû tiştî, Êsiv xebera Xwedê terîf dikir, li gora *Xebera Xwedê* dişuxulî û gura xebera Xwedê dikir.

Lê hûn çawanin? Çawa ku min îdî da kifşê, wekî diqewime Xwedê xewin û dîtînokên derheqa wê yekêda dane we, bona çî hûn hatine gazîkirinê. Diqewime Ewî wera derheqa wan progirama da xeberdaye, yê ku Ewî bona we qirar kirine? Lê, mînanî Êsiv, hûn li qûmistanêna û tê bêjî hûn çiqasî zêde Xudan digerin û gura *Xebera Wî* dikin, hûn awqasî ji wê xiyalê dûr dikevin, ya ku Ewî kirîye dilê we.

Diqewime we dîtîye, wekî merivên başqe û ew meriv jî, yê ku bi dijminatî nêzîkî we bûne, nava qulixêda pêş ketine (yan jî nava her govekeke jîyanêda), lê tê bêjî hûn ji wê xiyalê dûr dikevin, ya ku we ji Xwedê standîye. Diqewime hûn wê yekê dikin çî ku zanin, lê xiyal mîyaser nabe?

Diqewime dora we meriv hene, yê ku Xudan nagerin, lê ew pêşda diçin, û tê bêjî gul vedidin. Ew hemû “duayên” finansî û civakî distînin. Diqewime pêşkeftina wan lefektîyê û durûtîyêva girêdayî ye. Diqewime ew dighîjine açixîyê, çimkî tiştên nerast dikin û meriva dixapînin, lê tê bêjî ew “duakirîne”, lê hûn mîna Êsiv li zindana firawindanin.

Wî çaxî hûn çawa dikin? Hûn gazina dikin? Xwedê wê yekê dibêje:

Ew gotinên weye dijî Min giranin,- Xudan dibêje. -Lê hûn dibêjin: “Me miqabilî Te çi gotîye?”. Hûn dibêjin: “Xizmetkarîya bo Xwedê badîhewa ye, kara wê çi ye, ku em nava qeyde-qanûnên Wî da mane û li ber Xudanê Ordîya bi şîn-girî derbas kirîye? Lê niha em xwezîya xwe li kubara tînin, yên ku neheqîyê dikin, xêr-xweşîyêdanin, heta Xwedê jî dicêribînin û sax-selamet dimînin”” (Malaxî 3:13-15).

Ewên ku gazin dikirin çi digotin? Wana digot: “Çi kar hebû, wekî me gura Xwedê kir, çimkî nava jîyana meda tu tişt nayê guhartinê? Lê merivên neheq, yên derewîn, pêşda diçin, tèn duakirinê û gulvedidin” (eva şirovekirina Bîvêr e). Xwedê gotina wana hesab dike çawa xeberên gelekî giran û hesab dike, wekî dijî Wî ne. Diha zelal gotî, ew yek gazin û şikyat e. Gazinê îzin neda zarokên Îsrayêl ku ew bikevine welatê Sozdayî. Bo çi gazinkirin bona Xwedê bêhurmetkîrin e, û bona çi ew yek awqasî berk hate gunehkarkirinê? Ew dibêje Xwedê: “Ew çi ku Tu nava jîyana minda dikî, li min xweş nayê, û heger ez dewsa Te bûma, minê cûrekî mayîn bikira”. Ew yek rûyê tunebûna qedirgirtina hindava Xwedê da ye.

Xwedê dide zelalkirinê, ku kî berbi Wî divedîne, lê kî berbi duayên ku Ewî dane, divedîne. Yên ewlin bi wî meremîne: yên dawîyê gazinên xwe dikin, wekî bi fikira wan hemû tişt rast nîne. Duayên *rast* ew nînin, çi ku hinek çawa dua *nav dikin*. Hinek dua dikarin nemînin, heger dilê we rast nîne. Bi berbirbûna berbi wan meriva, menîyên kîjana yên xwehizîyêne, yên ku gazina dikin, Xudan dibêje ku Ewê çawa hindava wan û duayên wana bike.

““Heyî kahîno [bawarmendên gazindar], ev temî bona we ye. Guhdarîya Min bikin û qîrar bikin ku pesinê Navê Min bidin”,-Xudanê ordîya ezmîn dibêje,- “ yan na Ezê nifirê li ser weda bişînim. Ezê nifirê li wan dua bikim, kîjana hûn distînin. Belê, Min îdî nifir li wana kirine, çimkî hûn rast nêzîkî eşaretîya Min nebûne”” (Malaxî 2:1,2, NLT).

Heqê me, yan jî mîrasa me, eşîya û hebûn nînin, mîrasa me Xudan bi Xwe ye.

Hezeqêl 44:28-da nivîsar e: “Û evê bona wana bibe mîras: Ez im mîrasa wana...Ez im hebûna wana”. Gelek mesîhî roja îroyîn berê xwe ji mîrasa *rast* dûr xistine, û dewsa wê yekê wana guhdarîya xwe danîye li ser stendina hebûnê, yan jî tabîyê, diqewime usa jî li ser tiştên baş, yên ku ji Xwedê da hatine dayînê. Feqet ew mînanî kurê usanin, yê ku diha gelekî hewaskar e ku ji bavê xwe tişteki bistîne, lê ne ku tevî wî nava pêwendiyada be. Çar kurên min hene. Ez bi hizkirin pêşkêşa didime wana. Lê belê, heger ew tenê bona stendina tişteki tevî min biketana nava pêwendîya, wî çaxî ew yek wê dilê min biêşanda. Malaxî berdeyam dike:

“Wî çaxî yên xwedêxof bi hevra xebordan, û Xudan guhdarî da ser wan, bihîst, û bona yên xwedêxof, usa jî bona yên ku navê Wî bilind dikin” (Malaxî 3:16).

Ev meriv hema nava wan qewilên qûmistnêda diman, nava qewilên çawada yên “gazindar” diman. Lê pirsên wane sereke stendina tabîyê, yan jî tişteki mayîn nîbû. Ew dilê Xudan digerîyan. Nava merivên wî cûreyîda xwestina naskirina Wî hebû. Hûn dikarin tevî wan meriva derheqa têmayên civakê, yan xebatêda xebardin, lê dilê wana dişuxule, dema ku hûn wanra derheqa Xudan û Xebera Wî da xeber didin.

Derheqa merivên vî cûreyîda Lûqa dinivîse: “Lema, gava ewî rêda mera xeber dida û nivîsar mera şirove dikirin, agir dilê me diket?” (Lûqa 24:32). Wana berbi rastîyên ruh dicedandin û digotin: “Ez tenê dixwezim Xwedê naskim: ez dixwezim li Wî xweş bêm: ez tîbûn û birçîbûnê hindava Xebera Wî da texmîn dikim: ez dixwezim Wî şa bikim, çimkî Ew kanîya şabûna min e”. Bona wana ev e tiştê herî girîng. Hizkirina wane ewlin Îsa ye, lê ne ku nav, statûs yan jî hebûn e.

Kirê wan nayê guhartinê, nenihêrî wê yekê ku ew li qûmistanêne, yan bi mîlîyona meriva terîf dikin? :

“Çimkî em hevkarên Xwedêne: hûn zevîya Xwedêne, hûn avayîya Xwedêne. Anegorî kerema Xwedê, ya ku minra hate dayînê, mîna çîredestekî serwaxt min hîm avît, lê yekî din ser

çê dike. Lê bila her kes guhdarîyê bide ser, ku li ser wê çawa çê dibe” (A Korintî 3:9,10, NKJV).

Em gerekê guhdarîya mezin bidine li ser wê yekê, ku em jîyana xwe çawa çê dikin. Încîlêda malçêkirin sembola wê yekê ye, ku em çawa jîyana xwe çê dikin û çawa qulixî padişatîya Xwedê dikin. Em yên Xwedêne, çimkî em avayê Wî ne.

“...Li Îsa binihêrin, Yê ku Ew bona vê yekê kifş kir, çawa Mûsa jî temamîya mala Wî da amin bû. Çimkî Ew ji Mûsa zêdetir hêjayî rûmetê bû, çiqasî qedirê yê ku malê çê dike, ji qedirê malê zêdetir e. Çimkî her malek bi destê yekî tê çêkirinê, lê yê her tişt efrandîye, Xwedê ye” (Îbranî 3:1-4).

Guhdarîyê bidine li ser ku kê malê çê dike: Xudan. Ew bi qewatên me nayê çêkirinê. Çi ku Xwedê çê dike dimîne: çî ku em çê dikin, namîne. “Heger Xudan malê çê neke, wî çaxî ewên ku çê dikin, badîhewa dixebitin” (Zebûr 127:1). Ew hemû tiştên ku meriv bêyî Xwedê çê dike, jîyanê, malê, heta qulix jî, namînin.

Destpêbûn 11:4-da mînakeke derheqa wê yekêda nivîsar e: “Û gotin: “Werin em bona xwe bajarekî û bircekî çêkin, û serê wî bighîje hetanî ezmîn, û em bona xwe navekî qazanc bikin””.

Menîya çêkirçiyên birca Babîlonê kîjan bû? Wana dixwest ku ew bighîjine meremên xweye şexsîtyê û ew avayî bona rûmeta xwe çê bikirana. Babîlonîya dixwestin mîna Xwedê bûna, lê ji Wî serbest bûna. Înisîyatîva wana xwestinên wan mîyaser dikirin, lê ne ku yên Xwedê. Çêkirina bêyî Xwedê wê tu cara fayde nede, çimkî çiqasî jî menîyên me yên paqij bin, yek e, bêyî Xwedê ew tişt mijûlîya valayî ye. Awa bona çî ev eşaretî bo me hatîye dayînê:

“Lê bila her kes ha ji xwe hebe, ku çawa li ser çê dike...Heger kesek li ser wî hîmî çê bike (Yê ku Îsa Mesîh e), bi zêr, zîv, kevirên qîmetlû, dar, gîhê, yan jî kayê, lê bi çî tiştî jî çê bike, şuxulê her kesî wê eyan bibe, çimkî ew Roj (“kê dikare li ber

roja hatina Wî teyax bike?") wê bide kifşê, ewê bi êgir eyan bibe û kirê her kesî çi halide be, agirê kirên her kesî bicêribîne" (A Korintî 3:10-13, NKJV).

Zêr, zîv û kevirên qîmetlû sembola çêkirina bi xwestina Xwedê didine kifşê. Dar, gîha û ka sembola mêtodên çêkirina mene, ya anegorî mesela vê dinîyayê. Gelo ev xeber tenê dîwana li ezmîn didine kifşê? Na xêr. Ev xeber derheqa wê yekêdanin, wekî dema ku Ew bê paristgeha Xwe (Malaxî 3:16-4:1 û A Korintî 3:16,17), wê çawa agir bê, yê ku yan wê dar, gîha, kayê *bişewitîne*, yan jî wê zêr û zîv *paqij bike*. Awa bo çi Ew xebera Xwe berdewam dike: "Heger karekî yekî bişewite, ewê zyanê bikeve, lê ewê xilas bibe, feqet çawa derbasbûna nava agirra" (xeber 15, NKJV).

Heger hûn jîyana xwe, karê xwe, yan qulixa xwe bi matêrîyalên bi destê xwe çêkirî çê bikin, mînak, bi mêtodên qewata xwe yan jî vê dinîyayê... heger çêkin, bi rîya tirsandinê, yan jî kontrolkirina meriva... heger bighîjine açixiyê, kîsî lefekîya, yan jî destanînên meriva... heger wextê çêkirinê karê wan meriva xirab bikin, bi rêya rexnekirinê, yan jî buxdanbêjîyê...ev hemû tiştên ku hûn bi van mêtoda bigîjinê, wê bişewitin û unda bibin.

Gelek meriv bona çareserkirina pêşkeftina xwe berê xwe didine derewa û gelek cara eşkere derewa dikin. Ev tişt jî wê bişewitin. "Bila tu kes xwe nexapîne. Heger yek ji we li gora qeydên vê dinîyayê xwe serwaxt dibîne, bila bibe bêhiş, wekî bibe serwaxt. Çimkî serwaxtîya vê dinîyayê li ber Xwedê bêhişî ye" (A Korintî 3:18,19).

Her govekeke nava jîyana weda, nava kîjanêda menîya we ya kara şexsî ye, ew bona Xwedê dar e, gîha û ka ye. Neniherî wê yekê, ku ew yek çawa alî meriva dike, bi çiqasîva ew yek bi navê Xudan tê kirinê, yan jî çiqas wede bona wê yekê hatîye xerckirinê, ew hemû tiştê bişewitin.

Serwaxtîya vê dinîyayê xwehizî ye: "Lê heger dilê weda hevsûdîya xirab û çevnebarî hene...Eva serwaxtîya ne dayîna jorin e, lê ji dinîyayê ye, ya merivayî ye û ji cina ye" (Aqûb 3:14,15). Hevsûdî konkûrênsîyayê û şikberîyê pêşda tîne. Bona xweykirina tabîya xwe, em dikarin berê xwe

bidine xayîntîyê, qelpîyê, rûyê kîjanada em dikarin hevalên xwe, paqîjîya xwe û tiştên herî sereke, pêwendîyên xweye tevî Xwedê, unda bikin. Hetanî serwêr û qulixçî jî dikarin tabîya xwe, navê xwe, yan jî meaşa xwe xweyîkin û nêzîktîya xweye tevî Xwedê hesab hilnedin.

Lê wan merivara, yên ku bi bêqelpî Xwedê digerin, dikare bê texmînkirinê ku çiqasî zêde ew li Wî digerin, ew awqasî zêde ji Wî dût dikevin. Ew bi gumanbirî dikine qîrîn: “Xwedê, ez çiqasî zêde Te digirim, awqasî zêde dewsa bilindbûnê nimiz dibim”. Lê Xwedê dibêje: “Pêwendîyên xweye tevî Min diha zêde bide kûrkirinê”.

“Ewê ku tê cem Min, gotinên Min dibihê û diqedîne, ez wera bêjim, mîna kê ye. Ew mîna merivekî ye, yê ku malê çê dike, erdê dikole, kûr dike, hîmê wê li ser kêvir diafîne...” (Lûqa 6:47,48).

Dema ku malbeta me li Dallasê dima, min dîna xwe didayê ku çêkirçîya avayên çawa bilind çê dikirin. Ji nûva destpêkirî şuxul pêşda nediçû, çimkî wana bi meha erd dikula bona ku hîm daynin. Avayî çiqasî mezin bû, ew çel gerekê mezin bûya û hîmê avayî jî gerekê awqasî berfireh bûya. Li ser erdê dihate texmînkirinê, ku pale hêdî dixebitîn û pêşkeftin tunebû. Feqet nişkêva ew avayê bilind lez dihate çêkirinê. Himberî xebatên hazirkirinê, tê bêjî çêkirin nava rojekêda diqewimî.

Ev çêkirina lez himberî xebatên *pêşda hazirkirinê* tişteke nîbû.

Ez bawar dikim, wekî gelek meriv nava bedena Mesîh da nava êtapa pêşda hazirkirinêdanin, bi taybetî wekîlên nisileta cahil. Bona wê yekê ez rûmetê didime Xwedê. Diqewime ew bona qulixkirinê hatine gazîkirinê, yan jî ji Xudan hîvîya xiyalêne, lê niha ew li ser tabîyên qulixêye sereke cîhê xwe nagirin. Hemû tişt lez nabe, lê ez gumanim, wekî ew li qûmistanê hazirîyê derbas dibin, ew jî bi kontrola Xwedê. Nava jîyana wanda hîm tê dianînê, xeysetê Mesîh çê dibe, yê ku bi sala ser hev wê wana îzbat bike, yên ku bi kel û ced wê qulixî Mesîh û padişatîya Wî bikin.

Ewên ku li qûmistanê nînin, tê bêjî lez bi rêyên sîyasî, yan jî cûrên başqe bilind dibin û pêşkeftina xwe didine çareserkirin. Ewên ku li qûmistanêne, wanra dikare bê texmînkirinê ku ew cîda sekinîne.

Qûmistanê çawa derbas bibin

#8 Yêşû rast fem kir

Heger qûmistan bona kara me têra hatîye dîtinê, wî çaxî em çawa li qûmistanê qencîyê bistînin û ji xirabîyê dûr bimînin?

Yêşû mînaka merivekî usa ye, dilê kîjanî wextê bûyîna li qûmistanê rast bû. Dema ku Mûsa hilkişîya li ser çîyayê Sînayê, Yêşû li ser pala çîyê ma. Ewî dixwest çiqas karibûya nêzikî hazîrîya Xudan bûya. Dema ku Mûsa rastî Xwedê dihat, Yêşû careke mayîn li wir bû, bona ku nêzikî hazîrîya Xudan bûya. Heya wî çaxî jî, dema ku Mûsa xeberdana tevî Xudan ser hevda dianî, Yêşû li oda Civînê dima (binihêre Derketin 33:11).

Kitêba Yêşûda em dibînin, wekî pênc govekên gunehê, ji kîjana nisileta îsraêliyaye mezin nikaribû aza bûya, usa jî nava nisileta dudaye li qûmistanê (ya Yêşû) nehatine kifşê. Ew yek tenê carekê qewimî, ew jî nava jîyana merivekî bi navê Akar, lê rêbera û cimê carekêra Xwedê gerîyan, bona ku ew pirsgirêk hel bikirana. Nisileta duda rast nekir, çimkî wana teribandinên nisileta pêşda dîtîbûn, ku çawa dê-bavên wan li qûmistanê mirin û usa jî sozê Xwedê nestendin.

Yêşû û nisileta wî guhdarîya xwe li ser Efrandar dane merkez-kirinê û ketine welatê Sozdayî. Wana Xebera Xwedê bi cûrê qewîn xweyî kirin û xwe nedane gumanbirîyê. Ew ji gazinkirinê paşda sekinîn û bawarîya xwe li Xwedê anîn.

Diqewime ew jî rêke hêsa û lez bigerin, ku ji wî halî derbikevin. Lê belê, bi femkirina wê yekê, wekî ew rê wê rezê xeysetê qewîn nede û wê wana def bide ku ew ber daxun, ew qîrar dikin, wekî ew rîskeke mezin e. Bi hîvîyêsekinandina Xwedê, ew îzinê didine Arxîtêktor, ku Ew hîmê qewîn bide ser Zinar.

Niha hene serwêr, yê n ku bi kel û ced Xwedê digerin, lê careke mayîn tê texmînkirinê, ku tişteki gelekî hindik diqewime, yan jî tu tişt naqewime: ew li cîh û êtapa hişkayêne. Ew dîna xwe didinê, ku çawa yê n mayîn bi açixî xwe û qulixên xwe rêklam dikin, mêtodên markêtîngêye vê dinîyayê didine xebatê û nava torên sosîyalîda xiyala bextewariyê û açixiyê çê dikin. Lê belê, Xwedê îzinê nade, wekî merivê ku qûmistanêra derbas dibin, bi wan mêtoda çêkin, çimkî Ew bona wana hîmê qewîn û yê ku wê bimîne, çê dike.

Nava vê êtapa qûmistanêye hişkda Xwedê wana cuda dike, yê n ku hazirin bi gurêkirin hîvîya Wî bin û ji wana cuda dike, yê n ku hazirin bi derewa û bi gavên xwehiziyê pêşkeftina xwe bidine çaresekirinê. Pêşkeftina rast, ya ji Xwedê qirarkirî, dêmek, derketina ji qûmistanê, wê ew meriv bistînin, yê ku hîvîyêne, wekî Xwedê wê bê paristgeha Xwe. Nivîsar e:

“Gava bê wede, Ezê bi rastiyê dîwanê bikim... Çimkî bilindbûn ne ji rohilatê ye, ne jî ji rojavayê ye, ne jî ji qûmistanê ye. Lê hakim Xwedê ye: hineka nimiz dike, hineka bilind dike” (Zebûr 75:2-7).

Bêfaydetiya tebyeta bedenî

Rastîya derheqa wê yekêda, wekî beden û Ruh her dem nava şerkarîyêdanin, derheqa hemû govekên jîyanêdane, lê ne ku tenê derheqa qulixêda. Bîr nekin, wekî beden, tebyeta bedenî, tu cara nikare sozên Xwedê pêşda bîne. Heger beden tişteki pêşda bîne, wî çaxî problêmên we wê hebin, çimkî beden jî gerekê mecbûr bibe wê yekê xweyî bike. Heger Ruh tişteki pêşda bîne, wî çaxî Xwedê wê bona wê yekê bide.

Qulixa bedenî gelek cara atmosferê xwehiziyê û kontrolê pêşda tîne. Rêber bi kontrola xwe, yan jî bi hukumê xwe hukumî li ser meriva dikin, ku bighîjine faydeyên baş. Heger hûn peyîhatîkî wanin, wî çaxî hûn nişkêva bona açixî yan jî teribandina wana dibine cabdar, nenihêrî wê yekê ku hûn caba emirkinên wana çawa didin. Meriv dikevî nava atmosferê hukuma, qanûnparêzîyê û desthilatdarîyê.

Nenihêrî wê yekê, wekî ez hîmlî derheqa pirsên qulixdarîyêda dibêjim, ez dixwezim bidime kifşê, wekî ev yek tenê derheqa qulixa ruhanîda *nîne*. Gotina min derheqa her *tiştî* da ne, çî ku bi qewatên bedenê, yan jî tebyeta bedenîva tê çêkirinê. Ev yek dikare derheqa karmendîyê, yan jî xwendinêda bibe, yan jî govekên saxlemîxweyîkirinê, serkarîkirinê û leşkerîda be, yan jî derheqa sportê û govekên başqeda be, nava kîjanada Xwedê gazî dike ku bona cimeta Wî qulix bikin.

Ji alîkî mayînva jî, çî ku ji ruh dixulîqe fem dike, wekî ewî nava çêbûna xweda rola xwe nelîstîye û bo wê yekê jî fem dike, wekî ew bi xwe nikare xwe xweyke, yan jî pêşdaçûyîna xwe çareser bike. Xwedê bi Xwe bona wê yekê cabdar e, çî ku Ewî efirandiye û çê kiriye.

Dema ku Îshaq hate dinîyayê, tabîya Îsmayîl îdî îzbatbûyî bû (binihêre Destpêbûn 16-21). Li gora cêribandina min, Îsmayîl her dem dicêribîne îzbat bibe, hetanî ku xiyala derheqa Îshaqda bixulîqe. Hûn gerekê dijî wê yekê derbikevin, wekî bi qewatên xwe bighîjine sozê ji Xwedê stendî. Vê xeberê bîra xweda xweykin: “Berî vê carîyê û kurê wê bide, çimkî kurê vê carîyê gerekê tevî kurê min Îshaq war nestîne” (Destpêbûn 21:10).

Ew roj tê, wextê ku Xudan wê bêje cimeta Xwe: “Cedandinên xwe wêda biavêjin, yên ku Îsmayîl pêşda anîn, çimkî ewê ku ji tebyeta bedenî xulîqîye, wê tevî ewê ku ji sozê dayî xulîqîye, war nestîne”. Nenihêrî wê yekê, wekî çî ku bi qewatên me hatîye çêkirinê, û li ber çavê me çawa tiştê kardar tê kifşê, Xwedê wê bêje: “Wî hemû tiştî wêda biavêjin”, bona ku bedenek nava hazîriya Wî da rûmet nebe.

Wextê ku dîwana Xwedê eyan bibe, ew beşa jîyana we, ya ku bi karebûna we hatîye çêkirinê, wê li ber agirê ku paqij dike teyax neke. Heger nava vê jîyanêda hemû cedandinên we bona xwexweyîkirinê û pêşdaçûyîna we bûne, wî çaxî ew hemû tiştê bişewitin, lê hûnê xilas bin, “hema usa, çawa bi êgir” (A Korintî 3:15).

Tenê ew kar wê bimînin, yên ku li gora soz tî qebûlîkirinê û bi saya Ruhê Xwedê û keremê dixulîqin.

9


HÎNBÛNA QÛMISTANÎ

“Xudan leşkerên xweye here baş ji bilinddihên zêrandina distîne”.

- Çarlz Spêrcên

“Kurik mezin dibû û bi ruh qewat digirt û heta roja Îs-rayêlêva xuya bû jî li qûmistanê dima”.

- Lûqa 1:80



Çend sal pêşda ez rastî pirsgirêkekê hatim, ya ku dide kifşê, wekî em, peyîhatîyên Mesîh, gerekê bona hazirîyê wede başqe bikin, bona ku qewat bin û bawarîya xwe bidine qewînkirinê. Hûn bawar dikin, yan bawar nakin, ez bêjim, wekî ew yek ne ku li qûmistana hişk û zîhada qewimî, lê sera sportêda.

Ez 35–salî bûm û min li ştata Corcîyayê li civîneke bajarê Atlantayê terîf dikir. Piştî xilaskirina banga ku ji dilê min derdiket, ez tê bêjî li ser dikê hindik mabû bixerîqîyama. Min fem kir, wekî saxlemîya min ne baş bû û ez gerekê li ser xwe bixebitîyama heger min dixwest qulixa xwe bi helalî berdewam bikira.

Ez ji ştata Corcîyayê vegeîyam û min Lîzayêra derheqa wê yekêda gilî kir. Peyî wê yekêra min got:

-Ezê herim salona sportê.

Lîza zendegirtî mabû û gote min:

-Şikir ji Xwedêra. Min dua dikir, ku tu biçûyayî salona sportê.

Bi rastî ew tişteki gelekî baş e, wextê ku jina mêrîve usa heye, ya ku zane çawa bona mêrê xwe dua bike.

Wî çaxî em li Florîdayê diman, û li ser soqaca me, ji mala me du mal wêdatir, gulaşgirekî bi navê Kîp dima, yê ku endamê fêdêrasîya gulaşa hemdinîyayê bû. Malbetên me nêzîkî hev bûn, çimkî zarokên me jî emirda weke hev bûn. Ewî gelek cara pêşniyar kiribû, ku min tevî xwe bibe ewê salona sportêye hînûnê û min hîn bike, lê min her dem digote wî: “Na ez gelekî mijûlim û wedê min tune”. Ez mijûl bûm, lê usa jî

hinekî ditirsîyam, kê wê bixwesta tevî gulaşgîrê profêsiyonel hînî gulaşê bûya.

Bedena Kîp zirav bû, lê bejina wî 190 santîmêtr bû, bi xwe jî 108 kîlogîram bû, û tenê şeş selefê bedena wî nava donda bû. Damarên li ser wî dihatine kifşê, û figûra wî gelekî bedew bû. Min tevî zarokên xwe û wî gelek cara baskêtbol yan hokêy dilîst. Wextê ku ez wî diketim, ewî qet ez def jî nedidam, lê ez mêtir û nîv yan jî du mêtira paşda banz didam.

Pişti sefera li Atlantayê ez çûme cem wî û min gotê:

-Kîp, ez gerekê herime salona sportê. Te digot, ku tu dikarî min hîn bikî: tu hazîr?

Ewî lez bersiva min da:

-Bêguman, ezê te bibime salonê.

Min gerekê guhdarîya mezin bida li ser kenê wîyî sadîstîyê. Min qet nizanibû jî ku çi hîvîya min bû.

Sibetira mayîn em bi hevra çûne salona sportê. Min carekêra fem kir, wekî tenê sportsmênên profêsiyonel diçûne li wir. Atmosifêra li wir bi qewata mêrava tijîbûyî bû, lê bêhna bedenê, ya li wir belavbûyî bû, gelekî xirab bû. Dersa ewlin, ya ku ez li salonê roja ewlin hîn bûm, ew bû, wekî damar mezin nabin wextê ku tu giranîyê bilind dikî. Li ser wê giranîyê gerekê tu diha zêde bikî, kîjanê dikarî sê-çar cara bilindkî.

Wextê bilindkirina cara sisîya yan çara, dema ku nava damarên weda guhartin destpê dibe, wî çaxî usa diqewime, wekî hemû tişt di nava weda dibêje: “Ez êdî nikarim bilindkim”, lê xortên ku dora we berev bûne, dikine gazi: “Bilindke, bilindke”, û wî çaxî di nava weda tiştêk we def dide ku hûn qewatên xwe berev bikin û wê giranîyê cara çara yan pênca bilind bikin. Çawa şirovekirina vê şuxulkarîya dijwar, damar hema wî cûreyî mezin dibûn.

Ez gerekê bi şermkirin bêjim, wekî roja ewlin, ji tabîya paldayî min tenê 40 kîlogîram bilind kir. Ez gumanim, wekî Kîp zanibû ku cînarê wî gerekê hela hê rêyeke dirêj derbas bûya. Piştî çend hevtîya, wextê ku ez diçûme salonê, min dikaribû 45 kîlogîram bilind bikira. Piştî çend hevtîya jî min êdî 50 kîlogîram bilind dikir. Hinek wede derbas bû û ez gihîştme 55 kîlogîrama. Wextê ku ez gihîştme 60 kîlogîramî, ez usa

firnax bûm, wekî min dikaribû hesinên 30-î kîlogiramê li ser her alîkî zêde bikira. Min êdî şerm nedikir.

Hinekî dereng ezê derheqa vê yekêda gilîkim, lê şuxulkariya zêdekirina qewatên min, ya ku hêdî-hêdî derbas dibû, mîna tişteki usa ye çî ku wî çaxî diqewime, dema ku Xudan me dibe “salona Xweye sportêye li qûmistanê” û alî me dike ku em damarên xweye ruhanî bidine pêşxistinê.

Hema li qûmistanê jî ruhê me qewatê distîne, çimkî qûmistan ne tenê cîhekî bêav e, li kîderê em dikine qîrîn: “Xwedê, Tu li kîderêyî?”, lê ew cîhê cêribandinê mezin e. Mizgînî ew e, wekî nenihêrî wê yekê, ku li qûmistanê dijwarîyên mezin hene, em gerekê bîr nekin ku kê piştgirîyê dide me, bona ku wan giranîyên wextê telîmên meye ruhanî em bikaribin bilind bikin:

“Heger Xwedê pišta me ye, kî dikare dijî me be” (Romayî 8:31).

Xêncî wê yekê, wekî Ew pišta me ye û piştgirîyê dide me, Ew usa jî soz dide me:

“Hûn dikarin li Xwedê amin bin, Yê ku wê îzinê nede ku hûn ji wê ji yekê zêdetir bêne cêribandinê, çiqasî dikarin teyax bikin” (A Korintî 10:13, NCV).

Dêmek, nenihêrî wê yekê ku hûn nava cêribandina çawadanin, û nava qûmistana çiqasî giranra derbas dibin, Xwedê soz dide, wekî emê tu cara rastî cêribandina usa neyên, bona altkirina kîjanê qewatên me wê têrê nekin. Bi rastî, tişteki ecêbmayînê ye dema ku em derheqa wê yekêda difikirin.

Wextê ku hûn rastî cêribandina tîn, tu cara bîr nekin ku hûn kîne. Hûn kurê Xwedêyî hizkirîne, û Îsa dibêje we: “Awa Min hukum daye we, ku hûn mer û dûpişka û tamamîya qewata dijmin pêpes bikin û qet tu tiştê zîrarê nede we” (Lûqa 10-19). Anegorî vê xeberê, em fem dikin, wekî em dikarin her êrîşeke dijmin alt bikin. Heger usa nîbe Xwedê wê îzina wê êrîşê neda.

Lê belê, pirsek heye, derheqa kîjanêda em gerekê xebêrdin. Gelek meriv nagihîjin bona ku rastî dijwarîyên diha mezin bên. Bi gilîkî gotî, ew ji salonên sportê direvin, yan jî gazina dikin, dema ku ew li wirin. Pawlos nêzîkbûneke lap başqe şirove dike. Ew dinivîse:

“Û ev kerem ji Xwedêda bona xatirê Mesîh hate dayînê, ne tenê bona ku hûn bawarîya xwe li Wî bînin, lê bona Wî cefê jî bikişînin” (Filîpî 1:29, NKJV).

Gelo hûn zendegirtî namînin, wextê ku hûn dixwînin, wekî bona we “cefa” hatîye dayînê? Bi rastî, ew yek çi dide kifşê? Heger kesek bigota min: “Bona te tiştê hatîye dayînê”, ezê hîvîya duakî bûma. Ezê hîvîyê bisekinîyama û bifikirîyama: “*Gelo ezê çi bistînim?*”.

Meriv çawa dikare xebêrên “kerem” û “cefakîşandin” nava cumlekêda bike yek. Ew yek mîna wê meselê ye, çawa ku hûn bêjine kesekî: “Te roja bûyîna xwe kerem standîye, ku tu herî cem doxtirê dirana, ku emelyeta binê diran biki”. “*Bi rastî? Spas, lê ez naxwezim*”. Ew yek tê bêjî bêfikir e, çimkî wextê jîyana li welatekî mînanî Amêrikayê em berbi jîyana hêsa divedînin. Dêmek, fikira derheqa wê yekêda wekî bona me cefa hatîye dayînê, dikare me bike nava şaşîyê. Gelek meriv wextê ku rastî dijwarîyê tên dibêjin:

“Ez nikarim bawar bikim, wekî ev yek rastî min tê”.

“Bona çi ez?”.

“Bona çi ez gerekê nava vî hemû tiştîra derbas bibim?”.

“Ez nikarim vî halî li ser xwe bibim”.

“Tu kes fem nake ku ez nava çira derbas dibim?”.

“Gelo meriv nikare bi jîyana sade bijî?”.

“Xwedê, hîvî dikim vê yekê ji min dûr bixe”.

“Bo çi şerkarîyê bikim?. Diha baş e ez telîm bim...”.

Ez gumanim wekî her car, dema ku em rastî tengavîyê tên, em yan vî cûreyî fikirîne, yan jî me vî cûreyî gotîye. Mixabin, gelek cara em meremê tengavîyê û cefayê (qûmistanê) fem nakin.

Lê belê, mînanî her dema, Xwedê zane çi me lazim e û çiqas qewat

mera lazim e, bona ku em bona padişatîya Wî kardar bin. Awa bona wê yekê ye, ku Pawlos derheqa wî sozê Xwedêda li me eyan dike, wekî wê cefa mera “bên dayînê”, bi meremê şerkaîyê, bona ku damarên bawarîya me bighîjin.

Rola cêribandinê

Çawa ku min êdî da kifşê, meremekî hazirîya meye qûmistanî ew e, ku em karebûna xweye naskirina cêribandinê û dijîderketina hindava wêda bidine pêşxistinê. Îsa nava wedê qulixa Xweye pêşinda ev yek dît, dema ku Bavê îzin da mîrêcin ku Wî li qûmistanê bicêribîne. “Peyî wê yekêra, Îsa bi Ruhê Pîrozva tijî ji Êrdunê vegeirîya û ji alîyê Ruhda berbi qûmistanê hate rêberkirinê, ji alîyê mîrêcinda 40 rojî hate cêribandinê” (Lûqa 4:1,2, NKJV).

Min bi zanebûn xebera “îzin da” da xebatê, çimkî Xwedê tu cara xudanê cêribandinê nîne: “Bila tu kes, yê ku nava cêribandinêda ye, nebêje: “Ez ji alîyê Xwedêda tîm cêribandinê”, çimkî Xwedê xirabîyada nayê cêribandinê û ne jî Ew kesekî dicêribîne” (Aqûb 1:13, NKJV).

Bi rastî, gelo çi diqewime, wextê ku em tîm cêribandinê? Em zanin, wekî mîrêcin me berbi gunehkirinê def dide, bona ku me jî şabûna kirina gura Xwedê û pêwandîya tevî Wî bide dûrxistinê. Heger mîrêcin bi wî meremî me dicêribîne, wî çaxî Xwedê bi çi meremî îzinê dide ku em rastî cêribandinê bên. Petrûsê şandî vê bersivê pêşnîyar dike: “Awa Mesîh ku bona me bedenî cefa kişand, hûn jî bi wê nêt-fikirê sîlihkîrî bin. Çimkî yê bi bedenî cefa kişand, wî dest ji guneha kişandiyê” (A Pestrûs 4:1).

Bi cûrekî mayîn gotî, meremê cêribandinê serkeftina hindava gunehêda û rasthatina tevî dijwarîyaye li qûmistanê ew e, wekî em damarên xweye ruhanî qewîn bikin û diha zêde bighîjin. Nava wê gotinêda xebera kilît “sîlihkîrîbin”-e.

Hûn dikarin bînin ber çavê xwe, wekî koma leşkera bêyî sîlih here şêr? Bêyî helîkoptêrên leşkerî, tanka, tîvinga û cebirxana, bêyî sîliheki herne şêr? Wî çaxî krîzîsa mezin wê destpê bibe. Hema wî cûreyî jî peyîhatîyên Mesîh rastî qezîayê tîm, heger ew bi cefakîşandinê û cêribandi-

nava sîlihkirî nînin, yan jî hazir nînin.

Pîlotên hevaltîya avyasîyon hema mînaka merivên wî cûreyîne, yê ku bona pirsgirêkên usa hazirin. Ew hevaltîya avyasîyon, li kîderê ew dixebitin, şeş meha carekê wana dişîne hazirbûnê. Ew hîn dibin ku nava hemû halên xirabda gavên anegor biavêjin. Merem ew e, ku pîlot diha bi profesîyonalî bikaribe nava halê xirabda kontrol bike. Her dem, wextê ku teyarêda halê krîzîsê pêşda tê, rêwîyên ku teyarêdanin *hazir nînin*, ku dijî wê yekê derbikevin, lê pîlot wî çaxî dişuxule. Bo çi? Çimkî pîlot *hazirbûyî ye*.

Awa qûmistan nava jîyana mesîhîyê şikestîda çi dike. Em rastî di-jwarîya tîn, meremê kîjana ew e ku me sîlih bike û bona pêşerojê hazir bike. Em gerekê fem bikin, wekî emê rastî di-jwarîya bîn, rastî qûmistanê bîn. Îsa gote me, wekî li vê dinîyayê tengavîyên me wê hebin, lê Ewê alî me bike, ku em wana alt bikin. Û nava wî wedeyîda emê diha qewat bin.

Mecala mezin

Em gerekê qûmistanê çawa mecala bo pêşxistina damarên xweye ruhanî û zêdekirina qewatên xwe binihêrin, bona ku bikaribin wî hemû tiştî hildin, çi ku Xudan dixweze nava êtapa jîyana meye bi sirêda bide me. Aqûbê şandî dinivîse:

“Xwîşk û birayên min, dema ku hûn rastî her cûre tengavîya tîn, wê yekê hesabkin çawa mecala...” (Aqûb 1:2, NLT).

Em fem dikin ku mecal çi ye. Em, amêrîkî, karmenda hiz dikin. Nava karmendîyêda mecal îzinê didin ku em bighîjin, bighîjine açixîyê û gulvedin. Mecal îzinê didine me, ku em pêşeroja xwe berfireh bikin. Em gerekê tengavîya hema wî cûreyî lê binihêrin, çimkî Aqûb xebera xwe berdewam dike: “Çimkî hûn zanin, wekî bawarîya we tê cêribandinê, sebira we (yan jî teyaxê we) mecala gihîştinê distîne. Dêmek, îzinê bidin, ku ew bighîje, çimkî sebir we (yan jî teyaxê we) wê bi temamî pêşbikeve û hûnê bi tmamî pêşda herin û hewcê tu tiştî nîbin” (Aqûb 1:3,4, NLT).

Qûmistanê çawa derbas bibin

#9 Îsmayêl nexuliqînin

Dema ku em fem dikin, wekî em li qûmistanêne û em difikirin, wekî em zêde li wir mane, em tên cêrbandinê û dixwezîn tişteki bikin, bona ku xiyala me mîyaser bibe. Ez vê yekê çawa “xuliqandina Îsmayêl” nav dikim. Ew yek wî çaxî diqewime, wextê ku em dicêribînin bi xwe wê yekê mîyaser bikin, çi ku Xwedê mera soz daye. Îsmayêl gelek cara çawa caba hewcetîya me dixuliqe, lê bi qewatên me. Ev fikir jî serpehatîya Birahîm û Sarayê destpê dibe, kîjanara Xwedê kur soz da. Ew 11 sala hîvîyê sekinîn. Birahîm êdî 86-salî bû, lê Sara jî bona anîna zaroka gelekî pîr bû. Dêmek, ew derbasî progirama xwe bûn: Sarayê pêşniyar kir ku Birahîm ew zaroka sozdayî bi destî xulama wan, Hagarê, bistenda. Ew gelekî fikireke xirab bû. Her nêzîkbûneke xuliqandina Îsmayêl, heger ew

Li qûmistanê bona me mecal tê dayînê, ku em sebira xwe, yan jî teyaxê xwe *bidine zêdekirinê*. Gelo xebera “teyax” bona çi roja îroyîn gelek cara didine xebatê? Wê xeberê gelek cara wextê telimên sportê didine xebatê. Bi zêdekirina teyaxê xwe, em *karebûna* xweye bona şerkarîyên pêşerojê zêde dikin.

Fikir ev e: nava her cêribandinekêda, rastî kîjanê em tên, Xwedê îzina dijarîya bi meremê mexsûs dide, û ew merem zêdekirina *karebûna* me ye. Xwedê roja îroyîn wê îzina (û careke mayîn ez “îzinê dide” diwekilînim) dijarîkê bide, ya ku wê mîna dereca wî hukumî be, yê ku çawa Ew zane, emê sibê rastî wê bîn (mesela teyarê bîr bînin). Awa bo wê yekê ye ku cêribandin her dem zêde tê texmînkirinê, lê ne ku dereca hazîrîya û cabdarîya meye niha. Bi texmîn, Xwedê dijarîyên meye niha dide xebatê, bona ku pêşerojêda em bighîjine destanînen diha mezin.

Em paşda veqerine li ser telimên sportê. Çawa ku min êdî dabû kifşê,

baş jî tê kifşê, fikira xirab e. Her dem bîr nekin, wekî hûnê mecbûr bin bi qewata bedena xwe wê yekê xweyîkin, çî ku we bi bedena xwe xuliqandiye.

Dema bûyîna mine li qûmistanê, min jî cêribandiye programên wî cûreyî bidime xebatê. Min zanibû wekî Xwedê soz dabû min, wekî qulixa mine terîfkirinêye hemdinîyayî wê hebûya, lê ew yek nediqewimî û ez nava qulixa civîna cîhda “mabûm”. Min çend cara cêriband tiştêkî bikim û ji qûmistanê birevim. Ê bona cêribandinên wî cûreyî min bihakî giran da û negihîştme tu faydeyî. Hema min ew cêribandin dane sekinandinê, Xwedê şuxulî û hemû tişt guhart.

Ez berbirî we dibim, cefayê zêde nekişînin û Îsmayêl nexuliqînin. Îzinê bidin ku Xwedê wê yekê bike, çî ku Ewî soz daye we.

Kîp ez awqasî hazir kiribûm ku min bikaribûya ji tabîya palidayî 60 kîlogiram bilind bikira. Neniherî wê yekê, wekî ew yek bona min destanîna mezin bû, lê ez difikirîm ku gelo min dikaribû zêde bilind bikira. Heger em telîmên min himberî hazirîya ruhanî û qewata wê bikin, gelo wê çî bûya, heger Xudan tiştêkî usa bona min hazir bikira, bona kîjanê lazim bûya ku min ji 60 kîlogiramê zêdetir bilind bikira?

Min çûyîna li sera sportê berdewam kir. Piştî hinek wede ez gihîştme 90 kîlogiramî, lê nava du salên peyîra min ew giranî zêde nekir. Min li hemcivîneke Kalîfornîyaê terîf dikir û wî çaxî çend qulixçiyên civînê ji min pirsîn:

-Con, te qet sed kîlogiram bilind kirîye?

-Na xêr, eva ji pênc sala zêdetir e ku ez dicêribînim wê yekê bikim,- min bi cûrekî acizbûyî got.

-Emê alî te bikin,- wana got. Ê bi rastî, hema wê rojê min ji tabîya

paldayî sed kîlogram bilind kir. Ez gelekî ruhdar bûm.

Peyî wê yekêra, xebatkarekî nû gihîşte koma qulixdarîya “Mêsîncêr întêrnêyşînil”-ê. Ez pê hesîyam, wekî ew pêşda giranîbilindkir bûye û me destpêkir tevayî li salona sportê hîn bin. Bi alîkarîya wî min 105 kîlogiram bilind kir û carekê jî ez gihîştîme 110 kîlogirama. Lê gelo min dikaribû ji wê giranîyê zêdetir bilind bikira?

Piştî salekê, carekê min li civîneke bajarê Dêtroytê terîf dikir. Piştî berevbûneke roja yekşemê, serwêrê wê civînê gote min:

-Con, endamekî civîna me hînkirê giranîbilindkirina hemmiletîyê ye û bi nav û deng e. Sibe zû ezê li cem wî bim bona telîmbûnê. Teyê bixwesta tevî min bihatayî?

-Belê,- min bi şabûn bersiva wî da.

Roja mayîn em çûn. Piştî qîmetkirina min, ewî merivî ji min pirsî:

-Dêmek, te giranîya here zêde 110 kîlogiram bilind kiriye?

-Belê, lê min ew yek tenê carekê kirîye.

Baş, îro tê diha zêde bilind bikî.

“Çi?”. Min usa negot, lê ez fikirîm: “*Tu dîn bûyî! Ew yek tiştê bûyînê nîne!*”. Feqet piştî şêwirdariyên kurt û telîmkirina, ewî usa kir wekî min 120 kîlogiram bilind kir.

Ez gelekî şa bûm. Ez û xebatkarê koma me, yê ku giranîbilindkir bû, vegeyane Koloradoyê, û wî merivî bi rêya namên êlêktronî xebata tevî me berdewam kir. Em bi kel û ced telîm dibûn û sala peyîra ez careke mayîn çûme li wê civîna bajarê Dêtroytê. Wî çaxî ez 42 salî bûm.

Ewê roja yekşemê, min derheqa cudatîyên Ruhê Pîrozî ecêbda terîf kir. Roja duşemê em çûne dîsa wê salona sportê. Wî merivî got:

-Con, îşev min xewin dît, wekî te ji cîhê paldayî ji 140 kîlogiramî zêdetir bilind kir.

-Ew tiştê bûyînê nîne,- min gotê. Diqewime ez fikirîm: “*Gelekî baş e, lê min xewina usa nedîtîye*”.

-Con, te duh derheqa qewata Ruhê Pîrozda terîf dikir. Ewî ew xewin îşev da min. Niha palde, emê wê yekê bikin.

Bi vî cûreyî, piştî hazîrbûnê, hesinên giran serda zêde kirin, û min bi qîrîn bilind 150-î kîlogiram bilind kir.

Ez awqasî şa bibûm, wekî min ji firegeha Dêtroytê Lîzayêra têlêfon kir û gotê:

-Beşera min usa xweş e, wekî tê bêjî ez dikarim bêyî teyare bighîjime malê.

Wî çaxî, wextê ku min 150-î kîlogiram bilind kir, ez bi giraniya sed kîlogiramê telîm dibûm. Wextê hinek nêzîkbûna, min hetanî deh cara ew giranî bilind dikir. Lê niha bîr bînin, ku hevt sal pêşda min ji çi destpê kir. Gelo wê çi bihata serê min, heger wî çaxî, wextê ku ez 35 salî bûm, Kîp giraniya sed kîlogiramê dewsa 40-î bida ser? Diqewime ez bimirama. Diqewime ew giranî biketa ser min û min sîngê xwe bişkênanda. Sal lazim hatin ku bi telîma ez bighîjime qewata niha. Ew giraniya ku bona min bibû ya sade, wê hevt sal pêşda ez bikuştama. Awa bona çi cêribandinên me, yên ku carina dirêj dikişînin bi rastî telîmên ruhanîne, yên ku alî me dikin ku em bona cêribandinên pêşerojêye diha mezin hazir bin. Wextê ku em nava Xudanda diha qewat dibin, em dikarin diha zêde bona çêkirina padişatîya Wî bikin.

Tiştê xemgînî ew e, wekî merivê hebin, yên ku wê li ber textê dîwanê bisekinin, û Îsa hêsir çevada, wê bêje wan: “Min diha zêde bona te hazir kiribû, lê *karebûna* te tunebû ku te li ber wan dijwarîya teyax bikira, yên ku wê tevî hemû tiştî bihatana”. Eva bi taybetî tiştêkî tragîk e, çimkî çawa ku em zanin, Xwedê wê tu cara zêde nede me, çawa ku Ew zane ku çiqasî em dikarin li ser xwe bibin. Ewî soz daye me.

Dêmek, werin em serpêhatîya derheqa telîmên minda çawa alêgorîya bidine xebatê. Heger hûn dikarin dijîderketina 60 kîlogiramê bilind bikin, lê Xwedê bona we progirameke usa, yan jî tabîke usa, qîrar kirîye, anegorî kîjanê hûn gerekê *bikaribin* dijîderketina zêrandina, cêribandina 80 kîlogramê bilind bikin, Ewê îzinê nede ku ew yek biqewime, çimkî qewata weye anegor tune ku hûn wê giraniyê bilindkin. Diqewime Ew îzinê bide ku hûn dijîderketina 65 kîlogiramê bilindkin (bîr nekin, wekî Ew *xudanê* wê yekê nine), yê ku wê we bicêribîne, lê bêqewat neke.

Mînak, bînin ber çavê xwe, wekî kesek buxdana li we dike û derheqa weda behsên derew belav dike. Dewsa dijîderketinê, xweparastinê û derheqa wî merivîda buxdanbelavkirinê hûn gura Xebera Xwedê dikin,

qirar dikin tu tiştî nebêjin û dua dikin. Wî çaxî hûn cêribandina 65 kîlogiramêra derbas dibin. Wede ye êdî dereca 70 kîlogiramêra derbas bin. Heger hûn dîsa wextê cêribandina gura Xebera Wî bikin, telîma we wê pêşda here, hetanî ku hûn bighîjine dereca 80 kîlogiramê. Niha hûn bona tabîya diha bilind hazirin, ya ku Xwedê nava padişatîya Xweda bona we qirar kirîye, û ya ku progirama Wî ye, ya bona jîyana we ye.

Lê belê, heger hûn dizanin wekî derheqa weda buxdana dikin, hûn bixeyîdin û bi gunehkarkirinava bersivê bidin, wî çaxî eyan e ku wê çî biqewime. Xudanê, hêsir çavada, bêje: “Ez diêşim, lê tu gerekê paşda vegerî li ser dereca 60 kîlogiramê”. Hûn hela hê “salona sportê” danin, lê pêşkeftina we tune.

Telîm li ser wê derecê jî berdewam dibe. Paşê Ew îzina pirsgirêkeke finansî dide û ew jî cêribandina 65 kîlogiramê ye. Feqet dewsa gera li dayîna Xwedê, hûn carekêra dibêjin: “Problêm tune. Karta meye krêdîtê bi temamî xilas nebûye”, û Xwedê ewê giraniya zêde dûr dixê, dibêje: “Paşda vegere li ser 60 kîlogirama”.

Bi kutasî, wedeyê bê, wextê ku Xwedê bona dayîna karekî nava padişatîya Xweda, yan jî tabîkîda, hewcê we bibe û ew dijîderketin wê ya 80 kîlogiramê be. Heger we her dem cêribandinên qûmistanî, yan jî bilindkirina giraniya teribandî ye, Ew nikare pêşniyarî we bike, çimkî damarên weye ruhanî awqasî qewat nebûne ku nava wî halîda giraniyê bilind bikin. Ewê şexsekî mayîn bibîne, yê ku dikare wê xebatê bike, yan jî li ser wê tabîyê cîhê xwe bigire.

Serwêrî û qewata diha mezin

Awa bona çî qûmistan awqasî girîng e: *ew qewata me çê dike.*

Li qûmistanê Yûhennayê nixumdar bi ruhê xweva qewat bû.

Li qûmistanê Îsa bi ruhê Xwe qewat bû.

Damarên wane ruhanî ne ku nava wedê hêsada, lê wextê ku cêribandin hatin, wextê ku bawariya wan hate cêribandinê, gihîştin.

Aqûb mizgînîyê dide me: wextê ku hûn cêribandinekêra derbas dibin û bi cûrê xwestina Xwedê wê yekê dikin, wî çaxî hûnê tam hazir bin,

qewata weyê bona progirama bi sirê hebe, ya ku Xwedê wê bide we:

“Çimkî hûn zanin, wekî bawarîya we tê cêribandinê, sebira we (yan jî teyaxê we) mecala gihîştinê distîne. Dêmek, îzinê bidin ku ew bighîje, çimkî sebira we (yan jî teyaxê we) wê bi temamî pêşbikeve û hûnê bi temamî pêşda herin û hewcê tu tiştî nîbin” (Aqûb 1:3,4, NLT).

Nava gotina Aqûbda, ya “Îzinê bidin ku ew bighîje”, xebera “ew” *karebûn* û *teyaxê* me ye. Aqûb jî dibêje me ku em dikarin hîvîya çî bibin, heger em li qûmistanê rast bişuxulin. Xwedê dua tîne li ser wana, yên ku bi sebir li ber cêribandinê teyax dikin. Piştî wê yekê ewê tacê jîyanê bistînin, yê ku Xwedê soz daye wana, yên ku Wî hiz dikin” (Aqûb 1:12, NLT).

Xebera “tac” hukum dide kifşê, lê tevî hukum jî qewat tê dayînê. Çawa ku Îsa çû qûmistanê, ku ji alîyê mîrêcinda bihata cêribandinê, û Ew bi saya şikestîbûn û gurêkirina Xwe, bi serwêrî û qewata mezin ji qûmistanê derket (binihêre Lûqa 4:1,14) usa jî em dikarin bi serwêrî û qewata mezin, ji êtapên xweye qûmistanî derbikevin.

Ez nizanim hûn çî difikirin, lê ez dixwezim guman bim, wekî dam-arên mine ruhanî dikarin li ber wî hemû tiştî teyax bikin, çî ku Xudan bona min hazir kirîye.

Kesek dixweze telîm bibe?


AV LI QÛMISTANÊ

*“Heger em nikarin wî çaxî bawarîya xwe li Xwedê bînin,
wextê ku tê texmînkirinê ku hemû tişt dijî m eye, usa ye em bi
tomerî hildayî bawarîya xwe li Wî naynin”.*

- Çarlz Spêrcên

*“Her kesê ku ji vê avê vexwe, ewê dîsa tí bibe, lê ewê ku wê
ji wê avê vexwe, ya ku Ez bidimê, ewê tu car tí nebe. Belê,
ew ava ku Ezê bidime wî, wê dilê wîda bibe kanîke avê, ku
wê bona jîyana heta-hetayê bikişê”.*

- Yûhenna 4:13,14



Baran li qûmistanê kêmin. Li qûmistanê destanîna avê dijwar e û heger mecal heye avê bibînin, wî çaxî tenê dikarin ji bîra, yan jî kanîya bibînin. Qûmistan welatekî bêav û tî ye (binihêre Zebûr 63:1).

““Heger yek tî ye, bila bê cem Min û vexwe. Ewê ku bawarîya xwe li min bîne, çawa ku nivîsar dibêje, wê ji nav-dilê wî çemên ava jîyanê bikişin”. Ev gotin... bona Ruhê Pîroz got...” (Yûhenna 7:37-39).

Çend qewimandinên ji cêribandinên mine li qûmistanê bîr bînim, dema ku bona min dijwar bû nava duakirinêda ava saxlemkirinê bistenda. Carekê, wextê ku ez nava halekî usada bûm, min çadira xwe hilda û ez çûme baxçekî bajarê me bona ku temamîya şevê min li wir derbas bikira. Wê şevê min dua kir, paşê min xwend, paşê min destpê kir stiranên pesindayîne bistirêm. Sê sehet derbas bûn, lê tu tişt neqewimî. Min nûbûn texmîn nedikir: li dor-berên min hişkayî bû. Ez gelekî gumanbir bûm. Paşê ketime çadirê û min cêriband razêm.

Wê şevê tê bêjî hemû cina şayî teşkîl kiribûn: ez nikaribûm rihet razama. Ez dizvirîm ser alîkî, paşê li ser aliyê mayîn û difikirîm ku bona çi Xwedê hazirîya Xwe li min eyan nedikir. Sibetirê ez ji çadira xwe derketim û nava baxçeda gerîyam. Min bi Ruh dua dikir, lê min hela hê hişkayî texmîn dikir. Sehetek û niv wî cûreyî derbas bû. Paşê min li jor nihêrî û got: “Xudan, bi fikira min ez li qûmistanême”. Ez difikirîm: “Ez

dikarim herime malê û Wî negerim, û ji wê yekê tu tiştê neyê guhartinê. Ewî ez anîme li vir û tu tiştê neyê guhartinê, çimkî Ewî hela hê ez ji vir dernexistime”.

Ew yek fikirdarîke şaş bû. Xwedê me nava qûmistanêra derbas nake bona ku me bighîne gumanbirîyê û bêkarîyê hetanî wî çaxî, hetanî ku Ew halê me biguhêre. Qûmistan gerekê nebe cîhê teribandînê: ew gerekê bibe cîhê serkeftinê. Nişkêva min dengekî nerm û zirav bihîst: “Şerkarîyê bike”. Ew xebera tek-tenê prîska agir û jîyanê bû, ya ku bona min lazim bû. Min carekêra got: “Pêşkêşa Xwedê, dilê minda gurbe! Çemên avên sax bikişin! Bîra dilê minda, derkeve!”. Serpêhatîk hate bîra min, ya ku li qûmistanê hate serê Îsraêlîya:

“Û ji wir çûne Bêrê. Eva ew bîr bû, bona kîjanî Xudan gote Mûsa: “Cimetê berev bike, ezê avê bidime wan”. Wê hingê Îsrayêl ev stiran stira: “Bîr bide der”” (Jimar 21:16,17).

Çiqasî zêde min ev xeberên ji kitêba Pîroz diwekilandin, awqasî duayê min diha zêde aktîv dibû, hetanî ku min destpê kir nava baxçeda pêşda bigerim û paşda vegerim û pêra jî min dua dikir û bi qewat û agirê Xebera Xwedê, digot. Min nûbûna tam texmîn kir û tê bêjî ez bibûme merivekî başqe. Hazirîya Wî bi cûrê qewat tevî min bû. Çend deqe pêşda min giranî û zeyîfî texmîn dikir, lê niha ez bona şerkarîyê hazir bûm û min dikaribû bi Xebera Xudan tevî her dijminekî şer bikira.

Wê yekê nêzîkî 25 deqeyî kişand, lê tê bêjî pênc deqe derbas bûn. Ez bi nûbûnêva tijîbûyî bûm û ez hazir bûm ku min temamiya dinîyayê zeft bikira.

Îsa dibêje, wekî çemên avên sax wê ji dilê wî merivî bikişin, yê ku tê cem Wî û veduxwe. Li qûmistanê em rêtina Ruh (baranê) nabînin. Li wî cîhê zîha ava ku nûbûnê tîne, gerekê ji dilê me derbikeve, ji kanîya, yan jî bîra Xwedê.

Guhdarîyê bidine ser: Îsa dibêje (Yûhenna 7:39), wekî ew kanî yan jî ew bîr, derheqa kîjanîda Ew dibêje, Ruhê Xudan e, û wekî ji dilê bawar-mend wê gelek çem bikişin, lê ne tenê çemek.

Ruhê Xudan çi cûreyî ji dilê me dikişê. Îşaya pêxember binyatê karên ruh şirove dike: “Û li ser Wî Ruhê Xudan wê bitemire, Ruhê serwaxtîyê û îmanê, Ruhê şêwirê û qewatê, Ruhê ulm û xofa Xudan” (Îşaya 11:2).

Ruhê Pîroz tê navkirinê çawa Ruhê Serwaxtîyê, Ruhê Îmanê, Ruhê Şêwirê, Ruhê Qewatê, Ruhê Ulm û Ruhê Xofa Xudan. Çawa Îsa got, wekî Ruhê mîna çema be, usa ye çemê Serwaxtîyê heye, heye çemê Îmanê, çemê Şêwirê, çemê Qewatê, çemê Ulm û çemê Xofa Xudan. Tiştê ecêbmayînê nîne, wekî dilê min li ser rêya ber çadira min agir pê ket.

Awa dîsa çend rastî, yên ku piştgirîyê didine vê fikirê.

- Gotinên Silêman 18:4-da nivîsar e: “Xeberên devê mêriv avên kûrin, kanîya serwaxtîyê çem e, yê ku dikişê”
- Gotinên Silêman 16:22-da nivîsar e: “Serwaxtî kanîya sax e bona wî kesî, li cem kîjanî ew heye”.
- Gotinên Silêman 20:5-da nivîsar e: “Şêwira dilê mêriv avên kûrin, lê merivê aqil wê ewê derxe”.

Ev av dilê bawarmenddanin, çimkî Ruh li wir dijî. Lê belê, tenê merivê ku rêyên Xudan fem dike, wê wan ava ji bîrê derbixe. Nava vê xeberêda xebera kilît “derxe”-ye. Girîng e bîr bînin, wekî avên ku nûbûnê tînin, li qûmistanê bi rêya barana Ruh nayên, lê ji dil tînin derxistinê.

- Gotinên Silêman 10:11-da nivîsar e: “Devê merivê heq kanîya jîyanê ye”.
- Gotinên Silêman 15:23-da nivîsar e: “Bona mêriv bersiva devê wîye anegor şabûn e”.

Heger min qîrar bikira çadira xwe berev bikira û biçûma, bifikirîyama: “Diha baş e herime malê û êdî Xwedê negerim: Ewî ez anîme vî cîhê zîha û tu tişt wê neyê guhartinê, heger Ew min ji vir dernexe”, minê wî çaxî giranîya dilê xweda tevî xwe bibira. Feqet min ew yek got, çi ku Xwedê kire dilê min û min karibû ji bîrên kûr av derbixista. Ez gihîştîme kûraya xilazbûnê û min destpê kir ava nûbûnê derxim. Ew yek bi rastî mîna wê yekê bû, çawa meriv li qûmistanê ji kanîya sar avê veduxun.

Gelek meriv nava wî wedê zîhabûnêda teslîm dibin, lê Xwedê dibêje: “Pêşda here, nesekine!”. Dilê meda gerekê cedandina qewîn û qewat

hebe, ya ku wê îzinê nede me ku em awqas wede teslîm nebin, hetanî ku xwestina Wî mîyaser bibe.

Gelek meriv duakirinê didine sekinandinê û zîhabûnê texmîn dikin. Ew êdî dua nakin, çimkî ji bîra êdî av nayê, û stendina avê tê bêjî dijwar e. Ew zeyîf dibin, lê Xwedê dixweze wekî ew qewata xwe bona wan şerkarîya zêde bikin, yên ku wê pêşerojêda rastî wan bîn.

Em ji kîderê qewatê dibînin ku avê derbixînin? Ji şabûnê! Îşaya 12:3-da nivîsar e: “Û hûnê bi şabûn avê ji kanîyên xilazbûnê bikişînin.” Menî ew e, wekî “şabûna Xudan qewata we ye” (Nêmiya 8:10). Şabûn qewata ruhanî ye, ya ku qewatê dide me.

Şabûna Xudan çi ye? Bi sala ser hev, ez difikirîm, wekî şabûna Xudan wê yekê dide kifşê, ku gerekê li cem me jî ew şabûn hebe, ya ku li cem Xwedê heye, lê min ew yek fem nedikir. Lê belê, ew tiştêkî mayîn dibêje. Gelo we gotina “Şabûna wextê xwerinçêkirinê” bihîstîye? Nava xwerinçêkirinêda, çawa ku tê gotinê, şabûn tune. Meriv dixwezî bêtînin ku hûn şabûnê texmîn dikin, wextê ku hûn xwerinê hazîr dikin. “Şabûna Xudan” ew şabûn e, kîjanê em texmîn dikin, wextê ku em tevî Wî dikevî nava pêwendîya. Ew şabûnê dide me. Heger em li oda duakirinê hazîrîya Wî texmîn nakin, ew yek nade kifşê ku Ew me înkâr dike. Dêmek, şabûna me li ser texmînkirinê me nehatîye hîmdanînê. Ew yek li ser Şexsê Xwedê û pêwendîyên tevî Wî hatîye hîmdanînê. Em diha dûr dibînin, ne ku derewa derheqa wê yekêda ku em înkarbûyî ne û em fem dikin ku Ew gazî me dike... berbi bîrên kûr.

Bîrên xitimî vekin

Carekê Îshaqê kurê Birahîm kete nava êtapa zîhabûnê:

“Li welêt, li ser wê xelaya ku hêna Birahîmda bibû, xelayîke dîn bû... Xudan wîva xuya bû û gotê: “Berjêrî Misirê nebe, wî welatîda bimîne, kîjanî Ezê nîşanî te bidim. Vî welatîda xerîbîyêda bimîne, Ezê tevî te bim û dua li te bikim”” (Destpêbûn 26:1-3).

Xwedê temî da Îshaq ku nereve Misirê, li kîderê jîyan diha hêsa bû. Lê gote wî ku li wî cîhî bimîne, yê ku Ewî bona wî qîrar kiribû. Gelek cara, wextê ku dikevî nava cîhê zîha, fikira meye ewlin vî cûreyî ye: “Ezê ji vir herim”. Heger wextê duayê sibe zû em hazirîya Xwedê texmîn nakin, wî çaxî fikira me destpê dike bigere, derheqa wan kirada difikire, kîjana em gerekê nava temamîya rojêda bikin. Em lez duayê ser hevda tînin û derbasî navnîşa şuxulên xwe dibin.

Heger em li wê civînê zîhabûnê texmîn dikin, li kîderê em bêyî pîrskirina ji Xwedê diqesidin, em qîrar dikin: *“Ezê herime li wir, li kîderê ruhdarbûna ruhanî û terîfên balkêş hene”*.

Heger em zîhabûnê nava jîyana xweye civakî yan karmendîda texmîn dikin, em difikirin, wekî hêja ye em ji bajarê xwe dûr bikevin û cîguhastî bajarê bi êkonomîka pêşkeftî bibin. Em difikirin: “Heger ez li vir bimînim, ezê zîhabim û programê Xwedê wê nava jîyana minda usa jî mîyaser nebe”.

Gelek mesîhîyên amêrîkî hene, yên ku vî cûreyî difikirin. Ew ji to-reke sosiyalî derdikevin û dikevî yeke mayîn, ji mijûlîkî derbasî ya

Qûmistanê çawa derbas bibin

#10 Dermanê şabûnêye xewile

Heger hûn li qûmistanê, wî çaxî gelekî hêsa ye ku guhdarîyê li ser halê xwe bidine merkezkirinê. Ez dixwezim sureke biçûk li ber we eşkere bikim, ya ku bi rastî alî min kirîye ku ez bijîm û nava êtapên qûmistanêda heta gulvedanê jî bijîm. Wê yekê ez çawa dermanê Şabûnêye xewile nav dikim.

Dema ku nava jîyanêda tu tişt min şa nake, wextê ku tê texmînkirinê ku tu tişt naqewime, wextê ku ez ser hev dua dikim, lê nagihîjime tu faydeyekî, ez destpê dikim derheqa wê yekêda bifikirim ku Îsa çi kir. Tê bîra min, wekî Ewî eşkere ez ji dojê xilaz kirim, li kîderê agir tu cara nasekine û ew bêhna xirab tu cara

mayîn dibin, ji civînekê derbasî ya mayîn dibin, ji bajarêkî diçine bajar-ekî mayîn, dicêribînin cîhekî usa bibînin li kîderê zîhabûn tune. Dewsa wê yekê ku ew bîra bikolin û îzinê bidin ku Xwedê wana bide xebatê, ku li wî cîhê bêav ava nûkirinê bîne, ew “cîghastî Misirê dibin”, sivikayê û jîyana hêsa digerin. Ew fem nakin, wekî ji wan gelek êtapên zîha Xwedê hazir dibe jîyanê bide wê dîtinokê, ya ku Ewî daye wana. Ez zanim, wekî her dem nîne ku usa dibe, çimkî carina Xwedê bona çûyîna li cîhekî nû me hazir dike û îzinê dide, wekî cîhê kevin zîhabe.

Tiştê herî girîng rêberbûna bi Ruhê Xwedêva ye. Heger Ew tu tiştî nabêje, wî çaxî bimînin û şerkariyê bikin.

Îshaq gura Xwedê kir û li wî welatî ma, li kîderê xelayî bû, û ev yek qewimî:

“Îshaq wî welatîda erdê xwe reşand, Xudan serda barand, ewî wê salê sed car ber hilda. Û Xudan ew dua kir. Û însan bilind bû û çiqas çû mezin bû, heta ku gelekî mezin bû. Û pez û dewar û gelek xulamên wî hebûn, filistînîya hevsûdîya wî kirin. Hemû ew bîrên

derbas nabe. Zêrandin li wir tu cara nasekinin. Doje ne ku bona min hatiye çêkirinê, lê bona mîrêcin. Lê belê, mîrêcin merivatî xapand û hemûya tevî xwe dibe li wir. Neniherî wê yekê, Îsa emirê Xwe da min: Efrandarê min jîyana **Xwe** da, bona ku **min** ji wî cîhî xilas bike.

Dema ku ez destpê dikim vî cûreyî bifikirim, wextê ku berê xwe didime Wî, wextê ku bi razîbûnê jîyanê dinihêrim, wextê ku ez jîyanê ji alîyê heta-hetayêda dinihêrim, nişkêva ew halê min minra awqasî girîng nayê texmînkirinê. Eva dermanê Şabûnêye xewile ye: ez wî hemû tiştî careke mayîn bîr tînim, bona çî ez gerekê razî bibim û berê xwe bidime Îsa.

ku hêna bavê wîda, ku xulamên bavê Birahîm kolabûn, filistînîya xitimandin, tijî xwelî kirin... Û Îshaq dîsa ew bîr vedan, yên ku hêna bavê wîda, Birahîmda, hatibûne vedanê, yên ku peyî mirina Birahîmra filistînîya tijî kiribûn, ewî dîsa ew navên ku bavê wî danûbûne ser, danîne li ser wan” (Destpêbûn 26:12-15,18).

Îshaq ew av dît, hewcê kîjana bûn zevîyên wî, dema ku careke mayîn ew bîr vedan yên ku filistînîya xitimandibûn. Usa jî hêna Îshaqda, ew ava ku gelekî me lazime, bona ku toximê Xwedêyî helal bighîje û dilên meda mezin bibe, gelek cara gerekê ji bîrên xitimandî bê hildanê. Filistînî hema merivên vê dinîyayê û sistêma wê bûn. Gelek cara, dema ku em gelekî nêzikî sistêma vê dinîyayê dibin, em fem nakin ku bîrên me çawa tên xitimandinê. Bêhesab girîng e, ku em bîrên xwe vekin, bona ku em avdana lazim û pêwîst bistînin.

Ez gumanim, wekî ketina qîmetîyên kûltûra vê dinîyayêye nava bedena Mesîhda gelek bîr “xitimandine”. Gelo diqewime, wekî civîn, ya ku gerekê bibe kanîya ava ku dikişe, bûye cîhekî bêav, çimkî îzin daye dijmin ku wî bicêrbîne, bîra bixitimîne?

Pirs ew e ku gelo Xwedê dikare civîna Xwe bi ava tezeva bide dasekinandinê?

“Xudanê timê rêberîya te bike,
qurlixîyêda wê têr bike,
wê hestûyên te bişidîne,
tê bibî mîna baxçê avdayî
û mîna kanîya av lê naçike.

Cimeta teyê wan xirabeyên berê ava bikin:

Wî çaxî tê hîmên ji gelek qurnada mayî bidî sekinandinê û wî çaxî
tê çawa çêkirçiyê sûra û çêkirçiyê mala eyan bî”
(Îşaya 58:11,12, NLT).

Îshaq qîrar kir berbi xwestinên xwe necedîne û neçû wî welatî, li kîderê jîyan hêsa bû. Heger em jî wî cûreyî berbi xwestinên xwe necedînin, anegorî xwestina xwe nejîn, lê qedirê Xwedê bigrin, emê

jî bibine mîna baxçê avdayî û kanîya ava jîyanê, avên kîjanê naçikin. Heger em bi cûrê xwestina Xwedê bikin, Ewê bi destî me ava Xweye jîyanê bide merivên zîhabûyî û tî.

Xwedê rêberîyê li me dike ku em bîra vekin, kîjan vê dinîyayê xitimandine. Ez biwekilînim, wekî bona wê yekê qewînbûn lazim e û diqewime gelek wede jî lazim e, lê ne ku çend sehet, roj, hevtê, meh û diqewime sal jî.

Windabûna aktîvîyê

Bi fikira min, min gelekî zelal vê kitêbêda da kifşê, wekî femdarîya ku çawa qûmistan tê navkirinê, alêgorîya ye, ya ku dikare derheqa gelek halada be. Ew hemû hal bi tomerî hildayî ewin, wextê ku em zîhabûnê û kêmasîyê texmîn dikin. Gelek cara, çawa sîgnal, qûmistan dikare halekî usa be, wextê kîjanê aktîvîya meye bona mîyaserkirina navê me û pêwendîyên tevî Xwedê, cedandina meye berbi wana zeyîf dibe, yan jî winda dibe.

Îzinê bidin bi kurtayî ez derheqa cêribandina xweye qûmistanêye duemîne mezinda bêjim, wextê kîjanê ez serwêrê qulixdarîya cahila bûm.

Neh mehên mine ewline li vê civîna li Florîdayê tê bêjî yên nebînayî bûn: qulix berfireh dibû, û koma cahila mezin dibû. Ez ruhdar bibûm, bi qewatê û aktîvîyêva tijîbûyî bûm. Feqet, nişkêva, ezmanê zelalda, tê bêjî mîna birûskê, hemû tişt sekinî û aktîvîya min, usa jî cedandina min, carekêra unda bûn.

Min himberî berê diha zêde dua dikir, lê dihate texmînkirinê ku tu tişt nediqewimî. Xêncî wê yekê ew dîtînok, ya ku bona qulixdarîya mine cahila bû, destpê kiribû bitemire (şeraba kevin dirijîya). Min çiqasî zêde dua dikir, ew dîtînok diha zêde ditemirî. Ji derva tu tişt nehatibû guhartinê, lê dilê minda tiştêk dihate guhartinê.

Bi vî hemû tiştîva tevayî, nava vî wedeyîda me cêribandinên usa didîtî, yên ku nava jîyana meda tu cara neqewimîbûn. Cêribandina here mezin kîjan bû? Serwêrê min dijî min îş vekiribû, bona ku min ji xebatê bida derxistinê. Kurê wî nava qulixdarîya meye cahilada bû, û wextê

êvarekê piştî qulixdarîya cahila, ew nêzikî jina min bû û gotê:

-Xanim Lîza, ez çawa anegorî terîfên Con bijîm, heger dê û bavê min li malê... dikin (hewce nîne derheqa wê yekêda bidime kifşê ku ewî çî got: ezê tenê bêjim, wekî ew yek ne tiştêkî baş bû)?

Lîza zendegirtî mabû, lê ewê bersiva serwaxt da:

-Tu hindava Xebera Xwedêda amin bimîne, û îzinê bide ku Xwedê tevî dê û bvê te bixebite.

Ji wê rojêda destpêkirî, serwêrê min qirar kir min bêqedir bike û ji min azad bibe. Ewî destpêkir dizîva dijî min êrîşa berfireh mîyaser bike. Ewî bi açîxî hevraqayîlnebûn di navbera serwêrê civînêyî mezin û mînda çê kir. Nava encamên wê yekêda, 16 hevtîya ser hev, ez qet carekê jî rastî serwêrê xwe nehatim û min wîra qise nekir.

Piştî xayîntîyên bi meha ser hev, serwêrê me qirar kir min ji xebatê bide derxistinê. Yekşemê, şebeqekê, ewî elam kir, wekî nava qulixdarîya cahilada wê guhartinên mezin hebin. Du birayên serwêr gotine min, wekî roja duşemê wê min ji xebatê derxin.

Xwedê ecêbek kir û serwêrê meyî mezin fikira xwe guhart. Nava we-dekîda, piştî berevbûna roja yekşemê, hetanî şebeqa roja duşemê, Xwedê wîra xeberda. Em rastî hevdu hatin û ewî got:

-Con, Xwedê tu şandî li cem me, û tu gerekê ji vir dûr nekevî, hetanî ku Ew nebêje ku wedê te hatîye.

Piştî wê rathatinê şeş meh derbas bûn û kirên serwêrê min eşkere bûn û piştra ew carekêra ji koma civînêye qulixê derxistin. Kirên wî diha giran bûn, ne ku yên ji me geleka, çawa ku dianîn li ber çavê xwe.

Nava wê êtapa jîyana mînda ez rastî ne tenê vê şerkarîyê, yan jî şerkarîyên der hatibûm, lê usa jî rastî gelek şerkarîyên hundur hatibûm, yên ku jîyana mînda tunebûne. Ez careke mayîn fikirîm, wekî diqewime pirsgirêk nava mînda bû û min destpê kir her gunehêkî xwe xwe mikur bêm, yên ku min anîne bîra xwe, lê him êrîş, him jî zîhabûn nedisekinîn.

Rojekê, dema ku min careke mayîn dicêriband fem bikira, wekî ji gunehên min kîjan bû menîya wê yekê, Xudan got: "Tu rûyê gunehkirinêda neketî vê qûmistanê. Ez te bona wê guhartinê hazir dikim, ya ku

wê nava jîyana teda hebe”. Eva ew “şeraba nû” bû, derheqa kîjanêda min serê kitêbêyî pêncada digot.

Piştî wê yekê, wextê ku êdî serê salekê bû ku ez wê qûmistanêra derbas dibûm, Xudan rêberî li min kir ku ez ji xurek rojîyê hildim. Piştî çend rojên rojîya, ji devê min duak derket, yê ku min bi guhên xwe bi-hîst, lê tenê piştî gotina xwe. Ew qîrîna ku ji dilê min derket, dora fikira minra derbas bû. Min bi kel û ced dikire qîrîn: “Xudan, girîng nîne ku ezê li qûmistanê bim, li kîderê tu kes tune, yan jî ezê bona mîlfiyona meriva terf bikim: ezê wê yekê li hedru cîha jî bikim: ezê berbi dilê Te bicedfînim.

Nişkêva, dilê minda tê bêjî ronahî şuxulî, û min fem kir ku Ewî çî dikir: “Xwedê te hema ev yek dilê minda dikir”,- min got. - “Te ez usa guhartime, wekî niha Tu yî mîrasa min û hizkirina mine ewlin, lê ne ku qulixa min, yan jî tişteki mayîn. Ê wextê ku guhartin bê, ezê wê yekê nekime pût. Ezê Te, huba xweye ewlin, bersedim, û dewsa hizkirina Te qulixê hiz nekim. Dilê min wê tabiya rastda bimîne”.

Nişkêva hate bîra min ku Xwedê derheqa Dawidda çî got:

“Gava ew avît, Dawid ser wan kire padişa, bona wî şedetî da û got: “Min Dawidê Yêşa, merîkî mîna dilê Xwe, dît, wê xwestina Min gişkî bine sêrî”” (Karên Şandîya 13:22, NLT).

Îzinê bidin ku ez careke mayîn tişteki girîng bidime kifşê: Şaûlê padişa tu cara qûmistanêra derbas nebibû. Pêşda ew çawa yekî şikestî dihate texmînkirinê: ewî xwe nava eşiyayên rêwîfîyêda ji pêxember veşartibû, wextê ku ew çawa padişa dane sekinandinê. Lê belê, piştî çend açixîya, nepaqijîyên wî eşkere bûn. Nava şerê mezinda ew gihîşte serkeftinê, lê ewî bi cûrê xwestina xwe kir û gura emirên Xwedê nekir. Tê bêjî ew yek bes nîbû, û ewî bona xwe heykel çêkir. Eva hela hê destpêka kirên wîye neheq bû. Bi kutasî, ew bona wan nepaqijîya wînda bû, dijî kîjana ewî tu tişt nekir.

Du tişt hene, yên ku wê eşkere bikin ku dilê weda çî heye. Ji wana yek ew agir e, yê ku paqij dike, derheqa kîjanêda me îdî gotiye. Yê mayîn

açixî ye. Firqî ew e, wekî açixî nepaqijîyên we li wan meriva eyan dike, yên ku dora wene, lê hûn hela hê mînanî merivekî kor wê yekê nabînin. Gelek qulixçî nava salên jîyana xweye pêşinda îzinê nadin ku ew agir nepaqijîyên wan dûr bixe. Lê belê, çawa şabûn ew tèn gazîkirinê û piştî hinek wede qulixada cîqê xwe digrin. Mixabin, ew wî cûreyî bona wê yekê hazirîya anegor nastînin. Açixî nepaqijîyên wana eşkere dike û paşê wê xebatê winda dike, bona kîjanê ew hatibûne gazîkirinê.

Şaûl “qulixa” xwe usa hiz dikir, wekî meriv dikuştin, bona ku ew qulix xweyî bikira. Dawid berbi text nedicedand: ewî berbi dilê Xwedê dicedand. Wextê cêribandina xweye li qûmistanê, Dawid kanîya şabûna xweye rast, Xwedê, dît. Du cara ewî dikaribû Şaûl bikuşt, bona ku li ser textê padişatîyê rûnişt, û merivên li rex wî jî digotine wî ku ewî usa bikira. Heger menîyên Dawid wî cûreyî bûna, çawa ku yên Şaûl bûn, ewê Şaûl bikuşt, bona ku ewî hemû tişt bistenda, çî ku Xwedê bi destî Samûêlê pêxember wîra soz dabû.

Hene mêr û jin, yên ku hazirin xirab xeberdin, buxdana bikin û derewa bikin, bona ku wê yekê çî ku Xwedê wanra soz daye bistînin: bifikirin, wekî çiqas tişteki xirab e. Ew mîna Şaûlin: ew hazirin hemû tiştî bikin, bona ku mîrasa xwe bistînin, yan jî xweykin. Xwedê wan Dawida digere, dilê kîjana berbi Wî dicedînin, lê ne ku berbi tabiyê, hukum, pera, yan jî rûmetê. Nava encamê çêkirina meşkêda şeraba kevinda xeysetê Xwedê nava meda diha kûr tê kifşê. Ew xeysetê Xwedê ye, yê ku dikare hukumê şeraba Ruhe nû xweyî bike (rûnkirin û hazirîya Wî). Xeysetê me çê dibe, wextê ku em li Wî digerin, peyî Kîjanî em dixwezî herin.

Hûn dikarin bipirsîn: “Çiqas wede bona wê yekê wê lazîm bê?”

Bersiva min vî cûreyî ye: hûn gerekê derheqa wê yekêda nefikirin ku çiqas wede wê bona wê yekê lazîm bê. Vedanê berdewam bikin hetanî ku av derê. Gelek cara wê usa bibe, wextê ku bersiv dema duakirinekê wê neyê. Hûnê mecbûr bin wê yekê berdewam bikin çî ku we destpê kirîye û diqewime wextê duayê mayîn jî, yan jî hela hê gelek duakirina, tu tişt tunebe.

Wextê ku ez li Dallasê dimam û çawa alîkarê serwêrê mezin û jina wî min qulix dikir, min tevî hevaleyê xweyî nêzîk, yê ku serkarê ad-

mînîstrasîya civînê bû, me tevayî her sibeh dua dikir. Her sibeh, seheta hevta, em dihatine oda duakirinê û me gelek cara texmîn dikir ku Xwedê li wir hazir bû û bona me dişuxulî. Lê gelek cara, wextê ku seheta heşt û nîv nêzik dibû (destpêka roja xebatê), û em mecbûr dibûn herine ofîsa xwe, me tê bêjî acizî texmîn dikir, çimkî avên ku nûbûnê tînin, tunebûn. Bîr hela hê nehatibûne vekirinê.

Rojtira mayîn em diketine wê odê û me dîsa ji wî cîhî berdeham dikir, li kîderê em sekinîbûn. Carina wê yekê du roja dikişand, lê carina jî sê roja. Tê bîra min ku carekê hevtêke tam derbas bû, lê avên ku nûbûnê tînin tunebûn. Lê belê, wextê ku terk lê diket, me qewat û nûbûn distend.

Bi rêwîtiya li Amêrikayê, li civîna, ez rastî gelek mesîhîya tîm, yên ku îzin dane ku bîrên wan bêne xitimandinê û ew jî nava wî halîda îzbatbûyîne. Tiştê herî xemgînî ew e, wekî ez texmîn dikim ku ne hindik meriv, lê piranîya wan meriva, nava wî halîdanin. Gelo wê çi biqewimîya heger wan meriva ew pêşkêşa ezmana gur bikirana, ya ku dilê wandane, û îzin bidanê ku ew azad bişuxulîya? Meriv, malbet, civîn, wê bihatana guhartinê: temamiya Amêrikayê wê bihata guhartinê.

Nava jîyana gelekada pêşkêşa Xwedê bêkar maye. Heger tê texmînkirinê jî ku bîr xitimîne, yek e, Ruh hîvîyê ye.

Vedanê berdeham bikin. Hûnê qûmistanêda ava nû bibînin.

RÊYA XUDAN HAZIR BÛKIN

“Dijwarî her dem tiştê ji nişkêva û nexwestinê ye. Ew dakrkir e û diz e, lê destên Xwedêda ew dibe tiştêkî usa, bi kijanî qewata Wîye nebînayî eyan dibe”.

- Çarlz Stênlî

“Ez rast bêxêlif wera dibêjim, ku Kur nikare xwe serî xwe tiştêkî bike, Ew tenê wan tiştên ku dibîne Bav dike, Ew jî dike. Bav çi dike, Kur jî usa dike”.

- Yûhenna 5:19



Qûmistan ew cîh e, li kîderê rêya Xudan tê hazirkirinê, li kîderê her çîyak nimiz dibe, û her gelîk bilind dibe. Nava evê beşa eyanda Îşaya vê yekê zelal şirove dike:

“Dengê ku li qûmstanê bang dike:

“Rêya Xudan hazir bikin, û rêya nava çolêda bona Xwedêyê me rast bikin.

Her gelîk wê bilind bibe,

û her çîya û top wê nimiz bin,

û her cîhekî xar wê rast bibe,

û cîhên nerast wê bibine cîhên rast.

Û gerekê rûmeta Xudan dîyar bibe,

û her bedenek gerekê bi hevra bibînin,

çimkî devê Xudan gotiye”.

Dengek dibêje, gazî bike.

Û ewî got, çi gazî bikim?

“Vê yekê bêje ku hemû beden gîha ye,

û temamîya bedewîya wî

mîna kulîlka zevîyê ye.

Gîha hişk dibe, kulîlk diçilmise,

çimkî bêhna Xudan hate li ser.

Bi rastî cimet gîha ye.

Gîha wê hişk bibe, kulîlkê biçilmise,

lê xebera Xwedêyê me wê heta-hetayê bimîne”” (Îşaya 40-3-8).

Fikira vê yekê bona wan meriva çi ye, yên ku li qûmistanêne?

Nava bedena Mesîhda borcdarîyên me hemûya jî hene, kîjan Xwedê bona me qîrar kirine. Lê belê, pêşîya ku Xwedê îzînê bide ku em wana mîyaser bikin, em gerekê li qûmistanê bêne kontrolkirinê û hazirkirinê, li kîderê bedena me tê xaçkirinê. Li wir em usa jî hîn dibin hîvîya Xudan bisekinin, bêdeng bibin, hetanî ku dengê Wî bibihên û fem bikin ku Ew çi dike, bona ku em bi cûrê şikestî xwestina Wî bikin.

Ez dixwezim diha zêde derheqa jîyana xweda gilî bikim, bona ku nîşanî we bidim, wekî rêya nav qûmistanêra her dem nîne ku ji cîhekî hetanî cîhekî mayîn rast e, lê ew dikare li ser rêya xwe hinek rêyên şaş û çîhên hêsbûnêye neprogiramkirî raber bike.

Sala 1979-a, wextê hînbûna li ûnîvêrsîtêta “Pûrdyû”-ê ez li avayê ûnîvêrsîtêteyê cîhê mayîna xortada careke mayîn hatime dinîyayê. Piştî çar meha, ez bi Ruhê Pîrozva tijî bûm û Xwedê destpêkir minra derheqa qulixkirina bo Wî bêje. Ez we didime bawarkirinê, wekî qulix nedikete nava progiramên min: min nedixwest wê yekêva bihatama girêdanê. Ew hemû qulixçîyên ku min salên xortanîyêda nas dikirin merivên usa nîbûn, wekî min bixwesta bibûma mînanî wan. Ez zanim, wekî ew yek fikireke pêşda qîrarkirî bû, lê bona min ew meriv yên ji rastîyê dûr bûn, zarokên kîjana cûrekî mayîn bûn û ew malên xirabêda diman. Bêguman, min paşê fem kir, wekî fikirên min tevlîhevbûyî bûn, çimkî gelek qulixçîyên serwaxt hebûn, zarokên kîjana baş bûn û ew jî malên çêkirîda diman. Dema ku ez teze bûme bawarmend, ez difikirîm, wekî qulixçî ew e, yê ku bi jîyana tamva najî, yan jî meriv here Afrîkayê û li wir cîhekî xirabda bijî û qet cote solê wî jî tune bin.

Ez li bajarekî biçûk mezin bûme, binelîyên kîjanî sê hezar meriv bûn. Min qulixçîk nas dikir, yê ku katolîk bû (û ew bona min mînak nîbû, çimkî îzîna wan tunebû bizewicîyana), ew serwêrê civîneke biçûk bû. Du zarokên wî hebûn, yên ku qasî min bûn û ew cûrekî başqe bûn, û wextê ku ez diçûme mala wan, min bêhneke gelekî xirab texmîn dikir. Carekê, wextê ku ez li mala wan bûm, ew bêhna xirab awqasî zêde bû, wextê min bêhna xwe girt, çiqasî min karibû, û min menîk girt ku ji cem wan herim. Dêmek, hûn dikarin fem bikin, ku bona çi hewaskarîya mine

mezin bona qulixkirinê tunebû. Min nedixwest ez bibûma serwêr û zarakên mine cûrekî mayîn hebûna û ji mala min jî bêhneke xirab bihata. Min usa jî nedixwest ez bibûma mîsyonêr, biçûma Afrîkayê û jîyana xwe bin çadirekêda ser hevda bianîya.

Wî çaxî min progiram kiribû, ku ez ûnîvêrsîtêya “Pûrdyû”-ê, fakûltêya maşîneçêkirinê demam bikim û paşê dereca magîstrê serkarîkirinê ji ûnîvêrsîtêta “Harvard”-ê bistînim. Piştî wê yekê ezê hevaltîke amêrikîye mezinda derbasî li ser xebatê bûma, bighîştama qulixeke serkarîkir, minê gelek pere qazinc bikirana û minê piştgirî bida civîna xwe. Min usa têra didît, û min gotinên Xwedê hesab hilnedidan, yên ku derheqa qulixêda bûn (nava vê progiramêda tu tiştêkî xirab tune: awqasî Xwedê bona min tiştêkî başqe qirar kiribû).

Piştî çar meha, sibeha yekşemê, ez li civînê bûm û min terîfa serwêrê xwe guhdar dikir, dema ku Ruhê Xwedê gelekî berk eşaretî da min: “Min gazî te kirîye ku tu terîf bikî. Bersiva te kîjan e?”. Wî çaxî min zelal dengê Wî bihîst û min got: “Xudan, heger ez mecbûr bibim li Afrîkayê jî bijîm, û bêyî sol bim û mala ji gîhê çêkirîda bim, ezê terîf bikim û gura Te bikim”. Xwedê zane guhdarîya me çawa teglîf bike. Nava mehên derbasbûyîda, dema ku gotinên Wî usa bi hukum nîbûn, min êdî bahê qulixê hesab dikir. Niha, min qîrara xwe bi temamî fem dikir û ez hazir bûm Wî bidime razîkirinê, nenihêrî bahê ku min gerekê bida.

Xudan destpê kir min hazir bike. Agirê dilê minda dişuxulî. Min destpê kir bona xortên ku tevî min hîn dibûn derheqa Îsada gilî bikim û gelek xilas bûn. Piştî sal nîvekê, min destbi dersên lêkolînkirina Încîlêye li avayê ûnîvêrsîtêyê jîyînê kir, û ji temamiya ûnîvêrsîtêyê xwendikar dihatine wan dera. Her hevtê merivên nû Mesîh qebûl dikirin, qenc dibûn û azadî distendin.

Min pirsên xweye pêşin guhartin. Xwestina terîfkirinê dilê minda usa gewat bibû, wekî min dixwest ûnîvêrsîtêya “Pûrdyû”-ê bihişt, fakûltêya maşîneçêkirinê demam nekira, û biçûma mekteba Încîlê. Fikirdarîya min ev bû: bona çî lazim bû matêmatîka û fîzîka lêkolîn bikira, heger ez bona terîfkirinê hatibûme gazîkirinê, lê meriv dimirin û ew diçûne dojê. Îsayê zûtirekê vegeerîya: dêmek, ez gerekê lez biçûma deştên çandinê.

Êvarekê, dema ku min xebatên xwendinêye li malê dikirin, yên ku min êdî hiz nedikirin, min serê xwe ji ser kitêbê bilind kir û Încîla li ser dextlê nihêrî. Ez êdî ji dersên xwe westîyayî bûm. Min kitêba xweye dersê kewkî berbi dîwêr kir. Min qîrar kir, wekî ez gerekê êdî hîvîyê nesekinîyama: min gerekê ûnîvêrsîtê berda û biçûma mekteba Încîlê.

Min wî merivîra têlêfon kir, yê ku ez hîn dikirim: ew li ûnîvêrsîtêya “Pûrdyû”-ê lêkolîner bû û hevalê minî nêzîk bû. Min gote wî:

-Don, ezê xwendina xwe berdim û herim mekteba Încîlê.

Ewî bi cûrê serwaxt got:

-Were, îro êvarê em herin bigerin û bona wê yekê dua bikin.

Me usa jî kir, û Xwedê gote min: “Tê nava wedê ku Min qîrar kirîye qulix bikî... Xwendina xwe ser hevda bîne”.

Hinek wede nava fikirdarîya minda şerkarî destpê bû: ez difikirîm ku gelo Xudan wê xortekî ku li bajarekî biçûk mezin bibû, bişanda welatên cuda-cuda? Û min dengê Wî bihîst: “Kê program kirîye û ew qulix qîrar kiriye, bona kîjanê tu hatî gazîkirinê, te yan Min?”.

“Te”, - min gotê.

“Tu nafikirî, wekî Ez diha gelekî bona pêşdihatina wê qulixêda xemgînim ne ku tu?”. Gotina Wî guhdarîya min bire li ser wê yekê.

Bi vî cûreyî ez hêsa bûm û min fakûltêya maşîneçêkirinê demam kir. Piştî demamkirina xwendinê, ez carekêra li hevaltîya “Rokfêl întêrnêyşinil”-ê, çawa înjênêrê mêxanîkî, nava projeyeke qewatên leşkerîye behrêda, carekêra hatime hildanê li ser xebatê. Ez cîguhastî li wî bajarî bûm, li kîderê ez gerekê bixebitîyama, û li wir min civîneke gelekî baş dît. Piştî salekê ez û Lîza zewicîn.

Ez gihîştibûme wê civînê, wextê ku ez hela hê nezewicî bûm, û min li her cîha qulix dikir, li kîderê hewcetîya qulixkirinê hebû. Wê yekê usa jî piştî zewaca me berdewam kir. Ez qulixçiyê qeyde-qanûnê bûm, diketime nava qulixdarîya hebsa, min zarokên serwêra hînî tênîsê dikir û gelek pirsada min alî wan dikir. Mekteba vê civînêye Încîlê hebû, û ez diçûme dersên êvarê.

Piştî du sala civînê ez hildame li ser xebatê çawa alîkarê serwêrê mezin û malbeta wî. Min gote serwêr û qulixçiyên mayîn, wekî min

dikaribû tenê salekê bixebitîyama, çimkî ez bona terîfkirinê hatibûme gazîkirinê. Diketine nava borcedarîyên min şuştina erebên serwêrê min û jina wî, bênzîn dagirta wan ereba, solên serwêr paqij bikirana, şuxulên hûr bikira, zarokên wana ji mektebê bibira malê, ew hîn xweavêxistinê bikira, terîfkirên mêvan qebûl bikira û tiştên mayîn. Dewsa salekê, ez wê qulixêda çar û nîv salî mam.

Êdî hevt sal ji wê rojê derbas bibûn, dema ku min banga Xwedê qebûl kiribû. Wextê ku ez li ûnîvêrsîtêyê bûm, min didît ku xwendikar çawa xilas dibûn, qenc dibûn û azad dibûn, ez difikirîm ku tenê roj mane ku ez derbasî qulixa tam bibim. Min derheqa vê yekêda nizanibû, wekî Xwedê çawa ez pêşda dibirim.

Wextê qulixkirina li wê civînê, min sê cara bi cûrê neaçix cêriband derbasî li ser qulixa tam bibim. Dema ku ez bi teyarê ji Asîyayê paşda vedigeriyame Dallasê (ew cara sisîya bû ku min dicêriband bidîta, ku gelo ew cîh bû, yê ku Xwedê bona min qîrar kiribû) û min Mizgînîya Yûhenna dixwend, ez gihîştîme xeberekê, ya ku tê bêjî ji rûpelê derket: “Xwedê merivek şand, Yûhennayê Nixumdar” (Yûhenna 1:6, NLT). Min dengê Xwedê bihîst: “Tu dixwezî *ji alîyê Con Bîvêrda* bêyî şandinê, yan *ji alîyê Minda*?”.

“Ez dixwezim ji alîyê Teda bême şandinê”.

Û Xudan got: “Baş e, çimkî heger tu ji alîyê Con Bîvêrda bêyî şandinê, tê bi hukumê Con herî, lê heger tu ji alîyê Minda bêyî şandinê, tê bi hukumê Min herî”.

Peyîra ez dîsa hêsa bûm û min guhdarîya xwe da li ser wî cîhî, li kîderê Xwedê ez kifş kiribûm. Lê belê, piştî hinek wede nerihetîya min dîsa paşda vegeirîya. Hazirîya mine li qûmistanê hela hê ser hevda nehatibû: ew hela hê pêşda diçû.

Gelo Xwedê “ez kiribûme dextlê” nava wan hevt salada û hîvîya cîhê qulixa vala bû? Na xêr, hezar carî na xêr. Ez hatibûme birinê li wê qûmistanê, bona ku di minda xeysetê xwedêparêzîyê çê bibûya... bona ku rêya *Wî bihata hazirîkirinê*. Xeysetê min gerekê bighîştî, bona ku ez nava wê qulixêda rast bixebitîyama, bona kîjanê ez hatibûme gazîkirinê. Paşê min fem kir, wekî pêşîya gihîştina dereceke ruhanîye nû, şuxulkarîya hazirbûnê bona wê derecê lazim bû.

Derheqa qulixa bi qewatên xwe bîr bikin

Nenihêrî wê yekê, ku meremên me çiqasî başin, bêyî tevbûna Xwedê, em nikarin tişteki usa bikin, qîmetê kîjanî yê heta-hetayê ye, nikarin hetanî bi navê Îsa jî bikin. Xudan bi xwe got: “Ez rast bêxêlif wera dibêjim, ku Kur nikare xwe serî xwe tişteki bike, Ew tenê wan tiştên ku dibîne Bav dike, Ew jî dike. Bav çi dike, Kur jî usa dike” (Yûhenna 5:19).

Gotineke çawa ye! Îsayê Kurê Xwedê got, wekî Ewî nikaribû bi Xwe *tu tişteki* qîmetlû, bêyî însîyatîva Wî, bikira. Ezê çend mînaka bînim ber çava, bona ku bidime kifşê ku çi dixwezim bêjim.

Îsa Lazar û herdu xwîşkên Wî Meryem û Merta gelekî hiz dikirin, yê ku ji Beytanyayê bûn. Feqet Lazar giran nexweş ket û ev yek qewimî:

“Awa her du xwîşka Îsara cab şandin û gotin: “Xudan, va ewî ku Tu jê hiz dikî, nexweş e”. Îsa gava ev yek bihîst got: “Ev nexweşîya mirinê ye, lê bona rûmeta Xwedê ye, wekî bi wê yekê rûmeta Kurê Xwedê bilind bibe”. Îsa Merta, xwîşka wê û Lazarê birê wan hiz dikirin. Lê gava Wî bihîst ku Lazar nexweş e, Ew, du rojên din jî li wî cîhî derengî bû” (Yûhenna 11:3-6).

Nenihêrî wê yekê, wekî Îsa Mesîh bû, hevalên wîye nêzîk jî hebûn. Ewî Lazar hiz dikir û malbata wîra nava pêwendiyên başda bû. Lê belê, em dibînin, wekî wextê ku Îsa derheqa nexweşîya hevalê Xweda bihîst, du roja tu tişt nekir. Bona çi Ew ji Beytanyayê lez neçû? Menî ew bû, wekî Ewî ji Xwedê temî nestend. Îsa hîvîyê bû, hetanî ku ji Ruhê Xwedê temî bistenda. Dema ku ew yek qewimî, Ew çû.

Carekê, Xudan nîşanî min da ku heger Lazar hevalê min bûya, ezê carekêra bi erebê biçûma mala wî û minê destên xwe bidana li ser wî, bêyî fikirdarîya derheqa hîvîkirina rêberîya Ruh. Mixabin, gelek ji me usanin. Em difikirin, wekî Xwedê her dem tevî me ye û hewce nîne ku em nava halên wî cûreyîda rêberîya Wî hîvî bikin. Feqet, em gerekê bisekinin û hindava Ruhê Xwedêda hişyar bin. Xwedê zane ku Ew çi dixweze, û heger em hîvîyê bisekinin, hetanî ku emirkinên Wî pê bihesin ku dilê Wîda derheqa wê pirsêda çi heye, Ewê bêje me ku em çi bikin.

Diqewime em difikirin, wekî heger em bêyî rêberîya Ruh meriva nav bikin, Xwedê borcdar e hema wê demê wana qenc bike. Heger usa ye, gelo hêja nîne herine hemû nexweşxana û wana ji nexweşa bidine valakirinê?

Hinek cara Încîl dibêje, wekî Îsa “hemû qenc kirin”, lê her dem nîne ku usa dibe. Mînak, bona çî Îsa hemû nexweş, kor, seqet û sûqet li Beytlatayê qenc nekirin, lê tenê merivek qenc kir, yê ku 38 sala seqet bû (binihêre Yûhenna serê 5-a). Gelo dibe ku Ruhê Xwedê rêberîya Wî nekir, ku Ewî merivên mayîn qenc bikirana?

Çawa mînakeke mayîn, ya derheqa merivekîda, yê ku ji roja xweye bûyî seqet bû, û ew her roj dibirine li ber dergehê paristgehê. Bêşik, Îsa her car li rex wîra derbas bibû, wextê ku Ew ketibû paristgehê. Bo çî Ewî ew qenc nekir? Çimkî Bavê Wî *emir nekiribû ku wî merivî qenc bike*.

Diha dereng, peyî wê yekêra, wextê ku Îsa hate jorhilatinê, Petrûs û Yûhenna çûne paristgehê û bi rêberîya Ruh ew meriv qenc kirin, û bi wê yekê destpêka hişyarbûnê dan (binihêre Karên Şandîya, serê 3-a).

Dema ku Îsa qulix dikir, tu qanûneke zelal tunebû: Ewî tûyî li ser çend meriva dikir, yên mayîn nav dikirin, lê hinekara digot. Carekê Ewî ji heriyê glofîk çê kirin û çavên merivekî xistin. Hebûn meriv, wekî Ewî dişande li cem kahîna, û vî cûreyî...menîya vê pircûretiyê balkêş e, wekî Îsa tenê ew yek dikir, çî ku Ewî didît ku Bavê Wî dikir. Xwedê bona her halekî wedê wîyî rast zanibû û ew cûre jî zanibû, bi kîjanî her kes dikaribû qencbûn bistenda.

Xwedê hema vê yekê bona hemû xulamên Xwe dixweze...me bike cûrekî usa ku em tenê wê yekê bikin, bo ku em bibînin ku Îsa çî dike û bi rêberîya Wî bikin, lê ne ku wê yekê bikin, çî ku em difikirin, yan jî dixwezîn. Îsa Yûhenna 20-21-da dibêje: “Çawa ku Bavê Min Ez şandim, Ez jî wera dişînim”. Îsa bêyî rêberîya Bavê xwe tu tişt nekir. Em jî gerekê wî cûreyî peyî mînaka Îsa herin. Em gerekê mîna Wî bijîn, bi rêberîya Ruhê Pîroz û tenê bi rêberîya Wî bikin. Bona wê yekê pêwîst e, wekî bedena me gura Ruhê Xwedêda be, Ruhê Mesîh. Cîhê herî baş, li kîderê em dikarin bi rêberîya Ruh jîyanê hîn bibin, qûmistan e. Li vî cîhê dijarîyava tijî rêya Xudan tê hazirkirinê.

Piştî hazirîya li qûmistanêye çil salî Xwedê Mûsara got:

““Niha were ez te bişînime cem firewin, ku tu cimeta Mîn, zarokên Îsrayêl, ji Misirê derxî”?. . hingê Mûsa gote Xwedê: “Ez kîme ku herime cem firewin û zarên Îsrayêl ji Misirê derxim?”. Xwedê gotê: “Ezê tevî te bim”” (Derketin 3:10-12).

Niha em vê yekê himberî hev bikin, ku Xwedê derheqa wan merivada çî got, kîjana bi xwe xwe şandibûn:

“Min ew pêxember neşandine, lê ew xwexwe bezîne, Mîn wanra tu tişt negotîye, lê wana xwexwe pêxembertî kiriye... Ez miqabilî wan pêxemberên xewinên derewim,- Xudan dibêje,- yên ku bona wana gilî dikin û cimeta min bi derew û culetîya xwe dixalifin. Min ne şandine, ne jî emir li wan kirîye, lema ewê tu karê nedine vê cimetê,- Xudan dibêje”, (Yêrêmîya 23:21,32).

Çiqasî berk e! Tu kes wê nexweze ji Xudan banga wî cûreyî bistîne.

Çîsalîyêda, dema ku Mûsa cara ewlin cêriband zarokên Îsrayêl azad bike, ewî nikaribû ew yek bikira, yan jî *kar bida* wana, çimkî *Xwedê ew neşandibû*. Hetanî bi xwendina baş, bi serwaxtî cêribandina xweye rêbertîyê jî, kîjan ewî li Misirê standibû, bêyî piştgirîya Xwedê û wedê ji alîyê Wîda qirarkirî, Mûsa nikaribû ew yek bikira bona çî çawa ku *ewî zanibû*, Xwedê gazî wî kiribû. Nava encamên cêribandina bêçaixda tenê desthilatdarekî Misirê mir. Neniherî wê yekê, wekî meremên wî yên baş bûn, cêribandina mîsîya wîye ewlin diha gelekî zyan da, ne ku kar da. Piştî hazirbûna qûmistanîyeye çil salî, Mûsakî nû pêşda hat, yê ku bêyî temîyên Xwedê wê tu tişt nekira. Niha, dema Xwedêye qirarkirîda, bin rêberîya Mûsada eskerekî tam bin behra Sorda eyan bû. Awa firqîya di navbera qewata me û qewata Xwedêda: leşkerek himberî eskerekî tam.

Yûhennayê nixumdar 30-î salî bona qulixekê hazir bû, ya ku şeş meha kişand, lê Îsa got, wekî Yûhenna nava ewên ku ji jinê xulîqîbûn, pêxemberê herî mezin bû.

Tiştêkî balkêş e, wekî Xwedê nava şeş mehada dikare bi destî mêr,

yan jî jineke *ji alîyê Xweda şandî* zêde bike, lê ne ku kesek bi *qewatên xwe*, nenihêrî wê yekê, wekî 60 salî ser hev ew bi kel û ced dişuxule.

Hema derheqa wê yekêda Îsa dibêje:

“Ez rast bêxêlif wera dibêjim, ku Kur nikare xwe serî xwe tiştêkî bike, Ew tenê wan tiştên ku dibîne Bav dike, Ew jî dike. Bav çî dike, Kur jî usa dike” (Yûhenna 5:19).

Em careke mayîn xeberên Îşaya pêxember bixwînin:

“Dengê ku li qûmstanê bang dike:

“Rêya Xudan hazir bikin,

û rêya nava çolêda

bona Xwedêyê me rast bikin.

Her gelîk wê bilind bibe,

û her çîya û top wê nimiz bibin,

û her cîhekî xar wê rast bibe,

û cîhên nerast wê bibine cîhên rast.

Û gerekê rûmeta Xudan dîyar bibe,

û her bedenek gerekê bi hevra bibînin,

çimkî devê Xudan gotiye”.

Dengek dibêje, gazî bike.

Û ewî got, çî gazî bikim?

“Vê yekê bêje ku hemû beden gîha ye,

û temamiya bedewîya wî

mîna kulîlka zevîyê ye.

Gîha hişk dibe, kulîlk diçilmise,

çimkî bîna Xudan hate li ser.

Bi rastî cimê gîha ye.

Gîhayê hişk bibe, kulîlkê biçilmise,

lê xebera Xwedêyê me wê heta-hetayê bimîne” (Îşaya 40:3-8)”.

Xwedê dibêje, wekî qûmistan ew cîh e, li kîderê rêya Xudan tê amadekirinê. Rêya Xudan qewata merivatîyê nîne. Ew dibêje, wekî kubarîya bedenê wê nimiz bibe, yên şikestî (yên ku hîvîya Xudanin) wê bilind bibin, yên xar (fêlbaz, nerast û nepaqîj) wê rast bibin, û yên xa-

ro-marò (ji hizkirinê dûr, hişk û berk) wê bêne rastkirinê.

Salên xwendinê, dema ku min ji nûva destpê kiribû peyî Îsa herim, min gelek dua stendibûn û bi qulixkirina bona meriva gihîştibûme “açixîyê”, lê nava jîyana minda çîya hebûn, yên ku gerekê nimiz bûna û cîhên xar û nerast hebûn, yên ku gerekê rast bûna. Xwedê zanibû, wekî min gerekê wede qûmistanêda derbas bikira, bona ku min kêmasîyên xwe rast bikirana.

Wextê her cêribandineke li qûmistanê ew yek gelekî girîng e, ku îzinê bidin ku Xwedê nava jîyana meda usa bişuxule çawa ku Ew dixweze. Wextê ku min li Dallasê qulixî serwêrê xwe dikir, rojekê Xudan minra xeberda: “Con, wê yekê tê bernede çî ku Ez dixwezim dilê teda îro bikim, bi hîvîyêsekinandina qulixa Xweye terîfê, ya ku wê sibê bê. Bi rastî min awqasî dixwest terîf bikira, wekî min ew beşa jîyana xwe çawa wedê badîhewa derbazkirî hesab dikir.

Qûmistanê çawa derbas bibin

#11 Çentên xwe hazir xweykin

Nenihêrî wê yekê, wekî minê tu cara pêşnîyar nekira ku we usa bikira, wextê ku wedê qûmistanê dirêj dibe û tê bêjî ewê tu cara xilas nebe, diqewime we qîrar kiriye çentên xwe vekin û li vir îzbat bibin. Li min guman bin, wextê ku Xwedê qîrar bike ku hûn cîguhastî bin, Ew dikare wê yekê carekêra bike. Serhatîya Ûsiv bîr bînin: tê bêjî ew gerekê hetanî dawîya jîyana xwe hebsêda bima, lê bêyî eşaretî, nava rojekêda ew gihîşte wê xiyalê, ya ku Xwedê dabû wî. Belê, hema usa: nava rojekêda.

Nava qûmistanêke minda dihate texmînkirinê, wekî ez gerekê nava çil salên bi sirêda bimama. Lê nişkêva, Xudan bi cûrê berk gote min ku ez gerekê qulixa xweye niha bihêlim û bibime terîfkirê gerok. Ew guhartin carekêra neqewimî, lê wextê ku ew yek qewimî, ew mîna bobelîskê hat. Ez hazir bûm ku derbasî êtapa navê xweyî nû bûma. Çentên min berevkirî bûn

Hewce nîne ku em bikevine vê telê. Fem bikin, wekî Xwedê *wede unda nake*. Ew *wede bi cûrê kardar* dide xebatê. Wê yekê fem bikin ku hûn li kîderêne, ew beşa navê weyî girîng e. Ew cîhê weyî hazirbûnê ye. Ew rêya ji soz berbi pêşkeftinê ye, mîyaserbûna soz e. Îzinê bidin, wekî Ew derheqa wê yekêda nerihetbe, ku ew hemû tiştê awa bê stendinê û bê sêrî...lê hûn tenê tevî Wî gav bidin. Ew e Xwedê, Femandar û Mîyaserkirê me. Em gerekê li Wî guman bin û gura wî hemû tiştî bikin, çî ku Ew *roja îroyîn* nîşanî me dide.

Her car, wextê ku ez difikirîm, wekî min fem kiribû ku Ewê çawa ez nava qulixa terîfkirinêda îzbat bikirama, Ewî bi hizkirin digot: “Con te rêyek jî dîtîye, bi kîjanê ew yek wê neqewime”. Ew yek ne rast bû: Ewî ew qulix nişkêva da min. Xwedê me dike merivê razî (ne ku yê ji xwe razî), bona ku em bi wedê nihava bi cûrê tam bijîn.

Hemû tiştî bi cûrê xwestina Xwedê bikin

Wextê ku Xwedê hukum û qewata Xwe dide merivekî, û ew hukumê dayî bi çiqasîva mezin e, bi awqasîva bona gurênekirina li Ruhê Xudan dîwan mezin e. Xwedê Mûsa çilsalîyêda gunehkar nekir, wextê ku ewî bi xwestina xwe kir, çimkî nava jîyana wîda hela hê hukum û qewata Xwedê tunebûn. Lê belê, paşê hemû tişt hate guhartinê. Dema ku Îsrayêl li qûmistana Sînayê bû, cimeta ber gilîyê Mûsada hat û rûyê wî cîhîda gazinê xwe kir, li kîderê ew tevî Îsa hatibû. Ew tî bûn û av dixwestin. Ê Xwedê gote Mûsa ku ewî gerekê çî bikira:

“Xudan Mûsara xeberda û got: “Şivdarê hilde, tu Harûnê birê xweva civînê bicivînin, li ber çavên wana qeyêra xebardin, ku ew ji xwe avê hilde. Ê tê bona wan avê ji qeyayê derxî, ku civîn û heywanên wan bidî vexwerinê” (Jimar 20:7,8).

Xwedê temî da Mûsa ku qeyêra xeberde, bona ku ew avê bide. Lê bixwînin Mûsa çî kir.

“Mûsa destê xwe bilind kir û bi şivdara xwe du cara qeyê xist û bêhesab av derket, civînê û heywanên wan vexwerin. Xudan gote Mûsa û Harûn: “Çimkî we bawarîya xwe li Min neanî û pîrozîya Min zarên Îsrayêlva eyan nekir, lema hûn vê civînê nabine li erdê ku Min da wan”” (Jimar 20:11,12).

Guhdarîyê bidine li ser wê yekê, wekî Xwedê av da bi mîlfiyona meriva, yên ku li Mûsa dinihêrîn. Tiştê ecêbmayîne ye! Av ji qeyê: kê sedsala 21-êda derheqa ecêba wî cûreyîye qewatda bihîstîye? Bi wî cûreyî, nenihêrî wê yekê, wekî Mûsa gura temîyên Xwedê nekir ku çawa avê ji qeyê derxe, lê ew ecêb qewimî. Av bona cimetê çawa bersiva hewcetîya wê têra hatibû dîtinê. Xwedê cimet ji avê miqûf nehişt bona ku Mûsa ceza bikira. Lê belê, ew kirin bê encam nema: Xwedê îzin neda Mûsa ku rêberîya cimetêye berbi welatê Sozdayî bike.

Eva mînakeke baş e û derheqa wê yekêdane, wekî qewata Xwedê bona hewcetîyên meriva têra hatîye dîtinê, lê ne ku bona mezinkirina merivê ku pêşkêşa wî hebû. Diqewime Mûsa li ser cimetê hêrsketî bû û hinekî jî li ser Xwedê hêrsketî bû, çimkî ew mecbûr bû serwêrîya cimetêke wî cûreyîye bêterbe bikira. Mûsa hema wî cûreyî qeyê xist, çawa ku ewî li qûmistana Sînê pêşda kiribû (binihêre Derketin 17:1-7). Yan jî, diqewime Mûsa destpê kiribû diha sivik nêzîkî karebûna xweye rêberkirinê bibe: diqewime ew difikirî, wekî Xwedê wê qedirê wê yekê bigirta, çî ku ewî wê rast hesab bikira. Ewî dîsa bi cûrê xwestina xwe kir, lê encamên wê gelekî giran bûn. Mûsa bi qewat û karebûna Xwedêva bû: kanîya qewatên wî girêdana wîye ji Xwedêva bû. Ew yek, wekî Mûsa bêyî Xwedê li ber cimetê çî kir, bû dîwana lez.

Awa bona çî Aqûb 3:1-da nivîsar e: “Birayê min, bila gelek ji we nebîne dersdar, bi zanebûna wê yekê, wekî emê dîwana diha berk qebûlkin” (NKJV). Cabdarî yan rûmet bi çiqasîva zêde ye, bi awqasîva jî dîwan mezin e.

Qûmistan me hazir dike, ku em nava qewat û rûmeta Xudanda bişuxulin, bêyî sekinandina li ber dîwanê rûyê gurênekirinêda. Nava cêribandina qûmistanêye hişkda kubarî nimiz dibe, lê şikestîbûn bilind dibe.

Merivê bi rastî şikestî usa dijî çawa ku Îsa bû. Ew dike qîrîn: “Ezê tu tiştî nekim, hetanî ku nebînim ku çawa Ruhê Xwedê dike. Ez bi karebûn û qewata xwe tişteke nînim”.

Gelo ew yek tiştê bûyînê ye, wekî nava rojên meda Xwedê bi destî geleka rûmet û qewata Xwe eyan nake, çimkî Ew me ji dîwana diha mezin diparêze. Ez bawar dikim, wekî li qûmistanê Ew tebyeta bedenî ji ruh cuda dike, usa dike ku gazî Wî bikin û guhdarîya Wî bikin. Wî çaxî, wextê ku wedê eyanbûna rûmeta Wî bê, emê qedir bidine navê Wî û tenê *bi cûrê* xwestina *Wî* bikin.

Dengê Ruh guhdar bikin. Îzinê bidine Wî ku nîşanî we bide ku çawa Ew dixweze hûn wî karî bikin, yê ku Ewî bona we hazir kirîye. Binihêrin û guhdar bikin ku Xudan çi dike û çi dibêje:

“Ezê li cîhê xweyî nobedarîyê bisekinim û ji wê bilindayê dîna xwe bidimê. Li wir ezê bisekinim bona ku bibînim ku Xudan çi dibêje û Ewê çawa bersiva gazina min bide. Û Xudan gote min: “Bersiva Min bi cûrê zelal li ser texte binivîse bona ku yê ku direve, bikaribe banga rast bighîne yê mayîn, çimkî ev dîtîna bona wedê pêşerojê ye. Ew dawîyê şirove dike û ewê mîyaser bibe. Heger ew egle bibe jî, bi sebir hîvîyê be, çimkî ewê ese biqewime. Ewê derengî nekeve. Dîna xwe bide yê kubar. Ew li ser xwe gumanin û jîyana wan paqij nîne. Lê yê heq wê bi aminaya xweye hindava Xwedêda bijîn”” (Hebaqûq 2:1-4, NLT).

Pêxember got: “Ezê binihêrim, wekî bibînim ku Xudanê çi bêje min”. Ji wan cûra yek jî, bi kîjana Ruhê Xwedê dibêje, dîtînok e. Îsa got, wekî Ewî tenê ew yek fikir, çi ku *didît* ku Bavê Wî fikir. Hebaqûq got, wekî ewê dîtînen xwe binivîse û wê wedê qirarkirîda bi dîtîna xwe bireve. Ewî got, wekî merivê kubar nerast e (dêmek, ew meriv hîvîya Xebera Xudan nasekine, jê direve, bêyî dîtînoka derheqa wê yekêda, ku Xwedê çi dibêje). Lê merivê heq wê bi bawarîya xwe bijî, lê ne ku bi bawarîya merivekî mayîn.

Bawarî wî çaxî tê, wextê ku em wê yekê dibihên, çi ku Xwedê dibêje, lê paşê gura wê yekê dikin. Awa bo çi Xwedê zarokên Îsrayêl

birine qûmistanê, "...bona ku te hîn bike, wekî meriv tenê bi nan najîn, lê bi her xeberekê dijîn, ya ku ji devê Xudan *tê*" (Qanûna Ducarî 8:3, NLT). Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî nivîsar e "tê", lê ne ku "hat".

Xebera Xwedê piştgirîyê dide me: "Binihêrin wekî hûn Wî înkâr nekin, Yê ku dibêje [li gora wedê niha]. Çimkî heger ew netirsîyan ku Ew înkâr kirin, Yê ku li ser dinîyayê got, wî çaxî emê jî netirsîn, heger em berê xwe ji Wî vegefrînin, Yê ku ji Ezmîn dibêje" (Îbranî 12:25, NKJV). Û tu cara wê yekê bîr nekin, wekî ew çî ku Ew dibêje, her dem anegorî Încîlê ye.

Lê belê, heger hûn ji Încîlê beşekê digerin, bona ku wê yekê îzbatkin, çî ku hûn dixwezînin bikin, ew yek rêya Xwedê nîne. Îsa dikaribû bi Xwe Xwera bigota: "Ez bona qenckirina nexweşa rûnkirîme: dêmek ezê lez herim û destê xwe bidime li ser Lazar, çawa ku min pêşda ew yek kiribû". Dewsa wê yekê Ew hîvîyê sekinî ku Ruhê Xwedê bilivîya, û tenê peyî wê yekêra Ew jî livîya.

Qûmistan ew cîh e, li kîderê Xwedê me tîne ku me hîn bike, wekî her cêribandîneke kirina tiştêkî bona Wî, bêyî karebûn û rêberîya Wî, badîhewa ye. Dema ku em bi rastî fem bikin, wekî beden nikare tu tiştêkî bi qîmetê heta-hetayê bike, wî çaxî emê hazirbin ku wê xiyalê û wan progirama mîyaserkin, yên ku Ewî dane me. Qûmistan cîhê hazirbûnê ye: ew şuxulkarîya mîyaserkirina soz e. Werin em peyî mînaka Îsa herin û Ruhva bêne rêberkirinê, bona ku hemû tiştî bi cûrê xwestina *Xwedê* bikin, lê ne ku bi xwestina *xwe*.


SERKEFTINA LI QÛMISTANÊ

“Hemû xemgînîyên me, usa jî em, yên mirinêne. Xemgînîyên nemirî bona merivên nemirî tunene. Ew tîn, lê şikir ji Xwedêra, ew usa jî diçin. Mîna teyredên ezmana, ew li ser serê mera difirin, lê ew nikarin nava meda bijîn. Em roja îroyîn dizêrin, lê sibê emê şa bibin”.

- Çarl Spêrcên

“Dema ku meriv rêberîya xwedêtîyê qebûl nakin, ew dibine mîna merivên beyanî. Lê ewê ku gura qanûnê dike, ew şa ye”.

- Gotinên Silêman 29:18, NLT



Nenihêrî wê yekê, wekî em dikevîne qûmistanê, lê ew meremê meyî dawî nîne. Heger em li qûmistanê hemû tiştî rast bikin, emê qûmistanêda bighîjine serkeftinê û ji sînoren wê derbikevin.

Wextê qûmistanêke min aktîvîya min êdî bi temamî ser hevda hatibû. Ez serwêrê qulixdarîya cahila bûm û tê bêjî wê qûmistanê gelekî dirêj kişand. Ez êdî şikber bûm, wekî ew hal wê wextekê bihata guhartinê. Lê rojekê, piştî wedekî kurt, wextê ku pirsgirêkên min tevî serwêrê min destpê bûn, yê ku dicêriband min bêhurmet bikira û ji xebatê derbixista, Ruhê Xwedê da kifşê, wekî nava jîyana mînda guhartinê hebe. Ew yek wî çaxî bû, wextê ku Xwedê eyan kir, wekî ezê bihatama şandinê li “civîn û hemcivînen li hemû bajarên Amêrîkayê, ji kenarê rohilatê destpêkirî, hetanî kenarê rojavayê û ji sînorê Kanadayê destpêkirî hetanî sînorê Mêksîkayê, berbi Alyaskayê û adên Havayê...”.

Lê belê, çawa ku min êdî da dîyarkirinê, ew yek rojtira mayîn gewimî û heya nava wedê wê hevtîyêda. Şeş meh bêyî îzbatbûneke zêde derbas bûn. Û rojekê, nişkêva, serwêrê minî mezin hate civînê û got, wekî Xudan nîşanî wî dabû, wekî serwêrêkî wî (em nava serwêrtîya wê civîna 11 meriv bûn) zûtîrekê wê bibe terfîkirê gerok û wê êdî li civîna qulix neke.

-Con Bîvêr, ew serwêr tu yî, - ewî got.

Feqet, wede derbas dibû (dîsa şeş meh derbas bûn, heger ez rast bim), û ez hela hê li qûmistanê bûm. Û nişkêva, nava sê hevtîyada, min ji civîna cuda-cuda bona terfîkirinê hevt dewatname stendin. Ji wan

civîna yek ji sînore Kanadayê hetanî li wir rêya sehetekê bû. Ya mayîn li kenarê Florîdayêyî Başûr bû, ya sisîya ji Okêana Edil rêya sehetekê bû, lê ya çara nêzikî sînore Mêksîkayê bû. Ez çûme ofîsa serwêrê xwe û min jê pirsî ku min gerekê çi bikira. Ew kenîya û got:

-Con, min gote te, wekî Xudan ew yek nîşanî min daye. Tê kifşê, wekî wedê teyî li vir êdî ser hevda hatîye.

Zûtirekê (meha ewlinda, sala 1990-î), wextê berevbûnekê, serwêr destê xwe danî li ser min û Lîzayê, û hetanî roja îroyîn em terîfkirên gerokîn. Ez gerekê bêjim, wekî nava encamê hîvîyêsekinandina Xwedêda me diha *zêde* rez dîtine (ez nikarim gotina “diha zêde” gelekî bidime xebatê), ne ku wî çaxî heger me bi xwe destpê bikira qulix bikira, wextê ku bi fikira min ez êdî hazir bûm.

Ez dixwezim dîsa wî faydeyî nava navê xweda bibînim. Ev e menî, wekî merivekî 60-salî, yê ku bi dil cimeta Xwedê hiz dike, dikare derheq xweda bi bêqelpî gilî bike. Ez dixwezim, wekî hûn bi açixî navê xwe mîyaser bikin. Hetanî xilazkirinê, îzinê bidin ku ez bi çend fikirên tomerîkirinêye girîngva tevî we pareve bibim.

Nêt-meremê rast

Em gerekê li ser meremê Xwedê xwe merkez bikin, lê ne ku li ser wan tişta, yên ku dicêribînin pêşkeftina me bidine sekinandinê. Dîtinoka meye rast gerekê hebe, heger em dixwezim bighîjine meremê rast. Wê tişteki gelekî xirab be, wekî em rêke dirêje tam derbas bibin û bighîjine xeta şaş. Ew yekê bibe tiragêdîya, wextê ku tu sîlih bizvirînî alfyê nîşangehêye şaş û wê nîşangehê bixî.

Fêrisî gelekî xebathiz bûn, lê menîyên wan yên bona berjewandîyên şexsî bûn. Dîtinoka wane rast tune bû û bo wê yekê jî wana nîşangeha rast nexist.

Nav û meremê Xwedê, yê bona me: bo cimeta Wî, kîjanin? Nava Efesî 1:11-da nivîsar e: “...ku her tişt li gora meremê Wî pêşda qîrarkirî be, Yê ku hemû tiştî li gora şêwira xwestina Wî dike” (NKJV).

Gelek meriv gotina “pêşda qîrarkirî” dibihên û texmîn dikin, wekî

ew yek wedê konkrêt nade kifşê. Bona ku em vê fikirê fem bikin, em gerekê vê gotinê lê binihêrin. Xebera “pêşda” dide kifşê, wekî ew yek pêşîya destpêkirina tişteki ye, lê xebera “qirarkirî” dide kifşê ku dawîya wê şuxulkarîyê tê qirarkirinê. Ev herdu xeber tevayî didine kifşê: “dawîyê hetanî destpêkê qirarkin”. Bi vî cûreyî, Efesî 1:11 dide kifşê, wekî Xwedê pêşîya çêkirina me meremê merivatîyê êdî qirar kirîye.

Romayî 8:28,29-da nivîsar e:

“Em zanin ku her tiştîda Xwedê dike ku wanra bibe qencî, yên ku Wî hiz dikin û li gora qaz-qudreta Wî gazikirîne. Çimkî Xwedê kîjan pêşda bijartin, ew jî pêşda kifşê kirin ku bibine mîna Kurê Wî, wekî Îsa nava gelek xwîşk-birada nixurî be”.

Meremê Xwedê, yê ku Ewî bona me jî destpêka wededa qirar kirîye, ew e wekî em, yên ku Xwedê hiz dikin, li gora xeysê Îsa Mesîh bin. Her tişteki ku nava jîyana me û qulixa meda tê kirinê, gerekê bi vî meremî bibe. Meremê Xwedêyî sereke, yê bona çêkirina we ew nîne, wekî hûn bighîjine koma qulixêye açix, bi mîlîyona dolara pêşkêşî padişatîya Xwedê bikin, bibine artîstekî eyan, yan jî karîyêra açix çê bikin. Meremê wîyî sereke usa jî qenckirina nexweşa, mîyaserkirina mîsfîyayên merivhizîyê, xilazkirina cangorîyên tirafkîngê, azakirina merivaye jî narkotîka û qazanckirina undabûyîya nîne. Ev cedandin bi çiqasîva bi qedir û başbin, em gerekê fem bikin, wekî geleka ev tiştê kirine, lê negihîştine xeta dawî. Wana bi açixî şuxulkarîya xwe ser hevda neanîye, çimkî guhdarîya wana berbi qulixê bûye, lê ne ku berbi dilê Xwedê, yan jî meremê qulixêyî rast.

Niha pêwîst e caba vê pirsê bidin: “Bona çî Xwedê pêşda qirar kirîye ku em bibine mîna Îsa Mesîh? Meremê Wî kîjan e?”. Bersiv zelal e: çimkî Ewî em hiz kirin û xwest tevî me nava pêwendîyada be, bona ku “li nava wan zamanên ku wê bîn, dewlemendîya kerema Xweye bêhimber, hindava meda bi saya Mesîh Îsa, bi şîrinayî bide kifşê” (Esefî 2:7).

Kûçîkekî min û Lîzayê heye, navê kîjanî Lêksî ye. Ew gelekî baş e, aktîv û zîrek e, lê pêwendîyên meye tevî wî sînorkirîne. Carina bona min

gelekî nebaş e, wekî ez nikarim tevî wî qise bikim. Feqet pêwendîyên meye tevî kurikên me lap cûrekî mayînin. Ew çiqasî mezin dibûn, awqasî pêwendîyên meye tevî wan dihatine guhartinê. Emekê wanî mezin nava jîyana meda heye. Awa bona çî Xwedê em çê kirin. Ew naxweze ku pêwendîyên nimiz hebin, yên ku mîna yên tevî Lêksîne. Ew dixweze ku kur û keçên Wî hebin, bona ku jî dil berbi dil hevva bêne girêdanê.

Hema ji sêrîda jî ev bû meremê Xwedê. Wextê ku Xudan meriv çê kir û li baxçê Êdênê danî, Ew tevî Adem digerîya û nava pêwendîyada bû, çimkî Ewî Adem hiz dikir. Peyîhatîkî Adem nêt-fikira Xwedê fem kir. Derheqa wîda nivîsar e: “Henox rêya Xwedêda diçû û nişkêva bû qatî, çimkî Xwedê ew hildabû” (Destpêbûn 5:24). Nivîskarê kaxweza Îbraniya dinivîse, wekî Henox “...hate gotinê, wekî ew li Xwedê xweş hatibû” (Îbranî 11:5). Bona çî Henox li Xwedê xweş hatibû? Gelo menîya wê yekê qulixa wî bû? Na xêr, lê ew bû, wekî ew tevî Wî nava pêwendîyada bû.

Ew hemû tiştê, ku Xwedê pêşda kirîye, niha jî dike û wê pêşerojêda jî bike, û ew hema bi wî meremî ye. Dêmek, meremê qûmistanê ew e, ku me rast bike, bona ku em bibine mîna Îsa Mesîh.

Heger em meremê Xwedêyî bona xwe tê berdin, emê bibine cûrekî mayîn û emê bi ruhanî paşda herin. Heger em meremê Xwedê çawa civîn tê berdin, wî çaxî emê hişkbîn û emê ser hevda bêne guvaştinê, emê werguhêzî îdara ku bi prînsîpên vê dinîyayêva pêşda diçe, bibin. Em guhdarîyê didine li ser faydeya, reqemên diha mezin û avahiya, lê ne ku li ser hazirkirina şagirtên mîna Mesîh (binihêre Metta 28:19).

Em careke mayîn gotinên Silêman 29:18 bixwînin: “Li kîderê eyantî tune, cimê li wir wê bibe nezeftkirî (NKJV).

Xwedê derheqa wê yekêda dibêje, wekî wextê ku eyantîya me hebe, ewê îzinê nede ku em bi navê nimizva razîbin, yê ku şikilê Wî û mîna-hevbûnê têra nabîne. Ewê îzinê nede me ku em razîbûnê texmînkî, çimkî em hela hê mînanî Wî nînin, rû bi rû li Wî nanihêrin, û rûmeta Wî ya eyanbûyî nabînin. Ewê îzinê nede me, ku em xêncî xwestina Wîye kamil tiştêkî mayîn qebûl bikin. Ewê îzinê nede me ku em bibine mînanî vê dinîyayê û bi rêyên dinîya bedenîva herin.

Bi xebardana derheqa dîtînokêda, Îsa got: “Çira bedenê çav e. Heger çavê te pak e, tamamîya bedena teyê ronahîbe. Lê heger çavê te xirab e, tamamîya bedena teyê tarî bibe” (Metta 6:22,23). Ewî derheqa çavê meyî matêrîyalîda nedigot, lê derheqa çavê dilê me, yan jî femdarîya meda digot.

Hûnê bibine merivên usa, çawa ku hûn dilê xweda rastfîyê qebûl dikin: “Çimkî ew usa ye, çawa ku ew dilê xweda difkire” (Gotinên Silêman 23:7, NKJV).

Hûn çawa halê xwe dinihêrin, wê bi wê yekê bê qirarkirinê ku hûnê çawa nava wê yekêra derbas bibin. 12 cesûsên ku li welatê Sozdayî gerîyan û nihêrîn, dîsa ew tişt dîtî, dîsa ew bajarên sûrkirî, dîsa ew eskerên wan miletên ku li Kenanê diman. Lê belê, ji wan 12-a dudu, Yêşû û Kalêb, ew hemû tişt bi cûrekî mayîn dîtî. Wan herduya hal usa fem kirin, çawa ku Xwedê ew yek didît, lê yên mayîn welatê Sozdayî li gora cêribandin û karebûnên xwe dîtî. Çimkî çavên wan xirab bûn, kirên wan (yan jî, bi gotinên Yêşû, “temamîya bedenê) jî xirab bûn. Wana dijî xwestina Xwedê got û kir, û Ewî got, wekî behsa wane anî “xirab” bû.

“Bêje wan: “Ez saxim, -Xudan dibêje,- Min bihîst çî we got, xût usa ezê bînime serê we. Li vê qûmistanêda cinyazê weyê bimînin. Yê wan hemûyên jimartîye weke hesabê we, ji 20-salfîyê jortir, kî-jana ku hindava Mînda bêhna xwe teng kirine. Evana wê nekevîne li erdê ku Min sond xwer, wekî we lê warkim, xêncî Kalêbê kurê Yifûneh û Yêşûê kurê Nûn”” (Jimar 14:28-30).

Menî çî bû, wekî wan deh cesûsa behsa xirab anîn, rûyê çîda wana sozê Xwedê nestend? Menî femdarîya wane hindava dîtina wanda bû. Dîtina wana ne ku ya pêxembertîyê, lê ya tebyetî bû û behsa ku wana anîbû, li ser dîtina wan hatîbû hîmdanînê.

Bona ku qûmistanêra bi serkeftin derbas bibin, em gerekê hemû tiştî wî cûreyî bibînin, çawa ku Xwedê wê yekê dibîne. Dema ku Xwedê cesûs şandine welatê Sozdayî, zarokên Îsrayêl îdî ji salekê zêdetir bû ku gazinê xwe dikirin. Wî çaxî êdî femdarîya wan ya xirab bû: Eyantîya wan

tune bû, û ew hatibûne guhartinê. Dêmek, wextê ku Xwedê îzin da wan, ku ew wî welatî bibînin, li kîderê şîr û hingiv dikişîya, wana ew hemû tiştên qenc hesab hilnedan, yê ku li wir hebûn. Dewsa wê yekê wana guhdarîya xwe da li ser merivên li wî welatîyî qewat.

Ew merivên ku tenê qûmistanê dibînin (û dijarîyên wêva girêdayî), wê li qûmistana xwe bimirin. Ew merivên ku berê xwe didine berbi Wî û wê dîtînokê, ya ku Ewî soz daye wan, wê qûmistanêra derbas bibin, bibine leşkerên pîrozbûyî, yê ku hazirin welatê Sozdayî hildin, yê ku pêşîya wan e û ewê bona rûmeta Xwedê li wir bijîn.

“Lema em ji vê yekê venakişin (gumanbir nabin)...Belê, ji deravava dêris dibin, diçin, lê dilda roj bi roj nûyejîyîn dibin. Çimkî cefên meye dem-demî sivik me dikine xweyê rûmeta girane heta-hetayêye bêhimber. Awa em dîna xwe nadine tiştên ku xuya dibin, lê yê ne xuya (bi dîtina mîna Xwedê), çimkî tiştên xuya bona wextekîne, lê yê ne xuya heta-hetayîne” (B Korintî 4:16-18).

Himberî wan tiştên ku emê bistînin, wedê li qûmistanê derbaskirî û cefayên li wir, çawa yê sivik û dem-demî tên hesabê. Bi rastî, wextê ku hûn li qûmistanêne, gelekî dijar e bi sivikayî nêzikî wî halî bibin heger dîtînoka weye derheqa wê yekêda tune ku piştî derketina ji qûmistanê çî hîvîya we ye.

Wextê ku ez qûmistanêra derbas dibûm, ew yek tu cara çawa “wede-kî kurt” nedihate texmînkirinê. Ez carina difikirîm: “*Gelo evê wextekê xilas bibe? Gelo ew tiştê ku Xwedê soz daye wê bê sêrî?*”. Wî çaxî min gerekê fikirên vî cûreyî ji xwe dûrxistana û nava Xudanda piştgirî bida xwe. Min ew pêxembertî dianîn bîra xwe, yê ku min stendibûn û bi wana min şerkarî dikir (binihêre A Tîmotêyo 1:18). Ew pêxembertî bona jîyana min dîtînoka Xwedê bû, û Ewî ew dîtînok bi Ruhê Xwe, bi Xebera Xwe minva eyan dikir.

Li qûmistanê deşta şêr şexsê me ye. Şexs ji fikirê, texmînkirina û xwestinê ye. *Xwestin* ew beşa şexsê we ye, ya ku qîrar dike ku hûnê rêya Xwedê bibijêrin, yan ya bedenê bibijêrin, hûnê hemû tiştî bi cûrê xwes-

tina Xwedê binihêrin, yan hûnê cefayên xweye li qûmistanê binihêrin. Petrûs dinivîse: “Hevalên hizkirî, ez çawa binelî û bîyanîyê wedelû” eşaretîyê didime we, ku hûn ji xwestinên vê dinîyayê dûr bimînin, yê ku dijî şexsên we şer dikin” (A Petrûs 2:11, NLT).

Faktora qirarkir ew e, ku guhdarîya we li ser çî ye, li ser Xudan, yan li ser şexsê we? Ew xwestinên bedenî, yê ku fikira weda şerkarîyê dikin, wê berbi berjewardîyên şexsî bicedînin û wê we ji dîtinoka xwedêtîyê dûrbixin, çimkî rêya Xwedê ne ku çûyîna peyî şexsê we ye, lê ya ku dijî şexsê we ye.

Ew mizgînîya ku nava rojên meda ji alîyê gelekada hatîye terîfkirinê û qebûlkirinê berbi jîyana bedenî def dide. Roja îroyîn gelek bangên belavkirî nabêjine me ku bedena xwe xaç bikin. Ew dibêjin, ku bedenê hiz bikin û xwestinên wê mîyaserkin, nenihêrî wê yekê, wekî ew xwestin dijî nêt-fikira meye dawîne, ya ku ew e ku em bibine mîna Îsa Mesîh. Gelek cara têma wan bangaye hîmlî ev e: “Xwedê bona min çî dikare bike?”, lê ne ku: “Xwedê ji min çî dixweze?”. Mizgînîya ku hêsabûnê hiz dike, nade kifşê, wekî bi çûyîna peyî Mesîh, emê rastî cefayên rast bîn. Ewê gelek meriv hîn kirine ku ew bi serî xwe bijîn. Mizgînîya wî cûreyî bawarmenda bona bûyîna leşkerên Xwedê sîlih nake.

Pawlosê şandî derheqa vê yekêda dibêje, şagirtê xwe Tîmotêyora dinivîse:

“Awa tevî cefê me be, mîna eskerê Mesîh Îsayî qenc. Tu esker şuxulê binelîtîyêva mijûl nabe, wekî li seresker xweş bê”
(B Tîmotêyo 2:3,4).

Rûyê wê mizgînîyêda, ya ku hêsabûnê hiz dike, terîf dike, wextê ku em rastî tengasîya tîn, em rêya revê dibijêrin, dewsa wê yekê ku em rû bi rû li ber wê dijwarîyê bisekinin û ser bikevin. Mizgînîya wî cûreyî ne ku dîtinoka ezmanî, yan jî pêxembertîyê, lê dîtinoka xwehizîyê pêşda tîne.

Pawlos jî dinivîse:

“Awa Egrîpa padişa, ez miqabilî wê dîtina li ber çevaye ji ezmên nesekinîm. Lê min pêşîyê yên Şamê, Orşelîmê û temamîya to-

Qûmistanê çawa derbas bibin

#12 Kifşkirina bikin

Ez vê kitêbê 59-salîya xweda dinivîsim: wede gelekî lez diçe. Dema ku ez paşda dinihêrim, ez fem dikim, wekî wextê bûyîna mine nava qûmistanada ez gelekî gihîştîme, nenihêrî wê yekê, wekî minva dihate texmînkirinê ku ez dewsa pêşdaçûyîne paşda diçûm. Awa bo çi hevalê meyî berê Îbo dinivîse: “Ez pêşda diçim...ew li wir nîne... Lê Ew rêya min zane: Wextê ku Ew cêribandina min ser hevda bîne, ezê mîna zêr derkevim” (Îbo 23:8,10, NKJV).

Ez dikarim bi guman bêjim,wekî 90 selefê matêrîyalên kitêbên min (lê min êdî 20 kitêb nivîsîne) ez ne ku wextê zêdayê, lê wextê zîhabûnê hîn bûme, wextê ku min wedê xwe li qûmistanê derbas kirîye. Dêmek, şêwira min bona we: fesal kifşkirina bikin, wextê ku hûn li qûmistanêne. Ew çi ku hûn nava wan êtapada hîn bibin, wê qewata mezin bide meriva (usa jî pêşerojdêda bide we). Kê zane... diqewime rojekê hûn derheqa cêribandinên xweda kitêbê binivîsin.

Hevalê min, ez dixwezim nava jîyana weda hema niha pêxembertîyê bikim. Bi guhdarî dîna xwe bidine wê yekê, ku ezê wera çi bêjim. Nava wedê ku Xwedê qirar kirîye, Ewê tiştekî kifş nava jîyana weda bike, yê ku wê tesîreke mezin li ser geleka bihêle. Dêmek, heger hûn îzinê bidine Wî ku Ew wî meremî mîyaser bike, bona kîjanî hûn li qûmistanêne. Gelek meriv wê wî hukumî li ser xwe bibin û hûnê nava temamiya heta-hetayêda şa bibin, bi dîtina rezê şikestîbûna xwe. Hevalê min, hûnê mîna zêr derkevin, êdî cêribandî, qewat û amin.

praxên Cihûstanêra dannasîn kir, usa jî necihûyara ku tobe bikin, berbi Xwedê vegerin û kirên qenc bikin, wekî bê kifşê ew ji gunehkirinê vegefîyane. Bona vê yekê cuhîya ez partsgehêda girtim, xwestin min bikujin” (Karên Şandîya 26:19-21).

Vê dinîyayêda gelek dîtînok hene, lê tenê yek heye, ya ku “dîtînoka ezmîn e”, ya ku xwestina Bavê ye. Guhdarîyê bidine ser ku Pawlos çî dibêje: “Bona dannasînkirina van tiştan, çend cuhîya ez girtim û cêribandin min bikujin”. Ewî berbi dîtînoka ezmîn divedand û rastî dijîderketina mezin dihat. Heger ewî bawarîya xwe li Mizgînîya ku jîyana hêsa dannasîn dike, bianîya, çawa ku gelek meriv roja îroyîn dannasîn dikin û bawar dikin, wê usa jî ew dîtînok mîyaser nekira. Ewê negihîştan cem Egrîpayê padişan, çimkî hela hê pêşda ewê bicedanda ji dijwarîya paşda bisekinîya, yên ku wê rastî wî bihatana.

Yêrêmîya jî Încîlêda merivek bû, yê ku berbi dîtînoka ezmîn divedand, û nava encamê şikestîbûna Xweda ew bi devkî û bi fikirdarî zêrandin didîtin. Rojekê ew ji wê yekê westiya û destpê kir hinekî gazina bike: “Çima çerxa nepaka rast e? Çima hemû bêbext xêr û xweşîyêdanin?” (Yêrêmîya 12:1).

Xwedê gote wî: “Heger tu peyara revîyî, westîyayî, êdî tê çawa nigê xwe hespara biavêjî? (Yêrêmîya 12:5). Bi gilîkî mayîn gotî: “Yêrêmîya, heger tu ji peyayê mîrêcin diwestî, tê çî bikî, heger tu rastî sîyarên wî bêyî?”.

Şer ji pevçûyîna ye

Em gerekê bîr bînin, wekî serkftinên mezin bêyî pevçûyînên mezin nabin. Halê Yêrêmîya çiqas diçû xirab dibû. Li ser bêhurmetkirinên bi devkî zindankirin zêde bû, lê piştî hinek wede ew peyayî çelê kirin û usa hiştin, bona ku ew li wê derê bimira. Lê belê, Xwedê ew ji hemû tengavî û zêrandinên wî aza kir.

Roja îroyîn pîranîya bedena Mesîh rastî êrîşên bi fikira tê, lê ne ku zêrandinên fîzîkî, yên ku rastî Pawlos dihatin. Emê çawa bikin, heger cûrê wê yekê bê guhartinê? Tengavîyên roja îroyîn gerekê qewatê bidine

me, bona ku pêşerojêda em li ber pevçûyînên diha mezin teyax bikin.

Qûmistan qampa leşkerî ye bona şerên pêşerojê. Çawa ku em leşkerên nûye cahil dişînine qampa leşkerî, bona hazirbûna dema şêr, usa jî Xwedê leşkerên Xweye berevkişî dişîne qûmistanê, bona ku wana li wir hazir bike ku ew navên xwe nava çêkirina padişatîya Wî da mîyaserkin. Dijwarîyên mezin, kîjana leşker gerekê wê qampêda alt bikin, tirsên wan, zeyîfî û gumanbirîya wanin. Hema wî cûreyî jî şerên mezin, rastî kîjana em li qûmistanê tên, di dilê meda diqewimin.

Dijwarîke here mezin, rastî kîjanê em tên, gumanbirî ye. Carekê, wextê min dua dikir, Xudan ji min pirsî ku antonîma serxwatbûnê kîjan e?

“Bêguman, tirs e”,- min gotê.

“Gumanbirî ye”,- Ewî got.

Ez tu cara bin wê ronahiyêda derheqa wê xeberêda nefikirîbûm. Û min carekêra fem kir, wekî nava Xebera Xwedêda xeberên “qewat be û ser xwe be”, ku heşt cara bona Yêşû hatine gotinê, xeberên berdilhatinê bûn, bona ku ew gumanbir nebûya (binihêre Jimar 13:20, Qanûna Ducarî 31:6,7,23, Yêşû 1:6,7,9,18). Xudan zanibû, wekî wê şerekî mezin bibûya. Gumanbirî li qûmistana û wextê şera pêşda tê, wextê ku em fikirên xwe li ser xwe, lê ne ku li ser Xwedê û mîsîya xwe didine merkezkirinê.

Meremê dijmin ew e, ku guhdarîya we bide ser we: ewî ev stratêjî li qûmistanê dijî Îsa da xebatê. Îsa birçî bû, çimkî 40 rojî tu tişt nexweribû û mîrêcin gotê: “Heger Kurê Xwedê yî, bêje ku ev kevir bibine nan... (Metta 4:1-11). Fikira vê cêribandinê ev bû: ji progirama Xwedê cuda qewata Xwedê bidine xebatê, bona mîyaserkirina xwestinên bedenê. Em gerekê bîr nekin, wekî wextê ku Xwedê pêşkêşekê dide, meriv usa jî cabdarîya mezin distîne: ew gerekê wê pêşkêşê şaş nede xebatê, lê wî cûreyî bike çawa ku Xwedê dixweze. Xwedê wê hewcetîyên Îsa bida razîkirinê, lê usa çawa ku Ewî têra dîtibû. Dema ku mîrêcin çû, milyaket hatin û qulixî Îsa kirin.

Em careke mayîn binihêrin ku Îsa derheqa qulixa Xweda çi dibêje:

“Lema Îsa wanra got: “Ez rast bêxêlif wera dibêjim ku Kur nikare xwe serî xwe tiştêkî bike, Ew tenê wan tiştên ku Bav dike, Ew jî dike. Bav çî dike, Kur jî usa dike”” (Yûhenna 5:19).

Guhdarîyê bidine li ser xebera “dibîne”. Îsa bêyî qirara Xwedê tu tişt nedikir.

Nava wedên zîhabûnêda cêribandineke me jî ew bû, wextê ku bi cûrê xwestina xwe dikî, lê ne ku hîvîya xwestina Xwedê dibî. Mînak, ew yek dikare bide kifşê ku qewta Xwedê jî wedê qirarkirî zûtir bidine xebatê, bona ku ji Xwedê tiştêkî bistînin. Hûn dikarin bînin ber çavê xwe, wekî deşta şêrda leşkerê li gora emirê ofîsêrê xwe şer neke? Ew yek dikare him bona leşker, him jî bona leşkerên mayîn encamên giran pêşda bîne. Li qampa leşkerî û wextê telîmbûna tevayî, leşker hînî qedandina emirkirina dibe, bona ku wextê şêr bi bêaqilî zyanê nede xwe û hevalên xwe.

Ew yek girîng e, wekî wê yekê bîr nekin, çî ku Ezman li me eyan kirîye. Wedê usa wê hebe, wextê ku em bifikirin: “*Ez gerekê hema niha bersivê bistînim*”, yan jî “*Ez gerekê hema niha gavê biavêjim: heger tu tiştî nekim, hemû tiştê unda bibe*”. Heger weva tê texmînkirinê ku Xwedê wera tu tiştî nabêje, ew yek nade kifşê, wekî Ew wera *xeber nade*. Ez dixwezim bêjim, wekî Xwedê bi gelek cûra nava jîyana meda ye. Wî çaxî ew bang, ya ku Ew “dide” we, ev e: “hewce nîne, ku tu niha tiştêkî bikî”. Nava halên wî cûreyîda em gerekê *hîvîya Xudan bisekinin* û necêribînin bi xwe guhartina bikin:

“Hîvîya Xudan be, bila dilê te teyax û qewat be, û hîvîya Xudan be” (Zebûr 27:14).

Heger em guhdarîya xwe li ser hewcetiyên xwe bidine merkezkirinê, lê ne ku li ser Wî, gumanbirî û giranî wê dilê meda îzbat bibin. Em nikarin îzînin bidine xwe ku bixalîfin, û guhdarîya xwe bidine li ser “tengavîya sivik”. Dewsa wê yekê em gerekê berê xwe bidine berbi mezinaya rûmeta heta-hetayê, ya ku bona me nava wê tengavîyêda dişuxule (binihêre B Korintî 4:17).

Ev e şabûna li ber me dianî, û ev yek gerekê bibe dîtinoka me.

Şabûna li ber me dianî

“Xwîşk-birayên min, şabûneke mezin hesabkin, gava hûn bikevine nava cûre-cûre cêribandina. Femdarî ye, ku cêribandina bawarîya we sebirê pêşda tîne. Û sebir jî bila dûmka we dirêj bike, wekî hûn kamil û gihîştî bin, tu kêmasîke we tunebe” (Aqûb 1:2-4).

Şabûn qewata ruhanî ye, ya ku îzinê dide me, ku em ber dijwarîya û cêribandina teyax bikin. Guhdarîyê bidine ser wekî nivîsar e: “Bi temami çawa şabûn hesab bikin”, - ne ku çawa “Pareke şabûnê, lê para mayîn keder”. Dilê meda gerekê tevî şabûnê keder tunebe. Derheqa wê yekêda bifikirin. Bînin ber çavên xwe, wekî zincîreke we heye, ya ku ji 99 xe-leqên şabûnê ye û yek tenê ya kederê ye. Qewînbûna wê zincîrê hema bi wê xeleqa tek-tenêva wê bê qirarkirinê. Zincîr gerekê ji sed xe-leqên şabûnê be û navda gerekê tu xe-leqeke kederê tunebe, bona ku ew qewata we hebe, ya ku bona halê we pêwîst e.

Em zanin, wekî hêsa ye wan hala “çawa bi temami yên şabûnê hesab bikin”, kîjanada hemû tişt baş e. Feqet nava vê beşêda tiştê usa nivîsar nîne. Em gerekê wedê cêribandina “çawa bi temami yê şabûnê hesab bikin”, qûmistanê, zêrandina, tengavîyê, dijwarîya û dijîderketinên her cûreyî. Xwedê dibêje, çimkî Ew zane, wekî “qewata we şabûna Xudan e” (Nêmîya 8:10). Şabûna bona pêwendiyên nêzîke tevî Wî qewatê dide me.

Jina min û malbeta min, kur, bûk û nebîyên min şabûnê didine min. Dema ku ez ji wan dûrim, ez fotoşikilên wan dinihêrim û ew yek her dem şabûnê dike dilê min. Ew jî qewatê dide min.

Nêmîya hema derheqa wê yekêda digot. Cimet êtapa dijwarra derbas dibû û Nêmîya kire gazî: “Rûyê dijwarîya xweda ber xwe nekevin:berê xwe bidine berbi Xudan. Çimkî, wextê ku hûn nêzîkî Wî bibin, şabûnê dilê we tijî bike, û hûnê qewat bin” (şirovekirina min).

Rûmetdayîn her dem wê guhdarîya we bide li ser Xudan. Wextê tengavîya hêsaye derheqa karebûna Xwedêda bîr bikin, hema rûyê wî hukumîda, kîjanî em texmîn dikin. Dawid piranîya zebûrên xwe nivîsî, wextê ku ew nava tengavîyada bû. Bi rûmetkirina Xwedê, ewî

karibû nava halê gelekî nebaşda qewat bimîne.

Îşaya 61:3-da Xwedê dibêje, wekî Ew dide me “ rûmetê...dewsa koziya, serê wan kofi kin, dewsa heznîtîyê rûnê şabûnê bidime wan û dewsa ruhê merimîyê, çuxê rûspîtîyê”.

Qewimandinek tê bîra min, wextê ku min zîhabûn texmîn dikir û min ji nûva ev xeber fem kir. Ez li malê tenê bûm û wî çaxî giranîk hate ser min. Min Încîla xwe hilda, lê min gelekî bi dijarî dixwend. Min duakirin destpê kir û hemû tişt diha xirab bû. Dilê xweda min dengê Ruhê Xwedê bihîst: “Dengnivîsareke xweye pesindayîne dayne û guhdar bike”. Ez çûme li wê oda ku teyîb bû û min ew miqamê pesindayîne pêva kir, destpê kir bistirêm. Diha zêde lazim bû, û min *cêriband* li ber Xudan bireqisim. Min giranîke usa dilê xweda texmîn dikir, ku tê bêjî ez li ser hesinê helandî direqisim. Ez nava şerkarîya rastda bûm.

Wextê ku stiran xilaz bûn, min texmîn kir, wekî gerekê careke mayîn min ew stiran bidana ser. Cara duem min guhdarîya xwe da ser xeberên ku ji devê min derdaketin. Nişkêva min dilê xweda Îsa li ser text û huba Wîye mezin dît. Dilê min şabûnêva tijî bû, û min destpê kir li ser xwe guman bireqisim. Min texmîn kir, wekî berê min ji min dûr ket û zivirî alîyê mezinaya Îsa. Nava niv sehetê peyîra min distira, ez direqisim û mîna merivê beyanî ez nav mala meye biçûkda direvîm. Ew giranî dûr ket û ez bi jîyanê û qewatêva tijî bûm, ya ku niv sehetî pêşda li cem min tune bû.

Wextê pesindayîne guhdarîya min careke mayîn çû li ser Wî. Min careke mayîn ew yek li ser xwe texmîn kir, derheqa çida Îşaya dinivîse: “Hûnê bi şabûn avê ji kanîyên xilazbûnê bikişînin” (Îşaya 12:3). Bi destî şabûna Xudan, min destpê kir ji bîrên xilazbûnê qewatê bikişînim.

Pesindayîn alî me dike, ku em berê xwe bidine berbi şabûna li ber me dianî, lê ne ku berbi halê li dor-bera.

“Awa ku awqas elaleta şedaye giran dora me girtîye, de werin em hemû giranîyê û wî gunehê ku rihet li me diwele, ji xwe dûr bixin û bi teyax lecmeydana û pêşîya xweda birevin. De îdî em dîna xwe bidine Îsa, wî Pêşîkêşî, û Kamilkirê bawarîya me, Yê ku bona wê

şabûna pêşîya Xwe xaç hilanî, şerm ber tiştêkî hesab nekir, paşê kêleka Xwedêye rastê ser text rûnişt. Awa ser Wî bifikirin, Yê ku li ber wan gunehkarên miqabilî Xwe teyax kir. Hingê hûnê newestî û ji îlacê nekevin. We hê heta xûnrêtinê miqabilî guneh şer nekirîye” (Îbranî 12:1-4).

Îsa cefayê mezin kişand, yê ku kesî tu cara *nekişandîye* û *wê nekişîne*, bi xweyîkirina berê Xwe, yê li ser şabûna li ber Wî danî, ya ku êtapa piştî xaçbûnê ye. Şabûna Wî ew rûmet bû, ya ku piştî cefayên Wî wê bihata, û wê li peyî xwe gelek kur û keç bianiya nava padişatîya Wî, nava kîjanad-anin usa jî hûn û ez.

Awa em çawa bi rêça Wî diçin. Piştî înkarkirina şexsê xwe û xaçkirina bedena xwe, *jîyana heta-hetayê* hîvîya me ye. Piştî cefakişandina bedenî, gihîştina lazîm pêşda tê, bi saya kîjanê em diha nêzîkî Îsa dibin. Piştî dijwarîyên qûmistanê rûmeta diha mezin tê. Pawlos dinivîse: “Ez awa texmîn dikim, ku cefê meyî vî zemanî, li ber rûmeta wê meva eyan bibe, ne tu tişt e” (Romayî 8:18).

Rûmeta Xwedê hetanî vegera Wî wê li civînê eyan bibe. Rûmeta Wî wê awqasî mezin be, wekî ewê xilazbûnê bîne bajar û welatên tam. Vê dinîyayê hela hê tu cara tiştê mîna qewata Wî nedîtîye, yê ku wê bi destî wan peyîhatîyên Mesîh eyan bibe, kîjana îzin dane Xwedê ku wana paqij bike. Ev rêtina Ruhê Wî, ya ku wê dirûna mezin bîne, wê hewca piştgirîya merivahê nîbe. Qewat û rûmeta Xwedê wê piştgirîyê bidine wê yekê.

“Delalno! Ji wê alava tengavîyê ecêbmayî nîbin, ku bona cêribandinê tê serê we û nefikirin ku ev çi belav bû li we qewimî. Lê şabin ku hûn tevî cefên Mesîh dibin, wekî wextê xuyabûna rûmeta Wî hûnê jî ji şabûnê geş bin” (A Petrûs 4:12,13).

Careke mayîn, şabûna li ber me danî kîjan e? Rûmeta Wî, ya ku wê nava jîyana wan merivada xuya be, kîjana rûyê şikestîbûna Mesîhda cefadîtine. Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî cefê we weke wê şabûnê

ye, kîjanê hûnê bibînin û bîra xweda xweykin, wekî çiqasî dijîderketin mezin e, awqasî rûmet mezin e.

Jîyana xwe winda bikin

Hevalê min, çûyîna li peyî Xwedê nedine sekinandinê, wextê ku dijarî pêşda tên. Ez zanim, wekî Ewê berbi halên dijwar rêberîyê li we bike, çimkî şerkarî çiqasî mezin e, awqasî serkeftinê mezin be, him bona padişatîya Xwedê, û him jî bona we. Wextê wan şerkarîya, her dem, vê yekê bîr nekin:

“cêribandinên usa nayêne serê we, pêştirî wan cêribandinên ku têne serê merivên mayîn. Lê Xwedê amin e, Ew nahêle ku hûn jî qewata xwe der bêne cêribandinê. Ewê cêribandinêda delîlekê jî bike ku hûn bikaribin teyax bikin” (A Korintî 10:13).

Nenihêrî wê yekê, ku cêribandin çawa tê texmînkirinê, hûn dikarin wê yekê bi açixî û bi rûmet derbas bibin. Heger usa nîbûya, hûnê rastî wê cêribandinê nehatana: Xwedê wê îzina wê yekê neda.

Heger hûn jîyana xwe *hiz bikin*, hûnê demên dijwarda teslîm bibin. Hûnê peyî Wî neçin û jîyana we wê bêfayde be.

Eyantî 12-11-da nivîsar e: “Ewana pê xwîna Berx û xebera şedetîya xwe ser wî ketin, emirê xwe heta mirinê hiz nekin”.

Ew merivên ku jîyana xwe hiz dikin, diha zêde bona xwe xemgînin, ne ku bona xwestina Xwedê, lê Îsa dibêje: “Çimkî kî ku dixweze emirê xwe xilas bike, ewê winda bike û kî ku emirê xwe bona Min winda bike, ewê bibîne” (Metta 16:25).

Hûnê bikaribin li ber hemû tiştî teyax bikin, çi ku pêşîya we ye, heger tenê hûn jîyana xwe winda bikin. Ez dixwezim ber dilê weda bêm ku hûn pêşda herin, “hetanî ku Ruh ji Ezmîn li ser meda birije. Wî çaxî qûmistanê bibe deşta rezdar, û deşta rezdar jî wê dirûna bereket bide” (Îşaya 32:15, NLT).

Qûmistan ne ew cîh e, li kîderê em gerekê sîlihên xwe daynin û teslîm

bibin. Li qûmistanê em gerekê qewat û serxwe bin, bona ku bikaribin xwestina Xudan mîyaser bikin. Qûmistan ew cîh e, li kîderê em gerekê li ser xwe guman gura Xudanda bin û dijî mîrêcin derkevin.

Heger hûn niha li qûmistanêne, usa ye Xwedê hûn anîne li vir, bona ku hûn bizanibin dilê weda çi heye. Gelek cara, ew tiştên ku min çawa cêribandinên mîrêcin hesab dikirin, bi rastî ew govekên jîyana mine veşartî bûn, nava kîjanada gerekê em gura Mesîhda bin.

Wextê ku hûn berbi rewayê ezmana dicedînin, van xebera bîra xweda xweyî bikin:

“Lê şikir ji Xwedê ku timê me pêga koma Mesîhe serkeftinêda pêşda dibe û bêhna naskirina Xwedê bi me her dera belav dike” (B Korintî 2:14).

“Çi wê bikaribe me ji wê hizkirina Mesîh biqetîne? Derd-kul, talî-tengavî, zêrandin, xelayî-celayî, bêsitari, qeda-bela, yan şûr...? Lê em nava van hemû tiştada hê zêde ser dikevin, bi saya Ewî ku em hiz kirin” (Romayî 8:35,37).

“Lê şikir ji Xwedê, ku em bi destê Xudanê me Îsa Mesîh ser xistin” (A Korintî 15:57).

Terka çûyîna li peyî Xwedê nedin! Teslîm nebin! Wê dîtînokê xweykin, ya ku Ewî daye we, nenihêrî wê yekê, ku halê dor-berên we çi cûreyîne.

Ûsiv nava halekî usada bû, û dihate texmînkirinê, wekî guman tune bû, wextê ku ew avîtime çelê û paşê li welatekî mayîn ew zindan kirin. Tê bêjî jîyana wî êdî ser hevda hatibû. Pêşeroja wî wê çawa bûya? Bîr bînin: “Ew tişt ji destê mêriv nayê, lê ji destê Xwedê tê, çimkî Xwedê dikare her tiştî bike” (Marqos 10:27).

Hema wî cûreyî jî derheqa wedane. Çiqasî dijwar be, bîr nekin: “Hemû tişt bona yê ku bawar dike, îzin heye (yan jî tiştê bûyîne ye)” (Marqos 9:22).

Berê xwe li ser şabûna pêşîya we dianî xweykin, ya ku rûmeta Wî ye

ku weda eyan bûye. Hûnê qewatê bistînin ku wan tengavîya altkin, rastî kîjana hûn tîn. Bi temamîya dilê xwe Wî bigerin, û bawar bikin, wekî Ew bi Ruhê Xwe, bi Xebera Xwe wera xeber dide. Heger hûn usa bikin, hûnê li qûmistanê bighîjine serkeftinê.

“Wîra, Yê ku dikare we ji ketinê xweyke û li ber rûmeta Xwe bêqisûr eşq bide sekinandinê,
Xwedêyê bêşirikî, bêheval,
Xilazkirê mera, bi destê Îsa Mesîhê Xudanê me,
şikir û mezinayî,
qudret û hukumat be,
berî her-heyê û niha jî û heta-hetayê!
Amîn (Cihûda 1:24,25).

PIRSÊN BONA GOTÛBÊJKIRINÊ

Heger hûn vê kitêbê tevî dera “*Qûmistan*” dixwînin (ya ku fikreke gelekî baş e), ez pêşniyar dikim, ku hûn vîdêyoya hînkirinêye bona her hevtê têradîtî temaşe bikin, û pirsên anegor nava koma xweye biçûkda gotûbêj bikin. Vîdêyoyên hînbûnêye dera “*Qûmistan*” fikirên vê kitêbêye sereke diweklînin û berfireh dikin: dêmek, wê diha başbe, heger hemû tevbûyî him van vîdêyoyên hînbûnê temaşe bikin û vê kitêbê bixwînin.

Ev hemû tişt bona we ye.

Ders 1

Serê kitêbêyî ewlin bixwînin

1. Firqîya di navbera her heyîtîya Xwedê û hazirîya Wîye eyanbûyî kîjan e? Bona çi ew yek girîng e, wekî em firqîya di navbera wan herdu tiştada bizanibin?
2. Bona çi girîng e fem bikin ku em nava çi êtapêdanin, û em bizanibin ku em li qûmistanêne, yan na?
3. Bi fikira we, bona çi mîrêcin qûmistanê dide xebatê ku me bicêribîne, ku em bi rezedilî gunehê bikin, yan bawarîya xwe berdîn?
4. Bona çi Xwedê îzinê dide, ku em wedê xweyî li qûmistanê bidine dirêjkirinê?

Ders 2

Serên kitêbêye duem û sêem bixwînin

1. Cêrge meremên qûmistanê hene. Vê dersêda ji hevt meremên kifşkirî kîjan diha gelekî fikirdarîya weda man û bona çi?
2. Bi fikira we, bona çi mayîna gura Xwedêda zêdaya ruhanî pêşda tîne?
3. Qûmistan wedê eşkerekirina şexsê te ye. Hinek tiştê kifş bikin, yên ku hûn li qûmistanê derheqa xweda û derheqa şuxulkarîya Xwdêye tevî we hîn bûne.
4. Nava vî wedê şikestbûnêda, hûn çawa hîn bûne ku bi Xwedêva qewat bibin?

Ders 3

Serê kitêbêyî çara bixwînin

1. Di navbera soz û mîyaserkirina wîda şuxulkarîya hertimî heye. Bi fikira we, ev şuxulkarî bona çi girîng e?
2. We dîna xwe daye wê xebatê, ya ku şuxulkarîya sozdayînê nava jîyana weda mîyaser dike?
3. Bi fikira we, bona çi Xwedê pêşîya hazirbûna weye bo wê yekê soz dide?
4. Bona çi ew yek girîng e, wekî ji alîyê Xwedêda sozê bona jîyana we hebe, lê ne ku bernama pêncsaleye ji alîyê weda hazirkirî hebe?

Ders 4

Serên kitêbêye pêncâ û şeşa bixwînin

1. Bi çi cûreyî himberîhevkirina jîyanên Şaûl û Dawid alî me dikin, ku em girîngîya paqijbûna Xwedêye qûmistanî fem bikin?
2. Bi paqijbûnê zêr diha nerm dibe: sirîya xweda, Xwedê şuxulkarîya paqijbûnêye hindava Xweda diha zêde eyan dike. Wê yekê şirove bikin, ku nazikaya hindava Xwedê çi dide kifşê?
3. Wextê ku şuxulkarîya Xwedêye paqijbûnê gunehê yan jî zeyîfîya veşartî eşkere dike, bersiva me gerekê çi cûreyî be?
4. Şuxulkarîya paqijbûnê çi cûreyî alî me dike ku em diha zelal Îsa eyan bikin?

Ders 5

Serê kitêbêyî hevta bixwînin

1. Bona çi Xwedê gazinkirinê hiz nake? Nava êtapa jîyana weye nihada cîhê bîntengîyê çi cûreyî ye?
2. Firqîya di navbera merivên gazindare nava kitêba Malaxî û gazina Yêrêmîyada kîjan e? Bona çi Xwedê li ser koma ewlin hêrs ket, lê bersiva gazinên Yêrêmîya da?
3. Dîwan qîrarê dide kifşê, lê ne ku gunehkarîyê. Wextê ku dîwan li mala Xwedê destpê dibe, Ew qîrar dike ku kî ye layîq bona ku qulixî Wî bike. Bi fikira we, Xwedê çi hesab hildide, wextê ku vê qîrarê qebûl dike?
4. Xwedê derdanên usa digere, yên ku bona qulixê başin. Hûnê firqîya di navbera gazikirî û bijartîda çawa şirove bikin?

Ders 6

Serê kitêbêyî heyşta bixwînin

1. Caba weye pêşin kîjan bû, wextê we bihîst ku cefa pêşkêş e? Fikira we dawîya vê dersê çi cûreyî hate guhartinê?
2. Xwedê wê îzinê nede, ku hûn ji teyaxê xwe zêdetir bên cêribandinê. Gelo ev yek piştgiriyê dide we, û çi cûreyî?
3. Xwedê wê nehêle, ku qewata we li ser wê derecê bimîne. Li gora vê gotinê, progirama Xwedêye bona we çi cûreyî ye?
4. Hene hukum û pêşerojêda emê rastî wana bên. Niha Xwedê îzinê dide me, ku em cêribandinên usara derbas bibin, yên ku mînanî wan hukumanin. Xwedê derheqa pêşeroja weda çi gotîye, û gelo ew yek alî we dike, ku hûn wan hukuma fem bikin, kîjana hûn li ser xwe dibin?

Ders 7

Serê kitêbêyî neha bixwînin

1. Her dem nîne, wekî çûyîna li peyî Xwedê li nêzîkî aqila tê texmînkirinê. Bona çi dijwar e gumana xwe bidine ser Xwedê, wextê ku Ew cûrê şuxulî ji alîyê meda qebûl kirî “diteribîne”.
2. Hûn çi texmîn dikin, wextê ku Xwedê nava wedê ji alîyê weda qîrarkirî naşuxule? Hûn hukumên çawa û cêribandina texmîn dikin, wextê ku tê bêjî sozê Xwedê derengî dikeve?
3. Hûn dikarin bêjin ku nava vê rastîyêda hûn li ser vê fikirêne: *“Heger beden tişteki dixuliqîne, bedenê jî mecbûr bibe wê yekê xweyî bike”*? Ew yek ji tiştên mayîn bi çiva cuda dibe, kîjana Xwedê bi destî we dixuliqîne?

4. Çi we dide bawarkirinê ku hûn bi rêya ji alîyê Xwedêda qirarkirî diçin?

Ders 8

Serê kitêbêyî deha bixwînin

1. Qûmistan ji wan cîha ye, li kîderê Xwedê Xwe eyan dike. Wî çaxî bona çî dema ku em li qûmistanêne, meva tê texmînkirinê ku Xwedê ji me dûr e?
2. Ew yek çî dide kifşê ku berê ewlin berbi Xwedê bicedînin, lê ne ku berbi duayên Wî?
3. Bona çî ew yek qezîya ye, wextê ku soz yan jî navê we bona we dibe diha girîng, lê ne ku Xwedê bi Xwe?
4. Dema ku hûn dibînin ku çawa Xwedê Xwe li merivên Încîlê eyan dike, bi çiqasî ew yek hêvîdarîyên weye nava şuxulkarîya qûmistanêda diguhêre?

Ders 9

Serê kitêbêyî yanzda bixwînin

1. Ew yek bo çî girîng e ku em fesal bin ku berdildahatinê ji kederê distînin, bi taybetî wextê zîhabûna ruhanî?
2. Kokên meye ruhanî çî cûreyî qewîn dibin, wextê ku em diha zêde nava dua û kitêba Pîrozda kûr dibin, bi taybetî wî çaxî, wextê ku em naxwezin wê yekê bikin?
3. Gelo ew yek gumanê dide me, wekî êrîşa mezine li ser dirûna we pêşîya eyanbûna wê carekêra tê?
4. Bona çî fikirmîşbûna dora aminaya Xwedê wedê weyî li qûmistanê diguhêre?

Ders 10

Serê kitêbêyî dunzdeha bixwînin

1. Qûmistanê çi cûreyî hûn hazir kirine, bo ku hûn derbasî êtapa jîyana xweye bi sirê bibin?
2. Bona çi guhartin bi dijwarî tê dayînê? Dijwarîya weye here mezin bona hînbûna guhartinê kîjan e?
3. Nava şuxulkarîya tezekirina meşkên weye şerabêda çi diha zêde li ser we hukum hişt? Bona çi hema wê yekê guhdarîya we kişande li ser xwe?
4. Bona hildana tiştên nû em gerekê yê kevin berdin. Bona çi hûn gerekê berdin, bona ku yê nû bikaribin qebûl bikin?

ZÊDEKIRIN XILAZBÛN BONA HEMÛYA

“Heger tu bi devê xwe îqrar bikî, ku Îsa Xudan e û dilê xweda bawar bikî ku Xwedê Ew ji nava mirîya rakirîye, tê xilas bibî. Çimkî bi dil yek bawar dike, rast tê hesabê û bi dev îqrar dike, xilas dibe”.

- Romayî 10:9,10

Xwedê dixweze, ku jîyana weye tam û layîq hebe. Ew bi dil bona we xemgîn e û dixweze ku hûn progirama Wî bona jîyana xwe mîyaser bikin. Lê belê, tenê rêyeke berbi wê yekê heye: hûn gerekê bi destê Kurê Xwedê, Îsa Mesîh, xilasbûnê bistînin.

Bi saya mirina Îsa û rabûna Wîye ji nava mirîya Xwedê rê hazir kir, ku hûn bikevine padişatîya Wî, çawa kur yan keça Wîye hizkirî. Qurbanîya Îsaye li ser xaç jîyana heta-hetayê û bi bereket li we hatîye pêşkêşkirinê. Xilasbûn pêşkêşa Xwedêye bo we ye: hûn nikarin tu tiştî bikin, ku wê xilasbûnê qazanekin, yan layîqî wê bin.

Bona stendina vê pêşkêşa giranbiha, berê ewlin hûn gerekê gunehê jîyana ji Efrandarê xwe cuda, xwe mikur bèn, çimkî ev yek hema koka hemû gunehên weye kirî ye. Tobekirin peyman a gelekî berk e bona stendina xilasbûnê. Petrûs ev yek zelal kitêba Karên Şandîyada wê rojê da kifşê, wextê ku pênc hezar meriv xilasbûn stendin: “Awa tobekin û berbi Xwedê vegezin, bo ku gunehên we bêne resîtîkirinê” (Karên Şandîya 3:19). Încîl eyan dike, wekî ji me her kesek çawa xulamê gunehê hatîye vê dinîyayê. Ev xulamî ji gunehê Adem destpê bûye, yê ku bi zanebûn gura Xwedê nekir. Bi tobekirinê, hûn qîrarê qebûl dikin ku êdî tu cara gura şexsê xwe û mîrêcin nekin, yê ku bavê

derewê ye, lê gura Xudanê xweyî nû Îsa Mesîh bikin, Yê ku emirê Xwe bona we daye.

Hûn gerekê serwêrtîya jîyana xwe teslîmî Îsa bikin. Qebûlkirina Îsa, çawa Xudanê xwe, dide kifşê ku hûn îzîninê didine Wî ku Ew serwêrtîya temamîya jîyana we (ruh, şexs û beden) û wî hemû tiştî bike, çî ku yê we ye: Ew serwêrtîya here bilind nava jîyana weda distîne. Wî çaxî, wextê ku hûn vê yekê bikin, Xwedê wê we ji tarîstanê azad bike û wê we cîguhastî padişatîya Xweye nava ronahiyê û rûmetê bike. Bi gilîkî hûnê ji tarîstanê derbasî ronahiyê bibin û bibine lawê Wî.

Heger hûn dixwezin bi destî Îsa xilasbûnê bistînin, vî duayî biwekilînin:

“Xwedêyê Ezmana, ez fem dikim, wekî ez gunehkarim û ji norma heqîtiya Te ketime. Ez bona gunehên xwe layîqî cezakerina heta-hetayême. Spas, ku min nava vî halîda nahêlî, çimkî bawar dikim, wekî Te Kurê Xweyî tek-tenê, Îsa Mesîh şand, Yê ku ji Meyrema qîz hate dinîyayê, bona ku bo min bimira û cezayê min li ser xaç bidîta. Ez bawar dikim, wekî Ew roja sisîya ji nava mirîya rabû û niha jî aliyê Teyî rastê rûniştî ye, çawa Xudan û Xilazkirê min. Îro ez bona wê yekê tobe dikim, ku ji Te cihêbûyî bûm û jîyana xwe heta-hetayê teslîmî serwêrtîya Îsa dikim.

Îsa, ez dihebînim, wekî Tu Xudan û Xilazkirê minî. Bi Ruhê Xweva were nava jîyana min, û min bike zarokê Xwedê. Ez şuxulên tarîstanê berdidim, nêzîkî kijana bûm wextêda, û ji roja îroyînda ezê bona xwe nejîm. Ezê bi kerema Te, bona Te bijîm, çimkî Te emirê Xwe bona min daye ku ez heta-hetayê bijîm. Spas, Xudan! Niha emirê min bi temamî destên Te da ye, û anegorî Xebera Te, ezê tu cara bi navê Îsa şerm nekim. Amîn!”

Hûn bi xêr hatine li malbata Xwedê. Ez piştgirîyê didime we, ku hûn evê behsa baş bawarmendekîra gilî bikin. Ew yek jî girîng

e, ku hûn bighîjine civîneke cîh, ya ku bawarîya xwe li Încîlê tîne, û tevî wan meriva bikevine nava pêwendîya, yê ku wê nava bawarîya weda piştgirîyê bidine we. Hûn dikarin tevî qulixdarîya me (li sayta MessengerInternational.org biqesidin) pêwendîyê îzbat bikin, û emê alî we bikin, ku hûn li cîhê ku hûn lê dijîn, civînê bona xwe bibînin.

We hema hêja nigê xwe danî li ser rêya here ecêb. Ez bo we gelek eyantîya, keremê û hevaltîya tevî Xwedê, nava jîyana weda wera dixwezim.



Armanca qulixdarîya “Mêsincêr întêrnêysinil”-ê ew e ku alî şexsa, malbeta, civîna û mileta bike, ku ew qewata Xebera Xwedê fem bikin û li ser xwe texmîn bikin.

Bi saya vê femdarîyê, him meriv, him cîhên jîyanêye tam wê bêne guhartinê, û civakê bi aktîvî dijî vê neheqîya ku dinîyayê dizêrîne şerkarîyê bike.



Hûn diha zêde dixwezin? Şikil pêlkin.
CloudLibrary.org

Sayta **CloudLibrary.org**-ê dikeke zindî ye, ya ku îzinê dide serwêr û rêberên li temamiya cîhanê, ku ew bi zimanên xwe matêriyalên êlêktronîye belaş bistînin.


Herine sayta **CloudLibrary.org**-ê û cêrge matêriyalên Con û Lîza Bîvêra bixwînin, yên ku bi ji **100-êyî** zêdetir zimana wergerandî hene.

Kitêbên êlêktronî, dersên aûdîo û vîdêyo, kitêbên aûdîo, Mizgîniya...



EWÊN KU BI HETA-HETAYÊVA DILIVIN

Jîyana ku bi kemala xweva roja îroyîn û heta-hetayêva kifş e



Li ser vê dinîyayê jîyan hulm-gulm e, lê gelek meriv usa dijîn, ku tê bêjî peyî wêra tu tişt wê nebe. Lê em çawa vê jîyanê bijîn, ewê qirar bike ku emê çawa heta-hetayê derbas bikin. Kitêba Pîroz eyan dike, wekî bona bawarmenda derecên heqdayîneyê cûre-cûre hene: destanînen hineka wê wextê dîwanê bişewitin, lê bona yên mayîn wê mecala serwêrîkirina tevî Mesîh bê dayîne.

Con Bîvêr, anegorî prînsîbên B Korintî 5:9, bîr tîne, wekî hemû bawarmend wê li ber Mesîh bisekinin, bona ku wî hemû tiştî qebûl bikin, layîqî kîjana ew wextê jîyanê bûne. Ji me gelek meriv wê zendegirtî bimînin, dema ku pê bihesin, wekî piraniya wedê xwe li ser tiştên usa xerc kirine, yên ku wê layîqî heqdayîna heta-hetayê nebin.

Wî çaxî jîyana me çawa dikare kardar be? Kitêba “Ewên ku bi heta-hetayêva dilivin”, wê we hîn bike ku hûn navê xwe eşkere bikin û wî hemû tiştî çendbare bikin, çî ku Xwedê daye we. Bi nihêrandina li jîyanêye ji aliyê heta-hetayêda, hûnê qewatê bistînin, bona ku hûn bo meremên qewîn bişuxulin.

Hûn dikarin vê kitêbê, usa jî gelek dersên Con û Lîza Bîvêraye mayîn, ji întêrnête barkin, heger hûn li sayta întêrnêteye qulixdariya “Mêsîncêr întêrnêşinil”-êye belaş biqesidin:



CloudLibrary.org

HÛN XWE BÎRKIRÎ TEXMÎN DIKIN? NAVA DEMA JÎYANA XWEYE DIJWARDA: HÛN DIFIKIRIN: “XWEDÊ, TU LI KÎDERÊ YÎ?!”

Diqewime berê Xwedê wera xeber dida, lê niha Ew bêdeng e. Diqewime, wekî hûn nava bawariya xweda pêş ketine, lê niha hûn haziriya Wî nabînin. Hûn bi xêr hatine qûmistanê, li wî cîhî, yê ku di navbera stendina sozê ji Xwedê û mîyaserkirina wîda ye.

Heyneser, behseke qenc heye: qûmistan cîhekî xwelî û bêmerem nîne. Xwedê qûmistanê dide xebatê, bo ku we hazir û sîlih bike bo navê we, ew jî wî çaxî, heger hûn rast wê yekêra derbas bibin. Gelek meriv dikarin bifikirin, wekî ew evê êtapa jîyana xwera derbas nabin, çimkî hîvîya Xwedê dimînin. Hûn gerekê vê beşa xebata xwe biqedînin, bona ku wêra derbas bibin, û xebata we gelekî mezin e. Heger hûn naxwezînin wede xerc bikin û her dem li ser cîhekî bisekinin, ew yek girîng e, ku hûn bizanibin ku qûmistan çî ye.

Nava vê kitêba bi eşkerekirinê vî cûreyîva tijî, xudanê kitêbayî bi nav û deng Con Bîvêr we hîn dike, eyantîya û serpehatiyên pîroze girîng û kûrfikir dide xebatê, yê ku wê alî we bikin, ku hûn êtappên jîyanêye dijwarra derbas bibin û wê yekê bistînin, çî ku Xwedê bo we hazir kiriye.



CON BÎVÊR xudanê kitêbayî bi nav û deng û terîfkirê navnetewî ye, yê ku bêyî tirs û bêyî berdaxustinê Xebera Xwedê terîf dike. Con û kevanîya wî Lîza, qulixdariya “Mêsîncêr Întêrnêyşînil” saz kirine, meremê kîjanê ew e, ku peyîhatiyên Mesîh hazir bike, yê ku berbi berdaxustina naçin û vê dinîyayê diguhêrin. Eger ew li male ye, li Koloradoyê, lîstika kaxweza tevî çar kurên xwe dilîze, yan jî dicêribîne Lîzayêra bêje, ku ew tevî wî golfê bilîze.

Van materyala û yê mayî hûn dikarin li vê malperê dest bînin: **CloudLibrary.org**



Ev kitêb ji aliyê xudanê wêda pêşkêş e û ne bona firotanê ye.

Diha xêrê dixwezî?
Şikî pêkin.

